K.T.
Enstîtuya Zanistên Civakî ya Zanîngeha Dîcleyê
Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Doktorayê

MÎNAKA STANDARDKIRINA KURDIYA KURMANCÎ: KOVARÊN HAWAR Û RONAHÎYÊ

Sevda ORAK REŞİTOĞLU
16940312

Şêwirmend
Doç. Dr. Hayreddin KIZIL

Diyarbakır 2022

T.C.
Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Doktora Tezi

KÜRTÇE'NİN KURMANCÎ LEHÇESİNİN STANDARDİZASYON ÖRNEĞİ: HAWAR VE ROHAHÎ DERGİLERİ

Sevda ORAK REŞİTOĞLU
16940312

Danışman
Doç. Dr. Hayreddin KIZIL

Diyarbakır 2022

TAAHHÜTNAME

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ'NE

Dicle Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "Mînaka Standardkirina Kurdiya Kurmancî: Kovarên Hawar û Ronahîyê" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

30/06/2022

Sevda ORAK REŞİTOĞLU

İmza

PÊŞGOTIN

Ziman ji destpêka mirovahiyê ve hebûneke zindî ye ku bi her guherîn û geşedanê xwe pêş dixe. Bi saya peyvan dibe axaftin û têkiliyekê çêdike di nav mirovan de. Her gel li gorî zimanê xwe dikare xwe pênase bike, lewre hêmana ku wî dike *gel* zimanê wî ye. Zimanê ku di serî de wek axaftin derketiye holê, ji demeke gelek dûr û kevn ve wek nivîskî tê bikaranîn. Ji ber vê zimanê ku ewil wek axaftin peyda bûye, piştre bi demê re bi awayekî nivîskî hebûna xwe parastiye. Zimanê nivîskî di belavkirina fikir û ramanên gel de bû unsûreke bingehîn. Ango bi saya nivîsê, ziman ji quncikê xwe derket û rêya xwe berfireh kir, bi vî awayî rola ku girt ser xwe mezintir bû.

Wekî hemû gelên li cîhanê, kurmancan jî bi saya guherandina alfabeyê û bi pêşxistina nivîsê, di warê zimanê nivîskî de ber bi ronahiyê ve gavên mezin avêtin. Nivîsa kurmancan a ku bi alfabeya erebî bû, li gorî hin rewşenbîran têra wan nedikir û dengê zimanê wan bi awayekî xweşik nîşan nedida. Lewra li gorî wan alfabeya erebî, ne li gorî zimanên arî bû. Ji ber vê lêgerîn û nîqaşên li ser guherîna alfabeyê û sererastkirina zimên dest pê kir, di serdema dawî ya osmaniyan de. Di gel belavkirina van fikiran û amadekirina mînakên alfabeyê, ev fikir di wê serdemê de pêk nehat.

Em dikarin sala 1932yan wek şoreşa alfabe û nivîsa kurmancî bihesibînin, lewre di wê salê de ye ku Celadet Alî Bedirxan alfabeya xwe ya ku bi salan bû li ser dixebitî, di *Hawar*ê de weşand. Lê ev alfabe ne halê dawî bû, lewre nîqaşên wê di *Hawar*ê de berdewam bûn, bi taybetî li ser herfên /q/ û /k/yê di çend hejmaran de nivîs hebûn. Lê dawiya dawî ev mesele jî hat çareserkirin û îro jî em alfabeya ku Celadet Bedirxan danî bi kar tînin.

Ev xebata me ya berdest li ser standardîzasyona rastnivîsandina *Hawar*ê ye. Naveroka vê xebatê, ji xeynî destpêkê ji çar beşan pêk tê. Di destpêkê de, ji ber girêdana ziman û neteweyê, behsa netewe û netewetiyê hatiye kirin bi gelemperî, her wiha bi taybetî jî netewetiya kurdên serdema dawî ya osmanî hatiye vekolîn. Di beşa yekem de, ku ev beş wek teorîk bingeha xebata me pêk tîne, li gorî nêrîna Einar

Haugen û Joshua A. Fishman mijara standardîzasyon û plansaziya zimên hatiye vekolîn. Her wiha di vê çarçoveyê de, zimanên fransî û tirkî jî wek mînakên zimanên standardbûyî û sererastkirî cih digrin. Herî dawî nêrîn û fikirên ziman û standardîzasyona rewşenbîrên kurd hatiye dayîn.

Di beşa duyem de jiyana Celadet Bedirxan û kovargeriya wî hatiye lêkolînkirin. Kovara *Hawar*ê ji aliyê alfabe û hişmendiyê ve hatiye nirxandin. Di beşa sêyem de kovarên *Hawar* û *Ronahî*yê di çarçoveya rastnivîsînê de yên wek nivîsîna netewe, ziman, hejmar, daçek, lêker û navên erdnîgariyê de hatine lêkolînkirin. Ewil *Hawar* hatiye lêkolînkirin bi kûrahî, piştre ji aliyê zimên ve têkiliya di navbera *Ronahî* û *Hawar*ê de hatiye nîşandan. Tiştên ku wek hev in an jî ji hev cuda ne, hatine destnîşankirin.

Di beşa çarem de rastnivîsên piştî van her du kovaran hatine lêkolînkirin. Rastnivîsa Arif Zêrevan a bi navê *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (Kirmancî)* hatiye lêkolînkirin. Giringiya vê berhemê ew e ku piştî *Hawar*ê yekem rastnivîs e. Her wiha berhemên Halil Aktug û Kemal Burkay hatine lêkolînkirin. Herî dawiyê jî rastnivîsên Mustafa Aydogan û Komxebata Kurmancîyê ya Weqfa Mezopotamyayê hatine lêkolînkirin ku ev her duyên dawî bi cudahiyên pir biçûk ji hev vediqetin.

Pêkhatina vê tezê helbet bê alîkariya dost û hevalan pir kêm dima. Di serî de dixwazim ji şêwirmendê xwe Doç. Dr. Hayreddin Kızıl re spasiyên xwe bikim. Di xwendina dawî de bi saya nêrînên wî ev tez sererasttir bû. Her wiha ji jûriyê tezê re spas dikim, keda wan a ji bo beşa kurdî pir giranbiha ye; Doç. Dr. Hayreddin Kızıl, Doç. Dr. Osman Aslanoğlu, Doç Dr. Hacı Önen, Prof. Dr. Tahirhan Aydın û Doç. Dr. Ahmet Kırkan ê ku tu car pirsên min bêbersiv nehiştin û bi fikirên xwe rê li ber min ronî kir.

Her wiha spasiyên taybetî ji bo Zana Farqînî dikim ku hem pêşniyaza vê mijarê kiribû hem jî di her merhaleyê de alîkariya min kir, şaşiyên min sererast kirin, mijarên ku ez tê de dudilî bûm di hişê min de zelal kirin. Ji Husên Hebeş re gelek minetdar im ku xebata xwe ya doktorayê wek PDF bi min re par ve kir ku ev yekemîn xebata akademîk e li ser *Hawar*ê û çapa wê li Tirkiyeyê peyda nabe. Ji Ümran Altınkılıç re spas dikim, hem ji aliyê zelalkirina hin mijaran ve hem jî ji bo

peydakirina çavkaniyan gelek alîkariya min kir. Ji bo xwendina dawî û pêşniyazên wî, spasiyên xwe ji Murad Dildar re dikim. Her wiha ji aliyê wergerandina hin hevokên osmanî û şiroveyên wî yên li ser tezê, ji Suat Orak re minetdar im. Ji ber ku ez nedigihîştim ku her carê biçim Diyarbekrê, gelek spasiyên xwe ji Güneş Kan re dikim ku ji bo min karên wê derê anîn cih. Ji Pınar Yıldız re spas dikim ji bo motîvekirinên wê. Her wiha ji hevjînê xwe Hamdullah Reşitoğlu re spasiyên taybet dikim, ji xeynî ku bû şirîkê stresa min, karê mîzanpaja tezê jî wî girt ser xwe.

Sevda ORAK REŞİTOĞLU

Mêrdîn 2022

KURTE

Standardîzasyon di geşedana zimên de yek ji giringtirîn hêmanan e. Her wiha ji bo netewetiyê jî xwedî heman rolê ye. Zimanê hevpar jî ku bi saya zimanê standard çêdibe, ne tenê têkilî û danûstendinê hêsan dike, rê dide ku çanda gelekî bilind bibe, bi vê re girêdayî rewşa xwendewariyê jî zêde dibe û bivê nevê berhemdarî jî digihîje asta jortir. Standardîzasyona ku bi piştgiriya dewletê û avakirina komîsyonan encameke baş dide, li cem kurdan bi awayekî din, ango bi kovarekê çêbû. Celadet Alî Bedirxanê ku vî karê komîsyona "nefermî" girt ser milên xwe, bi hevalên xwe re kovareke nû ya bi navê *Hawar*ê derxist ku alfabeya vê kovarê ya latînî bû, xebatên li ser ferhengê û rêzimanê jî tê de cih digirtin. Di vê kovarê de mirov dikare gelek tiştên nû bibîne wexta li serdema derketina wê binêre, armanca vê xebatê jî lêkolîna li ser rastnivîsê ye, ka gelo di *Hawar*ê de di vî warî de çi xebat hatine kirin, an jî zimanê *Hawar*ê standardîzasyonek ava kiriye an na.

Helbet beriya *Hawar*ê jî hin nîqaş çêbûbûn ji bo sererastkirina zimên û guherandina alfabeyê. Di serdema dawî ya osmanî de nîqaşên bi vî rengî zêdetir bûn, bi vê re girêdayî nîqaşên der barê netewetiyê de jî derketin. Kovar û rojnameyên ku di serdema dawî ya osmanî de derketibûn, ji bo pêşketina kurdan bûbûn cihê perwerde û nîqaşê. Digel van nîqaş û pêşniyazên der barê alfabe û zimanê nivîskî, tu guherîn nehat kirin, lewre li gorî hin rewşenbîrên serdemê guherandina alfabeyê, ango qebûlkirina alfabeya latînî dûrketina ji mislimantiyê bû. Ji ber vê di vî warî de tu guherînek çênebû heta sala 1932yan.

Celadet Bedirxan di *Hawar*ê de hem alfabeyeke nû pêşkêşî kurdan dike hem jî der barê qaydeyên rêzimanê de dinivîse. Ev yekemîn berhem e ku qaydeyên zimên bi alfabeya latînî têne nivîsîn. Ji ber vê *Hawar* dikare ji bo standardîzasyona zimên wekî pêngava ewil bê hesibandin. Lê belê em nikarin bibêjin ku standardîzasyoneke tam pêk hatiye. Lewre ji hejmara ewil ber bi ya dawiyê ve ziman her ku diçe dikemile û ber bi geşbûnekê ve diçe.

Hêj *Hawar* weşana xwe nesekinandiye kovareke nû ya bi navê *Ronahî*yê derdikeve. *Ronahî* kovareke biwêne ye û tê de mijarên wek nûçe û dîrok zêdetir in. Wexta ku mirov berê xwe dide zimanê *Ronahî*yê, mirov dikare kemilîna zimên çêtir bibîne. Gelek qaydeyên rêziman û rastnivîsê di *Ronahî*yê de standard bûne.

Peyvên Sereke

Celadet Alî Bedirxan, Hawar, ziman, zimanê standard, standardîzasyona zimên

ÖZET

Bir dilin gelişim sürecinde en önemli unsurlardan biri de standardizasyondur. Bu unsur ulusçuluk için de aynı rolü oynar. Standard dil sayesinde oluşan ortak dil de, sadece iletişim için değil, aynı zamanda bir milletin kültürünü de üst seviyelere taşır ve bu sayede okuryazarlık artar, ister istemez yayıncılıkta da büyük bir gelişim izlenir. Devlet desteği ve komisyonların kurulmasıyla iyi bir sonuca ulaşabilen standardizasyon, Kürtler açısından daha farklı yollarla gelişti. Mesela bu rolü bir dergi üstlendi. Bu "resmi olmayan" komisyon görevini Celadet Alî Bedirxan, arkadaşlarıyla birlikte *Hawar* adlı dergisinde yürüttü. Bu dergi Latin alfabesiyle basılan ilk Kürtçe dergiydi ve içeriğinde sözlük ve dilbilgisi çalışmaları da yer alıyordu. Bu derginin yayınlanma dönemine de baktığımızda birçok yeni şeyle karşılaşabiliriz. Çalışmamızın amacı da bunlardan biri olan imla meselesi üzerine yoğunlaşmaktır. "*Hawar*'da bu tarz konular yer alıyor mu?" ya da "*Hawar* standard bir dil oluşturabilmiş midir?" soruları çalışmamızın temelini oluşturmaktadır.

Dilin gelişmesi ve alfabenin değiştirilmesi konusu *Hawar*'dan önce de gündemdeydi elbette. Osmanlı'nın son döneminde bu tarz tartışmalar daha da arttı ve bununla birlikte ulusçuluk tartışmaları da gelişti. Bu dönemde çıkan dergi ve gazeteler Kürtler'in ilerleme kaydetmesi için oluşturulan eğitim ve tartışma platformuydu adeta. Alfabenin değiştirilmesi ve yazılı dil üzerine yapılan tartışma ve önerilere rağmen, hiçbir değişiklik yapılmadı o dönemde, çünkü bazı aydınlara göre alfabenin değiştirilmesi, başka bir deyişle Latin alfabesini kabul etmek demek dinden uzaklaşmak demekti. Bu nedenle 1932'ye kadar hiçbir değişiklik yapılmadı.

Celadet Alî Bedirxan *Hawar*'da hem yeni Kürt alfabesini halkına sunuyor hem de dilbilgisi kuralları hakkında yazıyor. Dil kurallarının Latin alfabesiyle yazıldığı ilk eserdir bu. Bundan dolayı *Hawar* dil standardizasyonu açısından ilk örnek olarak görülebilir. Fakat tam bir standardizasyonun oluştuğunu söyleyemeyiz. Çünkü ilk sayıdan son sayıya doğru dil gittikçe olgunlaşıp gelişiyor.

Hawar henüz sonlanmadan *Ronahî* adında yeni bir dergi çıkıyor. *Ronahî* resimli bir dergidir, haber ve tarih yazıları çoğunluktadır. *Ronahî*'nin diline baktığımız zaman dildeki olgunlaşmayı daha net bir şekilde görebiliyoruz. Birçok dilbilgisi ve imla kuralları *Ronahî*'de standartlaşmıştır.

Anahtar Sözcükler

Celadet Alî Bedirxan, Hawar, dil, standard dil, dil standardizasyonu

ABSTRACT

One of the most important elements in the development process of a language is standardization. This element plays the same role for nationalism. The common language, which is formed thanks to the standard language, not only carries the culture of a nation to the next level for communication, but also increases the literacy rate, and inevitably, a great developoment is observed in publishing. Standardization, which could achieve a good result with state support and the establishment of commissions, developed in different ways for the Kurds. For example, a magazine took on this role. Djeladet Ali Bedirkhan carried out this "unofficial" commission with his friends in his journal *Hawar*. This magazine was the first Kurdish magazine to be published in the Latin alphabet and included dictionaries and grammar studies. When we look at the publication period of this magazine, we can encounter many new things. The aim of our study is to focus on the issue of spelling, which is one of them. "Is there such topics in *Hawar*?" or "Has Hawar been able to create a standard language?" These questions form the basis of our study.

Of course, the development of the language and the change of the alphabet were on the agenda before *Hawar*. In the last period of the Ottoman Empire, such debates increased even more, and with it, the discussions of nationalism developed. The magazines and newspapers published in this period were almost an education and discussion platform created for the progress of the Kurds. Despite the discussions and suggestions on changing the alphabet and the written language, no changes were made at that time, because according to some intellectuals, changing the alphabet, in other words, accepting the Latin alphabet meant turning away from religion. Therefore, no changes were made until 1932.

Djeladet Ali Bedirkhan both presents the new Kurdish alphabet to his people and writes about grammar rules in *Hawar*. This is the first work in which language rules were written in the Latin alphabet. Therefore, *Hawar* can be seen as the first example of language standardization. But we cannot say that a complete

standardization has occurred. Because from the first issue to the last issue, the language matures and develops.

Before the end of *Hawar*, a new magazine called *Ronahî* is published. *Ronahî* is an illustrated magazine, mostly news and history articles. When we look at *Ronahî's* language, we can see the maturation in the language more clearly. Many grammar and spelling rules are standardized in *Ronahî*.

Key Words

Djeladet Ali Bedirkhan, Hawar, language, standard language, language standardization

NAVEROK

Rûpel

PÊŞGOTIN ..... **I**

KURTE ..... **IV**

ÖZET ..... **VI**

ABSTRACT ..... **VIII**

NAVEROK ..... **X**

LÎSTEYA TABLOYAN ..... **XIV**

KURTEBÊJE ..... **XV**

DESTPÊK **1**

1. ARMANC Û GIRINGIYA XEBATÊ 1
2. SÎNOR Û ÇARÇOVEYA XEBATÊ 3
3. RÊBAZA XEBATÊ 3
4. NETEWE Û NETEWETÎ 4
   4.1. Netewe û Ziman 9
   4.2. Kurd di Pêvajoya Netewetiyê de 11
      4.2.1. Giringiya Perwerdehiyê di Weşanên Serdema Dawî ya Osmanî de 23

BEŞA YEKEM

ZIMAN JI ALIYÊ STANDARDÎZASYON Û PLANSAZIYÊ VE

1.1. STANDARDÎZASYON Û PLANSAZIYA ZIMÊN 30
1.2. MÎNAKÊN STANDARDÎZASYONÊ DI DÎROKÊ DE 43
   1.2.1. Mînaka Fransî 44
   1.2.2. Mînaka Tirkî 50
   1.2.3. Mînaka Kurmancî 59

1.2.3.1. Rewşa Sovyetê û Alfabeya wan 72

BEŞA DUYEM

CELADET ALÎ BEDIRXAN Û GIRINGIYA *HAWAR* Û *RONAHÎ*YÊ JI ALIYÊ STANDARDÎZASYONÊ VE

2.1. ŞOREŞGERÊ SERDEMEKÊ: CELADET ALÎ BEDIRXAN 76
2.2. HIŞMENDÎ Û GIRINGIYA ZIMÊN DI *HAWAR*Ê DE 88
2.3. ARMANCA *HAWAR*Ê Û FIKIRÊN STANDARDÎZASYONÊ 93
2.4. DANASÎNA ALFABEYA CELADET ALÎ BEDIRXAN 103
2.4.1. Fikirên li ser alfabeyê di *Hawar*ê de..... 110

BEŞA SÊYEM

JI ALIYÊ RASTNIVÎSANDINA KURMANCÎ VE STANDARDÎZASYONA *HAWAR* Û *RONAHÎ*YÊ

3.1. STANDARDÎZASYON DI *HAWAR*Ê DE 113
3.1.1. Lêker 115
3.1.1.1. Lêkerên Hevedudanî 116
3.1.1.1.1. Lêkerên Hevedudanî yên Navdêrî..... 116
3.1.1.1.2. Lêkerên Hevedudanî yên Dançêker 117
3.1.1.1.3. Lêkerên Hevedudanî yên Pasîv 118
3.1.1.2. Lêkera *bûn*ê 120
3.1.2. Daçek 122
3.1.3. /i/ya berî /y/yê 127
3.1.4. Navên Taybetî..... 128
3.1.4.1. Navên Welatan 128
3.1.4.2. Navên Zimanan 129
3.1.4.3. Navên Neteweyan 130
3.1.4.4. Navên Erdnîgarî 132

3.1.4.5. Nivîsîna Navên ku bi Dîn re Eleqedar in 134
3.1.5. Nivîsîna Unwanan..... 136
3.1.6. Qertafa Neyîniyê..... 137
3.1.7. Nivîsîna Peyvan 138
3.1.7.1. Peyvên Devokî 140
3.1.8. Navên Demsal, Meh û Rojan..... 142
3.1.8.1. Navên Demsalan 142
3.1.8.2. Navên Mehan 143
3.1.8.3. Navên Rojan..... 145
3.1.9. Cînavka Paşnûsek 146
3.1.10. Bikaranîna *kes*ê..... 147
3.1.11. Gihanek..... 147
3.1.12. Hejmar 148
3.1.13. /v/ û /w/ 149
3.1.14. Herfa Kelijandinê..... 149
3.1.15. Dubêje..... 150
3.1.16. Navên Stêrkan..... 150
3.1.17. Navên Hêlan 150
3.2. PÊVEKA *HAWAR*Ê: *RONAHÎ* 151
3.2.1. Berawirdkirina *Hawar* û *Ronahî*yê ji Aliyê Zimên ve 155

BEŞA ÇAREM

RASTNIVÎSÊN PIŞTÎ *HAWAR*Ê

4.1. *BINGEHÊN RASTNIVÎSANDINA KURDIYÊ* YA ARIF ZÊREVAN 166
4.2. *DERSÊN ZMANÊ KURDÎ* YA KEMAL BURKAY 171
4.3. *RASTNIVÎSA KURDÎ* YA HALİL AKTUĞ..... 175
4.4. *RÊBERA RASTNIVÎSÎNÊ* YA MISTEFA AYDOGAN Û YA KOMXEBATA KURMANCÎYÊ 177

ENCAM..... 196

ÇAVKANÎ..... 202

GENİŞLETİLMİŞ ÖZET 214

LÎSTEYA TABLOYAN

Rûpel

Tablo 1: Tabloya /i/ya Berî /y/yê ya Celadet Bedirxan……...….127
Tablo 2: Berawirdkirina Her Du Rêberan ji Aliyê Bêjeyên Fransî ve……..185
Tablo 3: Xalbendî……..194

KURTEBÊJE

//	fonem
amd.	amadekar
bnr.	binêrin
c.	cild
çev.	çeviri
h.	hejmar
KTC.	Kürdistan Teali Cemiyeti
KTTC.	Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti
KTTG.	Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi
r.	rûpel
vgz.	veguhêzer
wer.	werger

DESTPÊK

1. ARMANC Û GIRINGIYA XEBATÊ

Ziman di pêşketina neteweyê de xwedî roleke mezin e. Ji ber vê ye ku di dîroka cîhanê de, gelên ku xwestine bibin netewe û di nav miletên din de hêzdar bibin, wan ewil ji sererastkirin, standardkirin û belavkirina zimanê xwe dest pê kiriye. Armanca wan ew bû ku bi vî awayî bibin xwedî zimanekî hevpar û pêşî di nav xwe de hevpariyekê çêkin da ku her kes ji hev fam bike û li encamê jî ev ziman li cîhanê wekî zimanekî xurt belav bibe.

Wexta ku em li rewşa zimanên sereke yên cîhanê dinêrin, yên wek fransî, îngilîzî an jî almanî, em dibînin ku her yek ji pêvajoyekê derbas bûye da ku bibin xwedî zimanê hevpar. Ev pêvajo bi awayekî hêsan nebûye helbet, belkî bi sed salan berdewam kiriye heta ku bi awayekî tekûz cihgir bibe. Ji ber vê, em dibînin ku pêdiviya zimanên kêmnetewe û bindestan tenê bi standardbûnekê tune ye, zimanên ku niha li cîhanê serdest in jî ji pêvajoyeke bi êş derbas bûne, heta ku gihîştine rewşa xwe ya îro.

Zimanê hevpar netewetiyeke xurt diafirîne. Mînaka herî berbiçav Şoreşa Fransayê ye ku berî şoreşê akademiya wan a zimên hatibû avakirin û li gel xebatên vê akademiyê, gelê fransî xwe wek neteweyekê didît û hevgirêdanek çêbû di nav wan de. Helbet ev encam bi piştgiriyeke xurt a dewletê û hişmendiya gel bi hev re çêdibe. Neteweyên bê dewlet di avakirina zimanê xwe yê hevpar û standard de gelek zehmetî dikişînin, lewre ev barê giran li ser milê rewşenbîr û zimannasan dimîne.

Zimanê kurdî jî yek ji van zimanên bêdewlet û bêpiştgirî ye. Di serdema dawî ya osmanî de, rewşenbîrên kurd ên li Stenbolê ji aliyê netewetî û pêşketina zimên de xebateke qedirbilind meşand. Ev xebat wekî me li jor jî got bêyî piştgirî bûn, ango bêyî dibistan bûn ku ev kar herî baş bi dibistanan re dikarin biçin serî. Wan jî bi

xebatên xwe yên şexsî, bi avakirina saziyan û bi van re girêdayî bi weşandina kovar û rojnameyan, xwe bi netewetiya xwe û zimanê xwe ve girê dan.

Ev xebat û hişmendiya netewetiyê piştî hilweşîna osmaniyan zêdetir bû û rewşenbîran bêhtir guh da ser xebatên zimanî. Her çi qas bi avakirina Komara Tirkiyê ev xebat hatibin sekinandin jî, li Sûriyê, rewşenbîrên kurd ên ku li wir bi cih bûbûn, piştî têkçûna karên siyasî, xwe dane zimên û zimannasiyê. Celadet Alî Bedirxan xwedî roleke mezin bû li Şamê û tevî birayê xwe Kamiran Bedirxan, heval û hogirên xwe, xebata xwe ya ku bi salan bû li ser disekinî bi rêya *Hawar*ê pêşkêşî gelê kurd kir.

Her çi qas berî *Hawar*ê nîqaşên li ser alfabe, zimanê nivîskî û standardîzasyonê hatibin rojevê jî, tu car bi rêkûpêk nehatin pêkanîn. Giringiya *Hawar*ê ew e ku fikirên zimanê nivîskî û standardîzasyonê di pratîkê de xuya bûn, tiştê herî giring jî ew bû ku nîqaşên der barê alfabeyê de bi saya vê kovarê bi encam bûn. Her çi qas di hejmarên ewil de zehmetiyên vê alfabeya nû xuya bibin jî, hêdî hêdî kêmasî hatin sererastkirin û alfabe cihê xwe bi awayekî xurt girt. Bandora vê alfabeyê ne tenê li Şamê, cihê ku *Hawar* lê derket, her wiha li cihên wekî Tirkiyeyê û deverên ku kurd li wan dijiyan jî çêbû, wekî Libnanê. Ji xeynî van deveran divê em li komarên Sovyetan jî binêrin ku ev bandor li wir jî çêbû. Piştî hilweşîna Sovyetan alfabeya latînî ya Celadet Bedirxan lê belav bû –ku ji xwe berê alfabeya latînî hebû lê piştre hat qedexekirin û ya kirîlî li şûnê hat çêkirin.

Armanca vê xebatê ji destpêka *Hawar*ê heta dawiya *Ronahî*yê –ku xwediyê vê kovarê jî Celadet Alî Bedirxan bû- lêkolîneke kûr e di warê rastnivîsê de ku ev jî parçeyeke giring a standardîzasyonê ye. Me ji aliyê alfabeyê ve li van kovaran nêrî, her wiha lêkolîna li ser nivîsîna hejmar, dîrok, sal û meh, navên taybet, gihanek û hwd. bûn mijara me, ji xeynî vê ne bi temamî, lê bi awayekî sînorkirî me berê xwe da hin mijarên rêzimanê jî, yên wek nivîsîna lêkera *bûn*ê, nivîsîna qertafên neyîniyê û daçekan.

Bi vê xebatê me xwest em binêrin standardîzasyonek çawa pêk hatiye di *Hawar*ê de, guherîn di *Ronahî*yê de hatine kirin an na, her wiha li ser rastnivîsên piştî van kovaran çi qas bandora wan çêbûye, van rastnivîsên vê dawiyê bi temamî dane

pey şopa *Hawar* û *Ronahî*yê, an jî li gorî pêşketina ziman û jiyanê ji xwe re rêyeke nû dîtine? Di vê xebatê de em ê hewl bidin bersiva van pirsan bi dest bixin.

2. SÎNOR Û ÇARÇOVEYA XEBATÊ

*Hawar*a ku di 1932yan de derketiye ji aliyê alfabeya kurdî ya latînî û xebatên li ser rêzimanê ve wek bingeh tê dîtin. Xebatên li ser alfabe û rêzimanê yên di vê kovarê de hatine kirin, wek xebatên ewil têne qebûlkirin, lewre wek pratîk cara ewil di vê kovarê de hatine meşandin ev xebat. Ji ber ku sînorê me wek *Hawar* hatiye diyarkirin, me tenê di çarçoveya *Hawar*ê de, tevî binbeşên ku bi rastnivîsê re eleqedar in xebata xwe meşand, ji ber vê me li standardîzasyona zaravayên din ên kurdî nenêrî. Tenê em dikarin bibêjin ku me lêkolîneke biçûk jî li ser alfabeya kurdên Sovyetê kir, lewre bi guherîna çend alfabeyan, ya latînî jî hatiye bikaranîn, her wiha giringiya wê ew e ku ew berî alfabeya *Hawar*ê hatiye weşandin.

Di vê babetê de *Ronahî* jî dikeve nav qada xebata me. Ji ber ku hêj *Hawar* weşana xwe berdewam dikir, ew jî derket. Di vê çarçoveyê de analîzkirin û berawirdkirina wê ya bi *Hawar*ê re giring e. Em ê li vê kovara dawî jî binêrin ka gelo ji aliyê rastnivîsê ve çi qas dişibe *Hawar*ê an jî çi cudahî tê de hene.

Her wiha ji ber ku xebatên li ser ziman û standardîzasyonê berî *Hawar*ê di kovar û saziyan de xuya dibin, em ê berê xwe bidin wan xebatan jî da ku em bikaribin bingeha *Hawar*ê bibînin û li ser rewşenbîrên kurd ên serdema dawî ya osmanî bibin xwedî fikirekê, bi taybetî jî em ê li ser Celadet Bedirxan bisekinin ji bo fam bikin ka ev xebat çima derketiye û bingeha wê çi ye.

Ji bo bersivdana van pirsan em ê helbet li ser pêvejoya netewetiya kurdên serdema dawî ya osmaniyan xebatekê bikin. Nêrîn û çalakiyên wan bingeha vê xebatê pêk tînin, ji bo ku konteksta me ya ser standardîzayonê xirab nebe, em ê vê xebata netewe, netewetî û giringiya perwerdehiyê di beşa destpêkê de rave bikin.

3. RÊBAZA XEBATÊ

Bingeha vê xebatê li ser model û pêşniyazên Einar Haugen, Joshua A. Fishman û Charles A. Ferguson hatiye danîn. Einar Haugen çar model danîne ji bo

standardîzasyon û plansaziya zimên: hilbijartin, kodkirin, pêkanîn û belavkirin. Ferguson zimanên cîhanê bi dereceyan nîşan dide: (St. 0, 1, 2) û (W. 0, 1, 2, 3). Ya ewil standardîzasyonê nîşan dide û ya duyem jî bikaranîna wan a ji aliyê nivîsê ve. Her wiha Fishman bi van modelan li zimên dinêre: grafîzekirin, standardîzasyon û modernîzasyon.

Li ser van modelên heyî em ê berê xwe bidin xebata xwe û em ê li ser bisekinîn ka standardîzasyona kurdî li van modelan tê an na. Esas *hilbijartin* yek ji meseleyên bingehîn e ku berî *Hawar*ê jî hatiye zimên, bi hilbijartina zaravayî meseleya standardîzasyonê hêsantir tê çareserkirin. Bi *kodkirin*ê şêwaza nivîskî tê danîn û amadekirin. Bi vî awayî formeke rûniştî çêdibe. Bi *pêkanîn*ê çavkanî têne amadekirin an jî li sazî û dibistanan ziman bi awayekî pratîk tê hînkirin. Herî dawî û dibe ku ya herî bibandor be, *belavkirin* e ku bi rêya medya û weşangeriyê zimanê ku hatiye hilbijartin û wek nivîskî hatiye amadekirin, tê belavkirin di nav gel de.

Wexta ku em di vê çarçoveyê de li *Hawar*ê dinêrin, kurmancî hatiye *hilbijartin*. Bi alfabeya kurdî ya latînî bingehek hatiye danîn û *kodkirin*. Bi nivîsîna metnan *pêkanîn* çêbûye û her wiha di nav gel de hatiye *belavkirin* da ku zimanê nivîskî di nav her kesî de bê zanîn û bikaranîn.

Di vê çarçoveyê de sazî, kovar û rojnameyên serdema dawî ya osmanî hatin lêkolînkirin. Mirov dikare di van xebatan de rastî mijarên wek alfabe, ziman, hişmendî û netewetiyê bê. Di vî warî de rojnameya *Kurdistan* û *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, kovara *Rojî Kurd*ê û komeleya *Hêvî*yê bûne bingeh.

Ji ber ku bingeha mijara me rastnivîsîna *Hawar* û *Ronahî*yê ye, ji nav metnên wan em ê li babetên rastnivîsînê binêrin. Piştî analîzkirina van her du kovaran, em ê li ser rastnivîsên piştî van kovaran jî rawestin.

4. NETEWE Û NETEWETÎ

Dengvedana netewetiyê li cîhanê, li Ewrûpayê kengê dest pê kir û çawa belav bû mijara nîqaşê ye. Li gorî baweriya gelemperî netewetî di serdema şoreşa pîşesaziyê de ji civaka feodal qetiya û bi xwe re çend nirxên nû anî ku perwerdehî, xwendewarî, avakirina çandê, yekîtiya ziman û dîn hin ji wan in. Armanc ew bû ku

bi van nirxan yekîtiyek ava bibe; pênaseya vê ya gelemperî jî netewetî ye ku netewe jî pê re tê û her wiha ev jî nîqaşek e ka netewetiyê netewe ava kir an neteweyê netewetî ava kir. Nêrînên li ser van ji hev cuda bin jî, tiştê ku lêkolîner li hev tên têgiha *hevpar*iyê ye. Ji bo netewe û netewetiyê ev *hevpar*î bi taybetî di qada zimên de giring e, zimanê ku têgihiştina ji hev hêsan dike, ragihandinê ava dike, bi taybetî jî di nav gel de yekîtiyek çêdike.

Li gorî Anthony D. Smith ji demekê ve, ku nayê zanîn, baweriya netewetî ya neteweyan pêk hatiye. Li gorî wî hewce nake pêvajoya pêkhatina wan bê ravekirin. Milet her dem hebûn û tiştê ku guherî pêhesîna wan bû. Dîsa li gorî Smith, hemberî vê baweriya kevn, ekoleke ku bi vê zanistê re mijûl e girêdana netewe û netewetiyê ya bi modernîteyê re derxistine holê. Li gorî vê ekolê mimkin e ku mirov destpêka netewetiyê wek ji dawiya sedsala 18mîn nîşan bide. Modernîstên ku netewetiyê wek binyateke modern dibînin, der barê derketina serdema milet a li Ewrûpayê wek hev nafikirin. Li gorî hinekan ev serdem digihîje sedsala 18mîn û berî wê, lê li gorî hinekan jî ev serdem dawiya sedsala 19mîn û destpêka 20emîn e ku di wê sedsalê de mafê dengdana (ray) jinan çêbûye.[1]

Smith dibêje "dîroka netewetiyê" heye, lê ya modernîst e. Li gorî wî ev dîrok di çaryeka dawî ya sedsala 18mîn de bi Şoreşa Amerîkayê dest pê dike û bi Şoreşa Fransî berdewam dike. Li gorî vê nêrînê netewetî di van çil salên pêvajoya şoreşê de derketiye. Piştre di navbera salên 1810 û 1820î de, wekî ku di nav elîtên Kreole yên Amerîkaya Latîn de bûye, hêdî hêdî li beşên din ên Ewrûpayê –Sirbistan, Yûnanistan, Polonya- jî (dîsa) belav bûye. Yekemîn pêla mezintirîn a netewetiyê bi Şoreşên 1848an ên li Ewrûpayê bi encam bûye ku ev rewş wek "bihara gelan" jî hatiye binavkirin.[2]

Smith wateya netewetiyê li gorî cureyên wateyê yên sedsala dawî wiha pêşkêş dike: pêvajoya çêbûn û pêşketina miletan; hişmendiya aîdbûna miletekî;

[1] Anthony D. Smith, *Millî Kimlik,* Bahadır Sina Şener (Çev.), İletişim Yayınları, *7.* Baskı, İstanbul 2014, r. 76-77

[2] Anthony D. Smith, *Milliyetçilik – Kuram- İdeoloji – Tarih,* Ümit Hüsrev Yolsal (Çev.), Atıf Yayınları, Ankara 2013, r. 125

nimandina miletekî bi ziman û nîşanan; tevgera civakî û siyasî ya ku miletekî temsîl dike; doktrîn û/an jî îdeolojiya hem gelemperî hem jî taybetî ya miletekî. [3]

Smith netewetî û modernîteyê bi hev girê dide û li gorî wî mijara ku di serê her kesî de zelal bûye ew e ku têgiha *netewetî*yê modern e. [4] Her wiha li gorî wî ne tenê netewetî; milet, dewletên milî, nasnameya milî û hemû civakên "navmilî" jî modern in û ne ji ber dîroka wan a nêzik, ji ber ku ji aliyê wesfî ve jî nû ne, modernîst in. Şoreşa Fransî ne tenê îdeolojiyeke nû, lê belê şêwaza civakeke nû, cureya nasnameyeke hevpar a nû, cureyeke nû ya siyasetê û axir cureyeke pergalê ya navdewletî daye destpêkirin. Modernîte di van tiştan de pergala cîhana nû nîşan dide û di heman demê de rewşên nû yên moderniteyê bi xwe jî nîşan dide.[5]

Di pêşgotina pirtûka *Uluslar ve Ulusçuluk* (Netewe û Netewetî) a Ernest Gellner de, John Breully diyar dike ku Ernest Gellner yek ji teorîsyenê herî mezin e di mijara netewetiyê de û diyar dike, li gorî Gellner fikira netewetiyê berhemeke moderniteyê ye, ne ku afirînera wê ye.[6] Her wiha Gellner diyar dike ku netewe û netewetî ne xwezayî ne, lewre ev ne taybetmendiyên mayînde yên rewşa mirovahiyê ne, ev bi pîşesaziyê re derketine. Ev ne bûyerên keyfî, rastlêhatî ne, an jî ne tiştek wisa ne ku mirov berî wan bigire; girêdanên wan ên nêzik, heta yên bi mecbûrî hene bi pîşesaziyê re. Ji ber vê ye ku li ber çavê endamên civata pîşesaziyê netewe û netewetî xwezayî ne û netewetî hêza xwe ji vê xwezayîbûnê digire.[7]

Ji ber vê ye ku Gellner dibêje netewetî ne berhemeke neteweyan e, berevajî vê netewetî neteweyan derdixe holê û li gorî wî dewlemendiyên çandî yên berê jî dibin bingehek ji netewetiyê re. Ango "zimanên mirî têne vejandin, kevneşopî tê îcadkirin, hin taybetiyên xeyalî yên ku mirov dibêje kevn in, têne rojevê."[8]

Her wiha li gorî Smith, miletên derveyî Rojava piştî belavbûna netewetiyê çêbûne. Li Ewrûpaya rojava beşeke mezin a çêbûna miletan pêvajoyeke bêplan e, lê

---

[3] Anthony D. Smith, *Milliyetçilik – Kuram- İdeoloji – Tarih,* r. 15
[4] Anthony D. Smith, *Milliyetçilik – Kuram- İdeoloji – Tarih,* r. 15
[5] Anthony D. Smith, *Milliyetçilik – Kuram- İdeoloji – Tarih,* r. 71
[6] John Breully (Sunuş), Ernest Gellner, *Uluslar ve Ulusçuluk,* Büşra Ersanlı, Günay Göksu Özdoğan (Çev.), Hil Yayın, 3. Baskı, İstanbul 2018, r. 27
[7] John Breully (Sunuş), Ernest Gellner, *Uluslar ve Ulusçuluk,* r. 29
[8] Ernest Gellner, *Uluslar ve Ulusçuluk,* Büşra Ersanlı, Günay Göksu Özdoğan (Çev.), Hil Yayın, 3. Baskı, İstanbul 2018, r. 138

li derveyî Rojava, berejavî vê, milet bi armanc û tevgerên neteweperwerî çêbûne bi gelemperî û miletên rojavayî hema hema bi rasthatinî çêbûne, lê miletên din ên cîhanê wek projeyek hatine çêkirin.[9] Her wiha li gorî Smith têgiha *milet* dikare wiha bê pênasekirin: "Yên ku ax/welatekî dîrokî, mîtên hevpar û bîra dîrokî, çanda gelemper, ekonomiya hevpar, maf û peywirên zagonî yên hevpar parve dikin."[10] Li gel van taybetmendiyan, li gorî Smith sê tişt pir giring in ji bo netewetiyê: xweseriya milî, yekîtiya milî û nasnameya milî û wiha diyar dike, miletê ku nagihîje van her sê armancan nikare li ser piyan bimîne.[11]

Gellner bi du awayan têgiha neteweyê pênase dike û ev pênase jî ji têgihên *hevpar* ên Smith ne dûr in:

1- Du însan heke xwediyê heman çandê ne ji heman neteweyê têne hesibandin. Li vir çand tê wateya raman, nîşane, tevger û sîstema cureya ragihandinê.

2- Du însan heke xwe endamên heman neteweyê qebûl dikin, wê çaxê aîdê heman neteweyê dibin. Ango mirov neteweyan diafirînin; netewe berhema bawerî, dilsozî û piştgiriya mirovan bi xwe ye. Komeke mirovan, ango niştevanên welatekî an jî mirovên ku zimanekî diyar diaxivin, heke qebûl bikin ku aîdê heman komê ne û ji ber vê li hemberî hev hin maf û peywirên wan ên hevpar hene, ancax wê çaxê dikarin bibin neteweyek. Tiştê ku wan dike netewe ew e ku xwe ji endamên heman komê dibînin, ne ku hin taybetmendiyên hevpar ku wan derveyî komê dihêlin. [12]

Hem Smith û hem Gellner li ser modernbûn û nemodernbûna netewetiyê disekinin û her wiha taybetmendiyên netewe û netewetiyê derdixin pêş û bi taybetî jî cih didin *hevparbûn*ê. Lê Benedict Anderson wek tiştekî xeyalî li neteweyê dinêre, ango wek civata siyasî ya xeyalî bi nav dike û dibêje li gorî rewşa xwe hem bi awayekî sînordar hem jî xweser tê xeyalkirin. Li gorî Anderson endamên neteweya

[9] Anthony D. Smith, *Millî Kimlik,* r. 158-159
[10] Anthony D. Smith, *Millî Kimlik,* r. 32
[11] Anthony D. Smith, *Milliyetçilik – Kuram- İdeoloji – Tarih,* r. 20
[12] Ernest Gellner, *Uluslar ve Ulusçuluk,* r. 78

herî biçûk jî dê piraniya endamên din nas neke, li ser piraniya wan dê tiştekî nebihîze û di gel vê jî di mejiyê wan de her dem yekîtî hebe.[13]

Her wiha Gellner di mijara netewetiyê de civata çandinî û ya pîşesaziyê dide ber hev ku di navbera van de mirov dikare bi awayekî aşkera giringiya perwerdehî û zimên bibîne ku ev jî ji xwe bingeha avabûna netewetiyê pêk tînin. Gellner di berhema xwe de destnîşan dike ku çandinî bi gelemperî bi xizman ve têkildar e û hêza fizikî giring e, lê di civata pîşesaziyê de êdî takekesî derdikeve pêş û perwerdehî (xwendewarî/xwendin û nivîsîn) giring e. Ji bo ku mirov bikare bi pêş bikeve perwerdehî pir giring e di serdema pîşesaziyê de. Ji ber vê, hêza fizikî ew qas ne giring e di civata pîşesaziyê de lê xwendewarî giring e.[14] Her wiha li gorî Gellner "xwendewarî êdî ne pisporiyek e, di civakekê de ku her kes pispor e, şert û merca pêşîn a hemû pisporiyan e."[15]

Li gel vê xuya ye ji bo Gellner xwendewariya bi tenê serê xwe jî têrê nake. Divê ev xwendewarî bi zimanê nivîskî yê standard be û divê rasterast nebe jî tenê bi bargiriya dewletekê ev tişt dikare pêk bê da ku perwerdehiyeke tevahî çêbe. Zordestiya ku ji bo gihîştina çandeke standard a ku pişta xwe dide zimanê dayikê ya nivîskî ku bi dewletê re entegre bûye, neteweyan pêk tîne. Hesta xwezayîbûna nasnameya neteweyî, vê tiştê îfade dike ku di civata pîşesaziyê de, dewlet, nifûs û çand bivênevê dikeve nav hev.[16] Gellner bi van gotinan giringiya dewletê jî derdixe pêş di netewetiyê de. Her wiha li gorî wî ne netewe ne jî dewlet di her serdemê de û di her şert û mercan de çêdibin. Hebûna netewe û dewletan ne wek hev e. Lê di netewetiyê de, netewe û dewlet nesîbê hev in, heke yek ji wan tune be ya din kêm dimîne û ev jî dibe trajediyek.[17]

Li gorî vê pênaseyê kurdên ku bi taybetî piştî Şerê Cîhanê yê Yekem ketibûn pey netewetiya xwe, di navenda vê trajediyê de mane. Lewre bi parçebûna osmaniyan –ku heta wê çaxê xwe wek ji parçeyeke wan didîtin- fam kiribûn ku ne aîdê osmaniyan in. Hin derfetên wan çêbûbûn ji bo weşandina rojname û kovaran an

[13] Benedict Anderson, *Hayali Cemaatler – Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması,* İskender Savaşır, (Çev.), Metis Yayınları, İstanbul 2020, r. 24
[14] Ernest Gellner, *Uluslar ve Ulusçuluk,* r. 109
[15] Ernest Gellner, *Uluslar ve Ulusçuluk,* rr. 237-238
[16] John Breully (Sunuş), Ernest Gellner, *Uluslar ve Ulusçuluk,* r. 31
[17] Ernest Gellner, *Uluslar ve Ulusçuluk,* r. 77

jî avakirina dibistanan, lê bi tundbûna rewşê, diviyabû ji xwe re rêyek ava bikin. Berî Şerê Cîhanê yê Yekem tunebûna dewletekê belkî ne ew qas pirsgirêk bû, lewre rewşenbîrên kurd ên wê serdemê xwe wek osmanî didîtin. Lê bi taybetî piştî 1918an, sala ku kovara *Jîn*ê jî dest bi weşanê kir, hişmendiya li ser netewetiyê xurttir bû û mirov dikare bibêje ku di *Jîn*ê de ev gihîşt lutkeyê. Dem û dewran guherîbû û bi vî awayî kurdan nêrînên xwe yên der barê netewetiyê de, di rûpelên kovaran de nîşan didan.

4.1. Netewe û Ziman

Yek ji hêmanên herî giring û hevpar *ziman* e di pêvajoya netewetiyê de. Netewetiya ku behsa nasnameya milî, çanda milî an jî çand û dînê hevpar dike digihîje zimanê hevpar. Ev ziman, wexta standard dibe, rêya avabûna netewetiyê hêsantir dike.

Tu kes nikare dîroka derketina zimên bide. Her zimanek ji paşerojek bêbinî tê û bilind dibe. Ji ber vê ye ku ziman di civakên serdema me de, ji her tiştî bingehîtir têne dîtin. Her wiha ji xeynî ziman tu tişt nikare girêdanek di navbera me û miriyan de çêke ji aliyê hestan ve.[18]

Di pêvajoya avakirina neteweyê de, homojenbûna çandî û zimanî gelek giring hatiye dîtin ji bo avakirina nasnameya neteweyî û her wiha ji bo ewlehiya yekîtiya neteweyî. Ango netewetî, ji bo avakirin û berdewamkirina yekîtiya rawêjî (girîmanekî) yekîtiya zimên derxistiye pêş. Bi vî awayî, zimanên ku wek zimanê neteweyî derketine, wekî neteweyan, bi honakan hatine îcadkirin.[19]

Her wiha, ziman di nav civakê de derketiye û pê ve girêdayî ye. Wekî ku Umut Özkırımlı nîşan dide, li gorî Herder tiştê ku însan dike însan, ziman e. Ziman û fikir jî li gorî wî yek in, lewre berî ziman, behskirina însan bêwate ye; ziman di heman demê de fikir e. Mirovên ku bi zimanekî hevpar diaxivin, asta ewil a milet ava

[18] Benedict Anderson, *Hayali Cemaatler – Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması,* r. 168

[19] Eric J. Hobwsawm, *1780'den Günümüze Milletler ve Milliyetçilik: Program, Mit, Gerçeklik,* Osman Akınhay (Çev.), Ayrıntı Yayınları, 4. Basım, İstanbul 2010. Vgz. Salim Orhan, *Dil Politikaları ve Dil Hakları Üzerine Teorik Çerçeve,* İnönü Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi İnÜHFD, Cilt: 8, Sayı: 2, Yıl 2017, r. 336

dikin, milet jî ji malbatê tê û zimanê hevpar di nav malbatê de tê axaftin, ev jî koma herî biçûk e. Ango, însan xwediyê zimanekî ye û ev ziman jî di civakê de ye.[20]

Di vê kontekstê de ziman, însan û civak girêdayî hev in û bêyî yek ji wan, neteweyek ava nabe. Her însanê ku xwediyê hunera axaftinê ye, ji zimanên heyî yek ji wan diaxive, ev jî nîşan dide ku ew kes endamê/a civakekê ye. Hemû mirovahî dabeşî civakan bûne û însanek li gorî zimanê(n) ku diaxive dibe endamê/a civakekê.[21] Wekî ku Hüseyin Sadoğlu dibêje: "Ji ber vê di navbera ziman û hişmendiya civakê de têkiliyeke pir nêzik heye: qada ku ziman lê ye çi qas mezin be, civaka ku takekesek dê xwe aîdê wê his bike ew qas mezin dibe.[22]

Esas li ser vê fikira Özkırımlı divê mirov behsa ferqa zimanê hevpar û devokan jî bike. Wekî ku Porzig jî diyar dike, di nav zimanekî de gelek devok, an jî diyalekt hene. Ev devok her çi qas di nav sînorên welatekî de jî bin û zimanê hevpar ê welatiyan jî hebe, carinan famkirina ji devokan zehmet e. Ji xwe zimanê hevpar jî ji ber van devokan derdikeve holê. Famkirin, hînbûn an jî belavbûna zimên li vir jî temam nabe, her çi qas zimanekî hevpar ava bibe jî, ziman tiştek wisa ye ku li gorî mijar, pîşe û fikiran jî diguhere. Wexta ku em li cem yekî hiqûqnas an jî bijîşkekî/ê rûnin, dibe ku em termên ku di warê pîşeyên xwe de bi kar tînin baş fam nekin. Ev jî cihêrengiya zimên nîşan dide.[23]

Sadoğlu jî li ser giringiya netewe û zimanê hevpar disekine û dibêje ku ji sedsala 18mîn û pê ve, bi avabûna nasnameyên neteweyî, ziman hêmana herî giring hate dîtin ji bo karakterîzekirina neteweyê. Neteweparêzên wek Schleiermacher, Fichte, Mazzini, Pisacane û Herder difikirin ku bingeha civateke neteweyî zimanê hevpar e. Li gorî van rewşenbîran ziman ne îcadeke takekesî ye, hemû netewe di avabûna zimên de xwedî peywirekê ye. Ji ber vê, zimanekî hevpar hem delîlê hebûna neteweyekê, hem jî sembola aşkera ya yekîtiya neteweyî ye.[24]

---

[20] Umut Özkırımlı, *Milliyetçilik Kuramları: eleştirel bir bakış*, Doğubatı Yayınları, 9. Basım, Ankara 2020, rr. 35-36

[21] Walter Porzig, *Dil Denen Mucize*, Vural Ülkü (Çev.), Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2018, r. 157

[22] Hüseyin Sadoğlu, *Türkiye'de Ulusçuluk ve Dil Politikaları,* İstanbul Bilgi Üniversitesi, 2. Baskı, İstanbul 2010, r. 26

[23] Walter Porzig, *Dil Denen Mucize*, rr. 157-161

[24] Rudolf Rocker, *Nationalism and Culture,* Ray E. Chase (çev.), Black Rose Books, Montreal-New York 1998, r. 276-277, vgz. Hüseyin Sadoğlu, *Türkiye'de Ulusçuluk ve Dil Politikaları,* r. 27

4.2. Kurd di Pêvajoya Netewetiyê de

Di sernavê berê de, me bi nîşandayîna fikirên Ernest Gellner diyar kir ku pêngavên netewe û netewetiyê bi civata pîşesaziyê dest pê kiriye. Bi vê civata pîşesaziyê re, der barê perwerdehiyê de gavên mezin hatin avêtin û xwendewarî ji bo ku mirov bigihîje astekê bû hêmana herî giring. Bi vê ve girêdayî, bajarîbûn û derfetên kar jî zêde bûn. Pêngaveke din a giring a netewetiyê jî xwedîbûna ziman, dîn an jî çanda hevpar e. Miletên mezin ên ku haya wan ji giringî û yekîtiya zimên hebû, di vî warî de bi avakirina saziyên zimên û çapemeniyê dest bi xebatan kirin. Ji bo pêşketina zimên dibistan ava bûn, pirtûkên der barê zimên de yên wek rêziman, rastnivîs û ferheng hatin amadekirin ji aliyê komîsyonan ve.

Ev rewş ji bo kurdan cudatir bû. Kurdên bakur[25] ên ku di bin banê osmaniyan de dijiyan xwe wekî osmanî didîtin. Her wiha mislimanî ji bo wan pir giring bû. Ji ber ku xwe wek misliman, osmanî û piştre kurd didîtin, der barê netewetiya kurdan de gengeşeyek heye. Li gorî hinekan netewetiya kurdan ji Ehmedê Xanî dest pê kiriye ku di berhema xwe de behsa yekîtiya gel dike. Ji bo hinekan di serdema dereng a osmaniyan de dest pê kiriye, li gorî hinekan jî –ku ev nêrîn zêdetir e- piştî hilweşandina osmaniyan, li dora 1918an dest pê kiriye. S. Azad Aslan jî diyar dike ku bi bandora Şerê Cîhanê yê Yekem, rewşenbîrên kurd bi awayekî radîkal ji nêrîna xwe ya osmanîtî dûr ketin. Ango "guherîna ji nişka ve û tund a rewşenbîriya kurd a ji fikira osmanîtiyê bo netewetiya kurd di çar salan de çêbû."[26]

Em ê li vir berê xwe bidin serdema dawî ya osmaniyan û em ê li nêrînên rewşenbîrên kurd ên wê demê binêrin da ku em bikaribin mijara xwe zelaltir bikin.

Stenbol di wan serdeman de cih û warê rewşenbîrên kurd bû. Yên ku mişextî vir bûbûn, yên ku ji bo xwendinê hatibûnê, yên ku derfetek dîtibûn û li wir dest bi kar kiribûn bi awayekî gihîştibûn hev. Malbatên mezin ên wek Bedirxanî, Babanzade û Cemîlpaşa xwedî rolên mezin bûn. Li ser sirgûnî û bicihbûna malbata

[25] Em ê tenê li ser kurdên bakur bisekinin.
[26] S. Azad Aslan,"Folklor û Netewetiya Kurd a Ewil: Guherînên Giring ji Osmanîtiyê ber bi Netewetiya Kurd ve", *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî-Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur-Berawirdî-1,* Ramazan Pertev (Ed.), Sevda Orak Reşitoğlu (wer.), Avesta, Stenbol 2015, rr. 118-119

Bedirxaniyan, Tahir Baykuşak wiha tîne zimên û her wiha avabûna neteweperweriya kurdan a li Stenbolê jî bi vê girê dide:

> Dewleta Osmanî dema mîrektîyekê ji holê radike sirgûnê li mîr, malbata wî û rêveberên mîrnişînê ferz dike. Dewlet di vê dewreya sirgûniyê de ji qabiliyeta van kesan a rêveberiyê sûd werdigire û di nav burokrasiya xwe de wan bi cih dike. Bi vê yekê hewl dide ku entegrasyona van kesan bi dewletê re pêk bîne. Li gel vê yekê zar û ziçên van kesan jî di dibistanên modern ên împaratoriyê de perwerde dibin. Her çi qas armanc entegrekirina wan be jî hin ji wan zarokan li van dibistanan rastî fikirên modern ên vê serdemê tên û di nav tevgera neteweperwer a kurd de cih digirin.[27]

Ev rola ku me li jor behs kir, di serdema Meşrûtiyeta Duyem (1908) de aşkeratir bû, lewre mirov dikare bibêje ku *azadiyeke biçûk* bi dest xistibûn. Yekemîn rojnameya kurdî *Kurdistan* (1898-1902) a ku li Qahireyê derdiket, nikarîbû têkeve nav axên osmanî û xwe bigihîne xwînerên kurd. Deh sal piştî derketina yekem rojnameya kurdî, bi meşrûtiyetê derfetek çêbû ji bo kurdan da ku bi zimanê xwe binivîsin, an jî li hev bicivin. Lê belê, wekî ku Baykuşak diyar dike, ev nivîs dihatin sansûrkirin û lêpirsîn jî der barê wan de dihat vekirin.[28] Mirov dikare bibêje ku aşkerakirina fikiran dîsa bisînor bû, ji *azadiya biçûk* qesta me ev tişt bû.

Damezirandina komeleyan, di bin banê van komeleyan de derxistina kovar û rojnameyan ew ber bi nîqaşên nû ve dibirin. Rojnameya kurdî ya ewil bi salan şûn de rê li ber nivîsîna kurdî vekiribû. Di van weşanan de nîqaşên cur bi cur hebûn; ziman, guherîna alfabeyê, hişmendiya kurdan, yekîtiya kurdan, dîn û hwd. Kesên wek Xelîl Xeyalî û Abdullah Cevdet li ser alfabeyê pir disekinîn; bi guherîna alfabeyê kurd dê gavên ber bi modernbûnê ve biavêtana. Her çi qas ev komele û weşan wek xeter dihatin dîtin û ji ber vê dihatin girtin jî, rewşenbîrên kurd xwe dabûne vê rêyê. Piştî girtina van weşan û komeleyan di 1918an de careke din komeleyek bi navê Kürdistan Teali Cemiyeti (KTC/Komeleya Bilindbûna Kurdistanê) vebû û weşana wê ya bi navê *Jîn*ê derket û nîqaşên li ser netewetiyê cihekî mezin digirt tê de.

---

[27] Tahir Baykuşak, "Tevgera Kurd a li Stenbolê di Destpêka Sedsala 20an de", di *Akademiya Îsmaîl Beşîkçî 1-2019 Payîz* de, İBV Yayınları, İstanbul 2021, r. 34

[28] Tahir Baykuşak, "Tevgera Kurd a li Stenbolê di Destpêka Sedsala 20an de", r. 47

Wekî ku Mehmed Emîn Bozarslan jî dibêje di destpêka sedsala 20emîn de Stenbol navendeke pir giring bû û wekî gelên din rewşenbîrên kurd jî dixwest gavên der barê netewetiyê de biavêjin û serî li hemû fersendan didan ji bo vê yekê.[29]

Der barê vê mijarê de em ê li ser rojnameya *Kurdistan*ê, *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi* (KTTG/Rojnameya Alîkarî û Pêşketina Kurdan), kovara *Rojî Kurd*ê bisekinin û her wiha em ê berê xwe bidin Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti (KTTC/Komeleya Alîkarî û Pêşketina Kurdan) û Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti (Komeleya Hêvî ya Xwendekarên Kurd) jî.[30]

Djene Rhys Bajalan der barê rewşenbîrên kurd û girêdana wan a bi osmaniyan ve dibêje em dikarin fikirên wan di weşanên wan ên wek *Kurdistan* û *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi* de bibînin. Her wiha dibêje her çi qas gelên din ên di nav osmaniyan de ji xewa xwe hişyar bûne û ber bi netewetiyê ve gav avêtine jî, rewşenbîrên kurd di nav sînorên siyasî yên Împaratoriya Osmanî de mane û şûna ku ji xwe re bi avakirina partiyan armanca polîtîkayeke neteweyî saz bikin, ji bo ku osmanî hilneweşe alîkariya Tirkên Ciwan (Jon Tirk) kirine.[31]

Li gorî nêrînên Bajalan, hinek pispor dibêjin netewetiya kurdan berî 1898an dest pê kiriye. Lê hinek dîroknas li ser giringiya rojnameya *Kurdistan*ê disekinin û komeleyên ku di dema Meşrûtiyeta Duyem de ava bûne ji aliyê netewetiyê ve giring dibînin wekî ku me li jor jî behs kir. Ji bo akademîsyen û lêkolînerên kurd, ev komele nîşaneyên ewil ên netewetiya modern a kurdan e. Hinek lêkolînerên rojavayî jî wiha difikirin. Mesela kurdologê fransî Joyce Blau dibêje wekî welatparêz û Tirkên Ciwan, pêşengên tevgera netewetiya kurd jî daxwazên xwe yên azadiyê di rojnameyekê (*Kurdistan)* de anîne zimên.[32]

Bi vê nêrînê, Bajalan dibêje komele û weşanên ku di navbera 1898 û 1914an de ava bûne parçeyeke netewetiya kurdan in û zindîbûnek ava kirine di vî warî de,

---

[29] Mehmed Emin Bozarslan, "Sunuş", *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, Arap Harflerinden Latin Harflerine Çeviren: Mehmed Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, Uppsala 1998, r. 19

[30] Em ê ji niha pê ve navên orjînal ên rojname û komeleyan bi kar bînin.

[31] Kurdish Globe, *The shallowness of Kurdish intelligentsia and the crisis in Kurdish nationalism*, 2 Mayıs 2006, vgz. Djene Rhys Bajalan, *Jön Kürtler-Birinci Dünya Savaşı'ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1914)*, Burcu Yalçınkaya (Çev.), Avesta Yayınları, İstanbul 2010, r. 42

[32] Djene Rhys Bajalan, *Jön Kürtler,* r. 40-41

yên ku vê zindîbûnê ava kirine, pêşengên tevgera netewetiya kurd in û li vê tevgerê piştî Dewleta Osmanî piştgiriyeke xurt çêdibe.[33]

Rojnameyeke bi navê *Kurdistan* dest bi weşanê kiriye di sala 1898an de ji aliyê Mîqdat Midhad Bedirxan û Abdurrahman Bedirxan ve. Ev rojname ji bo kurdan xwedîqîmet e, lewre cara ewil rojnameyek bi zimanê wan tê nivîsîn. Ev rojname ewil bi rêberiya Mîqdat Midhad Bedirxan li Qahîreyê derdikeve û ji ber hin pirsgirêkan piştî hejmara 6an Abdurrahman Bedirxan vî karî digire ser xwe û li bajarên wek Cenevre, Londra û Folkstone derdikeve. Wekî ku Mehmet Emin Bozarslan dibêje, bûye "Rojnameya Gerok".[34] Rojname ji xeynî mijarên siyasî, behsa giringiya perwerdehiyê jî dike.

Ev rojname di serî de tenê bi kurdî derketiye. Sê hejmarên ewil bi kurdî, piştî hejmara 4an li gel kurdî, nivîsên bi tirkî jî hene û hejmarên 8, 9, 11, 15 û 16an dîsa bi kurdî derketine. Nivîsên piştre jî bi kurdî û tirkî ne. [35]

Binsernavê ewil ê rojnameyê wiha ye: "Kürtleri îkaz ve tahsil-i sanayiye teşvik için şimdilik on beş günde bir neşrolunur Kürtçe gazetedir."[36] Ev hevok piştre bi vî awayî guheriye: "Kürtleri tahsil-i ulûm ve fünûna teşvik eder nasayih ve edebiyat-ı Kürdiyeyi hâvî on beş günde bir neşrolunur Kürdçe gazetedir."[37] Ev jî nîşan dide ku Mîqdat Midhad Bedirxan û Abdurrahman Bedirxan li dû ronakbiriyê ne û dixwazin rêberiya kurdan bikin di rêya modernîzmê de.[38]

Mîqdat Midhad Bedirxan di rûpela ewil a rojnameya *Kurdistan*ê de ji Xwedê re şikir dike ji ber ku aqil û jîrahî daye wan û dibêje gelek ayet û hedîs hene ji bo hînbûna ilim û merîfetan. Dibêje li cîhanê çi qas misliman hebin di gund û bajarên wan hemûyan de dibistan, medrese û rojname hene lê kurdên ku girêdayî dînê xwe ne û ji qewmên din jîrtir û comerdtir in, ji qewmên din kêmtir xwendine û ji wan

---

[33] Djene Rhys Bajalan, *Jön Kürtler*, r. 41
[34] Mehmed Emin Bozarslan, *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902,* Cilt 1, Arap Harflerinden Latin Harflerine Çeviren: Mehmed Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, Uppsala 1991, r. 62
[35] Mehmed Emin Bozarslan, *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902,* Cilt 1, r. 6
[36] Kurmanciya vê hevokê: "Rojnameya panzderoj carekê ye ku kurdan hişyar dike û teşwîqî hînbûna hunerê dike."
[37] Kurmanciya vê hevokê: "Rojnameya panzderoj carekê ye ku kurdan teşwîqî ilim û zanistê dike û tê de edebiyata kurdî û şîret hene."
[38] *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902,* c: 1, r. 145

feqîrtir in. Her wiha dibêje ji ber vê ye ku ev rojname derxistiye. Piştre dibêje ew ê behsa ilim û merîfetê bike, ji kurdan re bêje ka medrese û dibistan li ku ne, li cîhanê çi dibe çi nabe û dibêje ew ê behsa şer û bazirganiyê jî bike.[39] Mîqdat Midhad Bedirxan dixwaze kurd jî hay ji tiştan hebin. Her wiha behsa misriyan jî dike û dibêje çima misrî li ku bin bila bibin zarokên xwe perwerde dikin lê kurd xizmeta yên din de dixebitin.[40]

Rojname her carê bangî mezinên kurd dike, behsa giringiya perwerdehiyê dike û ji wan rica dike ku zarokên xwe bidin xwendin. Xwendevan jî hemberî van gotinan bêdeng namînin, ji wan re nameyan dişînin, ji ber van xebatan wan pîroz dikin û biqîmetbûna xebatên wan tînin zimên.[41]

Celîlê Celîl balê dikişîne ser vê yekê ku armanca rojnameyê di dema Qahîreyê de bi taybetî perwerdehî bû û dibêje Mîqdat Bedirxan di beşa fransî ya hejmara ewil a rojnameyê de dibêje wexta vê rojnameyê derxistiye, xwestiye xwendinê bi miletê xwe bide hezkirin, gelê wî şaristaniya pêşketî nas bike û edebiyata xwe bizane.[42]

Ji ber ku M. M. Bedirxan xwe wek berpirsê kurdan dibîne, bi rêya vê rojnameyê dixwaze ji aliyê hişmendî û xwendewariyê ve alîkariya gelê xwe bike. Lê belê rojnameya wî nikare têkeve nav axên osmanî û ji ber vê M. M. Bedirxan ji Abdulhamîdê II. re nameyek dinivîse û tê de behsa armancên rojnameyê dike:

> Ji ber ku ez yek ji giregirên kurdan im û ji ber ku ez peywirdar û berpirsiyarê vê gotina pêxember im ku dibêje ‘hûn hemû şivan in û hûn hemû berpirsiyarê keriyên xwe ne’ wek evdekî armanca min pêkanîna peywira min e, ji ber vê min xwest ez ilim û huneran bi kurdan bidim naskirin, min bi zimanê kurdî ev rojname derxist û weşand.[43]

Deh sal piştî derketina rojnameya *Kurdistan*ê, ango di 1908an de piştî avabûna meşrûtiyetê, rewşenbîrên kurd jî gihîştin hev û bi rêberiya Seyîd

[39] *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902,* c: 1, r. 111-112
[40] *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902,* c: 1, r. 116
[41] *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902,* c: 1, r. 136-137
[42] Celîlê Celîl, *Kürt Aydınlanması*, Arif Karabağ (Çev.), Avesta Yayınları, İstanbul 2001, r.26
[43] *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902,* c: 1, r. 154

Abdulqadirê kurê Şêx Ubeydullahê Nehrî, li Stenbolê komeleyeke bi navê Kürd Teavün ve Terakkî Cemiyetî ava kirin.[44] Rojnameya ku bi vê komeleyê ve girêdayî bû derxistin: Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi. Li gorî Mehmed Emîn Bozarslan her çi qas jê re dibêjin rojname jî, ev esas kovarek e ku heftê carekê derdikeve.[45]

Armanca derketina vê rojnameyê ji *Kurdistan*ê ne cudatir e û di rojnameyê de hatiye gotin ku armanca komeleyê bi parastina hikumên makezagonê re vekirina rê û rêbazên perwerdehiyê ye ji bo gelê kurd, bi taybetî jî komele dixwaze kurd bi ermenan re li hev bên û navbera wan her xweş be.[46]

Dewleta Osmanî ji bo rewşenbîriya kurd a wê serdemê gelek giring bû, lewre her carê dianîn zimên ku kurd wek milet aîdê vê dewletê ne, ango her carê gotine ku ew berî kurdbûnê osmanî ne. Ev rewş di nivîsa Babanzade İsmail Hakkı de bi awayekî aşkera xuya dibe ku dibêje ev gelê paqij û xûypak ê ku beşeke xurt a osmaniyan pêk tîne, berî her tiştî misliman e. Piştre di nav rêbazên meşrûtiyetê de ku ev armanca jiyana miletan û bextewariya cîhanê ye, bêyî hîle û bêyî hesabeke veşartî, osmaniyeke heq e. Di asta sêyem de jî kurd e.[47]

Wekî ku Bajalan diyar dike ji bo rewşenbîrên wê serdemê nakokiyek di navbera dupatkirina kurdîtiyê û osmanîbûnê de tune bû. Pêşketin û modernbûna kurdan ji bo hevgirtina axa împaratoriyê gavekî giring bû.[48]

Ev rewş di rojnameya *Kurdistan*ê de jî bi awayekî aşkera xuya ye. Abdurrahman Bedirxan dibêje Dewleta Osmanî dewleteke misliman e û divê mayînde be û dibêje ji bo vê yekê çi ji destan bê ew ê bikin.[49] Her wiha di nivîsa xwe ya hejmara 20an de jî dibêje "Emrê leşker û miletê me di nav şeran de derbas bû ji bo welêt. Xew û rihetiya wan nema ji bo ku welatekî bi bereket ji me re bihêlin."[50] û ji van hevokan tê famkirin ku kurd xwe ji Dewleta Osmanî cudatir nabînin. Lewre bi

---

[44] Mehmed Emin Bozarslan, "Sunuş", *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, r. 19-20
[45] Mehmed Emin Bozarslan, "Sunuş", *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, r. 20
[46] *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, r. 63
[47] Babanzade İsmail Hakkı, "Kürdler ve Kürdistan", *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, sayı: 1, r. 67
[48] Djene Rhys Bajalan, *Jön Kürtler*, r. 97
[49] *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902*, c: 1, r. 310
[50] *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902*, c: 2, Arap Harflerinden Latin Harflerine Çeviren: Mehmed Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, Uppsala 1991, r. 342

hev re ketine şer ji bo welêt. Lê belê qîmeta ku wan daye dewletê, dewletê nedaye wan. Li gund û bajarên ku lê dijîn tunebûna dibistanan jî nîşaneya vê yekê ye.

Rewşenbîrên ku guh didan yekîtiyê, bi nivîsên xwe bangî ciwanan, mezinan û aliman dikirin. Bediuzzeman Seîdê Nûrsî dibêje sê cewherên me hene, yê ewil îslamiyet, yê duyem insaniyet û yê sêyem jî milliyeta me ye. Her wiha giringî dide xwendinê jî û ji bo pêşketinê dibêje: "Xwendin, xwendin, xwendin û destê hev girtin, destê hev girtin, destê hev girtin."[51]

Seyyah Ehmed Şewqî di nivîseke xwe de ji xeynî şîretên yekîtiyê, li ser hînbûna huner û bazirganiyê jî disekine û dibêje heke gel banqeyek veke zêrên xwe hêdî hêdî têxe wê derê, dê dewlemend bibe û ji bo welatê xwe jî bikêrtir bibe.[52]

Diyarbekirî Necdet di hejmara ewil a *Rojî Kurd* de li ser giringiya bazirganiyê disekine û behsa Ewrûpayê dike ku di cotkariyê de makîneyan bi kar tînin. Ji kurdan re pêşniyaz dike ku bila ew jî ji van makîneyan bistînin û her wiha dibêje bikaranîna wan ne "guneh" e.[53] Tiştê ku em ji van gotinan fam dikin ew e ku kurdan xwendin jî tê de, gelek tişt wek "guneh" dîtine. Wekî ku em ê di sernavê bê de jî bibînin Îbrahîm Hakkı Babanzade ji kurdan re dibêje xwendin ne guneh e.

Nivîskarekî bi navê Midhat jî li ser giringiya civakê disekine û dibêje însan mecbûr in bi hev re bijîn, lewre pêdiviya wan bi alîkariya hev heye û dibêje ji bo pêşketina civakê însan bi karên cur bi cur re mijûl bûn, hinek ji wan bi cotkarî, sanayî û bazirganiyê re mijûl bûn, hinek ji wan jî ji bo ku di navbera wan de aramî û pergalekê çêkin bûn memûr û bi vî awayî statuyeke civakî û ekonomîk bi dest xistin.[54]

Nivîskarekî ku navê xwe nedaye, dîsa li ser giringiya civakê disekine û dibêje însan nikare bi tena serê xwe bijî û girêdana wî ya bi civakekê re pêwîstiyeke

---

[51] Molla Seîd, "Kürdçe Lisanımız", *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, h: 1, r. 55
[52] Seyyah Ehmed Şewqî, "Gelî Welatîya", *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, h: 2, r. 100
[53] Diyarbekirî Necdet, "Cotkarî", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 1, İstanbul 2013, r. 120
[54] Midhat, "Devletin Genel Kuvvetleri, Ortaya Çıkışı, Ayrılık ve Eşitliğin Gerekliliği Bu Konudaki Fikir Ayrılıkları ve Görüşler", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu(Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 1, İstanbul 2013, r. 251

xwezayî ye, ji ber vê divê mirov ji bo wê civakê bixebite da ku civak pêş bikeve. Bi vî awayî divê mirov welatê ku lê dijî biparêze.[55]

Çar sal piştî Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti, di 1912an de komeleyek bi navê Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti tê damezirandin.[56] Wekî ku ji navê wê diyar e, ev komele ji xwendekaran pêk tê. M. Malmîsanij dibêje Hêvî yekemîn komeleya legal a xwendekaran e û dibêje "ji ber astengiyên zagonî li Tirkiyê bi bikaranîna navê kurd komeleyek nikarîbû bihata damezirandin, ji ber vê şaş nabe ku mirov bibêje li Împaratoriya Osmanî û Tirkiyeyê ev yekemîn û dawîn komeleya legal a xwendekarên kurd e.[57]

Hêvî ji aliyê xwendekarên kurd ve di 9ê Tebaxa 1912an de li Stenbolê ava dibe. Cihê wê yê ewil li Sirkeciya Stenbolê ye, lê ji ber ku ew cih teng e, cihê xwe diguhere û piştre çend carên din jî cihê xwe bar dike.[58] Armanca *Hêvî*yê jî parastina yekîtiyê, hişyarkirina kurdan a ji xewa wan a kûr e û dixwaze berê wan bide perwerdehiyê. Bi vê armancê di bin banê komeleyê de bi navên *Rojî Kurd* (1913) û *Hetawî Kurd* (1914) du kovarên giring derketine.

Yek ji armancên *Hêvî*yê ew e ku xwendekarên kurd hev binasin, di nav xwe de têkilî, yekîtî û xwişk û biratiyê daynin, li ser ziman û wêjeya kurdî bixebitin û bi pêş bixin, alîkariya xwendekarên ku dê bêne Stenbolê bikin.[59] Armanca *Rojî Kurd* jî ji ya *Hêvî*yê ne cudatir e û komele û kovarê wek nîşaneya hişyarbûnê nîşan dide.[60]

Li gorî Celîlê Celîl, bi bandora şoreşa Ciwanên Tirk û çanda Ewrûpayê, *Rojî Kurd* kiriye ku fikirên rewşenbîrên kurd ên der barê cîhanê de biguhere. Heta li gorî wî ev kovar di avakirina îdeolojiya neteweyî ya gelê kurd de weşaneke giring bû.[61]

---

[55] "Kürdlere", *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902,* Cilt 2, r. 481

[56] Ev nav di nav çavkaniyan de bi çend cureyên hatiye nivîsîn. Em ê jî wek "Hêvî" behs bikin. Ji bo agahiyên zêdetir, bnr. Malmîsanij, *Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti-İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği,* Avesta Yayınları, İstanbul 2002, r. 47

[57] Malmîsanij, *Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti-İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği,* Avesta Yayınları, İstanbul 2002, r. 50

[58] Malmîsanij, *Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti,* r. 50

[59] Malmîsanij, *Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti,* r. 61

[60] "Amaç ve Yöntem", *Rojî Kurd,* r. 241

[61] Celîlê Celîl, *Kürt Aydınlanması,* Arif Karabağ (Çev.), Avesta Yayınları, İstanbul 2001, rr. 90-91

Babetên *Rojî Kurd*ê perwerdehî, hişmendî, hişyarbûn û yekîtî bûn, ji xeynî van nivîsên li ser başkirin û bipêşxistina zimên, guherandina alfabeyê û derxistina pirtûkan jî hebû. Mirov dikare bibêje ku nîqaşên der barê guherandina alfabeya kurdî de cara ewil di vê kovarê de derketine. Yek ji wan nivîsan ev e ku Kerküklü Necmeddin li ser giringiya yekîtiyê disekine û dibêje heta ku gel neyê cem hev, ango cemiyetek ava neke nabe. Fikirên mezin bi tena serê xwe ava nabin, bi têkelbûna fikirên cuda çêdibin.[62]

Nivîskareke bi navê Xezal jî mezinên kurdan û yên neteweyên din dide ber hev û dibêje mezinên wan dixebitin, bi pêş dikevin, lê yên kurdan naxebitin. Her wiha bi vî awayî jî rexne dike ku kurd ne xwediyê civatekê ne, xwendin û nivîsînê nizanin, pirtûkên wan tune ne, ango li gorî wê tiştekî kurdan tune ye. Behsa komeleyên berê jî dike û li gorî wê ji ber ku wan jî yekîtiya xwe neparastiye, ji hev belav bûne. Der barê komeleya Hêvî de jî dibêje bi zorê komeleyek ava kirine lê belê yek ji mezinan jî alîkariya wan nake û dibêje çi biçûk, çi mezin, heke her kes alîkariya hev bike, ancax wê çaxê ew ê bi pêş bikevin.[63]

Xelîl Xeyaliyê ku keda ciwanan pîroz dike ji bo avakirina komele û derxistina kovarê, bi xwe jî gelek ked daye. Xeyalî herî zêde li ser perwerdehiyê disekine di nivîsên xwe de, lê belê mijarên li ser yekîtiyê jî paşguh nekirine. Vekirina dibistanan ji bo wî giring e, her wiha dibêje divê neyartî nemîne di nav kurdan de, ji bo ku yekîtiya di nav kurdan de biparêzin bangî mezinên kurd dike.[64]

M. S. Azîzî jî wekî ku di sekeratê de ne li kurdan dinêre û dibêje divê kurd hişyar bibin. Ew jî bi taybetî li ser xwendewariya wan disekine û dibêje rojnameyeke wan jî tune ye. Behsa giringiya rojnameyê dike û dibêje "Miletekî bê rojname, bê ziman e." Her wiha behsa *Hêvî* û rojnameyê jî dike û dibêje di vê rojnameyê de tenê dikarin behsa ilm û merîfetê bikin, nikarin behsa tiştekî din bikin, lewre li gorî

[62] Kerküklü Necmeddin, "Kürt Talebe Cemiyeti ve Kürtlerin Hilafet Makamına Hizmetleri", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 1, İstanbul 2013, r. 243
[63] Xezal, *"Dem[a] Kalê me-Çaxa me-Dema tê, Rojî Kurd*, cild: 1, r. 123
[64] M. X., "Ji Mezin[ên] 'Kurdan' ra", *Rojî Kurd*, jimar: 4, rr. 222-223

qanûna dewletê ji bo ku bikaribin rojnameyeke siyasî biweşînin, divê pênc sed zêrî bidin, lê dîtina vî pereyî jî ji bo wan gelek zehmet e.[65]

Rewşenbîrekî kurd ê wê serdemê Abdullah Cevdet jî bi taybetî li ser hişyarbûna kurdan sekiniye. Behsa giringiya dîrokê dike û dibêje gelê ku xwediyê dîroka xwe ya berê û dîroka xwe ya bê nebe, nabe xwediyê xwe jî. Miletên wiha jî dibin malên yên din, dibin êsîr. Behsa xwendewariyê dike û dibêje divê herfên nû qebûl bikin da ku zarokekî heft, heşt salî bikaribe di nav mehekê de hînî xwendin û nivîsînê bibe. Li gorî wî meseleya herî giring ev e û meseleyên din piştî vê tên.[66]

Bulgaristanlı Togan ji ciwanên kurd re dibêje, divê ji gelê xwe dûr nekevin, lewre li gorî wî heke kesên zana çi qas ji gelê xwe dûr bikevin, ew ê ew qas biyanî bin ji bo gel û dibêje divê teqez vegerin cem gelê xwe û dibistanan ava bikin.[67]

Wekî ku me behs kir *Hêvî* gelek li ser giringiya zimên disekine û nivîseke wiha diweşîne: "Neteweyeke nîvzimanî nabe. Neteweyeke wisa ne dikare zanist û hunerê hîn bibe, ne jî dikare pêş bikeve; va ye ji ber vê ye ku armanca yekemîn a komeleyê pêşxistina zimên a di asta xwendin û nivîsandinê de ye û derxistin û belavkirina pirtûkan e."[68]

Ji ber konsepta tezê em ê nekaribin behsa hemû komele û weşanan bikin, lê yek ji wan heye ku hêjayî behskirinê ye. Ev komeleyeke jinan e ku bi navê Kürt Kadınları Teali Cemiyeti (Komeleya Bilindbûna Jinên Kurd) ku di 1919an de ava bûye. Wekî ku di nav çavkaniyan de derbas dibe, seroka vê komeleyê Encum Yamulkî ye, lê ji bo vê delîleke nivîskî tune ye. Ji ber ku wê daxuyaniya komeleyê daye, li gorî hin lêkolîneran mimkin e ku Yamulkî damezirînera komeleyê bû.[69]

Wekî ku Rohat Alakom diyar dike, li gorî gotinên Mehmed Emîn Bozarslan navên endamên vê komeleyê ne diyar in. Tenê di kovarê de navê Encum Yamulkî

---

[65] M. S. Azîzî, "Hişyar Bin", *Rojî Kurd*, Jimar: 2, rr. 154-155
[66] Doktor Abdullah Cevdet, "Bir Hitap", *Rojî Kurd*, jimar: 1, r. 241-242
[67] Bulgaristanlı Togan, "Milletinize Karşı Vazifeniz", *Rojî Kurd*, jimar: 2, r. 261
[68] Hetawî Kurd (şimdilik onbeş günde bir neşrolunur), İstanbul, no. 4-5 (10 Mayıs 1330/27 Cemâziye'l evvel 1332 [1914]), s. 1-4. vgz. Malmîsanij, *Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti,* r. 100
[69] Ekrem Malbat, *Kürt Kadınları Teali Cemiyeti ve Nizamnamesi*, Nûbihar, Stenbol 2019, rr.33-34

derbas dibe, lê peywira wê jî nehatiye nivîsîn. Lê ji ber ku wê daxuyanî xwendiye, wisa dihesibînin ku ew damezirîner e.[70]

Ev komele piştî Kürdistan Teali Cemiyeti ava bûye û di kovara *Jîn*ê de behsa van her du komeleyan jî hatiye kirin. Ji ber vê Ekrem Malbat dibêje her çi qas di navbera van her du komeleyan de têkiliyeke şênber tune be jî, kovara *Jîn*ê wek xala hevpar a van her du komeleyan bû.[71]

Encum Yamulkî di axaftina xwe de armanca komeleyê diyar dike û dibêje ev komele dixwaze alîkariya jin û zarokan bike, yên ku di tengasiyê de ne. Her wiha li ser perwerdehiyê jî disekine û dibêje, dixwazin ji bo wan kar bibînin, dibistanan vekin heta jinên di komeleyê de jî dikarin mamostatiya wan bikin.[72] Di van hevokan de jî em daxwaza bipêşketin û perwerdehiyê dibînin ku ev jî ji komeleyên din ne cudatir in.

Wekî ku ji van çalakî û bernameyan xuya ye, rewşenbîrên kurd ên serdema dawî ya osmanî, ji bo pêşketina gelê xwe bêdeng nemane. Rola civakî ya ku girtine ser xwe, bi berhem û xebatên xwe derxistine pêş. Bajalan behsa gotinên Anthony D. Smith dike ku dibêje tenê rewşenbîr rêya bidestxistina azadiya milî nîşan didin û bi vî awayî her kes feydeya hevgirtin û yekîtiyê fam dike. Helbet alim û kesên bijarte yên din jî bandorekê li ser aliyên çandî û siyasî yên hin cureyên netewetiyê çêdikin.[73] Rewşenbîrên kurd jî wexta bangî hişyarbûna neteweyê dikin, dengê xwe digihînin ciwanan û bi taybetî aliman, her wiha li gorî wan divê rewşenbîr her dem li cem gel bin. Bi van komele û weşanan em armanca rewşenbîran dibînin, lê ji ber şertên wê serdemê bi tenê dikarin bi pênûsên xwe fikirên xwe bînin zimên.

Em dibînin ku serdema piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, netewetiya kurdan gihîştiye lutkeyê. Hişmendî zêdetir bûye û kesên ku destê wan pênûsê digire, dixwazin bi gel bidin hisandin. Lê nêrîneke wiha jî heye ku divê em li ser bisekinin. Her çi qas daxwaza netewetî û yekîtiya kurdan ji nivîsên wan xuya bibe jî, berî van

[70] Rohat Alakom, "100. Yaşında Kürd Kadınları Teâli Cemiyeti", di *Kürt Çalışmaları Bahar Akademisi-1* de, İBV Yayınları, İstanbul 2020, r. 16
[71] Ekrem Malbat, *Kürt Kadınları Teali Cemiyeti ve Nizamnamesi*, r. 37
[72] Ekrem Malbat, *Kürt Kadınları Teali Cemiyeti ve Nizamnamesi*, r. 35
[73] Anthony D. Smith, *Nationalism and Modernism,* New York: Routledge, 1998. vgz. Djene Rhys Bajalan, *Jön Kürtler,* r. 57-58

weşanan bi awayekî fiîlî serhildan pêk hatine. Barbara Henning jî bi taybetî li ser vê yekê disekine ku wexta netewetiya kurdan tê rojevê, serhildana Mîr Bedirxan tê bîra mirov. Piraniya dîroknasan wisa nîşan didin ku ev pêvajo bi Mîr Bedirxan dest pê kiriye.

Heta behsa Chris Kutschera dike û dibêje wî wek "le père du nationalisme kurde" ango wek bavê netewetiya kurdan bi nav dike. Her wiha ji ber ku li ser dîroka kurdan zêde çavkanî tune ne wê çaxê, çavkaniya wî ya herî bingehîn Kamiran Bedirxan e û li gorî agahiyên wî behsa statuya bedirxaniyan dike.[74]

Henning her wiha dibêje, Major Noel berevajî dîroknasên serdemê, wexta behsa netewetiya kurdan dike, ji Serhildana Bedirxaniyan dest pê nake, lewre berî vê serhildanê li Rewandiz (1834) û Silêmaniyê (1843) du serhildanên din çêbûbûn.[75]

Tiştê ku Barbara Henning dixwaze derxe holê ev e ku dîroknas û lêkolîner destpêka netewetiya kurdan bi bedirxaniyan ve girê didin. Li gorî wê bûyerên berî vê, ango kesên ku ne Bedirxanî ne, an kêm hatin nasîn an jî qet nehatine behskirin.[76] Li gorî hin lêkolîneran netewetiya kurdan û gava wê ya ewil serhildana Mîr Bedirxan e, lê hinek jî difikirin ku ev serhildan yek ji wan bûyeran e ku bi encama wendakirina otorîteya herêmî ya birêveberan çêbûye.[77] Wekî ku Komxebata Kurdên di Çavkaniyên Osmanî de diyar dike, aşkera ye ku ev serhildan bi armanca netewetiyê derneketiye, lê di gel vê, serhildan bûye yek ji argûmanên bingehîn ên netewetiya kurdan.[78]

Ji xeynî vê Henning wisa nîşan dike ku ev nêrîna ku di serê gel û lêkolîneran de çêbûye ji ber Celadet û Kamiran Bedirxan e ku der barê wan de dibêje "bîranînçêkerên profesyonel" lewre li gorî wê, ew Cizîrê bi hemû Kurdistanê ve girê didin, giringiya wê derdixin pêş û li ser vê dîrokek dinivîsin da ku bidin zanîn dîroka

---

[74] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, İbrahim Bingöl (Çev.), Avesta Yayınları, İstanbul 2021, r. 77

[75] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları,* r. 76

[76] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları,* r. 76

[77] Lütfî (Ahmed Ramiz), *20. Yy'ın Başlarında Kürt Milliyetçi Söylemine Bir Örnek*, Osmanlı Kaynaklarında Kürtler Çalışma Grubu, Bgst Yayınları, İstanbul 2007, r. 22

[78] Lütfî (Ahmed Ramiz), *20. Yy'ın Başlarında Kürt Milliyetçi Söylemine Bir Örnek,* r. 22

neteweyî ya kurdan bêyî dîroka Malbata Bedirxaniyan nabe.[79] Heta dibêje, di salên 1920î de ji ber ku bedirxanî li derve bûn, nekarîbûn tevlî bûyerên neteweyî bibin. Ji ber vê jî ji aliyê hinekan ve hatine rexnekirin, ji ber ku di doza neteweyîtiyê de kedek nedane û êş nekişandine. Bi vî awayî wan xwestiye ku ji van sûcdarkirinan xelas bibin û çîroka xwe bi pêkanîna hişmendiya neteweyî ve girê bidin û riya wê jî dîtin.[80]

Di gel van serhildanan ku li gorî lêkolîneran rewş û giringiya wan diguhere, mirov dikare bibêje ku netewetiya kurdan bi saya weşanan xwe nîşan da û her ku çû geş bû. Ji ber rewşa siyasî ya osmaniyan, belavbûn û herî dawî jî bi hilweşandina dewletê, rewşenbîrên kurd bêhtir pê hesiyan ku divê neteweya wan li ser piyan bimîne. Ji ber vê yekê jî, ji bo ku gel xwe binase û xwe bide nasîn, rewşenbîran xwest ku bi rêya weşanan, çi bi tirkî çi bi kurdî, netewetî û hişmendiyê bi kurdan bidin zanîn.

4.2.1. Giringiya Perwerdehiyê di Weşanên Serdema Dawî ya Osmanî de

Li gel gavên netewetiyê, hişyarkirina gel, perwerdehî û qet nebe hînbûna xwendin û nivîsandinê ji bo rewşenbîrên kurd ên serdema dawî ya osmanî mijareke pir giring bû. Babetên wek perwerdehî, xebat, hînbûna huner û bazirganiyê, ango pêşxistina hişmendiya gel di nav gotaran de cih girtine. Ji xwe wekî ku me li jor jî got, armanca herî mezin a van komele û weşanan ev bû. Gelek caran anîne ziman ku wekî miletên din divê dibistanên wan jî hebin, li ser perwerdehiya zarokan pir sekinîne ji bo bingeheke xurt a neteweyê çêbe, ji ber ku zarokên ku bi vê hişmendiye mezin dibin, dikarin ji bo gelê xwe bixebitin.

Gellner dibêje perwerdehiya mirovekî êdî veberhênana wî ya herî biqîmet e, dawiya dawî ji xwe re nasnameyek çêdike bi vî awayî. Her wiha dibêje bingeha perwerdehiyê ew qas mezin û biha ye ku ji xeynî dewletê, tu sazûmaneke din nikare ji binê wê rabe. Çand êdî ne amûrek e ku pergala civakî dixemilîne û dibêje:

> (…) çand niha hawirdoreke wisa ye ku pêdivî pê heye û tê parvekirin, ji bo jiyanê xwîna pêwîst e an jî endamên civakê tenê dikarin bi wê bêhna xwe

[79] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları,* r. 89

[80] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları,* r. 434

bistînin, her wiha atmosfereke hevpar e ku mirov bi wê jiyana xwe didomîne û berhemdar dibe. Ji bo civakekê çand tiştekî wisa ye ku her kes pê nefes distîne, diaxive û diafirîne, ji ber vê divê çand ji bo her kesî heman çand be. Jê wêdetir, divê êdî çandeke mezin û bilind (xwendewarî, perwerdehiya domdarî) be; êdî çand an jî kevneşopiyeke biçûk nabe, ya ku bi herêmê ve girêdayî ye an jî ne xwendewar e.[81]

Bicihanîna vê pênaseyê ji bo kurdan zehmet bû ji ber şert û mercên wê serdemê. Barê giran ê ku Gellner behs dike li ser milê rewşenbîrên kurd bû, lê ne bi rêya sazî û dibistanan, bi rêya pênûsan ev tişt pêk dihat. Ji ber vê, bi hêza pênûsên xwe, heta ji wan dihat bangî gelê xwe dikirin ji bo yekîtî û hişmendiyê.

Esas meselaya perwerdehiyê, gihandina zarokan ji bo rewşenbîrên wê serdemê pir giring bû. Lewre ji xeynî kovar û rojnameyan, di 1910an de komeleyeke bi navê Kürt Neşr-i Maarif Cemiyeti li dar xistibûn û armanca vê komeleyê avakirina dibistanan bû li Stenbolê, ji bo zarokên kurd. Dibistana ewil di 1910an de li Çemberlitaşê ya Stenbolê vebû û navê Kürt Meşrutiyet Mektebi lê hat dayîn. Lê ev dibistan di 1911an de hat girtin.[82]

Helbet piştî vê dibistanê hewldanên rewşenbîrên kurd bi pênûsan derdikevin pêş. Gelek ji van nivîskaran bi xemgînî tînin ziman ku kurd nexwende ne û cahil mane. Silêmanî ‘Ebdulkerîm di gotara xwe de –ku bi soranî nivîsiye- behsa cehaleta kurdan dike û dibêje kurd dikarin bi tenê bi perwerdehiyê jê xelas bibin. Her wiha dibêje kurd li Ewrûpayê wek eşqiya têne dîtin û edebiyateke wan jî tune ye. Wisa xuya ye ku ji ber vê fikirê ber dikeve, ji bo vê jî dibêje wekî ku her kes dizane alim, şair û siyasetmedarên kurdan jî hene.[83]

Hêvî komeleyeke xwendekaran e û wê di weşanên xwe de bi piranî cih daye çalakiyên çandî, zanist û perwerdehiyê. Gelek caran nezanbûna kurdan hatiye ziman di van weşanan de û hatiye diyarkirin ku komele ji bo başkirina vê yekê dê bixebite. Di diyardeya komeleyê de li ser vê mijarê wiha hatiye gotin: “Bêqîmetiya kurdan a îro ji ber cehaletê ye. Ji bo ku em ji vê yekê xelas bibin, divê em zarokên biçûk bidin

[81] Ernest Gellner, *Uluslar ve Ulusçuluk*, r. 116
[82] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları*, r. 381
[83] Silêmanî ‘Ebdulkerîm, “Her Min Bim û Kesî Tirî nî”, *Rojî Kurd*, jimar: 2, r. 152

xwendin. Yek ji armancên sereke yên komeleya me ew e ku em ji bo zarokên biçûk dibistanan vekin, wan di rêya xizmetkirina dîn, dewlet û neteweyê de mezin bikin."[84]

Seyyah Ehmed Şewqî jî li ber nexwendina kurdan dikeve û dibêje ew vê rojnameyê bi kurdî û tirkî derdixin da ku kurd jî bikaribin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Ji axa, mela û zarokan re dibêje bila vê rojnameyê bixwînin, bi saya vê rojnameyê dê bizanibin ka li cîhanê çi diqewime.[85] Lê belê mixabin di her hejmareke rojnameyê de yek an du nivîsên bi kurdî hene. Yên din hemû bi tirkiya osmanî hatine nivîsîn.

Xwînerek bi navê Seyid Tahirê Botî ji Edenê nameyek dişîne rojnameya *Kurdistan*ê û tê de dibêje ji bo kurdan pir xemgîn e, ji ber ku şev û roj difikire ku kurd ev qas jîr in lê çima bêzanist û bêhuner in, çima xwendin û nivîsînê nizanin. Bi nameya xwe ya hestiyar aniye zimên ku bi vê rojnameyê gihîştiye miradê xwe.[86] Ev jî nîşan dide ku kurd bi rastî jî êdî bi giringiya xwendewariyê dihesin û bi rojnameyekê jî be difikirin ku ew ê bikaribin pêş bikevin.

Dr. Abdullah Cevdet di *Hetawî Kurd* de hin pêşniyaz kirine ka divê mirov çawa xizmeta gelê xwe bike. Ji ciwanan re dibêje dema ku ew li şûna derekê ku lê bibin qeymeqam an jî rêveber, bixwazin li gundekî kurdan bibin damezirînerê dibistanekê û li wir bibin mamosta, ew ê wê çaxê têkevin rêya rast.[87]

Her wiha Mewlanzade Rifat berevajî fikira Abdullah Cevdet difikire û dibêje heta ku armanceke diyar tunebe, nabe ku mirov hema ciwanan bişîne gundên wan. Ev dê bibe kedeke belasebeb. Şûna wê dibêje ziman giring e ji bo pêşketina kurdan. Ji bo pêşxistina ziman jî divê mirov binivîse.[88]

Nivîskarekî din ê ku li ser xwendin û hînbûnê fikirên xwe diyar dike Abdurrahman Bedirxan e ku dibêje însan bi mejiyê xwe ji heywanan vediqetin, ji mejî mezintir tiştek din tune ye û ev mejî bi perwerdehiyê re newaze dibe, însanê

---

[84] Hetawî Kurd, İstanbul, no. 4-5, s. 1-4. vgz. Malmîsanij, *Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti,* r. 106
[85] Seyyah Ehmed Şewqî, "Gelî Welatîya", *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, rr. 157-158
[86] Seyîd Tahirê Botî, "Ji bo Cerîdeya 'Kurdistan'ê", *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902*, Cilt 1, eded: 5, rr. 161-162
[87] Ahmet Alan, *Hetawî Kurd (1913-1914)*, Avesta, Stenbol 2016, r. 82
[88] Ahmet Alan, *Hetawî Kurd,* r. 113

bêperwerde jî vedimire. Mînaka keştî, trên, top û tifingan dide û dibêje ev hemû bi zanista hunera mejiyê mirov çêbûne.[89]

Li ser vê gotina xwe Abdurrahman Bedirxan dibêje arnawudî bi zorê be jî ji xwe re dibistanên taybetî dane çêkirin û kurd jî dikarin wiha bikin. Her wiha dibêje heke bi xweşî nebe, dikarin wek arnawudan bi zorê bidin çêkirin.[90] Di nivîseke xwe ya din de jî dibêje bila israr bikin da ku li gundên wan dibistan bêne avakirin. Her wiha dibêje zarok divê biçin dibistanên li bajarên mezin da ku ilim û hunerê bielimin.[91]

İsmail Hakkı Babanzade jî li ser perwerdehî û giringiya ziman nivîsiye. Nivîsa Babanzade ji fikira osmanîtiyê jî ne dûr e û dibêje heke gundekî ku tenê zimanê dayikê lê tê axaftin hebe û mirov li wir dibistana tirkan veke, zarok dê perwerdehiya xwe gav bi gav bi tirkî bibîne, dê dawiya dawî bi vê perwerdehiyê bikemile, heta heke jîr be dê bigihîje asteke baş. Lê ji ber zimên ji emrê wî dê çend sal biçin. Heke ev zarok berhemên bi zimanê xwe bibîne û biçe dibistaneke kurdî bê guman dê zûtir bigihîje, perwerdehiya wî bêkêmasî be û dê bibe parçeyeke giring a malbata osmanî.[92]

Heman nivîskar behsa matbaa û berhemên çapbûyî jî dike û dibêje gelê ku zimanekî wî yê nivîskî tune ye, nikare xweşik biaxive û fikirên xwe bîne zimên û behsa kêmasiya berhemên çapbûyî dike û dibêje pirtûkên wan ên rêzimanê tune ne, matbaaya wan tune ye, her wiha kurd ji edebiyat, ilim û hunerê bêpar in. Her wiha dibêje hêz di perwerdehiyê de ye û perwerdehî jî bi ziman ve girêdayî ye. "Kurdên ku stûna herî giring a osmaniyan in, heke wiha jenggirtî û rizî bimîne, osmanîtiya ku pişta xwe didê, Xwedê neke, dê hilweşe." Bi vî awayî ji kurdan re pêşniyaz dike ku bila pirtûkên rêzimanê û ferhenga zimanê xwe ava bikin, piştre bila dîroka xwe binivîsin, hemû helbest û berhemên edebî yên nenivîskî bila bêne komkirin û nivîsîn. Her wiha li gorî wî heke bingeha zimên wiha bê danîn, dê pêşketin jî bê.[93]

---

[89] *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902,* c: 1, r. 178
[90] *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902,* c: 1, r. 201
[91] *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902,* c: 1, r. 226
[92] Baban: İsmail Hakkı, "Kürdçe Üzerine", *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi,* Arap Harflerinden Latin Harflerine Çeviren: Mehmed Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, jimar: 3, Uppsala 1998, r. 163
[93] *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi,* r. 162-163

Ev gotinên İsmail Hakkı di KTTGyê de derdikevin, piştî pênc salan, ango di 1913yan de em dibînin ku İsmail Hakkı di *Rojî Kurd* de jî bi heman israra xwe li ser zimanê nivîskî dinivîse. Li ser disekine ka çima zimanê wan ê nivîskî bipêş nakeve, di gel ku zimanê wan ê devkî pir xurt e. Wekî çareserî jî dibêje ji niha ve divê bingeheke xurt bê danîn û dibêje "li pêşberî dîrokê şerefa damezirîneran çi qas mezin be, berpirsiyariya wan jî ew qas mezin e."[94]

Babanzadeyê ku dibêje "sedemên ku şaristaniya hevdem ava dike û pergalekê jê re çêdike, bivê nevê ziman dikemilîne û ev kemilîn jî di nav qewman de zîndebûnekê çêdike" û bi vî awayî behsa giringiya ziman û perwerdehiyê dike. Her wiha dibêje ji ber ku perwerdehî ev qas berfireh e û divê mirov ruhê perwerdehiyê bide asta herî biçûk, wê çaxê ziman dibe peywira bingehîn. Her wiha dibêje xelasbûna cahiltiyê û hînbûna xwendewariyê bi perwerdehiya taybet a zimanê qewmekî re mimkin e. Heke ne ew qewm tam bi pêş nakeve û ev jî bandorên neyînî li ser civakê çêdike.[95]

Yek ji nivîskaran jî ku li ser ziman disekinî Xelîl Xeyalî bû. Xeyalî bi îmzaya Modanî X li ser mijareke giring disekine û dibêje mela û xwendewarên me çima hemû dersên xwe bi kurdî çêdikin, lê wexta van dinivîsin bi erebî, farisî an jî tirkî dinivîsin. Her wiha dibêje miletên li cîhanê bi zimanê xwe dinivîsin, dixwînin, pirtûkan çap dikin û li dibistanan jî zarokên wan dîsa bi zimanê xwe perwerdehî dibînin, lê yek ji wan jî ranabe û nabêje xwendin û nivîsandina bi zimanê me zehmet e û em ê zimanê miletekî din qebûl bikin. Her wiha dibêje zarokên wan di şeş mehan de hînî xwendin û nivîsandinê dibin lê belê zarokên me di deh salan de ancax du herfan hîn dibin.[96] Her wiha bi helbesteke Hacî Qadirê Koyî jî vê gotina xwe piştrast dike:

Milet bê kitêb û bê nûsîn

Xeyr kurdan niye le rûyî zemîn

---

[94] Babanzade İsmail Hakkı, "Kürtlerin Yükselmesi", *Rojî Kurd*, jimar: 3, r. 282
[95] Babanzade İsmail Hakkı, "Müslümanlık ve Kürtlük", *Rojî Kurd*, jimar: 2, r. 264
[96] Modanî X, "Ziman û Nezaniya Kurdan", *Rojî Kurd*, r. 160-161

Xelîl Xeyalî der barê zimên de şêx, mela û mîran rexne dike û dibêje ji bo dîn û dewletê gelek tişt dikin, lê ev xizmet û pirtûk hemû winda dibin û diçin. Lê zêde dike û dibêje heke ji sedî yekê van mirovan ji kurdan re xizmet bikira, dîwan û pirtûkên xwe bi kurdî binivîsanda, îro ne navê wan ne jî pirtûkên wan winda dibû û zarokên kurd dê berhemên wan bixwenda û ji wan re dua bikira. [97]

Bi deh madeyan Xelîl Xeyalî tiştên ku kurd muhtac in nivîsîne. Xalên pêşîn li ser xwendin û nivîsîna bi rihetî ne ku wiha pêşniyaz dike: "Herfekê ji bo xwendin û nivîsandina bilez, alfabeyeke nû, ferheng û îlmîhal." [98] Ji xeynî vê ji gel dixwaze ku der barê kurdî de di destê wan de çi hebe bila binivîsin û bişînin. Ji van pêşniyazan jî aşkera dibe ka Xelîl Xeyalî çi qas qîmet dida xwendewariyê û giringiya edebiyata devkî dizanîbû û nedixwest bila ev edebiyat winda bibe.

Bulgaristanlı Togan jî dixwaze bide zanîn ku dibistana seretayî ne tenê xwendin û nivîsandin e. Behsa pedagojiyê dike û dibêje bi vê re berê zarokan bidinê ku bila "baş bifikirin, baş bibînin û dawiyê bila bielimin nirxandinên rast bikin". Li gorî wî heke perwerdehiyeke wiha neyê dayîn, tenê dê xwendewarî zêde bibe. Kesên ku nebin xwedî fikirekê, bi xwendina xwe ya nîvçe dê ji cahilan bêhtir zerar bidin têkoşîna milî.[99]

Her çi qas rewşenbîr li ser van babetan disekinîn jî di nav gel de fikirên cuda hebûn. Li gorî hinekan xwendewarî tiştekî xeternak bû, lewre dibe ku ji dîn dûr biketana. İsmail Hakkı Babanzade jî bi vê tirsê dihese û ji wan re dibêje kurd wexta hînî xwendin û nivîsandinê bibin, dînê xwe naterikînin. Her wiha dibêje heta ku fesadî nekeve nav, encamên xweş derdikevin. Tirk û eceman wek mînak dide û dibêje wan jî wexta zimanê xwe sererast kir û bi kar anî ji îslamiyetê dûr neketin.[100]

M. Salih Bedirxan di gotareke xwe de behsa giringiya rojnameyê dike, lewre wisa difikire dibe ku gelek kurd nizanin ka rojname çi ye, ji ber vê bi vî awayî rojnameyê dide nasîn: "Mirov çi bixwaze dikare bi zimanê xwe bibêje û dikare karên xwe bi zimanê xwe bimeşîne. Rojname jî wiha ye. Qewmekî bêdîrok, nivîs û

[97] M. X., "Bextreşî û Mehrûmiya Kurdan", *Rojî Kurd*, jimar: 3, r. 195; her wiha, M. X., "Serê vê Jimar[a] Sisiyan da "Bextbireşî û Mahrûmiyan Kurdan", *Rojî Kurd*, jimar: 4, r. 226
[98] M. X., "Ziman", *Rojî Kurd*, jimar: 3, r. 187
[99] Bulgaristanlı Togan, "Milletinize Karşı Vazifeniz", *Rojî Kurd*, jimar: 2, r. 262
[100] Babanzade İsmail Hakkı, "Müslümanlık ve Kürtlük", *Rojî Kurd*, r. 264

rojname, wek însanekî ker û lal e. Tiştekî fam nake û nikare derdê xwe jî bibêje û bi vî awayî tu kes nikare bibe dermanê derdê wî."[101] Her wiha di heman nivîsê de dibêje heke jiyaneke baş dixwazin, divê pir bixebitin, bixwînin, dibistanan vekin, huner, bazirganî û cotkariyê hîn bibin.[102]

Pêvajoya pêşketina kurdan xuya ye di nav kurdan de tenê belav nebûye, çawa ku Celîlê Celîl dibêje di çapemeniya ermeniyan de jî ev mijar hatiye rojevê. Der barê rojnameya *Kurdistan*ê de di kovara "Anahid"ê (1900) de nûçeyeke wiha derketiye: "Hema hema hemû sernivîsên her hejmarekê, ji şîretên der barê giringî û pêwîstiya perwerdehiyê pêk dihatin. Ev gotar bi kelecanî bangî kurdan dikin, cesaret didin wan û dikevin nav dilên wan."[103]

Komele û weşanên ku me li jor behs kirin, der barê netewetî, ziman û pêşketinê de nivîs weşandine û fikirên li ser yekîtiyê derxistine pêş. Jê wêdetir, li ser perwerdehiyê pir sekinîne û xwestine ku gel hişyar bibin û li her derê dibistanan vekin. Fikirên li ser zimanê kurdî, guherandina alfabeyê û xebatên li ser rêzimanê bi piranî di *Rojî Kurd* de têne dîtin.

[101] M. Salih Bedirhan, "Berî Şîrê Qelem", *Rojî Kurd*, jimar: 3, r. 191
[102] M. Salih Bedirhan, "Berî Şîrê Qelem", *Rojî Kurd*, r. 192
[103] Anahid, 1900, sayı 4-5, s. 138. vgz. Celîlê Celîl, *Kürt Aydınlanması*, r. 33

BEŞA YEKEM

ZIMAN JI ALIYÊ STANDARDÎZASYON Û PLANSAZIYÊ VE

1.1. STANDARDÎZASYON Û PLANSAZIYA ZIMÊN

Ziman ji bo jîn û pêşketina neteweyekê navgîna herî giring e. Ziman tenê ne ew e ku têkiliyek çêdike di navbera du kesan de, bi saya wî neteweyek dikare koka xwe belav bike û her ku xurt bibe, dikare li cîhanê hêzdartir bibe. Zimanê yekbûyî û hevpar, gelê xwe digihîne hev û bi vê gihîştinê jî asta wî gelî bilind dibe, qet nebe li cîhanê, di nav neteweyên din de giringiyeke wî çêdibe. Her ku axivêr û bikarînerên zimanekî zêde bin, ew ziman ji windabûnê xelas dibe.

Taybetmendiya zimên ew e ku zindî ye û li gorî her rewşê dikare pêş bikeve. Heke em li rewşa bajar û gundan binêrin, em dikarin vê pêşketinê çêtir bibînin. Zimanê ku li gund an jî bajarokan tê axaftin, sînordar e. Heta, hejmara kesên ku dixwînin û dinivîsin jî kêm e, ji ber vê, ziman bi piranî bi rêya axaftinê zindî dimîne. Lê mirov her ku ji gund û bajarokan ber bi bajar û paytextan ve diçe, dikare bi rihetî ferqa zimên bibîne. Bi saya kar û bar, dibistan, nexweşxane û saziyên din zimanekî pêşketîtir heye li van deran. Her wiha ji ber çapemenî, sanayî û kapîtalîzmê jî bivê nevê zimanekî xurttir û hevpar hewce ye ji bo pêşeroja neteweyekê. Ferqa zimanê gund û bajaran jî ji ber şopa van hêmanan e.

Her ziman li gorî rewş û bikarînerên xwe digihîje astekê, çi nivîskî çi devkî be. Hinek ziman wek nivîskî bi pêş ketine, hinek ji wan jî tenê wek axaftin mane. Hinek ji wan mirine, hinek hatine qetilkirin, hinek jî ji kendavê filitîne. Zimanên ku bi pêş ketine bi saya gelê xwe, otorîteya hikûmetê, hêza bûyîna netewetiyê gihîştine asteke bilind. Lewre di bingeha van zimanan de hişmendiya yekîtî û hevparî heye. Sazkirina zimanekî hevpar, zimanekî ku hemû axivêrên wî dikarin bi heman awayî jê fam bikin, ne hêsan e. Ji bo zimanekî hevpar xebatên baş û kûr divê, avakirina komîsyonan, qebûlkirina di nav gel de, çapkirina materyalan, weşandin û belavkirina

wan; ango bi saya van xebatan zimanekî standard pêk tê. Ev hemû girêdayî hêzeke xurt e û ev hêz jî helbet dewlet e.

Laura Boulden li ser girêdana zimanê nivîskî û standard disekine û dibêje, zimanê standard di ragihandinê de karê însanan hêsantir dike. Her çi qas mirov devokên cuda bi kar bînin jî û ji van devokan fam bikin jî, nivîsandina van tiştek cuda ye û ew kesên ku bi devokên cuda diaxivin bi heman awayî nanivîsin. Ji ber vê ye ku xebateke hevpar giring e ji bo pejirandina devokekê. Her wiha tîne ziman ku di standardbûnê de zimanê nivîskî pir giring e, lewre tiştê ku zimên diparêze nivîs e û bi vî awayî ziman mayînde dibe.[104]

Zimanê standard bi xwe re pêşketinekê tîne. Pêşketina ku bêsînor dikare têkeve her quncikekê. Wê çaxê, zimanê paşdemayî çi ye? Zimanê ku têrê nake bikeve her aliyê civakê. Hemû zimanên mezin wextekî paşdemayî bûn. Wê çaxê zimanê rojane, ango *zimanê paşdemayî* çawa dibe *zimanê pêşveçûyî* an jî pêşketî. Ji bo famkirina vê divê mirov li têkiliya navbera ziman û neteweyê binêre.[105]

Yunan û romanên berê heta ji wan bê zimanên xwe belav kirin. Lê bi cîhana modern, pêşketina teknolojî û polîtîkayê her takekes bû xwediyê tevlîbûna biryarên polîtîk. Îcadkirina matbaayê, pêşketina sanayîyê û belavbûna perwerdehiya modern netewe-dewletek ava kir û bi saya vê netewe-dewletê malbata mîrîtiyê, cîrantî an jî eşîrtî ji holê rabû û ev kes li hemû welêt belav bûn. Bi saya van pêşketinan, mirov dikare bibêje ku netewe û ziman bûne yek. Her neteweyek divê zimanek wê hebe. Ne tenê hema têgiheke danûstandinê, zimanê rojane an jî diyalekt, lê belê zimanekî ji her aliyê ve temambûyî divê.[106]

George Puttenham di berhema xwe ya bi navê *The Arte of English Poesie* (1589) de dibêje: "Piştî ku axaftin ji bo têgihîştina giştî bi temamî tê sererastkirin û ji aliyê hemû welêt û neteweyê ve tê qebûlkirin, wê çaxê wek ziman tê binavkirin."[107] Ji ber vê ye ku hêj di dema Ronesansê de jî, pir aşkera bû ku ji bo xwendekaran

[104] Laura Boulden, "Standardbûna Zimên", di *Kovara Zend* de, Zend Bilim Kültür Eğitim Basın Yayın Ltd. Şti, İstanbul, Havîn/Payîz 2007, r. 55
[105] Einar Haugen, "Dialect, Language, Nation", *American Anthropologist,* New Series, Vol. 68, No: 4 (Aug., 1966), r. 927
[106] Einar Haugen, "Dialect, Language, Nation", r. 927
[107] Einar Haugen, "Dialect, Language, Nation", r. 925

têgiha *zimanî* bi bilindbûna neteweyê ve girêdayî bû û ev jî nîşaneya yekîtî û nasnameyê bû.[108]

Ronayî Önen jî der barê têkiliya ziman û neteweyê de wiha dibêje: "Ziman sembola sereke ya nasnameya çandî ye û di pênasekirina nasnameya neteweyî de ew giringîyeke siyasî hildigire ser milên xwe û dibe cudakereke 'rasteqîn'. Ziman, ji dem û mekanê azad, hêmaneke bingehîn a pêvajoya netewesaziyê ye; û wisa tê bawerkirin ku ew di navbera siberoj û pêşeroja neteweyekê de pirekê ava dike."[109]

Wexta ku em li têkilî û giringiya navbera ziman û neteweyê dinêrin, bivê nevê têgihên wek zimanê hevpar, zimanê standard û zimanê pêşketî derdikevin pêşiya me ku ev her têgih bêyî ya din nabe. Ji ber vê, em ê di vê beşê de behsa zimanê standard, standarbûn û her wiha bi standardbûnê ve girêdayî behsa plansaziya zimên bikin. Em ê bingeha xwe bi piranî li ser xebatên Joshua A. Fishman û Einar Haugen daynin ku wan li ser plansazî û standardîzasyonê berhemên bingehîn afirandine. Em ê di nav fikirên wan de giringiya plansazî û standardîzasyonê bibînin û her wiha em ê hewl bidin teoriya wan a li ser vê mijarê pêşkêş bikin.

Berî ku em têkevin nav senifandina plansazî û standardîzasyonê em li ser fikirên Einar Haugen ên li ser ziman û diyalektê bisekinin. Li gorî Haugen senifandin û nasnamekirina zimên hêj bi temamî nehatiye kirin. Lewre hê jî tê pirsîn gelo li cîhanê çend ziman hene, an jî li welatekî çend diyalekt hene?[110]

Ziman li ser diyalektan e. Mirov dikare bêje diyalekt(ên) zimanekî, lê mirov nikare bêje zimanê diyalektekê. Ango her diyalekt aîdê zimanekî ye, lê ziman ne aîdê diyalektekê ye. Ziman serbixwe ye. Her wiha mirov dikare bibêje ku her diyalekt zimanekî ye, lê her ziman ne diyalekt e.[111]

Du aliyên cuda yên bikaranîna *ziman* û *diyalekt*ê hene. Yek ji wan binyadî (structural), nasnamekirina zimên bi xwe ye; ji aliyê din jî fonksiyonel (functional) e ku ev jî nasnamekirina bikaranîna wî ya ji aliyê civakê ve ye. Xebatên lenguîstîk ji

---

[108] Einar Haugen, "Dialect, Language, Nation", r. 925
[109] Ronayi Önen, *Ziman û Netewesazî-Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*, Şehmuz Kurt (Wer.), Peywend Yayınları, İstanbul 2018, r. 23
[110] Einar Haugen, "Dialect, Language, Nation", r. 922
[111] Einar Haugen, "Dialect, Language, Nation", r. 923

aliyê lenguîstan ve wek karê wan ê navendî tên meşandin, lê sosyolojîst, heta sosyolenguîst li ser pirsgirêkên fonksiyonel dixebitin.[112]

Li Fransayê têgiheke din derketiye: *patois*. *Patois* zimanê axaftinê ye. Yanî wexta nivîskî be diyalekt e, lê wexta tenê tê axaftin *patois* ye. Her wiha di diyalektê de çandeke edebî heye. Piştî standardîzasyona zimên a li gor zimanê Parîsê, diyalektên nivîskî ji holê rabûne û ew êdî bûne *patois*. Ango piştî sedsala 14mîn zimanekî edebî û nivîskî derketiye holê û diyalekt bûne *patois*.[113] Qîmeta diyalektan ji ya *patois*yê zêdetir e, formeke wan a nivîskî heye û nêziktirê standardîzasyonê ne. Li gorî kesên ku di vî warî de ne pispor in (layperson), esas *patois* forma herî qels a jiyana zimên e, wek bi çanda gundan ve girêdayî ye.[114]

Charles A. Ferguson wexta li ser zimanên standard ên cîhanê difikire, wan dike du beş: dereceya standardîzasyonê (St. 0, 1, 2) û bikaranîna wan a nivîskî (W. 0, 1, 2, 3). 0 tê wê wateyê ku ji aliyê standardîzasyon an nivîsînê ve tu hevpariyeke berbiçav tune ye. St. 1 tê wê wateyê ku zimanek ji aliyê zêdetirî şêwazekê ve hatiye strandardîzekirin, wek mînak ermenkî, yunanî û hindî-urdû. Heta ermenkî wek standardîzasyona dumodelî (bimodal standardization) ye ku standard wek bingehîn herêmî ne; ermenkiya rojhilatî û ermenkiya rojavayî. Ev her du jî wek nivîskî têne bikaranîn.[115]

Danîna asta standardîzasyonê pir zehmet e, lewre herî kêm du aliyên wê hene, yek ji wan ji xwe pir tevlihev e. Aliyekî ji wan dereceya cudahiya navbera form an jî formên standard ên zimanekî û her wiha hemû cureyên wî ne. Ev cudahî dibe ku pir biçûk an jî pir mezin be bêyî aliyên din ku ev jî xwezaya standardîzasyonê ye û hemû civakê ev asta forma standardê qebûl kiriye. Wisa xuya ye, nêzikahiya herî hêsan ew e ku mirov her du serîkên skalayê (pîver) di navbera St0 û St2yan de bike. Em dikarin kurdî wek mînak bidin ku tê de cur bi curiyeke berbiçav a diyalektan heye, lê

[112] Einar Haugen, "Dialect, Language, Nation", r. 926
[113] Einar Haugen, "Dialect, Language, Nation", r. 924
[114] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* Taylor&Francis e-Library, 2001, r. 5
[115] Charles A. Ferguson, "The Language Factor in National Development", *Anthropological Linguistics,* Vol. 35, No. 1/4, A Retrospective of the Journal Anthropological Linguistics: Selected Papers, 1959-1985 (1993), rr. 124-126

belê tu formên zimên bi awayekî berfireh wek norm nehatiye pejirandin di navbera wan mirovan de ku pê napeyivin.[116]

Laura Boulden dibêje:

> Ji bo biserketina hilbijartina zimanekî standard, taybetiya herî giring jî pejirandina devokekê û awayê nivîsandina wê ye. Heke mirov li ser vê yekê li hev neke, pêvajoya standardbûnê bi pêş nakeve. Lêkolînên dîrokî yên der heqê standardbûna zimanên li seranserî cihanê de nîşanî me didin ku taybetiyên herî mezin ku têsîr li biserketina vê pêvajoyê dikin, yên civakî û çandî ne. Yanî, heke rewşa civakî û çandî guncan be, avakirina zimanê standard hêsantir e. Rewşa herî baş ev e, ku encamên leksîkostatîstîk, rewşa civakî-çandî, û bandorên ji derve li hev bên. Lê heke ne wisa be, divê giringiya rewşa civakî-çandî bê hesibandin, da ku bernameya ziman û standardbûna wî bên pejirandin.[117]

Her çi qas plansazî û standardîzasyona zimên girêdayî hev bin jî, ji aliyê avakirin û pêkanînê ve xwedî bingehên cuda ne. Wekî ku Fishman diyar dike, plansaziya zimên bi biryarên dîrokî re eleqedar e ku dixwaze qadên ku heta niha negihîştine hev bîne cem hev, lehengên ku parve dikin, klasîkên ku xwedî lê derdikevin, hestên ku wan hemûyan eleqedar dike. Ji ber vê, plansaziya zimên esas plansaziya *neteweyî* ye jî, bi vî awayî ji plansaziya pîşesazî û çandî cudatir e, hêj di serî de wek plansaziya *neteweyî* dest pê dike. Her wiha neteweperwerî û netewetî digihîjin hev û wek encam hemû reform û serkeftina planê hestan derdixe pêş û bi vî awayî nasnameyeke neteweperweriyê ava dibe. Plansaziya zimên bi navekî nû, peywireke nû û wek encama vê, bi vê hest û rûmetê dike ku dibistanên nû, fabrîkayên nû, xaniyên nû ava bike ku ev ne tenê ew armanc in ku bêne qebûlkirin, her wiha armancên pêwîst in ku ji bo wan divê mirov bixebite û şer bike. Ne giring e ku ev cureya hatiye afirandin naşibe zimanê dê an dapîra kesekî. Tiştê giring ew e ku

[116] bnr. Ernest N. McCarus *A Kurdish Grammar,* New York: American Council of Learned Societes, 1958, p. 1; D. N. MacKenzie "Kurdish Dialect Studies", I. London Oriental Studies, vol. 9. London: Oxford University Press, 1961, p. Xvii, vgz. Charles A. Ferguson, "The Language Factor in National Development", rr. 124-126

[117] Laura Boulden, "Standardbûna Zimên", r. 58

ev ziman nasnameyek û hêzeke nû derdixe holê ku otorîteya nû û kîtleyên nû pê dikevin nav hev û bawer dikin ku her dem girêdayî hev in.[118]

Ronayî Önen derketina têgiha plansaziya zimanî wiha rave dike:

> Têgiha 'plansaziya zimanî' ji aliyê zimannasê emrîkî Einar Haugen ve di dawiya salên 1950yî de hatiye danasîn û ji bo hemî hewlên hişmendî tê bikaranîn ku armanca wan guherandina reftara zimên a civateke zimanî ye. 'Ji pêşniyara peyveke nû bigire heta afirandina zimanekî nû' her hewldan di nava vê têgihê de cih digirin. Siyaseta zimanî tê wateya armancên berfirehtir ên zimanî, siyasî û civakî ku bingeha pêvajoya plansaziya zimanî pêk tînin.[119]

Einar Haugen ji bo plansaziya zimên 4 model derxistine. *hilbijartina diyalektê* (Selection of norm), *kodkirin* (Codification of norm), *pêkanîn* (Implementation of function) û *belavkirin* (Elaboration of function).[120] Fishman di gotara xwe ya *Language, Modernization and Planning* de dibêje, Haugen û J. V. Neustupny bi hêsanî li hev tên, ji ber ku plansazî dikare bi çavê yê din wisa bê dîtin ku xwe dubare dike. Neustupny li ser 4 modelên Haugen, ya pêncemîn derdixe: çandî (cultivation). Ev jî ji çavê Haugen dikare wek "dubare" bê dîtin. Her wiha "pêkanîn"a Haugen jî dikare bi çavê Neustupny wek dubare bê dîtin.[121]

Neustupny behsa du pirsgirêkên zimên dike di vê meseleyê de. Ya ewil nêzikahiya planî (policy approach) û ya din nêzikahiya çandî (cultivation approach) ye. Li gorî wî di nêzikahiya planî de hilbijartina zimanê neteweyî, standardîzasyon, xwendin-nivîsîn, rastnivîs û hwd. hene. Dîsa di nêzikahiya çandî de lenguîst li ser pirsgirêkên rastnivîsê, kêrkerî, pirsgirêkên şêwazê hwd. disekine.[122]

---

[118] Joshua A. Fishman, "Language modernization and planning in comparison with other types of national modernization and planning", in Language in Society, Vol: 2, No: 1, Cambridge University Press, 1973, rr. 31-32

[119] Ronayi Önen, *Ziman û Netewesazî-Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*, r. 36

[120] Einar Haugen, "The Implementation of Corpus Planning: Theory and Practice", Cobarrubias/J.A. Fishman (eds) *Progress in Language Planning: International Perspectives*, Mouton Publishers, Berlin 1983, r. 270

[121] Joshua A. Fishman, "Language modernization and planning in comparison with other types of national modernization and planning", r. 25

[122] J. V. Neustupny, "Basic Types of Treatment of Language Problems", *Linguistic Communications 1*, Monash University, 1970, r. 4

Her wiha Fishman li modela Ferguson jî dinêre û dibêje ew ji aliyekî din ve li pêşketina zimên dinêre: grafîzekirin (graphization), standardizasyon û modernîzasyon. Li gorî Ferguson, pêşketin (development) aîdê pêvajoya fonksiyon û tevgerên civakî ne bi îtîbarkirina kodekê, statuya karên heyî di termên van pêvajoyan de dibe ku an jî nebe ku ji ber plansaziyê be. Nêrîna Ferguson dibe ku wek encamên plansaziyê bê dîtin, bi vî awayî bi nêrînên Haugen û Neustupny li hev tê û esas ev tablokirineke çeprast e (cross-tabulatable).[123]

Haugen diyar dike ku Fishman *nirxandin*a (evaluation) Joan Rubin jî li ser zêde dike. Her wiha wek me li jor jî diyar kiribû ku li gorî Fishman modelên Haugen û Neustupny li hev tên, lê belê Haugen ji bo vê yekê dibêje "ev fersendek e ku bi hûrgilî ez ê bersiva vî tiştî bidim."[124] Haugen bi taybetî li ser modela Neustupny munaqaşeyek dike.

Li ser vê yekê, Haugen li ser 4 modelên xwe disekine yek bi yek û wiha diyar dike ku hilbijartina diyalektekê wek Neustupny bi mafdarî dibêje, wexta ku pirsgirêka zimên hebe hewce ye. Hilbijartin dikare bi şerên dirêj ên di nav gel de be an jî dikare takekesî be, dikare biryara piraniyan jî be. Dikare di şevekê de jî be, çawa ku Atatürk herfên erebî bi yên latînî guherand. Yên ku li hember derdikevin jî hene, wekî cihûyên hasîdîk ên ku dixwest li Îsraîlê jî zimanê yîdîşê bi kar bînin. Bi demê re dikare berevajiya diyalekteke hilbijartî jî be. Taybetiya wê ew e ku ji aliyê civakê ve tê bikaranîn, formeke polîtîkaya plansaziyê (policy planning) ye û tê de formeke lenguîstîk tê sazkirin.[125]

Kodkirin dikare bibe karê takekesekî/ê bi xwe jî. Ew kes bi awayekî nivîskî formek dide norma hilbijartî. Divê ew yê wî/wê be, gelek ziman li derve hatine kodkirin, ji mîsyoneran bigirin heta pisporan. Grafîzekirina ku Ferguson behs dike gava yekem e. Li cihê ku alfabe, kîte an jî *sîstema sembolan* (system of ideograms)[126] tê sazkirin, çanda nivîskî pir zû belav dibe. Grafîzekirina herî hêsan jî pêdivî bi hin biryaran heye û ev yek divê bi ehlê lenguîstek ve bê kirin. Hilbijartin û

[123] Joshua A. Fishman, "Language modernization and planning in comparison with other types of national modernization and planning", r. 25
[124] Einar Haugen, "The Implementation of Corpus Planning: Theory and Practice", r. 270
[125] Einar Haugen, "The Implementation of Corpus Planning: Theory and Practice", rr. 270-271
[126] Îşareta ku wateyê diyar dike.

kodkirin di heman stûnê de xuya dikin, lewre di her duyan de jî li ser formê biryar hene. Hilbijartin û kodkirin bêyî pêkanîn û belavkirinê wek egzersîzên li ser kaxizê dimînin, ku di pêkanînê de statuya civakî û di ya din de korpûsa lenguîstîk heye.[127]

Pêkanîn aktîvîteya nivîskarekî, enstîtuyekê, hikûmetekê ye ku forma zimên a hatiye hilbijartin û kodkirin belav dike. Ev tişt bi zimanê nivîskî pêk tê; wek pirtûk, broşûr, rojname û pirtûkên dersê. Ev kes an jî sazî, li ser dibistanan an jî medyayê, wek radyo û televîzyon, vî tiştî dikin navgîna hînkirinê an jî mijara hînbûnê.[128]

Belavkirin ji gelek aliyan ve berdewamiya pêkanîna normekê ye di rasthatina fonksiyonên cîhana modern de. Zimanên mezin ên Ewrûpayê wexta avakirina fonksiyonên neteweyî û navneteweyî yên latînî girt ser xwe, ji dema Ronesansê ve bi afirîneriya xwe standardek danî. Hewcedariya zimanekî modern ê ji çanda bilind, bi termînolojiya hemû qadên rewşenbîrî û humanîstîk heye.[129]

Piştî van ravekirinan Haugen îdîa dike ku "nêzikahiya çandî" ya ku Neustupny weşandiye ji xwe bi temamî di nav têgiha Haugen de heye. Her wiha wisa zêde dike ku Neustupny xuya ye difikire ku ew an berevajî "plansaziya zimên" e an jî li ser hatiye zêdekirin û her wiha li gor Haugen, Neustupny pir mafdar e ku vî tiştî wiha nîşan dide: neteweyên *pêşketî* bêhtir karakterîstîk in ji yên *bi pêş dikevin*. Nîşan dide ku têgihên ji bo *çand*ê parçeyeke termînolojiya vê qadê ne di gelek neteweyên Ewrûpî de ku tiştê dixwaze bê nîşandan ka akademiya parêzkarên zimên dixwaze bê kirin çi ye.[130]

Yek ji 4 modelên plansaziya zimên a Haugen hilbijartina normê ye, ango hilbijartina diyalektê ye. Ji bo perwerdehî û zimanê fermî diyalekta herî guncayî tê hilbijartin. Ev diyalekt divê ji her aliyê ve guncayî be. Kodkirin jî diyalekta ku tê hilbijartin stabîlîze dike û pêvajoya standardîzasyonê dest pê dike. Di pêvajoya standardîzasyonê de peywira ewil derxistina pirtûkên wek ferheng, rêziman û rastnivîsê ne û ev pêvajo bi piştgiriya akademî û kesên ku li ser vî karî dixebitin pêk tê. Pêkanîn, çalakiyên bi piştgiriya dewletê, enstîtuyan, rojname, kovar, pirtûk û her

[127] Einar Haugen, "The Implementation of Corpus Planning: Theory and Practice", rr. 271-272
[128] Einar Haugen, "The Implementation of Corpus Planning: Theory and Practice", r. 272
[129] Einar Haugen, "The Implementation of Corpus Planning: Theory and Practice", r. 273
[130] Einar Haugen, "The Implementation of Corpus Planning: Theory and Practice", r. 273

wiha bi navgînên ragihandinê pêk tê. Belavkirin jî bipêşxistina kodên nû yên bi rêya zanistî û teknolojîk e. Berhemdayîna têgihên nû û belavbûna wê, pêkanîna herî berbelav e di modernîzasyona zimên de.[131]

Li gorî vê nêrînê û her wiha li gorî ravekirina Hüseyin Sadoğlu divê plansaziya zimên û standardîzasyona zimên ji hev bêne veqetandin. Standardîzasyona zimên, bêhtir armanca xwe li ser standardkirina têgihan datîne û cihêwaziyên jêr û jor dike yek. Lê belê, plansaziya zimên li gel yekkirina cihêwaziyên jêr û jor, bi taybetî di qadên siyasî yên pirzimanî de pêvajoyên wek hilbijartin, guherandin, bipêşvebirin û pesendkirina normê jî dihewîne.[132]

Plansaziya zimên pirsgirêkên zimên di asta neteweyî de çareser dike. Di hilbijartina *kodkirin*ê de *hêz* lazim e, wek mînak hêza dewletê. Heke pirsgirêk stabîlîzekirina koda hilbijartî be wê demê plansazî bi ferheng, rêziman û hwd. kodkirinê dike. Heke pirsgirêk di bijareyan de be, yên ku zû belav dibin, plansazî bi têgih û ferhengên mezin çareseriyekê dibîne. Heke pirsgirêk cudahiyên di kodkirinê de be, plansazî bi afirîneriya edebî û qilawizan mijûl dibe.[133]

Her wiha di plansaziya zimên de plansaziya korpûsê (corpus planning) û plansaziya statuyê (status planning) heye. Wek Ronayî Önen diyar dike; plansaziya korpûsê di nav çarçoveya zimên de ye, plansaziya statuyê, hewldanên guhartina bikaranîn û fonksiyona zimanê civakê ne[134] û wiha berdewam dike:

> Polîtîkayên zimanî pala xwe didin helwestên der barê ziman, rêzikên hevpar ên civatên zimanî, hestiyarên neteweperwer û dînamîkên sosyolîngîstîk ên din ku der barê guherînê de ne. Û ji xwe plansaziya zimanî der barê van reftar û helwestên zimanî de ye. Di nava polîtîkayên zimanî de du cure plansazî hene: Plansaziya korpûs, ku der barê çarçoveya navxweyî ya ziman de ye; û

[131] Juan Cobarrubias, *Language Planning: The State of the Art*, in Progress in Language Planning, Edited by: Juan Cobarribuas, Joshua A. Fishman, Walter de Gruyter&Co., Berlin, 1983, r. 4
[132] Hüseyin Sadoğlu, *Türkiye'de Ulusçuluk ve Dil Politikaları,* r. 37
[133] Joshua A. Fishman, "Language modernization and planning in comparison with other types of national modernization and planning", r. 24
[134] Ronayi Önen, *Ziman û Netewesazî-Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*, 2018, r. 142

plansaziya statuyê, ku tê wateya hemî hewldanên guherîna bikaranîn û erka zimanî (an jî cureyên zimanî) yên di nava civaka navborî de.[135]

Yanî di plansaziya korpûsê de avakirina rêzimanê, sererastkirina alfabeyê, rastnivîs û hwd. heye. Ev kar dibe ku ji aliyê kesekî ve jî bê kirin. Lê di plansaziya statuyê de hêzeke otorîteyê divê; dibistan, enstîtu, zanîngeh tên avakirin, her wiha zimanê medyayê li gorî vê plansaziyê tê dirustkirin.

Ev her du plansazî dikarin ji aliyê teorîk ve cuda bên hesibandin, lê belê di rastiya xwe de plansaziya korpûs û plansaziya statuyê gelek ji hev ne dûr in. Ew nebe zimanek fermî jî, standardkirin tê wateya guherînên di statuya zimanî de û bi piranî hinek awayên plansaziya korpûsê (yên wekî dewlemendkirina bêjeyan, standardkirin û hwd.) di nava çarçoveya plansaziya statuyê de cih digirin. Ji bo mijûlbûna bi erkên nû yên zimanî (plansaziya korpûsê) yên wekî geşepêdana cure û hêmanên nû yên bêjeyî hene.[136]

Plansaziya korpûsê ji bo *zimanên ku bi pêş dikevin* pir giring e, yên ku bi cîhana modern, an jî ji bo armancên ticarî, tûrîstîk, polîtîk û perwerdehiyê geş dibin. Lê divê em wisa nefikirin ku tenê *zimanên ku pêş dikevin* divê bi zimanê xwe eleqedar bin, pê bilîzin an jî tev bidin. Di zimanên wek îngilîzî de jî guherîn têne kirin, wek mînak ji bo peyvên ku tê de serdestiya mêran xuya ye, yên wek "mailman", "fireman", hwd. jin dixwazin peyvên din bêne bikaranîn, lewre ev peyv zayendî ne.[137]

Di plansaziya korpûsê de du baweriyên berbelav hene: bikaranîna zimên alîkariya guherîna civakî dike û ji aliyê din ve bikaranîna zimên guherîna civakî stabîlîze dike. Carinan guherîna korpûsê berhemeke bermayî ya biryarên guherîna statuyê ya ewil e (wek rewşa Atatürk -ku alfabeya erebî bi latînî guherand û xwest

[135] Ronayi Önen, *Ziman û Netewesazî-Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*, rr. 36-37

[136] Ronayi Önen, *Ziman û Netewesazî-Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*, 2018, r. 37

[137] Joshua A. Fishman, *Do Not Leave Your Language Alone – The Hidden Status Agendas Within Corpus Planning in Language Policy*, Lawrence Erlbaum Associates, Publishers Mahwah, New Jersey, London 2006, rr. 3-4

civakê bike rojavayî an jî Ewrûpazîsyonek çêke), an jî ev navgînek e ji bo anîna guherîna civakî.[138]

Her wiha, di plansazî an jî standardîzasyonê de, berevajî zimanê devkî, zimanê nivîskî rihettir dikare bibe xwedî rêbazekê û bêhtir dikare bê kontrolkirin. Wekî ku Fishman diyar dike zimanê nivîskî ji aliyê dibistanan, edîtoran, weşangeran an jî hikûmetê ve dikare bê çavdêrîkirin (kontrolkirin). Zimanê nivîskî bi gelemperî xwedî standardeke xwe ye ku bi saya wê dikare bê hevrûkirin.[139]

Di tu zimanî de mirov wek diaxive nanivîse, an jî wek dinivîse naaxive. Her wiha axaftina însanekî/ê bi perwerde jî dikare diyalekta wî/wê an jî cihê ku lê mezin bûye derxe holê. Dîsa jî, standarda nivîskî dibe wek bedena mirov, dibe alaya wî.[140] Ji ber ku ev ziman yek e, wek diyalektan li gorî axivêran naguhere. Ji ber vê ye ku, bi zimanê standard ji mirov tê xwestin ku bila her kes bi heman awayî biaxive, binivîse û heman rêbazên rêzimanê bi kar bîne.

James Milroy dibêje di standardîzasyonê de *yek* heye; *tenê yek*. Ango ji şêwazan tenê yek divê bê hilbijartin. Helbet vê fikirê jî diparêze, ya ku berêvajî *yek*ê ye, û dibêje tu zimanekî bi temamî ne yekcureyî ye, her çi qas zimanê standard yekcureyiyê biparêze jî.[141] Mirov dikare ji gotinên Milroy vî tiştî fam bike, her çi qas zimanê standard ava bibe jî, cureyên derveyî standardê tu car winda nabin. Ji bo vê yekê jî zimanên îngilîzî û fransî mînak dide û dibêje "em van zimanan wek îngilîziya standard, fransiya standard bi nav dikin, lê esas di rastiya xwe de ne bi temamî yekcureyî ne."[142] Dibe ku qesta wî ya vî tiştî zimanê devkî be, lewre di zimanekî de ji bo nivîskî her çi qas standardbûnek çêbe jî, her wiha zimanê devkî çi qas ji rêya zimanê standard biçe jî, di axaftinê de, ango di zimanê devkî de mirov dikare şopa devokê bibîne.

---

[138] Joshua A. Fishman, *Do Not Leave Your Language Alone*, r, 4
[139] Joshua A. Fishman, *Do Not Leave Your Language Alone*, r. 6
[140] Joshua A. Fishman, *Do Not Leave Your Language Alone*, 2006, r. 7
[141] James Milroy, "The ideology of the standard language", *The Routledge Companion to Sociolinguistics*, Ed. by. Carmen Llamas, Louise Mullany and Peter Stockwell, Routledge Publishing, New York 2007, r. 133
[142] James Milroy, "The ideology of the standard language", rr. 133-134

Her wiha li gorî Milroy, di çanda zimanê standard de rastî û şaşî heye, navbera wan tune ye. Her kes divê vî tiştî bizanibe, ev zanîneke xwezayî ye, her wiha di çanda zimanê standard de ew xetaya mirov bi xwe ye, heke nekaribe bi awayekî xweşik kîtekirinê bike an jî xweşik neaxive. Li ser vê jî mînaka dibistanê dide û dibêje zimanê standard li dibistanê dikare bê hînkirin. Zarokek wexta diçe dibistanê, heta ji pêşdibistanê ve, hînî bilêvkirina peyvan dibe û bi bingeha rêzimanê hînî axaftinê dibe. Her wiha zarok li wir hînî xwendin û nivîsandinê dibe û xwendewarî bi zimanê standard tê bidestxistin.[143]

Fishman li ser plansaziya korpûsê û statuyê disekine ka ev her du wek hev in, li dû hev tên an ji hev cuda ne. Dibêje heke ev her du cuda ne, pêvajo bi kîjanê dest pê dike? Li gorî yên ku plansaziya statuyê berê dibînin, dibêjin bêyî plansaziya statuyê plansaziya korpûsê çawa dibe? Bi gelemperî, li cihên ku rewş berî destpêkirina plansaziya zimên derdikeve holê, mirov bi plansaziya korpûsê dest pê bike çêtir e, lewre piraniya armancên rewşên lezgîn hatine bidestxistin û ziman ji bo hikûmet, dibistan, medya û dadgehê hatiye erêkirin. Li vir mînaka zimanê fîlîpînî dide û dibêje:

> Pirsgirêka herî mezin a fîlîpînî jî ev e ku, wek mînak axaftin an jî nivîsîna tu kesekî ne tekûz bû. Mamosta tune bûn, pirtûkên dersê hêj tune bûn. Heke di demeke zû de plansaziyeke baş a korpûsê nebûya, an dê serê fîlîpînî biketa belayê, an jî ji ber kêmasiya xwe dê winda bibûya.[144]

Fishman wexta ku behsa piraniya zimanên Ewrûpayê dike di meseleya *berî plansaziya korpûsê* de, behsa zimanên bêdewlet jî dike li Ewrûpayê an jî li derekê din. Berî ku Estonya azad bûye xebatên ji bo modernîzekirina Estonyayê dest pê kirine. Pompeo Fabra berî îlankirina otonomiya Katalanê, dest bi xebatên li ser standardîzasyona nivîs û rêzimana katalanî kiriye. Ji bo baskî jî heman tişt e. Plansaziya korpûsê ji bo îtalyanan bi *dayîka hemû akademiyan* (Accademia dela Crusca - 1582) a navdar dest pê kiriye ku ev bi sedsalan berî yekbûyîna Îtalyayê hatiye damezirandin.[145]

---

[143] James Milroy, "The ideology of the standard language", r. 136
[144] Joshua A. Fishman, *Do Not Leave Your Language Alone,* r. 12
[145] Joshua A. Fishman, *Do Not Leave Your Language Alone,* r. 13

Yek ji wan zimanên bêdewlet bi statuya hazir dest pê nekiriye. Esas kêmasiya statuyê hestek dide ji bo zimanên hatine tepisandin da ku plansaziya korpûsê bikin. Hema ji ku be dikarin dest pê bikin. Belkî li ser dixebitin da ku dijberî û hêrsa desthilatdarên ku hatine dorpêçkirin û kontrolkirin kêm bikin. Her zimanek ne xwedî dewletek e, lê gelek ziman leksîkografek, rêzimannasek, stîlîstek wan heye. Ev kes bi dilxwazî karê xwe dikin, lewre di hişê wan de ji materyalê zêdetir rûmeta etnoçandî heye. Tunebûna hêzeke mezin, motîvasyoneke hêzdar e ji bo destpêkirina plansaziya zimên bi plansaziya korpûsê û piştre hêdî hêdî xebatên li ser plansaziya statuyê dikare hêzên ku çêbin xemgîn bike. Di tunebûna îhtimalên aşkera yên statuyê de, korpûs modernîte û serxwebûna hemû kesên derengmayî ye ku divê li ser bixebitin.[146]

Midaxeleyên wek *afirînerî* û *sînordarkirî* hene di plansaziya zimên de. Li gorî vê, midaxeleyên afirîneriyê dike ku zimanekî ku ne nivîskî ye bibe nivîskî, alfabe û rastnivîsa wî bibe standard û peyvên nû bêne afirandin. Berevajî vê, midaxeleyên sînordarkirî jî li hemberî cihêwaziya erdnîgarî û civakî, standardkirinê an jî bi armanca sadekirina zimên a ji bandorên biyanî îfade dike. Îbraniya ku îro zimanê dewleta Îsraîlê ye, ji aliyê Eliezer Ben Yehuda û Akademiya Zimên a Hebrewê ve, bi esasgirtina zimanê Tewratê hat standardîzekirin û modernîzekirin û ev dikare ji bo plansaziya navxweyî bê mînakdan. Ev plansaziya ku wek vejandina zimanê mirî tê dîtin, tev pêvajoya hilbijartina normê û avakirina ferhengê dihat organîzekirin.[147] Di vê rewşê de mirov dixwaze bipirse ka standardîzasyona kurdî jî dikare wek *plansaziya navxweyî* bê dîtin? Her çi qas zimanekî mirî nebe jî, ne xwedî standardekê bû û ji alfabeyê heta rêziman û rastnivîsê xebateke giranbiha li ser hat kirin.

Li ser vê em dikarin mînaka hewldanên Celadet Bedirxan û hevrêyên wî bidin. Wek mînaka Fishman, di rewşeke bêdewlet de dixwaze zimanê nivîskî stabîle bike û her wiha bi reformeke mezin; alfabeya erebî radike û li şûna wê ya latînî ava dike. Wek mînaka li jor, her zimanek xwedî rêzimannasek an jî stîlîstek e. Di rewşa kurdan de jî ew kes Celadet Bedirxan e. Bêyî dewlet, bêyî dibistan, bêyî enstîtû, bêyî

[146] Joshua A. Fishman, *Do Not Leave Your Language Alone*, rr. 13-16
[147] Hüseyin Sadoğlu, *Türkiye'de Ulusçuluk ve Dil Politikaları,* rr. 38-39

hêza otorîteyê kovara *Hawar*ê dike dibistan ji bo gelê kurd. Armanca wî hem zêdekirina hejmara mirovên xwenda, hem jî avakirina hişmendiya neteweyî ye. Wexta em li yekem rojnameya kurdî *Kurdistan*ê (1898) dinêrin, li ser xwendebûnê, hişmendiyê pir disekine, lê hewleke ji bo standardîzasyona zimên tune ye. Armanceke din a Celadet Bedirxan ew e ku bi vê standardîzasyona zimên têgihîştina mirovan a hev û din nêziktir bike. Di zimanên bêstandard de her çi qas heman zimanî biaxivin jî, ji ber cudahiya devokan herêmekê ya din fam nake, heta ev rewş di nav însanên nexwenda de îro jî berdewam e.

1.2. MÎNAKÊN STANDARDÎZASYONÊ DI DÎROKÊ DE

Ziman bûnewereke wisa ye ku her roj bi bûyerên nû û bi van bûyeran re eleqedar bi têgihên nû geş dibe. Wekî ku Milroy dibêje bi sed salan e pêşketina ziman bi ya ekonomîk û teknolojîk re paralel e.[148] Pêvajoya guherîn û dewlemendbûna wî bi bikaranînerên wî re eleqedar e. Zimanek ji hebûna xwe û heta îro rastî gelek guherînan tê, heta di hin ji wan de guherînên pir mezin çêdibin, ji alfabeyê bigirin heta peyvan.

Di nav van zimanan de em ê fransî wek mînak nîşan bidin ku ev ziman berê diyalektek bû û dûre ji latînî qetiya û bû zimanê welatekî. Zimanhezên wî pir hesas tev geriyane, fikira yekzimanî diparastin, lewre li Fransayê gelek diyalekt hebûn û her herêmek ji ya din dûr bû ji aliyê têgihîştinê ve. Ji bo têgihîştineke tevahî, zimanekî yekane hewce bû. Her wiha ev zimanê yekane jî rê li ber netewetiyê vedikir. Yekzimanî fikira netewebûnê derdixist li welêt. Ji bo neteweyeke baş, zimanekî tekûz û yekgirtî lazim bû. Em ê di vê beşa mînaka fransî de berê xwe bidin veqetîna ji latînî û avabûna Académie Française (Akademiya Fransî) ku armanca vê akademiyê parastin û standardîzasyona zimên e.

Mînaka duyem jî zimanê tirkî ye ku armanca me ya nîşandana vî zimanî guherîna alfabeya wî ye, wek guherîna alfabeya kurdî ya ku bingeha xebata me pêk tîne. Wekî ku tê zanîn alfabeya tirkî jî ji herfên erebî derbasî herfên latînî bûye. Her wiha di zimên de bi xwe jî guherîneke mezin pêk hatiye wek mînaka fransî. Osmaniya ku bi piranî ji peyvên erebî, farisî, kurdî û tirkî pêk tê, cihê xwe daye tirkî.

[148] James Milroy, "The ideology of the standard language", r. 133

Zimannasên ku li ser tirkî xebitîne gelek rê şopandine. Lêkolîna li ser geşedana van her du zimanan dê bergeha xebata me firehtir bike.

1.2.1. Mînaka Fransî

Mihtemel e ku fransî zimanê herî standardîzebûyî ye di nav zimanên ewrûpî de, wek mînak ji îngilîzî an jî ji almanî. Fransî mîrasgirê herî zû yê latînî bû, hemû têgihên wî yên rastîniyê (correctness) û aliyên entelektuelî girtin. Fransî ji bo zimanên din bû modelek ji aliyê standardîzasyonê ve û axêverên wî bi sed salan nedixwest wî zimanî wisa bihesibînin. Wexta nivîskarên îngilîz di sedsala 18mîn de difikirîn ji bo sererastkirina zimên divê akademiyek îngilîzî ava bikin, fikira enstîtuyeke wiha ji Fransayê hat. Ev xwestek bi piranî hat redkirin, lewre yên îngilîz nedixwest wek teqlîdkerên fransizên "zalim" bên dîtin.[149]

Li Fransayê, wek welatên din, pêvajoya standardizasyonê rasterast girêdayî dîroka neteweyê bi xwe bû. Wexta ku gel girêdayî dewleteke hevpar bû, zimanê wan jî bû navgîn û semboleke yekîtiya wan.[150] Ji ber vê, di nav netewe û zimên de her dem têkiliyek heye. Wekî Antoine de Rivarol dibêje: "Kesê ku diaxive, bi dengekî bilind difikire, heke em yekî/yekê bi gotinên wî/wê darizînin, em dikarin wê çaxê neteweyekê jî bi zimanê wê darizînin."[151]

Li vir wexta em dibêjin *gel*, helbet ne tenê *gel*ê bajarî, bi taybetî *yên gundî* di vê pêvajoyê de pir giring in. Li gorî Nurettin Beltekin avakirina netewe-dewletê ya Fransayê bi gundiyan dest pê dike. Berê hem ji ber tunebûna rê, hem jî dûrbûna ji bajêr, gundî debara xwe hema li gund dikirin. Lê piştî çêkirina rê, têkiliya gundiyan bi bajêr, danûstandina wir û her wiha bi vê re girêdayî, têkiliya wan bi dewlet û siyasetê re jî hat danîn. Ango sînorê di navbera gund û bajêr de rabû.[152]

---

[149] Einar Haugen, "Dialect, Language, Nation", r. 930
[150] Einar Haugen, "Dialect, Language, Nation", r. 930
[151] Séverine Rebourcet, "Le français standard et la norme: l'histoire d'une "nationalisme linguistique et littéraire" à la française", *École doctorale de The School of Languages, Literatures and Cultures de l'Université du Maryland,* Communications, lettres et sciences du langage, Vol. 2, No: 1, Printemps 2008, r. 107
[152] Nurettin Beltekin, "Perwerde û Înşakirina Nasnameya Neteweyî: Fransa û Tirkiye", di *Akademiya Îsmaîl Beşîkçî 1-2019 Payîz* de, İBV Yayınları, İstanbul 2021, rr. 56-58

Her wiha bi şer re sîstema leşkeriyê hat. Her çi qas di serî de leşker serekên xwe fam nedikirin jî, bi demê re hemû hînî fransiya Parîsê, ango zimanê standard bûn ku armanc jî ji xwe ev bû. Piştre giringiya dibistanan hat famkirin û li her derê vebûn.[153]

Li gorî R. Anthony Lodge, têkiliya navbera ziman û neteweyê di sedsala 15mîn de dest pê kir. Neteweya fransî li ser neteweyên din ên Gaulê bû serdest. Her wiha koma ku serdestiyê dikir, zimanê xwe wek sembola nasnameya neteweyî ya nû didît.[154] Li gorî van agahiyan, mirov dikare bibêje ku li Fransayê netewetî bi hevgirtina zimanekî, yanî bi standardkirina zimên derketiye. Bi saya vî zimanê hevpar di nav gel de yekîtiyek çêbûye, ji ber herêmên ku berê ji hev fam nedikir bi saya vî zimanê hevpar dikarin têkiliyek daynin di nav xwe de. Ji ber vê mirov dikare bêje ku ziman di netewebûnê de heyîneke navendî ye.

Carnot di rapora xwe ya 29ê Çileya 1793yan de ku pêşkêşî Konvansiyonê dike, dibêje têkiliyeke baş a di navbera welatiyan de tenê dikare bi yekîtiya zimên mimkin be. Li gorî wî, heta ku yekîtiya zimên pêk neyê, mirov nikare di navbera welatiyên fransî de hişmendiyeke neteweyî pêk bîne. Di vê rewşê de, pêngava herî giring a ku mirov zimanê fransî wekî zimanekî neteweyî bide qebûlkirin ew e ku mirov di pêvajoya perwerdehiyê de tenê wî zimanî bi kar bîne.[155]

Zimanê ku îro wek *fransî* tê zanîn, ji zimanê latînî tê ku li welatê Fransayê, tê axaftin. Wekî ku R. Anthony Lodge diyar dike, dîroka ku fransî wek ziman ji latînî veqetiyaye 842 tê zanîn, sala ku *Peymana Strasbourgê*[156] pêk hatiye, lê helbet wek devkî hêdî hêdî ji latîniya romanî veqetiyaye.[157] Giringiya *Peymana Strasbourgê* ew

[153] Nurettin Beltekin, "Perwerde û Înşakirina Nasnameya Neteweyî: Fransa û Tirkiye", di *Akademiya Îsmaîl Beşîkçî 1-2019 Payîz* de, İBV Yayınları, İstanbul 2021, rr. 56-58
[154] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 131
[155] Hüseyin Sadoğlu, *Türkiye'de Ulusçuluk ve Dil Politikaları,* r. 31
[156] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 10
[157] Jenelle Thomas, *That Ain't Right!: Language Standardization and Prescription in French, Spanish and English*, Advisor: Jeffrey Killman, General University Honors, Spring 2010, r. 15

e ku cara yekem e zimanê gel di metneke fermî de jî dihat bikaranîn.[158] Ango ev metn wek yekem metna ku ne latînî ye dikare bê hesibandin.[159]

Di dîroka Fransayê de her ku birêveber guheriye rewşa zimên jî guheriye. Wek Îbrahîm Seydo Aydogan jî behs dike, di dîroka Fransayê de her desthilatdarek xwestiye zimanê wî serdest be û ew ziman bê bikaranîn.[160] Di navbera sedsalên 13mîn û 16mîn de, fransiya Qral şûna latînî girt wekî zimanê hikûmet û dadê. Di dawiya sedsala 11mîn de ev ziman hêdî hêdî ket nav van qadan li başûr, lê li bakur ev pêvajo di sedsala 13mîn de pêk hat. Cihguhartina bi latînî di du astan de pêk hat: yekem ew e ku di wê serdemê de her herêmê di zimanê xwe de sîstemeke nivîskî ava kiribû ji bo karên îdarî û legal, di asta duyem de zimanê nivîskî yê Parîsê her ku diçû li her derê belav dibû, bi vî awayî ne tenê latînî lê belê zimanên herêmî jî ji holê radibûn, bi taybetî zimanê d'ocê. Ev pêvajo jî hêza qralên Fransayê nîşan dide.[161]

Pêvajoya derbasbûna ji diyalektê bo standardê di fransî de pir binavûdeng e. Wexta mesele zimanê fransî be an jî di zimanan de standardîzasyon be, di dîrokê de fransî cihekî giring digire, ji ber ku li Fransayê her herêm xwedî diyalekta xwe bû. Li gorî Aydogan diyar dike, li Fransayê ji 600î zêdetir zaravayên zimanê romayî hebûn û bi tenê kesên ku bi xwendin û nivîsandinê dizanîn latînî bi kar dianîn. Ev hemû zarava û devokên zimanê romanî bi sê grûban têne nîşandan: "Zimanên Oyl (oïl), zimanên ok (oc) û zimanên franko-herêmî (franco-provençal). Binavkirina van zimanan li gorî peyva 'erê' hatiye kirin. li başûrê Fransayê ji bo ku bibêjin 'erê' digotin 'oc', li bakur jî digotin 'oyl' û 'oui'ya îro ji bakuriyan hatiye."[162] Peymana Strasbourgê bi zimanê *oïl*ê, di 842yan de hatiye nivîsîn. Di sedsala 13mîn de ye ku fransî di pexşanan de hate bikaranîn, ev nivîs hem metnên edebî hem jî ne edebî bûn.[163]

---

[158] İbrahim Seydo Aydoğan, "Linguicide yan jî zimankujî-Geriyanek di dîroka Fransayê de li ser yekîtiya zimên û yekîtiya neteweyî", di *Kovara Zend* de, Zend Bilim Kültür Eğitim Basın Yayın Ltd. Şti., İstanbul, Payîz 2008, r. 15

[159] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 10

[160] İbrahim Seydo Aydoğan, "Linguicide yan jî zimankujî-Geriyanek di dîroka Fransayê de li ser yekîtiya zimên û yekîtiya neteweyî", r. 14

[161] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 120

[162] İbrahim Seydo Aydoğan, "Linguicide yan jî zimankujî-Geriyanek di dîroka Fransayê de li ser yekîtiya zimên û yekîtiya neteweyî", r. 15

[163] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 106-107

Di zimanê *oc*ê de ev pêvajo dirêjtir e. Mînaka ewil wergereke Boethius e bi navê 'Consolation of Philosophy'. Li başûr mînaka nivîsê xuya bû carekê û ji ber vê ye ku pir zû belav bû. Di sedsala 11mîn de zimanê *oc*ê di metnên legal de tê bikaranîn. Her wiha di nivîsê de bikaranîna occitanê zêdetir bû, hem di metnên edebî hem jî di belgeyên îdarî de dihat bikaranîn.[164]

Di serdemên navîn de ji xwe bikaranîna nivîsê û xwesteka li hember wê pir ne berbelav bû. Li derekê wiha ku çanda devkî berbelav e, derxistina metnên nivîskî zehmet bû, hem ji ber ku axaftina her herêmekê ji ya din cuda bû û ji ber vê dê metnên nivîskî tenê li herêma xwe bihata xwendin, hem jî veşartina alavên wek parşomen, mirekeb û pênûsan zehmet bû, her wiha biha jî bû.[165]

Ji xeynî vê, di wê serdemê de, hînbûna nivîsê dihat wateya hînbûna nivîsîna latînî. Her tişt li ser latînî ava bûbû. Hemû peyvên bi nivîsê re eleqedar, *latînî* dianî bîra mirov. Wekî mînak kesê xwenda (letré) wek bi latînî re eleqedar dihat dîtin, nivîsevanek (clerc) kesê ku xwendin û nivîsîna latînî dizanîbû dihat dîtin û her wiha *grammaire* di wateya gramera latînî de dihat bikaranîn.[166]

Di dawiya sedsala 12mîn de jî hêj zimanekî devkî yê standard tune bû. Piştî sedsala 12mîn hin devokên herêmî bûn xwedî prestîjekê, hem ji aliyê ekonomîk, hem ji aliyê polîtîk ve. Devoka Parîsê jî di nîveka duyem a vê sedsalê de bû xwedî nirxekê. Koka fransiya modern jî digihîje wê çaxê. Lê di wê serdemê de nivîsa fermî hê jî latînî bû, ancax di sedsala 13mîn de fransî di karên îdarî yên Parîsê de hate bikaranîn.[167]

Dûre bikaranîna fransî li qadên din zêdetir bû. Di 1257an de St. Louis diyar kir ku dê bikaranîna fermî bi fransî be, di 1510an de Louis XII got dê zimanê devkî (zikmakî) bibe zimanê welêt û di 1539an de bi fermana ku li Villers-Cotterêtsê hat dayîn, fransî bû zimanê dad û birêveberinê.[168] Bi vê biryarê zimanê dayîkê ango

---

[164] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 107
[165] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 107
[166] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 108
[167] Jenelle Thomas, That Ain't Right!: Language Standardization and Prescription in French, Spanish and English, r. 15
[168] Jenelle Thomas, That Ain't Right!: Language Standardization and Prescription in French, Spanish and English, r. 17

langage françois dê bihata bikaranîn ku ev jî yek ji devokan bû. Her wiha bi fermana Villers-Cotterêts, tenê devoka (françois) bakurî (zimanê zikmakî) divê bê bikaranîn. Bi vî awayî 1539 û pê ve fransiya Qral ket şûna piraniya zimanên herêmî.[169]

Di navbera sedsalên 13mîn û 16mîn de fransî di karên fermî û gelî de bû xwedî cihekî giring, ne tenê di karên hikûmetî û dadî de her wiha wek zimanê perwerdehiyê jî bû zimanekî giring.[170] Li Zanîngeha Parîsê fransî her dem zimanê ne fermî bû di navbera nivîsevanan de, lê bi avabûna Collège de Franceê re, di sala 1530î de fransî cara ewil di polê de hate bikaranîn.[171]

Di sedsala 16mîn de bikaranîna fransî di tib, matematîk, felsefe û dîrokê de berbelav bû. Divê bê nîşandan ku, Fransa jî wek welatên din ên Ewrûpayê ji nexwendebûnê, bi piranî ji zimanê devokî û ji çanda kolektîf derbasî çanda nivîskî, taybetî û takekes bû.[172]

Bi sedsalan vê tevliheviya ziman û diyalektan berdewam kiriye li Fransayê. Ji bo yekîtiya zimên xebatên wek ferheng û rêzimanê hewce bû. Standardîzasyon û kodkirin dê bibûya armanca mezin û gavên giring. Ji ber vê pêdiviyê akademiyeke fransî ya bi navê Académie Française hat damezirandin di 1635an de ji aliyê Richelieu ve. Armanca herî mezin a avakirina akademiyê belavbûna prestîja wê bû li sehneya Ewrûpayê. Serdemek wisa bû ku komek ji kesên elît li hemberî Îtalyayê xwe pir kêm didît hê jî, lewre vê akademiyê ji Florentine Accademia della Crusca (1582) ya Îtalyayê feyz girtibû û wek mînaka wê hatibû avakirin. Her wiha Richelieu dizanîbû ku kodkirina zimên tevgereke polîtîk bû û divê mirov ev kar ji rêzimannasan re bihişta. Çend kom derketin di sedsala 16mîn û destpêka 17mîn de ji bo ku curbicuriya zimanê nivîskî kêm bikin. Li gorî Richelieu bê guman heke kodkirin ava bibe, bi hêza zimên norm ava dibe – prensîbeke polîtîk a sedsalek berê li Villers-Cotterêts hat ava kirin. Her wiha pesndayînek an jî rexneyek ku ji akademiyê derkeve dê ne tenê kontrol bike ka nivîskar çawa dinivîsin, her wiha dê bizanibin ka çi dinivîsin, bi vî awayî dê bikaribe bandorek li ser têkiliya wan û rejîma

[169] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 126-127
[170] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 120
[171] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 127
[172] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 128

otorîter û merkezî bike. Endam û çalakiyên Akademiyê bi awayekî ne fermî pir di bin bandora Richelieu de diman di salên ewil de.[173]

Akademî li ser avakirina ferhenga xwe û xebatên rêzimanî û bêjeyî dixebitî. Çapkirina ferhenga fermî zêdetirî 40 salan ajot.[174] Ji sedsala 17mîn ve, bi avakirina Akademiya Fransî ya di 1632an de, enstîtu kefîltiya sadekirina zimên dikir, bi vê polîtîkaya sadekirinê, dê ziman ji peyvên binî (bas) û pir populer paqij bûbûya.[175] Her wiha tevî sadekirinê, armanca ewil a akademiyê ew bû ku bi baldarî û hesasî li ser rêbazên zimên bixebitin û bikaribin bi wî zimanî xebatên hunerî û zanistî çêkin.[176]

Yekem rêzimana vê akademiyê *Grammaire de l'Académie* di 1932yan de derket ancax û rexneyên giran lê hatin kirin. Di qada ferhengî de bandora wê bi hêztir bû. Yekem ferheng di 1694an de hat çapkirin.[177] Bi saya vê ferhengê zimanê fransî wek sîstemekê hatiye dîtin. Ev ferhenga ku di bin parastina dewletê de bû, nîşaneya yekîtiya zimanê neteweyî bû. Her wiha armanca ewil a vê ferhengê ew bû ku zimanê fransî ji bo Ewrûpayê pêşniyaz bike.[178]

Vê enstîtuyê bi awayekî aşkera bandor li kodkirina fransiya standard kir û parêzkareke mezin a bikaranîna zimên a îro ye jî.[179] Wexta ku fransî hêj standardîze nebûbû, gel nikarîbû ji hev fam bikira. Heta di 1660î de Racine ji bo ku bê famkirin mecbûr dima îspanyolî û îtalyanî bi kar bîne li Uzèsê. Di 1789an de nîvê nufûsa başûr ji fransî fam nedikir. Li ser her tiştî Akademiya Fransî barekî giran girt ser xwe, barekî ku însanan nedixwest û bi sed salan wan henekê xwe pê kir wexta

[173] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 160
[174] Jenelle Thomas, That Ain't Right!: Language Standardization and Prescription in French, Spanish and English, r. 19
[175] Séverine Rebourcet, "Le français standard et la norme: l'histoire d'une "nationalisme linguistique et littéraire" à la française", r. 111
[176] Patrick Picard, "Aux Sources de l'Academie Française", *Revue des Deux Mondes,* Mars 1994, r. 118
[177] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 161
[178] Giovanni Dotoli, "La Grammaire Dans la Prèmiere Édition du Dictionnaire de l'Académie Française (1694), Verbum 7 (7): 54, December 2016, r. 54
[179] R. Anthony Lodge, *French From Dialect to Standard,* r. 160

Akademiyê xwest peyv, rêziman û rastnivîsa fransî li gorî axaftin û nivîsînê saz bike.[180]

Wekî ku Fishman diyar dike, li gorî endamên Akademiyê, ku ev yek enstîtuyek bû, armanc nûkirin û bipêşxistina netewetiya fransî bû. Ji ber ku netewetiya fransî bi xwe encameke xebata Akademîyê ye, çênabe mirov alîkariyê ji wê bixwaze da ku Akademî bigihîje hedefên xwe.[181] Wekî ku li jor xuya dibe, xebatên akademiyê ne tenê li ser ziman bûn, tevî zimên li ser neteweyê jî xebat dihatin kirin.

1.2.2. Mînaka Tirkî

Di sedsala 19mîn de li Tirkiyê hin guherîn çêdibûn. Modernbûn dihat wateya netewebûnê û nîqaşên neteweperweriyê yên di împaratoriyê de berê rewşenbîran da ziman û pirsgirêkên bi tirkî re eleqedar. Netewe û netewe-dewlet di guherîna mirovahiyê de pêvajoyeke nû bû û diviyabû zimanekî li gorî wê bihata dîtin. Ev ziman hebû û bê guman tirkî bû. Lê belê tirkî di nav erebî û farisî de winda dibû û diviyabû ji vê rewşê bihata xelaskirin.[182]

Her çi qas biryarên ku li ser tirkî û alfabeyê di dewra Komarê de hatibin girtin jî, tirkî û alfabeya ku dihat bikaranîn hêj di nîveka ewil a sedsala 19mîn de, ango di dewra Tanzîmatê de dest pê dike. Tiştên ku rewşenbîr dibînin ew e ku osmanî têk diçe û Komar li ser vê tê avakirin û guherîna ewil jî ya alfabeyê ye ku di 1928an de pêk tê.[183]

Di dewra osmaniyan de hejmara kesên ku dixwînin û dinivîsin pir kêm bû. Ew kesên xwendewar ji kesên rewşenbîr û mirovên dewletê pêk dihat. Sedema herî mezin jî ew bû ku xwendin û nivîsandina bi herfên erebî gelek zehmet bû, tunebûna herfên dengdêr jî ev rewş zehmettir dikir. Her wiha zimanê gel û fermî jî ji hev

---

[180] Joshua A. Fishman, "The Impact of Nationalism on Language Planning: Some Comparisons between Early Twentieth-Century Europe and More Recent Years in South and Southeast Asia", in *Can Language be Planned?*, Editor(s): Joan Rubin, Björn H. Jernudd, University of Hawai'i Press, 1971, r. 10

[181] Joshua A. Fishman, "The Impact of Nationalism on Language Planning" r. 11

[182] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, Mehmet Fatih Uslu (Çev.), Paradigma Yayıncılık, 1. Basım, İstanbul 2007, r. XXV

[183] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, r. XXVI

cudatir bû. Di nav osmanî de peyvên erebî û farisî pir zêde bûn, her wiha ji xwe osmanî ji zimanên erebî, farisî û tirkî pêk dihat. Dewletên din, bi taybetî Ewrûpa bi bikaranîna herfên latînî pir zû hînî xwendin û nivîsandinê dibûn. Ji ber vê ye ku bi salan nîqaşên li ser zimên û alfabeyê kêm nebûn di nav osmaniyan de. Wekî Agâh Sırrı Levend diyar dike sadekirina zimên ji bo famkirina gel pir giring bû. Zimanê burokrasiyê an jî zimanê edebiyatê bi peyvên erebî û farisî dihat xemilandin ku gel ji van fam nedikir. Heta helbestên ku bi vî zimanê xemilandî nehatine nivîsîn bêqîmet dihatin dîtin. Wekî Levend aşkera dike, ji bo sadekirina zimanê tirkî gava ewil ji aliyê Reşit Paşa ve hatiye avêtin. Li gorî Reşit Paşa pirtûkên der barê fen û hunerê de diviyabû ji aliyê gel ve bihatana famkirin û bi zimanekî sade dê zûtir belav bibûna.[184]

Her wiha sadekirina zimên û têgihiştina gel a vî zimanî bi rêya rojname û kovaran rihettir çêbûye. Şinasiyê ku di 1860î de bûye pêşengê rojnamegeriyê, di rûpela ewil a *Tercüman-i Ahval* de tîne zimên ku ev rojname dê bi zimanekî sade bê weşandin da ku gel jê fam bike û wiha dibêje: "Wekî ne hewce ye mirov pênase bike, çawa ku peyv lutfeke Xwedê ye ku mexseda xwe dibêje, nivîsa ku îcada herî xweşik a mejiyê mirov e, ilma şekildayîna peyvê ye bi pênûsê. Di bingeha van rastiyan de, em didin zanîn ku ev rojname dê wisa bê nivîsîn ku hemû gel dê bi hêsanî jê fam bike"[185]

Kesên ku ji bo sadekirina zimên xebitîne, piştî Şinasi; Namık Kemal, Ali Süavi, Ziya Paşa û Ahmet Mithat Efendi ne.[186] Balkêş e ku Namık Kemal hem dixwaze ziman bê sadekirin hem jî li gorî wî erebî û farisî hêzek e ji bo zimên.[187]

Fikirên li ser sadekirina zimên di 1911an de dîsa derdikevin pêş. Kovareke bi navê Genç Kalemler (Pênûsên Ciwan) derdikeve û Ömer Seyfeddinê ku yek ji nivîskarên wê kovarê ye, li ser sadekirina zimên disekine.[188] Li gorî Ziya Gökalp jî ji

[184] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, Üçüncü Baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 1972, r. 81
[185] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, r. 83
[186] bnr. Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, rr. 113-134
[187] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, r. 139
[188] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, rr. 313-314

bo dirûskirina tirkî, divê peyvên erebî û farisî neyên avêtin, lê divê qaîdeyên wan zimanan ji tirkî bêne derxistin.[189]

Bi vî awayî hewldanek çêbû ji bo derxistina peyvên biyanî ji zimên. Ev hewldan jî dibû sedema nîqaşan di nav rewşenbîran de. Hin ji wan digot divê ev peyv neyên derxistin, lewre êdî ketine nav zimên û gel hînî van bûne, jê wêdetir zehmet e ku mirov şûna van peyvan yên nû peyda bike. Li gorî Hüseyin Cahit, divê mirov meseleya peyvan zêde mezin neke. Peyv wek xwezayî dikarin têkevin nav zimên û dîsa bi wî awayî derdikevin. Hewce nake mirov xebateke taybetî bike li ser.[190] Li gorî hinekan jî divê demildest ev ziman ji peyvên biyanî bihata azadkirin. Wisa difikirîn ku zimanekî sade û xwerû lazim bû, bi vî awayî bikaranîna zimên dê ji bo gel rihettir bûya.

Nihat Sami Banarlı jî dibêje zimanên ku bûne navneteweyî çar in: latînî, erebî, îngilîzî û tirkî. Bandora wan a li ser civakê wiha rave dike:

> Zimanên împaratoriyê ji axên ku li wan serdest in, bacê distîne, wekî mehsûlan berhev dike peyv û ziman distîne. Pîvana van stendinan tune ye. Çi qas ji wan re hewce be an jî dilê wan çi qas bixwaze dikarin bistînin. Ji aliyekî ve çand, huner û îqtîdara xwe li ser van welatan belav dikin, kêfa wan tê ku dibînin li her çar aliyê cîhanê hikumê wan heye, zimanê wan tê axaftin û alaya wan li esmanan e. Ji aliyê din ve jî peyvên ku ji heman welatan digirin li gorî rêziman, estetîk û fonetîka xwe dikin neteweyî û dikin yên xwe. Em ji van re dibêjin 'peyvên fethkirî.'[191]

Her wiha çend hewldanên guherîna alfabeyê jî çêbûne. Berî fikira latînîzekirina alfabeyê, guherînên di nav alfabeya erebî de dihatin rojevê. Hin kesan dixwest bi çêkirina herf an jî îşaretên dengdêr alfabeya erebî siviktir bikin.

Hêj di 1851ê de Ahmet Cevdet hewl daye ku alfabe bê guhartin.[192] Piştî wî Münif Paşa jî li ser vê mijarê sekiniye. Li gorî wî herfên peyvan ji hev cuda bihatana nivîsîn dê rihettir bûya. Münif Efendi (Paşa) ku di konferanseke 1862yan de behsa

[189] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, r. 331
[190] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, r. XXXIV
[191] Orhan Koloğlu, *Osmalıcadan Türkçeye Okuryazarlığımız,* Tarihçi Kitabevi, İstabul 2015, r. 29
[192] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, r. 37

alfabeyê û zehmetiyên wê dike û dibêje ji ber ku ev zehmetiyên ku têne behskirin di nivîsên ewrûpiyan de tune ne û perwerdehiya wan jî heta ji wan tê hatiye hêsankirin, zarokên şeş, heft salî hînî xwendin û nivîsînê dibin, ji jin û mêran bigirin heta emeleyan, her kes têra ku derdê xwe bibêje hînî nivîsînê dibe. Her wiha ji ber zehmetbûna nivîsê behsa pirsgirêkên di perwerdehiyê de dike û dibêje ev nivîs ne li gorî hunera çapê ye ku ev jî navgîna herî baş a berbelavbûna perwerdehiyê ye. Alfabeya miletên din û ya xwe dide ber hev û dibêje alfabeya miletên din ji sih, çil herfan pêk tê û pirtûka ku dixwazin çap bikin bi rihetî çap dikin û behsa alfabeya xwe dike û dibêje herfên wan ji yên miletên din du, sê car zêdetir in û yên ku bi hunerê re eleqedar in van herfan dizanin.[193] Di vê gotina xwe de Ewrûpayê mînak dide û dibêje li wir zarokên pênc, heft salî bi rihetî dikarin hînî xwendin û nivîsînê bibin. Ji bo çareseriyê du rê nîşan dide: ya yekem danîna herekeyan li jêr û jorê peyvan, ya duyem jî di nivîsîna peyvan de cudakirina herfan. Yanî li gorî wî herf bi hev ve neyên nivîsîn dê rihettir be û ew bi xwe jî rêya ewil îza dibîne û rêya duyem tercîh dike.[194]

Ömer Seyfettin jî li ser zehmetiya guherandina herfan disekine û dibêje wek alfabeya latînî, di alfabeya wan de jî herfên dengdêr hebin, ev jî têrê nake. Li gorî wî divê guherîneke wisa be ku şekilê herfan neyê guhartin. Her wiha dibêje ji xwe ev pêk bê jî gelek wext digire, ango di nav penc an deh salan de çênabe, di nîv sedsalekê de ancax çêdibe û dibêje bi vî awayî neviyên wan dikarin sûdê jê wergirin.[195]

Nêrîneke ji van cudatir heye ku di 1863yan de ji aliyê Fethali Ahundzadeyê Azerbaycanî[196] ve tê pêşniyazkirin. Li gorî wî ji bo nîşandana herfên dengdêr hewcedariya hin herfên nû hene.[197] Ahundzade Mirza Fethali gavekî mezin diavêje ji bo sererastkirina herfan. Li gorî wî herfên ku bi kar tînin ji bo xwendina peyvan ne guncayî ne. Her peyv dikare cur bi cur bê xwendin û ev jî zehmetiyek e ji aliyê xwendinê ve. Eleqeya herfan bi dîn re tune ye. Her wiha herfên kevn ên erebî jî piştî îslamê pir hatine guherandin. Piştre di 1863yan de xebata xwe pêşkêşî meqamê Sadaretê ya li Stenbolê dike. Lê belê xebata wî nayê qebûlkirin. Li gorî biryara wan

[193] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, r. 154
[194] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, rr. 153-154
[195] Orhan Koloğlu, *Osmalıcadan Türkçeye Okuryazarlığımız,* r. 258
[196] Agâh Sırrı Levend wek Ahundzade Mirza Fethali bi nav dike.
[197] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, r. 37

divê herfên berê bêne sererastkirin. Xebata Mirza Fethali bikêr e lê ji aliyê çapê ve dîsa îza ye. Her wiha wisa tê dîtin ku heke alfabe bê guhartin dê berhemên îslamî bêne jibîrkirin.[198]

Berî ku bingeha alfabeya latînî bê danîn, ev fikir dihat bilêvkirin. Di Şerê Çeneqeleyê de efserên osmanî di nav xwe de peyivîne li ser vê meseleyê. Ahundzade jî wexta ku pêşniyaza wî hatiye redkirin, li ser vê fikirê sekiniye. Di wê serdemê de Şemseddin Sami û birayê wî Abdül Bey ji bo arnawudî alfabeyeke nû ava kiriye ku ev 36 herf ji herfên latînî û yûnanî pêk hatine. Hüseyin Cahit Yalçın ê endamê Servet-i Fünun, di Rojnameya *Tanin*ê de pesnê vê alfabeya nû dide û li gorî wî divê tirk jî vê rêyê bişopînin.[199]

Hüseyin Cahit Yalçın, Kılıçzade Hakkı û Celâl Nuri İleri dixwazin zimanê wan êdî bi herfên latînî bê nivîsîn. Celâl Nuri dibêje: "Herfên me berbad in. Em bi van herfan nikarin karê xwe bimeşînin. Divê demildest em herfên latînî qebûl bikin. Herfên latînî hem pir tabiî, hem jî ji yên erebî bêhtir li tirkî tên."[200]

Di sala 1914an de kovareke bi navên cuda yên wek *Hürriyet-i Fikiriyye, Serbest Fikir* û *Uluvvet-i Fikiriyye* derketiye ji aliyê Kılıçzade Hakkı ve û di van kovaran de pênc gotarên bêîmza derketine. Van gotaran piştgirî daye alfabeya latînî û li gorî wan bivê nevê dê guherînek çêbûya. Heta Kılıçzade Hakkı ji xwedîfetwayan tiştek wiha dipirse:

> Gelê fransî esasên îslamiyetê maqûl dibîne û dixwaze riya rast bibîne. Gelo ji bo ku mirov wan bike misliman divê dev ji zimanê xwe yê kubar berdin û bi herfên erebî binivîsin? Ez ne li benda bersiva 'erê' me, lê heke bersiveke wisa bê, ez ê jî bibêjim 'hûn nikarin bi vê hişmendiyê hemû dinyayê bikin misliman.' Lê heke hûn bibêjin 'na, hewce nake' wê çaxê ez ê ji we rica bikim ku hûn der barê bikaranîna herfên latînî de fetwayek bidin. Na, fransî çi qas ereb bin, em jî ew qas ereb in.[201]

---

[198] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, rr. 155-156
[199] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, rr. 39-40
[200] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, r. 361
[201] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, r. 40

Ev gotin hewldanên nivîskarekî ye ber bi modernîzmê ve û pir aşkera dike ku eleqeya alfabeyê bi dîn re tune ye. Ev jî ji bo kesên ku difikirin "heke alfabe bê guhartin em ê ji dîn dûr bikevin" bersiv û mînakeke baş e. Her wiha ev mijar ji zû ve ye di hişê Atatürk de hebûye. Heta di 13ê Gulana 1914an de bi fonetîka fransî bi herfên latînî nameyeke tirkî dinivîse.[202]

Hüseyin Cahit heman fikirên xwe yên li ser guherîna alfabeyê diparêze û *Resimli Gazete*[203] ya ku di Îlona 1923an de çap bûye li ser zehmetiyên alfabe û perwerdehiyê disekine ku li gorî fikirên wî zarok piştî perwerdehiya sê, çar salan jî nikarin bi awayekî dirust bixwînin, heta dibêje ne zarok tenê, yek ji mezinan jî nikare bibêje ku her peyvê bi awayekî rast bi lêv dike. Piştre bi pirsa xwe dubare dike ka gelo zimanekî wiha, perwerdehiyeke wiha dibe an na û li ser bikaranîna alfabeya latînî israr dike.[204]

Yên dijî alfabeya latînî di nav tirseke wisa de ne ku dibêjin dê ji dîn dûr bikevin. Avram Galanti, di nivîsa xwe ya bi sernavê *Lâtin Hurufatı Meselesi* ya di Yeni Mecmuayê de, hêj berî 1908an, li Misirê diyar dike ku hemberî herfên latînî ye:

> Heke herfên latînî bêne qebûlkirin dê wek ya erebî hewcedarî bi xalan (nuqte) hebe. Bikaranîna herfên latînî pir xetere ye. Herfên latînî welatên îslamî ji hev diqetîne, yên ku bi benê qewî bi hev ve hatine girêdan. Alema îslamê dê ji hev belav bibe. Qurana ku mislimanan digihîne hev, bi nivîsa erebî, ango bi ya tirkî hatiye nivîsîn, ev tê wê wateyê ku her misliman divê hînî nivîsa erebî bibe. Madem ev mecbûriyet heye, qet faydeyeke bikaranîna herfên latînî tune ye, her çi qas rihet jî be. Madem ne hewce ye, meseleya bikaranîna herfên latînî dê jixweber ji holê rabe.[205]

Fikirên li ser alfabe û sadekirina zimên li aliyekî, meseleya perwerdehiyê jî meseleyeke giran bû. Gelek sedemên bipaşdemayînê hebûn, ya herî giring jî zehmetiya xwendin û nivîsandina herfên erebî bû. Ji bo pêşketina miletekî, ji bo xelasbûna ji cahiliyê şertê herî mezin perwerdehî bû. Abdül Fraşeriyê arnawudî, di

---

[202] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, rr. 40-41

[203] Li gorî Orhan Koloğlu navê vê rojnameyê *Resimli Gazete* ye. Lê li gorî lêkolîna me Hüseyin Cahit Yalçın cara duyemîn di 1921ê de *Tanin Gazetesi* ava kiriye. Dibe ku rojnameya ku Koloğlu behs dike *Tanin* be. Ji bo zêdetir agahiyê bnr. https://islamansiklopedisi.org.tr/yalcin-huseyin-cahit (25.04.2022)

[204] Orhan Koloğlu, *Osmalıcadan Türkçeye Okuryazarlığımız*, rr. 300-301

[205] Orhan Koloğlu, *Osmalıcadan Türkçeye Okuryazarlığımız,* r. 306

1878an de, di axaftina xwe ya meclisê de li ser giringiya perwerdehiyê disekine û dibêje bipêşketin tenê bi perwerdehiyê çêdibe. Ji ber vê li ser giringî û belavbûna dibistanan disekine, her wiha tiştê giring ew e ku li ser perwerdehiya jinan jî radiweste û dibêje ku ew jinan naxin şûna insanan û nizanin ku perwerdehiya mêran girêdayî perwerdehiya jinan e. Her wiha dibêje, "Heke dayîk cahil be, dê zarokên wê jî ew qas bê terbiyet û bêexlaq bin."[206]

Di rojnameya Ceride-i Havadis de meseleya xwendin û nivîsînê gelek caran derdikeve rojevê ku yek ji wan ev e:

> Li Ewrûpayê 200-300 sal berê xwendin û nivîsîn dest pê kir. Kesên ku emrê wan di navbera 7 û 14an de ne, ji xwe re herwe dixwînin û piştre berê xwe didin hunerê. Şermeke pir mezin e mirov nekaribe bixwîne û binivîse. Ceza li wan kesan dibirin, yên ku zarokên xwe naşînin dibistanê. Rast e ku dibêjin li Parîsê heta hemal jî dikarin bixwînin û binivîsin. Li Ewrûpayê xwendin û nivîsandin tiştekî pir rihet e, lewre nivîsa wan ne wek ya tirkî ye ku zimanê nivîskî û axaftinê ji hev cuda ne.[207]

Hasan Tahsin di rojnameya Hukuk-u Beşerê de -ku li Izmîrê derdikeve- di 22yê Adara 1919an de gotareke bi sernavê *Alt Tabaka* (Çîna Jêrîn) diweşîne û dibêje dibistanên ku divê umûmî bin, aîdê zarokên serdestan e. Yê feqîr ji sibê heta êvarê dixebite, heta hewcedariya wî bi xebata zarokê wî jî heye. Ev kes piştre ji ber nezanîna xwe nikarin mafên xwe biparêzin. Her wiha hejmara kesên ku dixwînin û dinivîsin diyar dike ku li gorî wî hema ji sedî çar in û behsa girîgiya çîna jêrîn dike ku dibêje ew bingeha dewletê ye, dewleta ku li wan difikire, li xwe jî difikire.[208]

Ji sala 1923 û pê ve nîqaşên li ser herfên latînî zêdetir dibin. Di wê salê de, ango di 1923yan de, di kongreyekê de meseleya bikaranîna herfên latînî tê rojevê dîsa, lê belê serokê kongreyê General Kâzım Karabekir hemberî vê fikirê ye. Li gorî wî heke alfabeya latînî qebûl bikin ew ê sîleheke baş bidin destê hemû Ewrûpayê û

[206] Orhan Koloğlu, *Osmalıcadan Türkçeye Okuryazarlığımız,* r. 184
[207] Orhan Koloğlu, *Osmalıcadan Türkçeye Okuryazarlığımız,* r. 83
[208] Orhan Koloğlu, *Osmalıcadan Türkçeye Okuryazarlığımız,* r. 295

ew ê li hemberî alema îslamê bibêjin ku tirkan nivîsa ecnebiyan qebûl kiriye û bûne xirîstiyan.[209]

Ev mijar di rojnameyan de her dem cihê xwe digire. Heta di 1926an de di rojnameya *Akşam*ê de pirsek tê pirsîn di vî warî de. Gelo divê em herfên latînî qebûl bikin an na? Heke em qebûl bikin çi menfaeta me tê de heye, heke em qebûl bikin zerara wê çi ye? Bi piranî alfabeya latînî qebûl nakin. Yên ku qebûl dikin tenê Refet Avni, Abdullah Cevdet, Mustafa Hâmit in.[210] Ji bo ku li Tirkiyeyê hejmara kesên xwenda zêde bibe, ewil diviyabû dev ji herfên erebî berdana, lewre ev herf ji bo bikaranîna tirkî pir ne guncayî bû.[211] Guherîna alfabeyê, xelasbûna ji cehaletê bû.[212]

Bi vî awayî ji bo guherînê û ji bo modernbûnê bi biryara komîsyonên ku têne avakirin, herfên latînî têne qebûlkirin û xebatên di vî warî de dest pê dikin. Ji bo fikirîna li ser alfabeya latînî ka li zimanê wan tê an na, *Dil Encümeni* tê avakirin. Namzetên vê encumenê yên li Enqereyê di 26 Hezîran 1928an de dicivin û dest bi raporên li ser alfabe û rêzimanê dikin.[213] Ev heyet dibe du kom: yek ji wan dê bi alfabeyê re, ya din jî dê bi rêzimanê re mijûl bibe.[214]

Di 9ê Tebaxa 1928an de, Atatürk li Sarayburnuyê axaftinek dike û li şûna herfên latînî têgiha *Herfên Nû yên Tirkî* bi kar tîne û daxuyaniya biryara şoreşa nivîsê dide:

> Zimanê me yê xweşik û ahengdewlemend dê bi herfên nû yên tirkî xwe nîşan bide. Em mecbûr bûn ku serê xwe ji wê çarçoveya hesin xelas bikin ku bi sed salan e tê de ye, ji wan îşaretên ku nayên famkirin û em jî fam nakin, divê em ji wan xelas bibin. Em dixwazin zimanê xwe fam bikin. Em ê bi van herfên nû di demeke kin de, bi awayekî newaze fam bikin. Ez ji vê bawer im, hûn jî bawer bibin.[215]

---

[209] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, r. 42
[210] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, r. 396
[211] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, r. XXVI
[212] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, r. XXVII
[213] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, r. 401
[214] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, r. 43
[215] Orhan Koloğlu, *Osmalıcadan Türkçeye Okuryazarlığımız,* r. 314

Li ser vê guherînê fikirên erênî xuya dibin di rojnameyan de. Wekî mînak di rojnameya Hakimiyet-i Milliyeyê de, nivîseke bi navê *Gazeteler* (Rojname) derdikeve di 20ê Kanûna Paşîn a 1929an de bi îmzaya F.N. ku herfên berê wek sirekê dibîne û dibêje bi saya van herfan ev sir rabû û xwînerên nû peyda bûn.[216]

Piştî ku Atatürk li Sarayburnu axaftina li ser alfabeyê dike, xebatên di vî warî de dest pê dikin.[217] Piştre xebatên li ser ferhengê jî dest pê dikin ku ev xebat pir giring e ji bo wan. Lewre dê hem hejmara peyvan derkeve holê hem jî li şûna peyvên biyanî yên ku li tirkî nayên, dê peyvên tirkî bêne dîtin.[218] Her wiha ji bo xebatên li ser zimên Türk Dili Tetkik Cemiyetî (Komeleya Vekolîna Zimanê Tirkî) tê avakirin di 1932yan de.[219] Armanca vê komeleyê ew e ku dewlemendiya zimanê tirkî derxin holê. Di bin banê vê komeleyê de xebatên li ser rêziman, lenguîstîk, fîlolojî, etîmolojî û hwd hatine kirin. Ev komele di serdema Atatürk de sê caran civiyaye: 1932, 1934 û 1936. Di civîna 1934an de navê komeleyê bi Türk Dili Araştırma Kurumu (Saziya Lêkolîna Zimanê Tirkî) û di 1936an de bi Türk Dil Kurumu (Saziya Zimanê Tirkî) hatiye guherandin.[220] Ev komele îro jî xebatên xwe bi vî navî didomîne.

Her wiha, piştî guherîna alfabeyê mijara sadekirina zimên hê jî mijareke giring e di wê demê de. Lê vê carê ne ku tenê dixwazin peyvên biyanî ji zimên derxin, her wiha dixwazin ji kokên tirkî peyvên nû çêkin. Lê tirkiyeke pir cuda derdikeve holê. Ji ber ku ev fikira Atatürk e, cara ewil ew bi van peyvan axaftinekê dike. Her wiha di 1936an de Güneş-Dil Teorisi (Teoriya Roj-Zimên) derdikeve û afirînerê vê fikirê jî Dr. Kvergiç e.[221] Wexta ku tê dîtin xelasbûna ji peyvên biyanî tune ye, yanî sadekirina ku ew difikirin pir zehmet e, lewre peyvên nû û ecêb derdikevin holê û gel ji van fam nake, divê careke din li ser vê mijarê bê rawestandin. Ji ber vê ev teorî tê derxistin û li gorî vê teoriyê her peyv ji tirkî

[216] Orhan Koloğlu, *Osmalıcadan Türkçeye Okuryazarlığımız,* r. 323
[217] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, r. 402
[218] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, rr. 406-407
[219] Agâh Sırrı Levend, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, r. 408
[220] Ji bo dîroka Türk Dil Kurumu bnr. https://www.tdk.gov.tr/tdk/kurumsal/tarihce-2/#:~:text=T%C3%BCrk%20Dil%20Kurumu%2C%20T%C3%BCrk%20Dili,S%C3%A2mih%20Rif'at't%C4%B1r. (25.04.2022)
[221] Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, rr. XXXVI-XXXVII

derketiye û di vê rewşê de êdî hewce nake peyvên biyanî derxin ji zimên.[222] Li gorî vê baweriyê tirkî çavkaniya hemû zimanên cîhanê bû.[223]

1.2.3. Mînaka Kurmancî

Li jor me behsa fransî û tirkî kir ka ji aliyê zimên ve ew di pêvajoyeke çawa de derbas bûne. Kurdî zimanek e ku di nav çar welatan de hebûna xwe diparêze. Rewşa kurdî ji van her du zimanan gelek cudatir e helbet, li pişt wan zimanan dewleteke xurt heye ku piştgirî dide guherîna zimên, lê belê kurdî di nav çar welatan de asê bûye, xwedî zaravayan e û bêdewlet e. Ji ber ku bêdewlet e û piştgiriyeke wî ya xurt tune ye, her zarava hewl daye ku li welatê ku lê dijî li ser xwe bimîne. Bi vî awayî hevzimanî jî çênebûye di nav kurdan de û ji ber vê ye ku standardîzasyoneke bingehîn pêk nehatiye di nav zaravayan de.

Ji ber ku xebata li ser hemû zaravayan mijareke kûr e û ji mijara me dûr e, em ê hewl bidin ku li rewşa kurmancî binêrin. Her wiha em ê hinek li ser rewşa zimanê kurdên Sovyetê jî binêrin. Ji ber ku hem kurmancî ye, hem jî alfabeya wan gelek caran guheriye, geh bûye latînî û geh bûye kirîlî ku ev jî nêzikî mijara me ye. Her çi qas mijara me zimanê *Hawar*ê û alfabeya wê jî be, rewşa Sovyetê babeteke giring e û wek tê zanîn, berî ku *Hawar* alfabeya latînî biweşîne, ev bûyer di nav kurdên Sovyetê de pêk hatiye.

Ji xeynî rewşa Sovyetê, em ê guh bidin rewşenbîrên kurd ên li Stenbolê jî ku serê xwe gelek bi giringiya zimên êşandine û wan kedeke mezin daye. Di her weşanên xwe de behsa perwerdehî û hînbûna zimên kirine, her wiha gelek caran rewşa alfabeyê jî hatiye rojevê.

Zimanê axaftinê di nav kurdan de berbelav bû. Lê ji ber ku perwerdehiya wan a bi zimanê wan tune bû, bi zimanên serdest dinivîsîn. Her wiha bi wê re girêdayî, herêmek bi rihetî nikarîbû peyvên herêma din bi kar bianiya. Ji ber ku di nav kurdan de weşangerî jî berbelav nebû, rewşa ji hev famkirinê jî zehmettir bû. Di vî warî de em dikarin rojnameya *Kurdistan*ê wek mînak nîşan bidin, ya ku di 1898an de derket

---

[222] Ji bo zêdetir agahiyê bnr. Geoffrey Lewis, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, rr. XXXVII-XXXIX

[223] M. Malmîsanij, *Türkiye ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayımcılığının Dünü ve Bugünü,* Vate Yayınevi, İstanbul 2006, r. 15

û nivîsên kurdî yên M. M. Bedirxan û Abdurrahman Bedirxan digihîşt ber destê kurdan ku ev jî şanaziyek mezin bû ji bo wan. Ev rojname giringiya weşangeriyê nîşan dide ku bi xwendin û nivîsînê ziman dikare bibe yek û gel dikare ji hev fam bike. Piştre bi kovarên cur bi cur ên destpêka salên 1900î nivîsên kurdî û giringbûna wê hişmendiyeke din ava kir di nav gel de.

Ev hişmendî giringiya yekîtî, netewebûn, perwerdehî û zimanê nivîskî bû bi kurtasî. Wekî ku Amir Hassanpour di hevpeyvînekê de tîne zimên "eger di pêwendiyan de her kes zimanê xwe bi kar bîne, gelekî zehmet dibe. Lê eger zimanekî yekgirtî hebe, endamên wê neteweyê û wî welatî bi awayekî hêsantir pêwendiyan bi yekî din re datîne."[224]

Husên Hebeş ê ku di 1982yan de wek teza doktorayê li ser *Hawar*ê xebitiye, yekem pirtûka akademîk a der barê *Hawar*ê de nivîsiye bi navê *Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de* û dibêje "Hebûna sê elfabeyan ji zimanê kurdî re, hebûna sê sînora ye." Lewre li gorî wî zimanê neteweyî jî wekî gelê kurd parve bûye û heke lêkolînerek bixwaze der barê edebiyata kurdî de lêgerînekê bike, divê her sê alfabeyan jî bizane, heke ne lêgerîna wî kêm dimîne.[225] Ev jî giringiya yekîtiya alfabeyê nîşan dide.

Her wiha Hassanpour li ser çapemeniyê jî disekine û dibêje di warê avakirina zimanê standard de çapemenî pir giring e.[226] Rewşenbîrên kurd ên serdema dawî ya osmanî jî bi giringiya zimên û çapemeniyê hesiyabûn, ji ber wê nîqaşên ku di weşanên wan de derdiket her di vî warî de bû.

Malmîsanij jî li ser çapemeniyê bi heman awayî difikire û diyar dike berhemên çapemeniyê û çapkirî xwedî roleke giring in di warê belavbûna fikiran de û her wiha di standardbûna zimên de.[227] Fikirên Jemal Nebez ên di warê standardîzasyonê de jî gelek giring in ku bi awayekî sosyolojîk lê dinêre û ji pêvajoya devkî ber bi ya nivîskî ve rewşa zimên wiha dinirxîne:

---

[224] Zanyar Umranî, "Bi Emîr Hesenpûr re li ser Zimên û Neteweyê", ji soranî: Mistefa Dewlemend, di *Kovara Zarema*yê de, Sal: 5, h: 13, İstanbul 2018, r. 62

[225] Husên Hebeş, *Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de,* Çapa Înternetê, April 2022, r. 148 https://drhabasch.wordpress.com/2022/04/18/raperina-canda-kurdi-di-kovara-haware-de-2/

[226] Zanyar Umranî, "Bi Emîr Hesenpûr re li ser Zimên û Neteweyê", r. 67

[227] M. Malmîsanij, *Türkiye ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayımcılığının Dünü ve Bugünü,* r. 33

> Ziman berhemeke mirovî ya hizrî ye. Her ziman (bilî esperantoyê) ji qonaxa devkî dest pê kir wekî navgîna bazirganî û ragihandinê. Şert û mercên dîrokî derfetê bidin, zimanekî wesa devkî dikare bikemile ku bibe zimanê nivîskî. Ev şert û merc tixûbdar in ji ber civakê. Carinan faktorên dînî tixûba lê datînin, carna faktorên polîtîk, carên dîtir faktorên aborî û psîkolojîk an jî ya rast kombînasyoneke van hemî faktoran karîger in. Bo me wesa xuya dike ku faktorên dînî diyarker bûn di serdemên qedîm de, berê di pêşketina ji zimanê devkî bo zimanê nivîskî û paşî bo standardîzasyonê. Kurd bi tenê li cîranên xwe binêrin bes e ku vê yekê bibînin. Bo nimûne, mîsyonerê xirîstiyan Mesrop Meştotz li sala 406an, tîpên ermenî durist kirin da ku têkstên dînî bi zimanê ermenî qeyd bike. Dînê îslamê, hevkat kitêba pîroz a îslamê Qur'an, ku bi zaravayê Qureyş wehy bûbû, kir ku ev zarava bibe zimanê nivîskî yê hemî ereban.[228]

Lê belê wekî ku Jemal Nebez diyar dike, kurdî wek zimanê axaftinê maye. Kurdên ne misliman îbadetên xwe jî bi zimanê xwe kirine. Wekî mînaka êzdiyan ku alfabeya xwe ya duristkirî kitêbên xwe yên wek *Cilwe* û *Mishefa Reş* transkrîbe kirine. Yarsanan jî alfabeya erebî bi forma farisî bi kar anîne dema ku kelamên xwe yên bi kurdî transkrîbe kirine.[229]

Jemal Nebez li ser serdestiya dewletên wek Osmanî û Îranê jî disekine û dibêje rewşenbîrên kurd ên li mîrîtiyên kurdan bûne xwedî hişmendiyeke mezin a netewetiyê û bi vî awayî zimanê kurdî jî bi pêş ketiye. Behsa kurmanciya bakur dike ku di sedsala 16mîn de bûye zimanê nivîskî û hêdî hêdî li bakur belav bûye. Nebez behsa Şerefxanê Bidlîsî jî dike ku *Şerefname* (1596/97) bi farisî nivîsiye û ev jî nîşan dide ku zimanê kurdî wek nivîskî di nav gel de belav nebûye û dibêje ji sedsala 19mîn pê ve hewldanên li ser vê yekê zêdetir bûne û mînaka Elî Teramaxî dide ku yekem gramera erebî bi zimanê kurdî nivîsiye da ku zarokên kurd bikaribin bi zimanê xwe bixwînin û bibin xwedî kitêba dersê.[230]

Serdema zêrîn a zimanê kurdî ji axaftinê bo nivîskî di serdema dawî ya osmanî de ye. Dewleta Osmanî di nav gengeşeyekê de ye di wê serdemê de,

---

[228] Jemal Nebez, *Kurd (Dîrok û Kultura Wan),* Ergîn Opengîn (Wer.), Avesta Yayınları, İstanbul 2007, rr. 60-61
[229] Jemal Nebez, *Kurd (Dîrok û Kultura Wan),* r. 64
[230] Jemal Nebez, *Kurd (Dîrok û Kultura Wan),* rr. 70-71

Meşrûtiyeta Duyem tê îlankirin, Tirkên Ciwan xwe derdixin pêş û netewetî wek pêlên behrê di nav rewşenbîran de belav dibe. Helbet ev jî têrê nake, bi netewetiyê re nîqaşên li ser ziman û modernbûnê jî belav dibin.

Mirov dikare bibêje ku netewetiya kurdên ku di nav Dewleta Osmanî de dijîn, di destpêka salên 1900î ve xuya dibe. Bi taybetî jî bi avabûna İttihat ve Terakki Cemiyeti (Komeleya Yekîtî û Pêşketinê) re kurd jî gavên mezin diavêjin ber bi netewetiyê ve. Wekî ku Celadet Bedirxan diyar dike, her ku tirk xwedî li neteweya xwe derdiketin, an jî hemû miletên din ên li Tirkiyeyê wek tirk dihesibandin, rêya netewetiyê vebûye ji bo miletên din jî.[231] Ji ber ku tu milet tune ye ku dev ji neteweya xwe berde û wek qalib navê neteweyeke din bigire ser xwe.

Em dikarin bibêjin ku daxwaza bipêşxistina ziman û neteweyê bi awayekî paralel pêk hatiye di nav kurdên Dewleta Osmanî de. Lê wekî ku Malmîsanij diyar dike "tevgera neteweyî ya kurdên ku hê ji feodaliyê xelas nebûne, li gorî gelên din ên ku di nav sînorên Împaratoriya Osmanî de dijîn derengtir dest pê kiriye. Rewşa weşanên kurdî jî di heman dema vê hişyarbûna neteweyî de bi pêş ket."[232] Ev derengbûn jî dibe ku ji ber hestên kurdan bû ku xwe wek osmanî didîtin. Wekî ku Celadet Bedirxan li jor diyar dike, heta ku tirkan netewetî dernexistiye û miletên din wek *yên din* nedîtine, ji xwe kurd wek osmanî bûn.

Di vê gengeşî û xwesteka jidil a bipêşketinê de rewşenbîrên kurd jî bêdeng nemane. Bi kelecanekê xebatên xwe yên der barê weşangeriyê de kirine, hem bi osmanî hem bi kurdî daxwaza xwe anîne zimên û xwestine gelê xwe hişyar bikin. Di wê serdemê de ye ku cara ewil nivîsên kurdî bi hesteke germ belav bûne. Li gorî Malmîsanij, di serdema osmaniyan de, nîvê pirtûkên kurdî yên ku bi alfabeya erebî hatine weşandin di salên 1918-1919an de hatine weşandin. Lewre ji ber gengeşiya Şerê Cîhanê yê Yekem şerê cîhanê ku osmanî têk çûye, rewşenbîrên kurd ên li Stenbolê ev rewş wek avantajek dîtiye û çend pirtûk û kovar weşandine.[233]

---

[231] Emir Celadet Ali Bedirxan, *Bir Kürt Aydınından Mustafa Kemal'e Mektup,* Doz Yayınları, Birinci Baskı, İstanbul 1992, r. 22
[232] M. Malmîsanij, *Türkiye ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayımcılığının Dünü ve Bugünü,* r. 33
[233] M. Malmîsanij, *Türkiye ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayımcılığının Dünü ve Bugünü,* r. 43

Lê belê hê ji destpêka weşangeriyê ve her rewşenbîrî li gorî xwe, ango her yek li gorî axaftina xwe dinivîsî. Standardek tune bû, jê wêdetir nivîs bi herfên erebî bûn. Nivîsîna bi herfên erebî jî nîqaşek derdixist di nav nivîskaran de, lewre adaptasyona herfên erebî bo nivîsên kurdî zehmet bû, hemû dengên kurdî bi van herfan nikarîbûn bihatina nivîsîn.

Ji ber van pirsgirêkan rewşenbîrê wê serdemê Abdullah Cevdet xwest ku herfên latînî bila bêne bikaranîn lê vê jî deriyê nîqaşeke din vedikir. Li gorî hin rewşenbîran devjêberdana ji herfên erebî dûrketina ji îslamê bû ku wekî me di binbeşa jor de diyar kir, ev fikir di nav rewşenbîrên tirk de jî pir berbelav bû. Ji xwe wexta ku kurd bûne misliman zimanê erebî wekî zimanê dînî wergirtine. Ji ber vê ye ku rewşenbîrên wê serdemê nexwestine zû bi zû dev ji alfabeya erebî berdin. Li gorî wan nivîsîna bi herfên latînî, meylekê çêdikir li ser modernbûn û ewrûpîbûnê ku ev yek jî li gorî hişmendiya wan, ew ji nirx û dînê wan dûr dixistin.

Li gorî gelên din ên di bin banê osmaniyan de kurd her çi qas dereng bi giringiya netewetiyê hesiyabin jî, bi çarlepkî xwe pê girê dane û dev jê bernedane. Her wiha ji ber qedir û qîmeta zimanê kurdî ye ku bêdewlet jî be, bêdibistan jî be ev gel wek netewe xwe nîşan daye û li ser piyan maye. Esas ev hişmendiya miletbûn û netewetiyê bi nivîskarê gewre Ehmedê Xanî xuya dibe. Wekî ku Celadet Bedirxan jî diyar dike meseleya kurdîtiyê ne nû ye, hêj di sedsala 17mîn de di *Mem û Zîn*a Ehmedê Xanî de hatiye aşkerakirin.[234] Her wiha li gorî Amir Hassanpour diyar dike, bi rastî jî Ehmedê Xanî wek şertê bingehîn ê avakirina dewleta kurd bi azadiya edebiyat û zimên ve girê dide.[235]

Geşbûna hişmendiya netewe û zimên li cem kurdên li Tirkiyeyê wekî ku me diyar kir di serê 1900î dest pê dike. Stenbol wargeheke pir giring e ji bo wan. Dînamîzmeke xurt heye di nav rewşenbîrên kurd ên wê demê de ku dixwazin zimanê xwe biparêzin û xwe wek neteweyekê bi nav bikin. Ji ber vê dest bi weşandina kovar û rojnameyan dikin û heta ji wan tê, di van weşanan de behsa giringiya zimên û perwerdehiyê dikin. Her wiha mirov dikare bibîne ku ev mijar di nav miletên din ên

[234] Emir Celadet Ali Bedirxan, *Bir Kürt Aydınından Mustafa Kemal'e Mektup,* r. 21
[235] Amir Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985,* İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan (Çev.), Avesta Yayınları, İstanbul 1997, r. 151

Dewleta Osmanî de jî di rojevê de ye. Meseleyên alfabe û sadekirina zimên ne tenê li cem kurdan, lê belê di nav tirk û arnawudan de jî têne nîqaşkirin. Ji ber ku xwendin û nivîsandina bi herfên erebî fêrbûna zimên girantir dike. Di vê rewşê de kesekî/ê pir dereng hînî xwendin û nivîsandinê dibe. Ji ber vê, xebatên li ser alfabeya kurdî di wê serdemê de, di nav rewşenbîran de gelek caran têne ser zimên. Çawa ku Mikail Bülbül diyar dike, nîqaşên di nav tirkan de kevntir in û digihîje dema Tanzîmatê, lê belê fikir heman fikir e, li gorî wan jî sedema cehaletê zorbûna alfabeyê ye.[236]

Li gorî salixdana Malmîsanij, alfabeya kurdî ya ewil a ku li ser bingeha herfên erebî hatiye sazkirin, ji aliyê Xelîl Xeyalî ve hatiye amadekirin di 1909an de û li Stenbolê hatiye weşandin.[237] Mamoste Qedrî jî nîşan dide ku Xelîl Xeyalî yekemîn alfabeya kurdî ya erebî saz kiriye. Li gorî wî, bi danîna çend îşaretên li ser hin herfan, Xelîl Xeyalî alfabeya kurdî saz kiriye û alfabeya wî ji 34 herfan pêk tê.[238] Ronayî Önen jî diyar dike ku ev berhem ji ber ku yekemîn e, pir giring e, her wiha ji ber ku destpêka nîqaşan jî vedike pir giring e.[239]

Di nav weşanên Komeleya Hêvîyê de jî li ser alfabeyê fikirên giring hene, yek ji wan ew e ku herfên erebî ji bo nivîsîna bi kurdî ne guncayî ne, ji ber vê jî divê alfabeyeke nû û herfên latînî bêne bikaranîn. Balkêş e ku hin rewşenbîrên ku bi zimanê rojavayî dizanin, di wê serdemê de bala xwe didin vê meseleyê û li ser disekinin.[240]

Abdullah Cevdet ji kurdan re dibêje dev ji herfên erebî berdin û derbasî herfên latînî bibin. Her wiha Cevdet ji osmaniyan re jî heman tiştî dibêje û di 1913an de fikirên xwe wiha tîne zimên:

---

[236] Mikail Bülbül, "Weke Qada Rengvedaneke Neteweperweriyê di Pratîkên Tirk û Kurdan de Nîqaşên li ser Alfabeyê", di *Sempozyûma Edebiyata Berawirdî ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî* de, Nüket Esen, Ramazan Çeçen (Amd.), Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Birinci Baskı, Mardin 2015, r. 178

[237] Malmîsanij, *Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği*, r. 101

[238] Doç. Dr. Mamoste Qedrî, "Dîroka Xet û Alfabeyên ku Kurdan Bikaranîne û Berhemên ku Bi Wan Nivîsandine", di *3'yemîn Rojên Wêjeyê li Diyarbekirê- Konferansa Zimanê Kurdî* de, Weşanên Midûriyeta Çand û Turîzmê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, Diyarbekir 2006, rr. 103-105

[239] Ronayi Önen, "Dilde Bir Modernleşme Öyküsü: Celadet Bedirxan'ın Alfabe Serüveni" di nav *Kürt Tarihi* de, sayı: 25, İstanbul 2016, r. 43

[240] Malmîsanij, *Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği*, r. 101

> Divê em li ser bixebitin ku hejmara kesên ku dixwînin û dinivîsin herî kêm bigihîje ji sedî çilan. Her wiha divê em wê alfabeyê qebûl bikin ku zarokek bikaribe di nav mehekê de hînî xwendin û nivîsandinê bibe û tiştê ku dixwîne rast bixwîne, her wiha divê em dev ji wan herfan berdin ku heta niha hatine bikaranîn. Meseleyên din ji vê ne giringtir in.[241]

Pêşniyazên ji xeynî herfên latînî jî hebûn di wê serdemê de. Abdurrezak Bedirxan aniye zimên ku kurd li şûna herfên erebî divê herfên kirîlî bi kar bînin ku rûs jî van herfan bi kar tînin.[242] Li gorî Mewlanzade Rifat jî herfên erebî ji bo kurdî ne guncayî ne, divê herfên berê, ango yên ûrdû bêne vejîn û sererastkirin.[243]

Li gorî Celîlê Celîl pirsgirêka herî mezin a di perwerdehiya kurdan de ew bû ku, kurdan diviyabû bi reformeke sîstema zimên dest pê bikira. Ji ber ku kêmasiya di zimanê nivîskî de bipêşketina çandî jî zehmettir dikir. Ev pirsgirêk ji aliyê rewşenbîrên kurd ve jî hatine zimên di nav *Rojî Kurd* de. Her wiha diyar dike ku di wê serdemê de cemiyetek li ser belavkirin û bipêşxistina alfabeyê jî hatiye damezirandin û bi saya vê cemiyetê li ser projeya sazkirina alfabeya nû ya kurdî bêhtir sekinîn.[244]

Her wiha divê mirov diyar bike ku Tewfîq Wehbî jî alfabeya latînî amade kiriye di serê salên 1920î de û Nebez wiha diyar dike: "Forma wê alfabeya nû bêhtir li ser bingeha bikaranîna îngilîziyê bû. Lê hikûmeta Iraqê qedexe kiriye ji ber ku nedixwest alfabeyeke 'ewrûpî-xirîstiyanî' belav bibe."[245]

Ji bo rewşenbîrên li Stenbolê ev mesele gelek giring bû û demildest divê bihata çareserkirin. Xelîl Xeyalî bi deh madeyan rêz dike ka pêdiviyên kurdan bi çi hene. Li gorî wî ewil divê ji bo kurdan herfên nû bêne dîtin ku bikaribin zû hînî xwendin û nivîsînê bibin. Her wiha li gorî Xeyalî divê ferheng û îlmihal jî bêne amadekirin û ev xebat nîşan dide ka Xeyalî çi qas guh dida nivîsê. Her wiha ji gel

---

[241] Doktor Abdullah Cevdet, "Bir Hitap", *Rojî Kurd*, rr. 241-242
[242] Malmîsanij, *Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği*, r. 105
[243] Ahmet Alan, *Hetawî Kurd (1913-1914)*, r. 113
[244] Celîlê Celîl, *Kürt Aydınlanması*, r. 84
[245] Jemal Nebez, *Kurd (Dîrok û Kultura Wan)*, r.77

dixwaze ku di destê wan de çi materyalên devkî hebin bila hema binivîsin û bişînin. Bi vî awayî dixwaze bila edebiyata devkî winda nebe.[246]

Nivîskarekî bi navê Süleymaniyeli Mesud jî li ser meseleya alfabeyê disekine û li gorî wî bipaşdemayîna gelê wî ji ber curbicurbûna herfan e. Wekî diyar dike, di herfên erebî de gelek cure hene û dibêje "ji bo hînbûna şeş herfan, divê mirov heştê şekilên cuda hîn bibe". Ji bo hînbûna sih û sê herfan, hînbûna şekilên ji du sedan zêdetir dê hem ji bo xwendekar hem jî ji bo mamosta gelek zehmet be. Ji bo çareseriya vê jî dibêje divê li dibistana seretayî ji bo her herfekê tenê şekilek bê hilbijartin û yên din neyên bikaranîn. Her wiha çil şeklan pêşniyaz dike ku ew her çil di her matbaayê de hene. Bi vî awayî Süleymaniyeli Mesud bi herfên erebî alfabeyeke sadekirî pêşniyaz dike.[247]

Bulgaristanlı Togan şîretan li ciwanên kurd dike û dibêje bila vegerin welatê xwe û perwerdehiyê belav bikin. Dibêje di vê rewşê de, dê meseleya alfabeyê derkeve pêşiya wan û çareseriya vê ne ew qas hêsan e û ew ê bibin pisporê vî karî. Divê berî her şert û mercan, der barê xwendin û nivîsandina zû de guh bidin pêdiviyên serdemê û dibêje ev hêza neteweyî ye ku ji wan rewşenbîran pêk tê û ew ê li gorî van pêwistiyan bi wêrekî hikum û biryaran bidin.[248]

Yek ji wan kesan jî ku difikire alfabe divê bê sadekirin M. S. Azîzî ye. Wisa difikire ku alfabeya ku ji aliyê Tamîm-i Maârif ve Islâh-ı Hurûf Cemiyeti (Cemiyeta Belavkirina Ilim û Serastkirina Herfan[249]) ve hatiye sazkirin ji bo kurdan guncayî ye.[250] Her wiha dibêje bi vê alfabeya nû insanên herî cahil jî dikarin di nav 3-4 mehan de hînî xwendin û nivîsandinê bibin. Li gorî wî piştî alfabeyê divê pirtûkeke rêzimanê û dîrokê bê amadekirin.[251]

Tamîm-i Maârif ve Islâh-ı Hurûf Cemiyeti nivîsekê dişîne kovara *Rojî Kurd*ê û dibêje li ser guherandina alfabeyê çend nîqaş hene niha. Hinek ji wan dibêjin divê

---

[246] M.X., "Ziman", *Rojî Kurd*, jimar: 3, r. 187
[247] Süleymaniyeli Mesud, "Alfabemiz ve Okumayı Kolaylaştırma", *Rojî Kurd*, jimar: 1, rr. 254-255
[248] Bulgaristanlı Togan, "Milletinize Karşı Vazifeniz", *Rojî Kurd*, jimar: 1, r. 261
[249] Ji aliyê Mikail Bülbül ve kurdiya vê cemiyetê wiha hatiye destnîşankirin û em ê jî vî navî bi kar bînin. Bnr. Mikail Bülbül, "Weke Qada Rengvedaneke Neteweperweriyê di Pratîkên Tirk û Kurdan de Nîqaşên li ser Alfabeyê", r. 181
[250] Ji bo şeklan bnr. *Rojî Kurd*, jimar: 2, r. 269
[251] M. S. Azizî, "Alfabemiz ve Okumayı Kolaylaştırma", *Rojî Kurd*, jimar: 2, rr. 269-270

alfabeyên latînî, ermenî û slavî bêne qebûlkirin, li gorî hinek ji wan jî qebûlkirina van alfabeyan xeter e û divê alfabeya erebî bê nûkirin. Cemiyet jî dibêje divê fikira ewil qet neyê qebûlkirin, lewre ji xeynî herfên erebî –di gel temamkirina kêmasiyan- bi tu alfabeyeke din ne mimkin e ku mirov bi zimanên qewmên îslamê binivîse. Ji ber ku li gorî cemiyetê ew ê ji erebî veqetin bi vî awayî û dê mislimantî hilweşe.[252] Her wiha li gorî wan heke kurd bi herfên din binivîsin dê zimanê wan xirab bibe û dibêje heke herfên erebî bêne nûkirin ew ê ji miletên din bi paş ve nemînin û her wiha ew ê bibin xwedî nivîseke serdesttir.[253]

Fikirên Babanzade İsmail Hakkı jî ji van ne cudatir in. Li gorî wî divê kurdî bi zimanekî sade bê nivîsîn û herfên erebî bêne sererastkirin. Her wiha dibêje kurdî li gorî zimanên din bêhtir xwedî avantaj e, lewre alfabeyeke wan a berê tune ye û ew ê bi hêsanî fêrî alfabeya nû bibin. Herfên ji xeynî erebî "ecêb" dibîne û li gorî wî alfabeya erebî ya bi awayê hêsantir li gorî nivîsîna kurdî çêtir e. Ji xwe kurd ji malbata rojhilat in, Babanzade ji aliyê alfabeyê ve jî wan girêdayî rojhilatê dibîne û li gorî wî divê kurd ji vê malbatê veneqete. Latînîzekirinê û teqlîdkirina arnawudan wek cinayetekê dibîne. Li gel van fikiran, amadekirina pirtûkên wek rêziman û ferhengê pêşniyaz dike.[254]

Em dibînin ku berî Şerê Cîhanê yê Yekem daxwazên rewşenbîrên kurd ên der barê zimanê nivîskî de her diçe geştir dibe, di gel nêrînên cuda. Piştî şer ev nîqaş dîsa berdewam in, heta em dikarin bibêjin ku gurtir in. Rojnameya *Serbest*iyê careke din derdikeve û mizgîniya avakirina ji nû ya "Komeleya Kurd ji bo Belavkirina Neşrîyatê"[255] dide. Piştî CTKê[256] yekemîn komele ye ku ava bûye.[257]

Li gorî daxuyaniya *Serbestî*yê, ev komele ji bo sererastkirin û standardkirina kurdî hatiye damezirandin. Her wiha diyar dike komeleyê bi çapkirina *Jîn*ê dest bi xebatên xwe kiriye.[258] Armanca sereke ya komeleyê perwerdehî ye, lewre di nav

---

[252] *Rojî Kurd,* jimar: 2, r. 271
[253] *Rojî Kurd,* jimar: 2, r. 272
[254] Babanzade İsmail Hakkı, "Kürtlerin Yükselmesi", *Rojî Kurd*, jimar: 3, r. 283
[255] Navê resen: Kürd Tamîm-i Maârif ve Neşriyyât Cemiyeti
[256] Kürdistan Teâli Cemiyeti
[257] Bilal Altan, Mehmet Akbaş, Ercan Çağlayan, "Kürdistan Teâli Cemiyeti'nin Şubeleri ve Bağlı Kuruluşları", di *Akademik Tarih ve Düşünce Dergisi* de, cilt: 6, sayı: 1, Mart 2019, r. 332
[258] "Kürd Dilinin Standartlaştırılması", *Serbestî*, no: 480, 4 Mayıs 1919, vgz. Seîd Veroj, *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan 1913-1923*, Dara Yayınları, Diyarbakır 2018, r. 64

sînorê xebatên xwe de nîşan daye ku ew ê xebatên ku bi zimanê kurdî hatine kirin, bi awayekî xweşik çap bikin, ferheng, rêziman û pirtûkên dersê amade bikin, dersxaneyên şevê vekin û her wiha mizgînî dide ku ew ê pirtûkxaneyek veke ku tê de dê pirtûkên herêmî û biyanî hebin. Komele giringî dide wergerê jî ku dibêje ew ê berhemên li ser kurd û Kurdistanê wergerînin, yên ku li rojhilat û rojava derketine.[259]

Her wiha wekî ku Seîd Veroj diyar dike, di *Serbestî*yê de behsa alfabeyê jî tê kirin. Li gorî kovarê alfabeyek hatiye amadekirin û ew ê heta çend rojên din çap bibe. Pesnê alfabeya nû jî tê dayîn ku ji ya berê gelek baştir e.[260]

Di nav rûpelên *Serbestî*yê de nivîsên Kamiran Bedirxan ên der barê zimên de balê dikişînin. Kamiran Bedirxan di nivîseke xwe de behsa reformekirin, sererastkirina rêbazên rêzimanê, herfên sade û sivik dike û dibêje heke ev mijar çareser bibin dê hêviyên der barê dahatûyê de pêk bên. Li ser alfabeyê pêşniyazek dike û dibêje, divê alfabeyeke wisa be ku yên gundî jî bikaribin di demeke kurt de hînî xwendin û nivîsandinê bibin. Kamiran Bedirxan balê dikişîne ser tiştekî giring jî wexta dibêje "hetta mirovên alim, mutefekîrên maqûl û nûjen, karin bibin mutefîq û tesdîq bikin ku ev yek li gorî Quranê ye jî".[261] Alîkariyek ji aliman dixwaze di vî warî de, lewre wekî ku me behs kiribû yên ku li hemberî alfabeyên latînî derdikevin hene di wê serdemê de. Xuya ye Kamiran Bedirxan jî dixwaze bila alim bînin zimên ku bi vê alfabeyê mirov ji dîn dûr nakeve.

Mijarên li ser netewetî, xwendin û nivîsandinê û her wiha modernbûnê di kovara *Jîn*ê de jî berdewam in. Kurdîyê Siwêrekî balê dikişîne ser ku kurdî ne yek cure ye, ango bi gotina me standardek wê tune ye û vê rewşê wiha tîne zimên:

> Ji min ra dibêjin ku "bi kurdî nivîsar binivîse." Li ser kîjan ziman? Zimanê Kurdî ne yek e ku… Xelkê Silêmanîyê zimanê Hekarîyan nizane; Dumilî Kurmancî nizanin; çewtê vê yekê jî rast e. Ez û hemî Kurd, em dixwazin ku yek

[259] "Bername", *Jîn*, ji herfên erebî bo herfên latînî: M. Emîn Bozarslan, Weşanên Deng, c: 2, h: 10, Uppsala 1985, r. 493

[260] "Kürd Dilinin Standartlaştırılması", *Serbestî*, no: 480, 4 Mayıs 1919, vgz. Seîd Veroj, *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan 1913-1923*, rr. 83-84

[261] Kamiran Bedirxan, "Kürdler ve Kürdistan: Kürd Lisanı", *Serbestî*, no: 486, 5ê Gulana 1919, vgz. Seîd Veroj, *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan 1913-1923*, rr. 122-123

zimanekî me hebe, her kes bi wî zimanî bixwîne û binivîse. Ev kar jî li ser milê ciwanên Kurdan maye; bila ew bixebitin.[262]

Hewldanên Xelîl Xeyalî yên li ser guherîna alfabeyê nasekinin. Giringiya alfabeyê di kovara *Rojî Kurd* de tîne zimên, her wiha di 1920î de jî heman mijar serê wî mijûl dike û Salih Akin vê rewşê wiha destnîşan dike:

> Di 1920-1921ê de, du Kurdên bi eslê xwe ji Bitlîsê, Xelîl Xeyalî û Mihemed Emîn, li Stembolê, bêyî ku bixwazin encamên biryardar bi dest bixin, bi tecrûbekirina guhaztina kurdî ji herfên erebî bo herfên latînî mijûl dibin. Di 1921ê de, rêxistineke kurdî, li Stembolê, "Rêbereke zimanê kurdî" belav dike ku mirov dikare tê de van rêzan bixwîne: "Mixabin ev alfabeya [erebî] têra zimanê me nake. Em xwe li hemberî pêdiviya reformeke pirr acîl û zarûrî ya tîpên alfabeya xwe dibînin. Divê ev rastî ji aliyê herkesî ve wiha bê zanîn.[263]

Kurdîyê Bitlîsî ku wek Xelîl Xeyalî tê zanîn, li ser bingehdanîna zimên disekine. Li gorî wî ferheng û rêzimanên ku heta niha hatine amadekirin ji aliyê naverokê ve kêm in. Divê bingehên zanyarî bêne danîn. Her wiha ji bo vê bingehê pêşniyaz dike ku "Komela Kurd ji bo Belavkirina Zanînê û Weşanan"[264] bibe xebatxane û tê de *Qomîta Zimên* bê avakirin û endamên wê qomîteyê zarek, an jî çend zarên kurdî bizanibin û kesên ku bi zimanên biyanî dizanin bila tevlî bibin.[265]

Her wiha li ser qeydkirina peyvan jî disekine û ji bo vî karî dibêje divê ferhengek wek bingeh bê girtin û beranberî her peyvekê, peyveke kurdî bê nivîsîn û ji bo berhevkariya peyv û gotinên pêşiyan jî rê û rêbazên xwe rêz dike.[266] Ji bo hilbijartina zimên jî pêşniyazek dike ku ev jî çar modelên Einar Haugen tîne bîra mirov. Kurdîyê Bitlîsî dibêje: "Di amadekirin û sererastkirina rêzimana zimên da, rîya kurttirîn û normaltirîn ew e ku malbata zimên a mezintirîn bingeh bê qebûlkirin. Di dema me da ev heq, heqê Kurdîya Jorîn e. Ji ber vê yekê ez dikarim tewsîye bikim ku, bi vê mexsedê devokê Hekarîyê û Botan bê tercîhkirin."[267]

---

[262] Kurdîyê Siwêrekî, "Gazindek", *Jîn*, c: 4, h: 16, r. 741
[263] Salih Akin, *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî,* Avesta Yayınları, İstanbul 2013, r. 23
[264] Ev nav di berhema Seîd Veroj de wiha derbas dibe: Komeleya Kurd ji bo Belavkirina Neşrîyatê.
[265]Kurdîyê Bitlîsî, "Li Ser Zimanê Kurdî", *Jîn*, c: 3, h: 15, r. 696
[266] Kurdîyê Bitlîsî, "Li Ser Zimanê Kurdî", rr. 696-697
[267] Kurdîyê Bitlîsî, "Li Ser Zimanê Kurdî", r. 699

Dîsa behsa giringiya belavkirin û pêkanînê dike ku ev jî di nav her çar modelên Einar Haugen de hene. Li gorî Kurdiyê Bitlîsî divê di hemû rojnameyan de zimanê ku komîte hilbijartiye bê bikaranîn û çi bibe bila bibe dev ji vî tiştî bernede. Her wiha dibêje divê pirtûkên biçûk ên li ser zanînên pêşîn bêne nivîsîn û belavkirin, ji xeynî van pirtûkên biçûk divê pirtûkên zanyarî û teknîkî jî bêne çapkirin. [268]

Ev hewldanên avakirina komeleyan û derxistina weşanan rewşa kurdî ya li nav rewşenbîrên li Stenbolê pir baş derdixe ber çavan. Wekî ku em dibînin, wek mînaka tirkî, yên ku dixwazin derbasî alfabeya latînî bibin hene, lê bereksê vê, yên ku naxwazin ji herfên erebî dûr bikevin jî hene. Piştî kovara *Jîn*ê bi qasî ku em dizanin weşaneke bi kurdî an jî li ser kurdî dernakeve heta 1932yan. Kovareke nû derdikeve di vê dîrokê de bi navê *Hawar*ê. Celadet Alî Bedirxanê ku xwediyê vê kovarê ye, her çi qas yek ji rewşenbîrên Stenbolê jî be, ji ber bûyerên mişextiyê kovara xwe ne li Stenbolê, lê belê li Şamê derdixe. Di vê kovarê de nîqaşên berî wî bi encam dibin û alfabeya kurdî ya bi herfên latînî cara ewil di weşanekê de xuya dike.

Di avakirina zimanekî de helbet alfabe ne bes e, çawa ku alfabe skeleta zimanekî ava dike, rêziman jî gewdeya wî ava dike. Piştî hewldan û guherînên li ser alfabeya kurdî, divê em berê xwe bidin rêziman jî ku yekem car ji aliyê Mauricio Garzoni ve di sala 1787an de bi navê *Grammatica e Vocabulario della lingua kurda* (Rêziman û ferhengoka zimanê kurdî) li Romayê çap bûye. Balkêş e ku mîsyoner û oryantalîstên ku hatine Kurdistanê berê xwe dane rêziman û ferhengê jî. Helbet ji ber ku yekîtiya kurdan tune bû, her yek rêzimana devera ku lê maye amade kiriye. Ji xeynî Garzonî, S. A. Rhea bi navê *Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District* (Kurte rêziman û ferhengoka zimanê kurdî yê devera Hakariyê), E. B. Soane di 1922yan de *Bahdinan Kurmanji. A Grammar or the Kurmanji of the Kurds of Mosul division and Surrounding districts of Kurdistan* (Kurmanciya Bahdînan. Rêzimaneke kurmanciya kurdên welayeta Musil û qezayên

[268] Kurdîyê Bitlîsî, "Li Ser Zimanê Kurdî", r. 700

derdorên Kurdistan), P. Béidar jî di 1926an de bi navê *Grammaire kurde* (Rêzimana kurdî) pirtûkek çap kiriye.[269]

Piştî van xebatên biyaniyan, yekem rêzimana ku ji aliyê kurdekî ve hatiye nivîsîn *Bingehên Gramera Kurmandjî* ye ku ji aliyê Celadet Bedirxan ve di 1934an de hatiye nivîsîn. Akin der barê rêzimannivîsiya kurdan de wiha dibêje: "Mirov dikare beşdarbûna Kurdan di pêvajoya nivîsandina rêzimanan de wek danîşana transfera têkoşîna Kurdan bo mafên xwe yên çandiyên di warê ziman de binirxîne."[270]

Wek rêziman û alfabeyê, ferheng jî xwedî roleke mezin in di standardîzasyona zimên de. Her zimanek di pêvajoya standardîzasyonê de wek gavekî giring bûye xwediyê ferhengekê. Ferhenga kurdî ya ewil, berevajî rêzimanê ku cara ewil ji aliyê biyaniyekî ve tê nivîsîn, ji aliyê kurdê gewre Ehmedê Xanî ve, di sala 1684an de bi navê *Nûbihara Biçûkan* tê nivîsîn. Piştre nivîskarê yekem rêzimana kurdî Garzonî ferhenga kurdî-îtalyanî nivîsiye di 1787an de û ev ferheng beşeke pirtûka wî ya rêzimana kurdî ye. Her wiha August Jaba ferhengeke kurdî-fransî amade kiriye di 1879an de. Yusuf Ziya'al-Din Paşa al-Khalidi yê Filistînî jî ferhengeke kurdî-erebî derxistiye di 1892yan de.[271]

Kurdîyê Bitlîsî di gotara xwe ya bi navê *Li Ser Zimanê Kurdî* de li ser van berhemên biyaniyan dibêje, divê mirov giringiyeke mezin nede van xebatan, lewre rojavayiyên ku ev xebat derxistine, an qet bi zimên nizanin an jî pir kêm fam dikin. Lê belê dibêje mirov dikare van xebatan wek nimûne jî qebûl bike, lê tu car nikarin bibin bingeh.[272]

Tevgera Xelîl Xeyalî ya hemberî xebatên oryantalîstan dibe ku ji ber nenivîsiya kurdan be. Helbet her gel dixwaze xwedî rêzîman û ferhengan bibe û bi pêş bikeve, lê xuya ye hesasiyeta Xeyalî ew e ku ev berhem çima ji aliyê gelê wî bi xwe ve nayên nivîsîn ku ev zimanê wan ê zikmakî ye. Bersiva vê pirsê dîsa digihîje

[269] Ji bo biyografiya van berheman, bnr. Salih Akin, *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî,* r. 41
[270] Salih Akin, *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî,* r. 45
[271] Salih Akin, *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî,* rr. 58-59
[272] Kurdîyê Bitlîsî, "Li Ser Zimanê Kurdî", r. 695

nexwendebûn û cahiliyê ku Xelîl Xeyalî tevî rewşenbîrên serdema xwe, li ser vê mijarê pir disekine.

1.2.3.1. Rewşa Sovyetê û Alfabeya wan

Sovyet ji aliyê çarçoveyê ve ne di nav xebata me de ye, lê belê ji ber ku cara ewil alfabeya kurdî ya latînî li wir hatiye bikaranîn, em ê bi kurtasî li ser bisekinin. Sovyet berevajî dewletên din, ji aliyê zimên ve azadiyek daye kêmneteweyên xwe. Wexta mirov li dîroka wan dinêre, mirov dibîne ku hewldanin çêbûne der barê perwerdehiya zimanê zikmakî de, jê wêdetir dibistan hatine vekirin û di wan dibistanan de xwestine ku perwerdehî bi zimanê zikmakî pêk bê. Ji ber vê rewşenbîr û nivîskarên kurd ên Sovyetê bi zimanê xwe xwendine û zarokên xwe jî dane xwendin.

Yek ji wan nivîskaran Eskerê Boyîk e ku di berhema xwe ya bi navê *Çanda Kurdên Sovêtê* de behsa rewşa gelê kurd dike û dibêje piraniya wan nexwende bûn, jiyana wan bi koçerî û nîvkoçerî, her wiha di nav feodaliyê de derbas dibû. Li gorî ku dide xuyakirin, ji hezarî belkî yek an jî du kes xwendin û nivîsandin dizanîbû, ew jî bi zimanê rûsî, ji ber ku alfabeya wan û xwendewariya kurdan tune bû wek gelek neteweyan. Lê belê, li gorî Boyîk rave dike, her çi qas Împaratoriya Rûsyayê siyaseta dagirkerî û kolonyalîst meşandiye jî, ji aliyê çandî û aborî ve mafên gelên bindest parastiye. Ji vî aliyî ve jî Rûsyayê bi Dewleta Osmanî û Îranê ve dide ber hev û dibêje Rûsya ji wan dewletan demokratîktir û qenctir bû. [273]

Tiştê herî berbiçav ê ku li Sovyetê tê kirin, giringiya perwerdehiyê ye û ji ber vê li her derê welêt dibistan têne vekirin. Boyîk rewşa perwerdehiyê wiha vedibêje:

> Di vî halê xirab û tengasiyê da, hukumeta Sovêtê ya nû demeke kin da karine pirr mezin kirin aliyê perwerdekirin û pêşxistina gel û netewên wî welatî da. Heta gund û qiclên herî dûr û biçûk da jî dibistan hatine vekirin, dersdar hatin hazirkirin, pirtûkên dersa çap bûn, sîstêma xwendin-perwerdekirinê welêt da

[273] Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovêtê,* Peywend, İstabul 2019, rr. 13-14

tevayî hate damezirandin, ew jî ne bi zimanekî (bi zimanê gelê desthilatdar), lê bi zimanê her gel û neteweyî.[274]

Bi biryara hikûmeta Ermenîstanê, di 23yê Adara 1921ê de, di dibistanên seretayî de perwerdehî divê bi zimanê dayîkê bûya. Ji ber vê jî di 1921ê de pirtûkeke dersan a kurdî ya bi navê *Şems* hatiye amadekirin bi herfên ermenî.[275] Lê herfên kurdî gelek caran guheriye li Sovyetê, yên kirîlî û latînî jî hatine bikaranîn. Herfên latînî yên Sovyetê berî *Hawar*ê hatine bikaranîn, lê ji ber şert û mercên polîtîkaya wê derê, cihê xwe daye alfabeyeke din dîsa.

Eskerê Boyîk der barê pêvajoya alfabeya kurdî ya li Sovyetê dibêje, di sala 1921ê de Ermenîstanê biryar daye ku bila li hemû dibistanan perwerdehî bi zimanê zikmakî be. Lê belê ji bo kurdan ev rewş zehmet bûye, lewre wan alfabeyek tune bûye ji bo xwendingehan. Ji ber vê karek li ser vê hatiye meşandin û berî her tiştî û di demeke kin de amadekirina alfabeyekê pêwîst bûye. Di meha tîrmehê ya heman salê de li ser hîmê alfabeya ermenî, alfabeyeke kurdî hatiye amadekirin ji aliyê Lazo (Hakob Xazariyan) ve. Lê di pratîkê de hatiye dîtin ku ev alfabe têra hemû qanûn, reng û dengên zimanê kurdî nake. Her wiha kurd tenê li Ermenîstanê nebûn. Alfabeyeke wisa lazim bû ku hemû kurdên Sovyetê bikarîbûna jê fam bikin û sûdê jê wergirin.

Di sala 1925an de civînek li nehiyeya Hacîxelîlê hatiye lidarxistin û di wê civînê de biryar hatiye dayîn ku alfabeya kurdî bila li ser hîmê latînî bê amadekirin. Di dawiya sala 1928an de Îsahak Marogûlov[276] û Erebê Şemo alfabeya kurdî ya latînî amade kiriye û hema wê salê pirtûka wan a bi navê *Xo-Xo Hinbuna Xondьna Nvisara Kyrmançi* (Xwe bi xwe Hînbûna Nivîsandina Kurmancî) çap bûye û di 1930î de li hemû dibistanên kurdan bi vê alfabeyê ders hatine dayîn. [277]

Her çi qas di nav çavkaniyan de xwediyê vê alfabeyê wek Marogûlov û Şemo bêne dîtin jî, li gorî hevpeyvîna ku Îbrahîm Seydo Aydogan bi Celîlê Celîl re kiriye, ew alfabe ya Marogûlov tenê ye. Argûmanên wî jî ev in ku, Erebê Şemo hevalê nêzik

[274] Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovêtê,* rr. 14-15
[275] Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovêtê,* r. 16
[276] der barê jiyana Îsahak Marogulov de bnr., Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovêtê,* di dîpnot 22yan de, r. 46
[277] Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovêtê,* rr. 44-47

ê Marogûlov bû û Marogûlovê ku hema bîst salan e li ser alfabeya kurdî dixebitî, ji Erebê Şemo jî alîkarî dixwest carinan ji aliyê fonetîkê ve, lê ev nayê wê wateyê ku bibe şirîkê xebata wî.

Li gorî ku Celîlê Celîl diyar dike, Marogûlov wexta ku alfabeya xwe amade kiriye, bi awayekî fermî şandiye komîsyonê û dipirse heke Erebê Şemo jî şirîkê vî karî bû, çima di wê serdemê de hember derneketiye û negotiye ka çima navê wî li ser tune ye. Her wiha li gorî agahiyên Celîl, di nav arşîvan de jî alfabe li ser navê Marogûlov xuya ye.

Celîlê Celîl diyar dike ku navê Erebê Şemo piştî vegera wî ya ji sirgûniyê û piştî mirina Marogûlov tev li alfabeyê bûye. Her wiha diyar dike ku di *Rja Ţəzə* (Rya/Riya Teze) de jî navê Marogûlov tenê derbas dibe, her wiha tiştê balkêştir jî ev e ku Erebê Şemo, Marogûlov pîroz kiriye ji bo alfabeyê. Celîl jî li vir bi mafdarî dipirse, heke ew jî şirîkê alfabeyê bûya, gelo ew ê hember derneketa şûna pîrozbahiyê.[278] Pierre Rondot jî wexta behsa alfabeya Sovyetê dike, wek çêkerê alfabeyê tenê navê Marogûlov bi bîr tîne.[279]

Wekî ku em dibînin di 1928an de li Sovyetê alfabeya latînî hatiye amadekirin, Celadet Alî Bedirxan jî di 1932yan de li Şamê bingeha alfabeya latînî daniye. Dibe ku di serî de haya wan ji hev tune bû, lê piştre haya wan ji hev çêbûye û Têmûrê Xelîl di nivîsa xwe ya ku li ser Heciyê Cindî nivîsiye, aşkera dike. Ev nivîs bi navê *Zargotinzarê Kurdan ê Herî Mezin* di pirtûka Firîda Hecî Cewarî de weşiyaye. Têmûrê Xelîl behsa hejmara 8an a *Hawar*ê dike ku di nivîseke vê hejmarê de Celadet Bedirxan bi navê Herekol Azîzan tîne zimên ku çend hejmarên *Riya Teze* gihîştine ber destê wî. Li gorî ku Têmûrê Xelîl diyar dike, ji ber hin sedeman e ku di *Hawar*ê de nehatiye behskirin ka kê ew rojname ji wan re şandine, lê belê dibêje ku em dizanin yê şandiye Heciyê Cindî ye û ji ber vê jî hatiye girtin.[280]

Her wiha Heciyê Cindî bi xwe jî behsa vê bûyerê dike û wekî ku diyar dike çend hejmarên *Hawar*ê jî gihîştine ber destê wî. Ji xeynî vê, tê diyarkirin ku kovarên

[278] Îbrahîm Seydo Aydogan, *Guman-1 Zimanê Kurdî*, Weşanên Lîs, Diyarbakır 2013, rr.299-304
[279] Pierre Rondot, "Trois Essais de Latinisation de l'alphabet kurde: Iraq, Syrie, U.R.S.S.", *Extrait du Bulletin d'Études Orientales de l'Institut Français de Damas, T. V.*, Le Caire 1936, r. 18
[280] Firîda Hecî Cewarî, *Heciyê Cindî Jiyan û Kar*, Weşanên Lîs, Diyarbakır 2008, r. 201

*Hawar*ê yên ku di 1939an de li cem Heciyê Cindî hatine dîtin, girêdana wan a sîxuriyê derxistiyê holê li cem dewletê:[281]

> Çend caran min û Bedirxanê ji bajarê Şamê (Sûriye) name ji hev re dişandin. Min carekê dîsa kovara "Hawar" stand, di wê de nameya ku Bedirxan ji min û Cerdoyê Gênco re şandibû hebû. Di nameyê de, Bedirxan hêvî dikir elam bikin ka Kurdên Yekîtiya Sovyetê çawa dijîn, çi dibistan hatine sazkirin ji bo zarokên Kurdan û tiştên mayîn. Wergera nameyê şandin ji Kommerkeziyê re û li wê derê biryar girtin, wekî em bersiva nameyê nedin![282]

Bi vî awayî em dibînin ku her çi qas li Sovyetê alfabe û pirtûkên dersê yên kurdî bi awayekî azad hatibin çapkirin û xwendin jî, pirsgirêkên din jî kêm nebûne ji serê rewşenbîrên wê derê. Her wiha alfabeya latînî demeke dirêj berdewam nekir, bi guherîna birêveberinê, li şûna alfabeya latînî ya kirîlî hate bikaranîn û careke din ya latînî hate bikaranîn. Di gel van guherînan, Boyîk aşkera dike ku ev kar û barên kurdewarî yên ku hatine meşandin, hemû bi alfabeya latînî ya Celadet Bedirxan in.[283]

Mirov dikare bibêje ku, her çi qas li Sovyetê giringiya çand û perwerdehiya kêmneteweyan hebe jî, ji ber siyasetê her carê alfabe jî hatine guherîn. Lê belê alfabeya Celadet Bedirxan li wir jî bibandor bûye.

---

[281] Firîda Hecî Cewarî, *Heciyê Cindî Jiyan û Kar*, r. 65
[282] Firîda Hecî Cewarî, *Heciyê Cindî Jiyan û Kar*, r. 68
[283] Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovêtê,* r. 52

BEŞA DUYEM

CELADET ALÎ BEDIRXAN Û GIRINGIYA *HAWAR* Û *RONAHÎ*YÊ JI ALIYÊ STANDARDÎZASYONÊ VE

2.1. ŞOREŞGERÊ SERDEMEKÊ: CELADET ALÎ BEDIRXAN

Celadet Alî Bedirxan hêj nehatibû dinyayê, mohra mişextiyê li eniya bav û bapîrê wî hatibû danîn. Mişextiyeke demdirêj bû, wisa bû ku hemû endamên bedirxaniyan, çi biçûk çi mezin, li deverên dûr mezin bûn, xwendin, zewicîn, ketin hepsê û tiştê trajîk jî ev e ku di mişextiyê de rastî mişextiyan hatin, heta mecbûr man ku ji mişextiya ku êdî bi awayekî hînî jiyana wê bûbûn, reviyan. Ango, ji xwe ji axa xwe dûr ketibûn, gelek ji endamên bedirxaniyan, mecbûr mabûn ku axa sirgûniyê jî biterikînin.

Bapîrê Celadet Bedirxan, Mîr Bedirxan ji ber têkçûna serhildana hemberî osmaniyan hatiye mişextkirin.[284] Tevî malbat û xebatkarên xwe ku ev ji sed kesî zêdetir bûn, wek sirgûn çûne Stenbolê û piştre demeke dirêj li Girîtê mane. Mîr Bedirxanê ku ew qas dewlemend bû û li ber çavê gelê xwe xwedîqîmet bû, li Girîtê bi zorê debara xwe dikir. Piştî çend salan destûr hatibû dayîn ku vegere Stenbolê. Li wir jî çend salan ma û çû Şamê, piştî çûyîna xwe bi salekê, ango di sala 1870yî[285] (li gorî Ahmet Kardam ev dîrok îhtîmaleke mezin Hezîrana 1869an e)[286] de çû rehma Xwedê.

Bi van mişextiyan ku di 1847an de dest pê kir, armanc ew bû ku beriya van serhildanan bigrin, lewre bedirxanî ji ber xurtbûna xwe xeterek bûn belkî. Wekî ku Seîd Veroj diyar dike ji serhildana Mîr Bedirxan (1846) heta belavbûna Xoybûnê

---

[284] Ji bo zêdeti agahiyê bnr. Ahmet Kardam, *Cizre-Bohtan Beyi Bedirhan Direniş ve İsyan Yılları,* Dipnot Yayınları, Ankara 2017; Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*

[285] Seîd Veroj, *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan 1913-1923,* r. 18

[286] Ahmet Kardam, *Cizre-Bohtan Beyi Bedirhan-Sürgün Yılları*, Dipnot Yayınları, Ankara 2019, r. 240

(1947) ev pêvajo sed salek berdewam kiriye[287] û lêkolîna li ser vê babeteke berfireh e. Bi awayekî ecêb çîroka Malbata Bedirxaniyan li wir bi dawî nebûye, çawa ku Dr. Barbara Henning diyar dike, berevajî vê, malbat ji qeydên dîrokî nehat jêbirin û endamên malbatê bi awayekî xurt vegeriyan.[288]

Yek ji van endaman jî Celadet Alî Bedirxanê kurê Emîn Alî Bedirxan (1851-Girît)[289] e ku di sala 1893yan de li Stenbolê hatiye dinyayê. Esas em dibêjin 1893, lê Rewşen Bedirxan dibêje dibe ku Celadet bi xwe dizanîbû sala jidayîkbûna xwe, lê nedixwest bibêje. Dibe ku psîkolojîk be, nexwestiye ferqa emrê wan aşkera bibe.[290] Lê ji rojnivîska Celadet Bedirxan em dikarin pê derêxin ku di sala 1893yan de çêbûye, lewre di 1924an de diyar kiriye ku 31 salî ye.[291] Her wiha Rewşen Bedirxan diyar dike ku di gulanê de, li Kadikoya Stenbolê hatiye dinyayê, lê jidayîkbûna wî gelek bi pirsgirêk bûye, heta di serî de gotine qey miriye.[292]

Li Mektebî Sultanî (Lîseya Galatasarayê) xwendiye û Kamiran Bedirxan di bîranîna xwe de ku bi Thomas Bois daye nivîsîn, dibêje:

> Polîtîkayeke mezin a împaratoriyê hebû. Ji ber vê bavê min û hinek ji mamên min li memûriyetên bilind bûn û hinek ji wan jî rasterast girêdayî Serayê bûn. Malbata me jî xwedî îmtiyazan bû. Yek ji wan jî ew bû ku hemû zarok û neviyên Emîr Bedirxan ji bo dibistana herî baş a Konstantînopolîsê, ango ji bo Lîseya Galatasarayê dihatin qebûlkirin.[293]

---

[287] Seîd Veroj, Seîd Veroj, *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan 1913-1923*, r. 15

[288] Dr. Barbara Henning, "Osmanlının Son Döneminde ve Sonrasında Osmanlı-Kürt Bedirxaniler Ailesinin Tarihi - Bir Genel Bakış Denemesi ve Daha Fazla Araştırmaya Çağrı", di *Kamiran Alî Bedirxan (1895-1978)* de, Heval Bucak&Hikmet İlhan (Çev.), Avesta Yayınları, İstanbul 2019, r. 15

[289] Seîd Veroj, *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan 1913-1923*, r. 18

[290] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985,* Avesta Yayınları, İstanbul 2020, r. 46

[291] Celadet Alî Bedirxan, *Rojên Almanyayê (1922-1925)*, Osman Özçelik (Wer.), Avesta Yayınları, Stembol 2015, r. 69

[292] Wexta ku Celadet Bedirxan çêdibe, ji ber ku serê wî pir mezin e, diya wî ji ber nexweş dikeve. Dixwazin gazî doxtor bikin, ji bavê wî Emîn Alî re dibêjin, lê ew dibêje doxtor nayê, bila bimire. Ji ber vê diçin cem Bedrî Paşayê birayê Emîn Alî û rewş jê re dibêjin. Ew jî doxtor dişîne. Wexta ku doxtor diçe, rewşa diya Celadet Bedirxan pir xirab e. Bi awayekî zarok derdixe û zarok birîndar e, wekî miriyekî hatiye dinyayê, xwîn jê diherike. Doxtor jî berê xwe dide diya wî, ji bo wê baş bike. Keçika ku alîkariya wan dike, diçe cem Celadet ka cemidîye an na hema reverev tê û dibêje zarokê ku we gotiye mirî ye, dijî. Bnr. Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985,* rr. 46-47

[293] Joyce Blau, "Emir Kamiran Bedirxan'ın Anıları", di *Kamiran Alî Bedirxan (1895-1978),* Avesta Yayınları, İstanbul 2019, r. 66

Wexta ku Kamiran Bedirxan 9 û Celadet Bedirxan jî 11 salî ne û li Lîseya Galatasarayê ne, bûyera kuştina Ridvan Paşa pêk tê û hemû zarokên Malbata Bedirxan Paşa ji dibistanê têne hildan û tev malbatên xwe têne mişextkirin, her wiha hinek ji wan jî têne girtin. Emîn Alî Bedirxan wê çaxê li Enqereyê dixebite û di karê xwe de pir baş e, her wiha meaşê wî jî baş e. Her çi qas ew di nav vê bûyerê de nebe jî, ji ber ku bedirxanî ye, tev malbata xwe tê mişextkirin.[294] Cihê wan ê ewil Îsparta ye. Kamiran Bedirxan bi awayekî pir xweş behsa Îspartayê dike. Heta diyar dike ku xelkê wê derê jî ji wan re rêz digirin. Lê ev têrê nake helbet, divê zarok dibistana xwe berdewam bikin. Mixabin ji ber ku ji aliyê siyasî ve wek xeter têne dîtin, zarok ji bo dibistanê nayên qebûlkirin. Divê ji waliyê Konyayê destûr bixwazin. Heta ku destûra wan bê, Emîn Alî zarokên xwe bêperwerde nahêle. Her şev wan li derdora xwe dicivîne û der barê helbestên kurdî û klasîkên Îranê de tehlîlan dikin.[295]

Bi vî awayî jiyana wan di navbera Îsparta, Akka û Hamayê de derbas dibe û rojekê xeberek tê ku hin guherîn hatine kirin di hikûmeta Konstantînopolîsê de û yên ku sirgûn bûne dikarin vegerin. Bi vî awayî ew jî vedigerin mala xwe.[296] Piştî vegera xwe, Kamiran û Celadet Bedirxan li Lîseya Vefayê perwerdehiya xwe berdewam dikin.[297] Piştî lîseyê, berî Şerê Cîhanê yê Yekem, Celadet Bedirxan li Stenbolê beşa hiqûqê dixwîne. Piştî qedandina hiqûqê, li Edîrneyê, li burokrasiya adliyê ya osmanî wek katib dixebite.[298]

Emîn Alî Bedirxanê ku tu car ji siyasetê qut nebûye, bi hişmendî û perwerdehiyê zarokên xwe gihandiye. Li Stenbolê Kamiran û Celadet Bedirxan jî bûne endamên saziyan û her wiha bi nivîskariyê jî xwe derxistine pêş. Wekî ku Veroj diyar dike nameya ji bo rojnameya *Serbestî* yekemîn nivîsa Celadet Bedirxan e[299] û "ev name di 20ê Sermaweza sala 1908ê de, di hejmara 5an a rojnameya *Serbestî*yê de hatîye neşirkirin."[300] Her wiha nivîsên wan ên wê serdemê bi tirkî ne û îslam û

---

[294] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, r.275
[295] Joyce Blau, "Emir Kamiran Bedirxan'ın Anıları", rr. 71-72
[296] Joyce Blau, "Emir Kamiran Bedirxan'ın Anıları", rr. 70-78
[297] Joyce Blau, "Emir Kamiran Bedirxan'ın Anıları", r. 78
[298] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, r. 348
[299] Seîd Veroj, *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan 1913-1923*, r. 40
[300] Bahoz Şavata, "Bi Seîd Veroj re li ser Pirtûka *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan (1913-1923)*, di *Kürt Tarihi* de, sayı: 42, İstanbul 2020, r. 47

osmanîtiyê diparêzin. Kamiran Bedirxan jî wexta behsa wan rojan dike, dibêje nîvê serê me misliman, yê din jî osmanî bû.[301]

Helbet osmanîbûna wan ne tenê bi nivîsan bû, di gel sirgûnan, nexweşiyan, birçîbûnan, veqetandina ji malbatê, dîsa jî tev osmaniyan ketibûn nav qada şer û wekî osmaniyekî şer kiribûn. Seîd Veroj salên wan ên di navbera 1913 û 1923yan dike du beş. Li gorî vê dabeşkirinê, beşa yekem ji salên 1912-13 û heta dawiya Şerê Cîhanê yê Yekem e ku di vê serdemê de xebatên wan bi piranî li ser osmanîbûn û yekîtiya wan e. Serdema duyemîn jî piştî şer e ku heta derketina wan a ji Stenbolê berdewam dike û ev serdem ji serdema berê cudatir e, lewre piştî şer hişmendiya wan guheriye û xebat û nivîsên wan bêhtir li ser rêxistin û siyasetê bûye. Her wiha Veroj diyar dike ku hemû berhem û nivîsên wan ên wê serdemê, bi osmanî hatine nivîsîn.[302] Ji xwe piştî şer wexta *Serbestî* dîsa dest bi weşanê kiriye, Celadet û Kamiran Bedirxan bi asteke bilindtir tê de xebitîne, dest bi rojnamegeriyê kirine, heta debara xwe jî pê kirine. Di vê serdema duyemîn a *Serbestî*yê de bandora Abdullah Cevdet û Mewlanzade Rifatê ku xwediyê kovarê bûye, pir li ser her du birayan çêbûye ji aliyê feraseta siyasî û rewşenbîriyê ve. Her wiha wekî ku Veroj diyar dike "di nav rûpelên berdest ên *Serbestî*yê de, li ser navê Celadet Bedirxan heft (7) meqale û li ser navê Kamiran Bedirxan jî panzdeh (15) meqale hatine belavkirin.[303]

Di vê mijarê de tiştê balkêş ew e ku di gel van zehmetiyan çima ew qas li cem osmaniyan mane. Yek ji sedeman ev e ku kurdên di wê serdemê de xwe ji osmaniyan dûr nabînin. Ji ber ku ew jî misliman in, ev têra wan dike. Ango ne cihû an jî xirîstiyan in ku ji wan veqetin. Tiştê din jî wekî ku Barbara Henning diyar dike meseleya aboriyê ye. Di dawiya sedsala 19mîn de, neviyên Mîr Bedirxan her ku xwestine vegerin welatê xwe, gotine ji ber kêmasiya aboriyê ew dixwazin vegerin. Ji ber vê, zêdekirina meaşê wan an jî dayîna karekî baş bi kêrî osmaniyan jî dihat da ku venegerin welatê xwe û tevliheviyê dernexin.[304]

---

[301] Gérard Chaliand, "Emir Kamiran Bedirxan ile İlişkilerime Dair Tanıklık", di *Kamiran Alî Bedirxan (1895-1978)* de, Avesta Yayınları, İstanbul 2019, r. 116

[302] Seîd Veroj, *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan 1913-1923*, rr. 87-88

[303] Bahoz Şavata, "Bi Seîd Veroj re li ser Pirtûka *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan (1913-1923)*, rr. 48-51

[304] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, r. 163

Ji xeynî vê, berî 1918an rewşenbîrên osmanî-kurd ji bo dewleta osmanî dixebitîn da ku li ser piyan bimînin. Wan nedixwest împaratoriya osmanî têk biçe û tiştek wiha nedihat bîra wan jî.[305] Ev jî bersivek e ka Celadet û Kamiran Bedirxan çima li cem osmaniyan tevî şer bûne. Lewra wexta ku mirov li jiyana wan a dawî dinêre ku li ser kurdayetî, çand û edebiyata kurdan gelek xebat kirine, jiyana wan a berî 1918an li ber çavan şênbertir dibe. Di wê serdemê de ew jî wekî gelek rewşenbîrên kurd xwe *osmanî* dibînin, ji ber vê xebat û şerên wan ên tev osmaniyan, ne tiştekî derî aqil e. Wekî Henning diyar dike nasnameya kurd di wê serdemê de ne li dijî osmaniyan bû, beravajiyê vê temamkerên hev bûn.[306]

Lê belê piştî Şerê Cîhanê yê Yekem dem û dewran diguhere, osmanî têk diçin û siyaset jî diguhere. Hinek rewşenbîr rasterast berê xwe didin xebatên ser netewetiya kurdan û hinek jî xwe vedikişînin. Hinek jî ji ber biryarên tund mecbûr dimînin ku birevin wekî bûyera Emîn Alî û kurên wî. Roja ku biryara bidardekirina Emîn Alî û her sê kurên wî Sureyya, Celadet û Kamiran tê dayîn mecbûr dimînin ku derkevin derve. Sureyya Bedirxan bi bavê xwe re diçe Misirê û Celadet û Kamiran jî berê xwe didin Almanyayê.

Mirov dikare salên wî yên li Almanyayê ji rojnivîska wî bibîne her çi qas bi awayekî kûr nenivîsandibe jî. Celadet û Kamiran Bedirxan wexta diçin Almanyayê, dev ji xwendina xwe bernadin. Her du jî qeyda xwe di beşa hiqûqê de çêdikin. Lê belê Almanyaya wê serdemê di nav rewşeke pir xirab de ye, ji ber vê jiyana wan a li wê derê pir rihet derbas nabe. Celadet Bedirxan di wê rojnivîskê de behsa tunebûna pere û xwarinê, rewşa aboriya xirab a Almanyayê dike ku di nav krîzeke mezin de ye, hevdîtinên xwe yên bi birayên xwe Kamiran, Tewfîq û Safder dike. Her wiha ji ber tunebûna pere behsa qewirandina ji zanîngehê dike ku wê çaxê di 31 saliya xwe de ye.[307] Piştre diyar nake ku berdewam dike an na lê li gorî agahiyên Rewşen Bedirxan berdewam dike, dîplomaya xwe distîne, heta li Şamê parêzeriyê jî dike.[308]

---

[305] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, r. 372

[306] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, rr. 372-373

[307] Celadet Alî Bedirxan, *Rojên Almanyayê,* r. 69

[308] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985,* r. 90-91

Di gel van rewşên xirab Celadet Bedirxan dev ji elimandina zimên, çûyîna konseran û gerê bernade. Heta di serî de tê nîşandan ku li ser dersên kemanê jî dixebite.[309] Pereyê ku bavê wî jê re dişîne, her çi qas bêqîmet jî be li ber pereyê Almanyayê, dîsa bi kêrî wî tê. Lê ji ber ku meaşê bavê wî tê qutkirin, ew jî bê pere dimîne û rewşa wî xirabtir dibe.[310] Ji ber van bûyeran ji aliyê derûnî ve xwe pir xirab hîs dike, tu car nayê bîra wî ku dê ev qas feqîrî bibîne û xwarina wî tenê kartol be.[311] Ji bo ku debara xwe bike çîrokên Nesredîn Xoce werdigerîne û dişîne weşanê, carinan gotar dinivîse ji bo rojnameyê, bi almanî çîrokan dinivîse, dersên taybetî dide û pûlan difiroşe. Balkêş e ku dersa yûnanî dide li wir, ev jî nîşan dide ku zimanê wî yê yûnanî pir baş e.[312] Heta Kamiran Bedirxan jî vê agahiyê piştrast dike; wekî ku di bîranîna wî de tê dîtin, di dema rêwîtiya sirgûniyê de li keştiya yûnanan siwar bûbûn, kaptan ji wan zarokan pir hez kiribû, lewre bi yûnaniyeke pir xweş diaxivîn. Her wiha Kamiran Bedirxan diyar dike ku wexta zarok bûn, bavê wan mirebiyeke yûnan girtibû ji bo wan, lewre bavê wan dixwest zimanên ku di împaratoriyê de pir têne axaftin, bila zarokên wî jî hîn bibin.[313] Ji xeynî dersên yûnanî, dersên tirkî jî dane.[314]

Ev daxwaza bavê wan hatiye cih, lewre her yek xwedî çend zimanan bûn. Wekî ku Rewşen Bedirxan diyar dike, Celadet Bedirxan ji xeynî tirkî û kurdî; rûmî, fransî, erebî, almanî û farisî dizanîbû. Her wiha piştî ku zarokên wî jî mezin bûne, dest bi elimandina îngilîzî jî kiriye û sertîfîkaya îngilîzî girtiye.[315] Di gel zanîna van heft, heşt zimanan, Henning diyar dike ku Major Noel di rojnivîska xwe de dibêje ne Celadet ne jî Kamiran bêyî wergêrekî nikarîbûn bi kurmancî biaxivin.[316] Lê belê di wergera tirkî ya pirtûka Major Noel de em dibînin ku der barê kurmanciya Celadet Bedirxan de tiştek nabêje, lê ji bo Kamiran Bedirxan dibêje bi kurmancî nizane.[317]

---

[309] Celadet Alî Bedirxan, *Rojên Almanyayê*, r. 23
[310] Celadet Alî Bedirxan, *Rojên Almanyayê*, r. 40
[311] Celadet Alî Bedirxan, *Rojên Almanyayê*, rr. 49-50
[312] Celadet Alî Bedirxan, *Rojên Almanyayê*, rr. 65-66
[313] Joyce Blau, "Emir Kamiran Bedirxan'ın Anıları", r. 74
[314] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985*, r. 91
[315] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985*, r. 37
[316] Major Noel, *Diary of Major E.M. Noel, C.I.E., D.S.O.,* on Special Duty in Kurdistan from June 14th to September 21st, 1919 (Basra: Hükümet Yayınları, 1919), s. 55, vgz. Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, r. 332
[317] E. W. Charles Noel, *Kürdistan 1919-Binbaşı Noel'in Günlüğü*, Avesta Yayınları, Bülent Birer (Çev.), İstanbul 2014, r. 108

Li ser bikaranîna zimanê Celadet Bedirxan, Henning nakokiyeke wiha derdixe holê. Dibêje, her çi qas Celadet Bedirxan di tevahiya jiyana xwe ya li Sûriyeyê reforma zimanê kurdî û alfabeya latînî diparast, peyvên nû çêdikir û di *Hawar*ê de zimanê edebî afirand bi tena serê xwe ku îro jî ev wek zimanê standard tê qebûlkirin, di têkiliyên xwe de, di nameyên xwe de ku ji birayên xwe û dostên xwe re şandine, her wiha di nîşeyên xwe yên kesane de bi piranî tirkiya osmanî bi kar aniye. Her wiha diyar dike ku di nav nivîsên şexsî yên Pierre Rondot de tê dîtin ku li ser kaxizên *Hawar*ê nîşeyên wî yên osmanî hene ku bi herfên erebî hatine nivîsîn.[318] Heke rewş bi rastî jî wiha be, nakokiya Celadet Bedirxan jixweber derdikeve, lewre di *Hawar*ê de gelek caran rexne li alfabeya erebî dike ku dibêje bi hêsanî nayê famkirin.

Celadet Bedirxan heta 1925an li Almanyayê dimîne. Piştre vedigere Misirê cem malbata xwe. Di 1927an de diçe Şamê. Hin rewşenbîrên kurd ên li Şamê di wê serdemê de tevgera Xoybûnê ava dikin û Celadet Bedirxan jî yek ji wan e. Du, sê salan di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de diçe û tê. Lê belê ev tevger jî naçe serî û Celadet Bedirxan xwe ji siyasetê dikişîne, di 1930î de vedigere Şamê û berê xwe dide ziman û çandê.

Xebatên ziman û çandê jê re rêyeke nû vedikin, lewre li gorî wî, bi pênûsê, bi nivîsê, bi xwendinê nifşek dikare bi pêş bikeve û hişmendiya neteweyî çêbibe. Ji ber van fikir û ramanan dest bi xebatên alfabeya kurdî dike, dixwaze bingeha wê ya latînî dayne, ji ber ku li gorî wî rêya modernbûnê, bi alfabeyê re eleqedar e û alfabeya latînî jî rêya elimandina xwendin û nivîsandinê bi awayekî hêsan vedike. Ji ber van sedeman, Celadet Bedirxan difikire ku ji bo hişyarkirina gel weşanek pêwîst e. Rewşen Bedirxan jî vî tiştî piştrast dike û dibêje *Hawar* ji Xoybûnê bibandortir bû. Lewre ev kovarek e û li her derê belav dibe. Heke Xoybûn ji sed kesan pêk dihat, ev kovar bi hezaran belav dibû li cîhanê.[319]

Barbara Henning diyar dike ku wexta Celadet û Kamiran Bedirxan di 1919an de bi Major Noel re çûn û pê li axa bav û bapîrê xwe kirin, bandora wê demê li ser

---

[318] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, r. 362

[319] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985*, rr. 67-69

wan pir çêbûye. Celadet Bedirxan stranên wê herêmê berhev kirine, meraqa wî ya li ser folklora kurdan, piştî wê gerê di tevahiya emrê wî de pê re bûye.[320] Ev ger ji dîtina axa xwe wêdetir, bû sedema fikirîna li ser alfabeya latînî jî. Major Noel bi alfabeya latînî notên kurdî dinivîsîn, nivîsandina hêsan a Major Noel bala Celadet Bedirxan kişandibû[321] û bingeha alfabeya nû esas di wê gerê de hatibû danîn û di 15ê Gulana 1932yan de bi kovara *Hawar*ê wek pratîk jî derket holê. Celadet Bedirxan alfabeya xwe ya nû diyarî gelê xwe kir.

Meseleya alfabeyê meseleyeke hesas bû ji bo Celadet Bedirxan, lewre dengek nû bû ev. Dengê mirov dengekî bêdîmen e, lê yê nivîsê ne wisa ye, xwedî dîmenek e. Her wiha dengê mirov bisînor e, tenê li derdor dikare bê bihîstin, lê dengê nivîsê dikare bigihîje her derê cîhanê. Ev alfabe ji ber vê ev qas giring bû ji bo Celadet Bedirxan. Wî dixwest dengê hişmendiyê, zanînê, yekbûnê li her derê cîhanê bê bihîstin. Kurd ancax wê çaxê dê bikarîna dengê hev bibihîzin. Ev deng, deriyekî bû ji bo têketina cîhana modern û ewrûpî.

Celadet Bedirxan gelê xwe biqîmet didît. Lewre dixwest bila zimanê wan tenê di nav malê de nemîne, bi çend peyvan sînordar nebe. Li gorî wî kurdî ji tu zimanên din ne kêmtir bû û bi xebatê dikarîbû bigihîşta asteke bilind.

Bi van xem û keseran, bi daxwaza nivîsîna bi awayekî hêsan, Celadet Bedirxan xwest alfabeyeke nû çêke ji bo gelê xwe. Her çi qas nîqaşa guherandina alfabeyê berî wî dest pê kiribe jî, ev nîqaş negihîştibûn tu encamekê. Celadet Bedirxan jî her çi qas alfabeya xwe di 1932yan de bi gelê xwe da nasîn jî, xebatên wî di 1922-23yan de dest pê kirine. Heta ji bo ku dilê bavê xwe jî xweş bike, jê re gotiye ku alfabeyeke nû çêkiriye, lê bavê wî jî wek nîqaşên berê yên ku li dijî alfabeya nû ne, hemberî vê fikire derketiye, lewre kurdên ku misliman in dê nexwazin dev ji alfabeya xwe berdin, ji ber ku li gorî wan alfabe bi dîn re têkildar e û ew naxwazin ji

[320] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, r. 426

[321] Ji bo bîranîna bi Major Noel re bnr. "Pêşgotingeq", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, cild: 1, hejmar: 13, Stockholm 1998, rr. 263-264

dînê xwe dûr bikevin. Lê belê Celadet Bedirxan dîsa jî dev ji vê xwesteka xwe bernedaye.[322]

Lê belê fikira hêsankirina alfabeyê ji zû ve ketibû hişê Celadet Bedirxan û wî dixwest vê fikirê pêk bîne. *Hawar* bû bingeha vê fikirê. Celadet Bedirxan alfabeya xwe da nasîn û ji xwîneran jî hêvî û lava dikir ku hînî vê alfabeyê bibin ji bo bipêşketina zimên û hişmendiyê. Her wiha bi hezar zehmetiyên amadekirina nivîs, çapxane û belavkirinê Celadet Bedirxan alfabeya xwe bi kurdan da qebûlkirin û îro bi saya wî kurd dikarin bi hêsanî binivîsin û bixwînin. Helbet karê Celadet Bedirxan ne tenê alfabe bû, wekî ku Rohat Alakom dadixuyîne "rêberê şoreşa herfan"[323] Celadet Bedirxan[324], li gel alfabeya xwe, li ser hûrmûrên rêzimana xwe jî xebitiye.

Celadet Bedirxan dixwest ji xeynî alfabeyê, standardîzasyonek çêbe da ku hemû kurd ji hev fam bikin. Ji ber vê, wî bi xwe jî ne bi devoka botî lê bi zimanekî wisa dinivîsî da ku ev ziman bila bibe zimanekî hevpar. Ji aliyê şêweyê ve jî kovareke nû bû. Li gorî Henning dibêje, Celadet û Kamiran Bedirxan wexta kovar derxist, wekî birayê xwe Sureyya nedane pey şopa *Kurdistan*ê ku mamên wan derxistibûn. Qey wan dixwest rûpeleke nû vekin.[325]

Ziman ji bo Celadet Bedirxan mijareke giring bû, her çi qas wî û Rewşen Bedirxan bi tirkî diaxivîn jî, berî ku zarokên wan çêbin Celadet Bedirxan axaftina bi tirkî li malê qedexe kiriye. Ji ber ku li gorî wî, ew niha mezin bûne êdî, ne giring e bi çi zimanî biaxivin, lê zarok divê zimanê xwe bizanibin û bi kurdbûna xwe bihesin.[326] Ev jî çîroka Elyezer bîn Yehuda tîne bîra me, ya ku di *Hawar*ê de jê behs dike.[327] Her wiha tiştekî balkêş e ku Celadet û Kamiran Bedirxan jî bi hev re bi tirkî diaxivîn. Berî ku Celadet Bedirxan axaftina tirkî li malê qedexe bike, di dawiya 1929an de,

---

[322] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985,* r. 93

[323] Rohat, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, Weşanên Deng, İstanbul 1991, r.193

[324] Rohat Alakom li vir jidayîkbûna Celadet Bedirxan wek 1897 û ya Kamiran Bedirxan jî wek 1895 nîşan daye. Li gorî vê agahiyê Celadet ji Kamiran biçûktir e. Lê belê piraniya çavkaniyan, bîranîna Kamiran Bedirxan jî tê de, nîşan didin ku Celadet du salan ji Kamiran mezintir e. Her çi qas li ser jidayîkbûna wî dîrokeke hevpar tunebe jî, wekî ku me diyar kir, li gorî bîranînên wî yên Almanyayê, ev dîrok 1893 ye. bnr. Rohat, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987),* r.193

[325] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, r. 474

[326] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985,* r. 109-110

[327] Ji bo çîrokê bnr. Herokol Azîzan, "Zilamek û Zimanek", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 2, h. 40, Stockholm 1998, r. 944

axaftina tirkî ya di nav xwe de jî qedexe kiriye, yanî di navbera xwe, Kamiran û Rewşen Bedirxan de.[328] Meseleya zimên ji bo bapîrê wî Mîr Bedirxan jî meseleyeke giring bû ku gotiye "ditirsim hûn zimanê xwe ji bîr bikin. Heke hûn zimanê xwe ji bîr bikin, hûn ê welatê xwe Botan jî ji bîr bikin. Tiştê ku ez ji we dixwazim ew e ku hûn li malê, bi zar û zîçên xwe re bi zimanê bav û bapîrê xwe biaxivin. Yê ku wiha neke ne kurê min e."[329] Di van hevokan de, girêdana di navbera ziman, netewe û welat de tê dîtin ku hesasiyeta Celadet Bedirxan jî tam ev e ku dixwaze zarokên wî bi zimanê xwe biaxivin.

Di wê serdemê de çapkirina kovarekê pir zehmet bû. Ew li Şamê bûn û matbaayên wir hemû bi erebî bûn. Celadet Bedirxan bi xwe herf saz kirine ji bo matbaayê. Ji ber ku herfên latînî yên wê derê cuda bûn, wî ji Beyrûdê herf anîne û bi destê xwe çêkirine. Yanî di wê serdemê de zehmetiya mezin belkî ne nivîsîna fikiran bû, lê belê çapkirina wan bû, wexta ev nivîs ne erebî bin, kedeke mezin dixwest ji bo amadekirinê.[330] Her wiha *Hawar* du, sê salên ewil li matbaayê çap bûye, piştre, ango çend meh piştî zewaca Celadet û Rewşen Bedirxan[331], matbaaya xwe êdî anîne malê û Rewşen Bedirxan jî ji aliyê ambalajkirin û nivîsîna navnîşanan ve alîkariya Celadet Bedirxan kiriye.[332]

Pirsgirêkên kovarê ne tenê ji aliyê aborî û matbaayê ve bûn. Wexta ku Celadet Bedirxan xwestiye *Hawar*ê derêxe, ji birêveberên fransî destûr xwestiye. Wan jî hê ji serî de ji aliyê aborî ve alîkarî kiriye, her wiha sozek wiha jî dane ku heke kovar rêya fransîhez bişopîne, ew ê zêdetir alîkar bibin ji aliyê aborî ve. Ji xeynî vê, divê nivîsên siyasî nehatina nivîsîn û nivîskar jî bi navên xwe yên resen binivîsandina. Wan hêvî dikir ku bi saya *Hawar*ê ew ê bikaribin civaka kurdan

[328] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985,* r. 141
[329] Malmîsanij, *Cızira Botanlı Bedirhaniler*, r.32
[330] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985,* r. 71
[331] Celadet Bedirxan û Rewşen Bedirxan (keça Mehmed Salih Bedirxan) di sala 1935an de dizewicin. Ji vê zewacê kurek wan çêdibe. Celadet Bedirxan navê birayê xwe Safder lê dike, yê ku li Almanyayê ji ber nexweşiyekê, di emrekî biçûk de wefat dike. Kurê Celadet Bedirxan jî dora yek saliya xwe ji ber nexweşiyekê wefat dike. Piştî wî du zarokên wan ên din çêdibin bi navê Sînemxan û Cemşîd. bnr. Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985,* rr. 110-111
[332] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985,* r. 108

kontrol bikin û bandorekê li ser wan çêkin. Meseleyeke din jî heye ku destûr nehatibû dayîn ku Osman Sebrî di *Hawar*ê de binivîse.[333]

Ev dibe ku ji ber tevgerên wî yên hemberî fransiyan be. Osman Sebrî di bîranîna xwe de diyar dike ku di nav birêveberên fransî û osmanî de peymanek hebû. Kesên ku direviyan û diçûn Sûriyeyê, heke ne ji ber sedema siyasî be, divê bihatina vegerandin. Çûyîna Osman Sebrî jî hem ji ber meseleyên siyasî, hem jî ji ber kuştina dijminê xwe Bedir Axa bû, yê ku bû sebeb her du mamên wî bêne dardakirin. Dewleta Osmanî jî ji fransiyan dixwest ku Osman Sebrî vegerînin, ji ber ku ji xeynî meseleyên siyasî, sûcek hebû li ortê. Osman Sebrî jî wexta bi birêveberên fransî meseleyên siyasî jî dane zanîn, biryar hat girtin ku Osman Sebrî venegerînin. Lê daxwaza wan ew bû ku, bêyî destûra wan tevlî tiştekî nebe. Lê Osman Sebrî wexta tevlî Xoybûnê bû û ji bo kar çû Dêrsimê, haya birêveberê fransî jê çêbû. Dibe ku ji ber vê meseleyê wan nexwestiye Osman Sebrî tê de binivîse.[334] Her çi qas nayê zanîn ka ev mijar çawa hatiye çareserkirin jî, Osman Sebrî di *Hawar*ê de û her wiha di *Ronahî*yê de nivîsiye.

Lê belê encamên ku fransizan nedixwest derketin holê. Ev kovar bû amûrek di navbera xwîner û nivîskaran de û bi vî awayî platformek çêbû ji bo danûstandina wan.[335] *Hawar* ji fransiyan piştgirî girtibû, jê wêdetir ev kovar ne tenê di nav kurdan de, di nav ermenî û fransiyan de jî belav dibû û bi saya dîplomat û oryantalîstên ku têkiliya Celadet Bedirxan bi wan re hebû, gelek aboneyên kovarê çêbûbûn.[336]

Her wiha Pierre Rondotyê ku hevaltiya wî bi Celadet Bedirxan re hebû, di navbera *Hawar* û birêveberên fransî de têkiliyeke navendî çêkiribû û karê wî ew bû ku nivîsên *Hawar*ê kontrol bike û heke hewce be sansûr bike.[337] Ji xwe me li jor gotibû nivîsên siyasî qedexe ne di kovarê de, ev tişt jî nîşan dide ku Celadet Bedirxan

---

[333] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, 2021, r. 473

[334] Osman Sebrî, *Hatıralarım*, Abdullah Koçal (Çev.), Weşanên Lîs, Diyarbakır 2012, rr. 125-131

[335] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, 2021, r. 474

[336] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, r. 477

[337] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, r. 478

mecbûr bû li gorî dilê wan binivîse ji bo saxiya kovarê. An jî dibe ku piştî Xoybûnê bi rastî jî ji siyasetê sar bûbû û bi tenê dixwest li ser çand û ziman binivîse.

Her çi qas em dibêjin yên ku piştgiriya *Hawar*ê dikir gelek bûn, yên ku neyartî dikirin jî hebûn. Di salên 1940î de bedirxaniyan piştgirî dida fransiyan, lê yên ku li hemberî fransiyan derdiketin jî têkiliya xwe bi bedirxaniyan re birîn. Her wiha li gorî hinekan -ku ev piştgirên berê yên bedirxaniyan bûn- bedirxaniyan pereyê Xoybûnê veşartibû û ji bo berjewendiya xwe bi kar anîbû.[338] Osman Sebrî jî Celadet Bedirxan sûcdar dike di vê meseleyê de ku ev berî *Hawar*ê qewimiye. Li gorî wî, Celadet Bedirxan dê pere bidaya wî ji bo ku biçe Dêrsimê û karê wan li wir bimeşîne, lê Celadet Bedirxan pere nedabûyê û Osman Sebrî dibêje pereyê ku ji Xoybûnê stendibû, bi xwe xwaribû.[339] Bûyereke ji van jî xirabtir ew e ku hinek kes li hemberî wan derketine û gotine heke hê jî vê kovarê biweşînin, ew ê nusxeyên wê li ber her kesî biçirînin.[340]

Li gorî Rewşen Bedirxan behs dike, Celadet Bedirxan bi gelek navan nivîsiye di *Hawar*ê de. Wexta ku peyvek ji yekî dibihîze, wê dike nivîs û navê wî kesî ku jê bihîstiye lê datîne. Ji bo ku *Hawar* bi du sê navan dernekeve, tiştekî wiha kiriye. Heta bi navê Rewşen Bedirxan jî nivîsiye; her çi qas ew fikir, fikirên wê jî bin, Rewşen Bedirxan li hemberî vê derketiye, lewre bi xwe nikarîbû bi kurmancî binivîse. Lê belê Celadet Bedirxan ew bi vî awayî qanih kiriye: "Belkî rojek tu jî hîs bikî û binivîsî."[341] Lê belê li gorî Malmisanij neqil dike, haya Rewşen Bedirxan ji van nivîsan hebûye. Fikirên xwe an jî mijarekê ji Celadet Bedirxan re gotiye û wî jî li ser navê wê nivîsiye.[342] Di vê gotinê de xuya ye haya Rewşen Bedirxan heye ku ew ê li ser navê wê binivîse, lê di hevpeyvîna xwe de, ya ku bi Mehmed Uzun re kiriye, diyar dike ku piştî derketina kovarê haya wê jê çêdibe ku Celadet Bedirxan navê wê bi kar aniye.

---

[338] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, r. 479

[339] Osman Sebrî, *Hatıralarım*, r. 143

[340] Barbara Henning, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, r. 479

[341] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985*, r. 78

[342] "Celadet Bedirxan'ın Eşi Ruşen Bedirxan", Kurdistan Press, no: 11, s. 12, vgz. Malmîsanij, *Cızira Botanlı Bedirhaniler,* r. 256

Hawar ji ber rewşên aborî, ango ji ber tunebûna kaxizê sekiniye. Çawa ku Rewşen Bedirxan diyar dike, mirov dibêje qey Celadet Bedirxan hîs kiriye ku dê bê girtin, berî ku ew bigirin, wî bi xwe weşana xwe sekinandiye. Li parlamentoyê hatiye axaftin ku bila vê weşanê bisekinînin, lê hewce nekiriye ku ew bisekinînin, ji xwe Celadet Bedirxan biryara sekinandinê daye.[343]

Hawar di 1943yan de disekine lê kovara ku hinek ji wê cudatir e derdikeve bi navê *Ronahî*yê. Ev kovara ku biwêne ye, di 1ê Nîsana 1942yan de derdikeve û heta Adara 1945an berdewam dike. Di beşa sêyem de em ê bi awayekî berfireh behsa naverok û şêweyên van her du kovaran bikin, her wiha ji ber ku armanca tezê jî ev bi xwe ye, em ê ji aliyê rastnivîsê ve jî bidin ber hev.

Piştî ku ev her du kovar jî disekinin Celadet Bedirxan jiyana xwe li Şamê didomîne tev malbata xwe. Sala 1951ê ji bo debara wan dibe saleke xweş, lê ji aliyekî ve jî dibe saleke trajîk. Celadet Bedirxan wê salê dest bi karê çandina pembû dike. Gundê ku Celadet Bedirxan lê dixebite 30 km ji malbata wî dûr e. Dixwaze li wir bîrek bê kolan. Navê wê bîrê jî datîne "Bîra Qederê" û di nameya xwe ya dawî de wek navnîşan vî navî bi kar tîne. Wexta ku bîr tê kolandin qezayek çêdibe û Celadet Bedirxan dikeve nav bîrê. Wexta derdixin dibînin ku di nav heriyê de wer bûye. Dibin nexweşxaneyê û li wir jiyana xwe ji dest dide.[344] Mirina wî jî wek jidayîkbûna wî bi awayekî trajîk çêdibe. Lê ji neviyên xwe re mîraseke mezin dihêle, çawa ku Fırat Aydınkaya diyar dike ku modernbûna navgînî bêyî Celadet Bedirxan nayê nivîsîn, yê ku bi kurdiya modern, matbuata modern, hişmendiya modern, alfabe û rêzimanê, rê ji bo modernbûna kurdan re vekiriye ew e.[345]

2.2. HIŞMENDÎ Û GIRINGIYA ZIMÊN DI *HAWAR*Ê DE

Rewşenbîrên kurd hem di serdema *Hawar*ê de hem jî berî wê hewl dane ku hişmendiyeke kurdî çêbe di nav gel de. Bi avakirina komeleyan, çapkirina kovar û rojnameyan xebateke giring meşandine. Armanca wan xwedîderketina li ziman û neteweyê, bipêşxistina xwendin û nivîsîna bi kurdî bû. Ji ber ku wan dizanîbû bêyî

[343] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985,* r. 113
[344] Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985,* rr. 188-191
[345] Fırat Aydınkaya, "Kürt Modernleşmesi Dosya Editörü", di *Kürt Tarihi* de, sayı: 25, İstanbul 2016, r. 9

perwerdehî, bêyî xwendin û nivîsîn, bêyî ziman miletek nikare bi pêş bikeve û zarokên xwe bigihîne.

Ji ber vî tiştî her yek bi awayekî karê xwe dimeşand di vê rêyê de. Ev hişmendî ne tenê karê rewşenbîran bû, wan dixwest ên ku nanivîsin jî bila xwe ji vê rêyê dûr nexin. Alîkariya madî jî pir giring bû û wan dixwest bila kî çi qas dikare, kî dikare çi bike bila bike.

Ji ber vê çendê, kurdên Cizîrê bi navê *Civata Arîqarîyê Ji Bona Qurdên Belengaz* civatek ava dikin da ku halê kurdan xweştir bikin. Ev civat di *Hawar*ê de jî cihê xwe digire û alîkariya madî ji gel tê xwestin da ku bikaribin dibistan û nexweşxane ava bikin: "Sernîveqa civatê ji bona danîna dibistaneqê û lêqirina xestexaneqê ji niho ve xwe qar diqe."[346] Her wiha dibêje yên ku nikarin alîkariya madî bikin, dikarin ceh û genim jî bişînin, ango bi her awayî alîkarî qebûl dikin.

Di nivîsa *Lehî*yê de nivîskar kurdan dişibîne lehiyê, behsa giringiya yekîtiyê dike û dibêje: "Qurd ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê tên dakurtandin. Qo gihane hev dibin lehî, lehîqe boş, tu qes, tu tişt li ber wan niqare biseqine. Felata welatê me di rabûna vê lehîyê de ye."[347]

Celadet Alî Bedirxan behsa hişmendî û giringiya xwendinê dike di çîroka xwe ya bi navê *Ber Tevna Mehfûrê* de. Dayikek ku mêrê wê miriye, tev du keç û kurekî xwe diçe bajarekî biçûk û xebata dayikê tenê têrê nake. Ji bo xwendina kurikê biçûk divê her du keç jî bixebitin. Rojeke zivistanê wexta li kar in Zîzê ji xwişka xwe Rindê pirsan dike ka çima di vê zivistanê de dixebitin. Rindê jî bersiva wê dide û dibêje heke ji nav kurdan jî yên xwenda derkevin, ew ê bi xwe bibin serhosteyên xwe, heta dibêje ne tenê serhoste, dê ji hakiman heta paleyan, hemû ji nav wan bin û wê çaxê dê zimanê ku pê diaxivin li her derê bê gotin û bihîstin. Halê xwe yê xirab bi nexwendina miletê xwe nîşan dide.[348]

Li vir esas Celadet Bedirxan dixwaze giringiya xwendinê bi hemû kurdan bide zanîn û bi saya wan zarokên xwenda ji cahiliyê xelas bibin. Wan çaxan dibe ku

[346] "Civata Arîqarîyê ji Bona Qurdên Belengaz", *Hawar*, c: 1, h: 2, r. 44
[347] "Civata Arîqarîyê ji Bona Qurdên Belengaz", *Hawar*, c: 1, h: 2, r. 44
[348] Celadet Alî Bedirxan, "Ber Tevna Mehfûrê", *Hawar*, c: 1, h: 4, r. 85

ji ber kar be an jî ji ber tunebûna dibistanan be, piraniya kurdan nexwenda bûn û zarokên xwe jî nedişandin dibistanê. Celadet Bedirxan dixwaze bide zanîn ku, xwendina van zarokan tenê bi kêrî malbata wan nayê, bi saya wan zarokên xwenda, dinya dikare bê guhartin, gelê kurd dikare bigihîje rihetiyekê, welat dikare bifilite, "welat bi xebata mirovên xwenda xelas dibe". Yanî ev daxwazeke neteweyî ye.

Xortek bi navê Wecdî Cemîl Paşa di nivîsa xwe ya bi navê *Hawareq* de hawara xwe digihîne Celadet Bedirxan û dibêje: "Apo, tu nizanî Hawar bi me çikas xweş e, çikas delal û beha ye. Tu zanî çira apo? Ji lewra qo ev sê çar sal in ez di dibistana biyanîyan de dixwînim, hîn ez bi xwe ne hesiya bûm lê ev Hawara dilşewat ez dîn qirim. Şev û rûj dixwînim, bendên wê ji ber diqim, û dîsan jê têr nabim." Her wiha axaftina xwe ya bi bavê xwe re jî vedibêje û jê dipirse ka çima wî dişîne dibistana biyaniyan û çima di wan dibistanan de zimanê Hawarê tune ye. Bavê wî jî bersiva wî dide û dibêje ku dibistana wan, ango dibistana kurdan tune ye ku zarokên xwe bişînin. Rexne li gelê xwe jî dike û dibêje heta niha şûna ku xizmeta gelê xwe bikin, ya miletê kirine û zimanê miletên din bi pêş birine û yê xwe şûn ve hiştine.[349] Ji van gotinan xuya ye, hişmendiyekê çêdibe di nav ciwanan de, li ser jiyana xwe, zimanê xwe û miletê xwe difikirin. Êdî dixwazin li dibistanên xwe, bi zimanê xwe perwerde bibin.

Her wiha di heman hejmarê de Celadet Bedirxan behsa wî xortê sêzdeh salî[350] dike û jê re dibêje: "Belê hevsal û hogirên te jî weq te difiqirin, êdin ew jî dixwazin her tiştî bi zmanê xwe hîn bibin û di dibistanên qurdan de bixwînin. Ewle be qurê min, hêdî hêdî, birêve, ew jî dê çêbibin."[351] û bi van gotinan hêviyên xwe tîne zimên.

Herfên latînî ji ber ku herfên ewrûpî ne, ji aliyê hin kesan ve nayê qebûlkirin di wan çaxan de. Ew kes dibêjin ev herf wan ji dînê wan dûr dixe û heke ew dev ji herfên erebî berdin ew ji îslamê dûr dikevin. Lê belê baweriya Şêx Evdirehmanê Garisî wiha nebû. Heta Celadet Bedirxan jê dipirse gelo herfên latînî ji aliyê şerîetê ve tê qebûlkirin an na. Bersiva wî wiha ye: "Ma çire (manî) hebit. Xwedê emr û nehyên xwe ji me re ne bi herf û şiqlan, lê bi kiseyê daye zanîn. Ji xwe şiqlên herfên

[349] Wecdî Cemîl Paşa, "Hawareq", *Hawar,* c: 1, h: 8, r. 167
[350] Celadet Alî Bedir-Xan, "Qurdeqî Qiçiq", *Hawar,* c: 1, h: 8, r. 168
[351] Celadet Alî Bedir-Xan, "Qurdeqî Qiçiq", *Hawar,* c: 1, h: 8, r. 168

kurana pêşîn ne ji şiqlên îrû bûn. Ji lewra mîrê min, te qo xwendiye û dinya dîtiye, seh biqe û ji me re herfinen welê bibijêre qo miletê me zûqa hînî xwendinê bibit. Fetwa bi min re ye."[352] Ev bersiv hişmendiya Şêx Evdirehman radixe pêş û nîşanî me dide ku ew wek şêx û melayên hevçaxê xwe nafikire. Her wiha Celadet Bedirxan pesnê Şêx Evdirehman dide, behsa jîrbûn û zanabûna wî dike û dibêje "piriya fekehên wî bi herfên latînî jî dizanî bûn."[353]

Meseleya xwendin û alfabeyê bi awayekî henekî jî tê vegotin di *Hawar*ê de. Pêkenoka *Ker, Gur û Rovî* ya ku di hejmara 12an de derbas dibe, behsa serpêhatiyeke van her sê ajalan dike. Gur dike rovî bixwe, lê rovî bi awayekî wî dixapîne û bi mexseda çûyîna hecê dikevin rê. Di rê de rastî kerekî tên û ew jî tevlî wan dibe. Wexta ku pir birçî dibin, biryar didin ku yê herî ciwan kîjan be ewil wî bixwin. Helbet rovî dîsa dekên xwe dike. Gava gur nêzikî ker dibe da ku nivîsa latînî ya ser sola wî bixwîne, ker pehînek li nav her du çavên wî dide. Rovî jî bi vî halê gur hem digirî û hem dikene. Wexta ker jê re dibêje "mirov ne şîna te zane, ne jî şahiya te", rovî lê vedigerîne: "Weqê tê bîra min qo gurî berê xwe da bû mala xwedê giriyên min jê re tê. Lê weqê xwendina latînî tête bîra min, qenên min tên. Malxrabo ma qengê te Hawar xwendiye qo bi herfên latînî bizanî."[354] *Hawar* ew qas ber dilê wan şîrîn e û Celadet Bedirxan ew qas dixwaze kurd bi alfabeya latînî bixwînin, ev mesele di nav pêkenokan de jî cihê xwe digire.

Yekane jina ku di *Hawar*ê de dinivîse Rewşen Bedirxan e û ew jî bang li jinên kurd dike da ku xwenda bin û zarokên xwe bigihînin. Wekî ku behs dike, di hişmendiyê de rola jin û dayîkan pir mezin e. Di nivîsa xwe de rewşa miletê xwe tîne zimên û dibêje di bin hikumê miletên din de ne. Bangî jinên kurd dike ku alîkariya mêrên xwe bikin, zarokên xwe bielimînin xwendin û nivîsandinê da ku ji nexweşiya nezaniyê xelas bibin. Li ber rewşa zarokên kurd dikeve û dibêje zarokên xelkê li dibistanên xwe bi zimanê xwe perwerde dibin, lê yên kurd bi zimanê xelkê perwerde

[352] Celadet Alî Bedir-Xan, "Şêx Evdirehmanê Garisî Çû Rehmetê", *Hawar,* c: 1, h: 11, r. 224
[353] Celadet Alî Bedir-Xan, "Şêx Evdirehmanê Garisî Çû Rehmetê", *Hawar,* c: 1, h: 11, r. 224
[354] "Qer, Gur û Rovî", *Hawar,* c: 1, h: 12, r. 248

dibin, ji ber vê daxwazekê ji jinên kurd dike ku ewil ew hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin da ku bikaribin zarokên xwe jî bielimînin.[355]

Divê li vir dîsa bê diyarkirin ku, wekî me di hevpeyvîna Rewşen Bedirxan û Mehmed Uzun de dîtibû, Rewşen Bedirxan dibêje wê tu car di *Hawar*ê de nenivîsiye, lewre kurmanciya wê bi qasî nivîsê tune bûye. Dibe ku ev fikirên Rewşen Bedirxan bin, lê belê diyar dike ku Celadet Bedirxan ev nivîsîne şûna wê. Wekî ku em dizanin Celadet Bedirxan bi gelek navan nivîsiye di kovarê de, da ku hejmara nivîskaran zêdetir xuya bibe. Lê belê çima hewce dîtiye bi navê Rewşen Bedirxan binivîse? Dibe ku ji ber bandora nêrîn û fikira jinê be. Dibe ku fikirîbe jinên ku van rêzikan bixwînin, dê bifikirin ku jin jî di vê rêyê de kedek didin, xwedî fikir in û dixwazin miletê wan bi pêş bikeve.

Celadet Bedirxan behsa zimanên mirî dike, wan jî wek mirovan zindî nîşan dide û dibêje ew jî "dizên, dijîn û dimirin". Behsa hin zimanên mirî dike ku li dû xwe tiştek nahêlin û winda dibin. Her wiha behsa hinekan jî dike ku li dû xwe berhemên mezin dihêlin û ew berhem îro jî têne xwendin. Di vî warî de zimanê latînî û ibranî dide ber hev û dibêje latînî îro jî zimanekî mirî ye. Piştre behsa serpêhatiya vejandina zimanê îbranî dike û dibêje divê miletên bindest û bêziman, an jî bêyî zimanê nivîskî divê jê îbretê bigirin. Hînbûna zimanê zikmakî wek şexsî nabîne, li gorî wî ev wezîfeyeke milî ye. Giringiyê dide zimanê ku di nav malê de tê axaftin û dibêje wexta ku mirov tê malê, çawa ku cilên xwe yên derve diguherîne û yên malê li xwe dike, divê zimanê derve jî li derve bihêle û li malê tenê bi zimanê xwe biaxive. [356]

Wekî ku em ji van hevokan dibînin, bêyî ziman neteweyek nayê avakirin. Ziman bingeha gelbûn û bipêşketinê ye. Celadet Bedirxan jî nîşan dide ku ev fikira netewebûn û bipêşketinê hêj di serdema Ehmedê Xanî de jî hebû. Her çi qas ev fikir pir kevn jî be, pêkanîna wê zehmet bû ji bo gelê kurd. Celadet Berdirxan dibêje fikira miletbûnê berî Ewrûpayê li cem Ehmedê Xanî peyda bûbû:

> Xanî di wextekî welê de rabû ko –berî niho bi sê sed û neh salan- ne li cem me, lê li Ewropayê jî xelk hêj li miliyet û li nijadê xwe hişyar ne bû bûn û zelamên ji

[355] Rewşen Bedir-Xan, "Kebanî û Mamosta", *Hawar*, c: 2, h: 27, r. 691
[356] Herokol Azîzan, "Zilamek û Zimanek", *Hawar*, c: 2, h: 40, rr. 945-946

> yek miletî hev û dû ji bo ketolîkî an protestaniyê dikuştin. Di heyameke welê de Ehmedê Xanî bîra miliyeta xwe, bîra kurdaniya xwe biri bû û ji kurdan re goti bû hon berî her tiştî kurd in, rabin ser xwe, dewleteke kurdî çêkin û bindestiya miletên din mekin.[357]

Bi van nêrînên di *Hawar*ê de em dibînin ku her rewşenbîrek di serdema xwe de hewl daye ku riya kurdan ronî bike û rê li ber wan bixe da ku xwe bi pêş ve bibin. Ji Ehmedê Xanî heta Celadet Bedirxan, her rewşenbîr li gorî xwe xebatek pîroz kiriye da ku kurd ji nezaniyê xelas bibin û her yek li ser zimanê kurdî sekiniye, lewre avabûna neteweyekê, bidestxistina hişmendiyekê, bipêşketina miletekî ancax dikare bi zimên, bi zimanekî hevpar û nivîskî pêk bê.

2.3. ARMANCA *HAWAR*Ê Û FIKIRÊN STANDARDÎZASYONÊ

Piştî damezirandina Komara Tirkiyeyê demeke dirêj weşanên kurdî hatine sekinandin. Yekemîn weşana ku piştî komarê derketiye *Hawar* e ku wek weşanên berî xwe ne li Stenbolê, lê belê li Şamê çap bûye. Xwediyê kovarê Celadet Bedirxan, tevî birayê xwe Kamiran Bedirxan û hevalên xwe xebateke li ser çand û zimanê kurdî meşandiye.

Hejmara yekemîn di 15ê Gulana 1932yan de derketiye û bi tevahî 57 hejmar çap bûye. Armanca sereke ya vê kovarê danîna hîmê alfabeya kurdî ya latînî ye, lê belê li gel herfên latînî, metnên bi herfên erebî jî hene heta hejmara 23yan. Ji hejmara 24an û pê ve nivîsên bi herfên erebî nehatine weşandin di kovarê de. Ev jî dibe ku ji bo adaptasyona gel a hemberî herfên latînî be ku di serî de bi du alfabeyan kovar hatiye weşandin. Her wiha hema hema di hemû hejmaran de nivîsên fransî hene. Hinek ji van wergerên metnên orjînal in, hinek ji wan jî nivîsên serbixwe ne ku behsa çand û zimanê kurdan dikin. Hejmara dawî ya *Hawar*ê di 15ê Tebaxa 1943yan de derketiye.

Celadet Bedirxan bi xwe behsa avabûna Hawarê dike di hejmara 27an a 1941ê de. Sê tarîxên giring nîşan dide ji bo Hawarê. Ya yekem 15 Gulan 1932 ye ku wekî em jî dizanin ev dîroka derketina hejmara ewil a Hawarê ye. Celadet Bedirxan wiha behsa vê dîrokê dike: “Tarîxa pêşîn: 15 Gulan 1932. Di vê tarîxê de gazî û

[357] Herekol Azîzan, “Klasîkên Me”, *Hawar*, c: 2, h: 33, rr. 813-814

hawara Kurdan ji dil û devê wan ketine nav xêz û xêzikên çend rûpelan û kovareke kurdî anîne pê. Ji Kurdan re Hawar, Hawareke nû, Hawara zanîn û danzanînê za."[358]

Alfabeya xwe dişibîne alaya serxwebûnê û dibêje roja ku *Hawar* derket rojeke tarîxî ye û kurd bûn xwediyê alfabeya xwe. Her wiha serbilind e ku kurmanc pê hesiyane û bêyî dijwarî bi alfabeya xwe dinivîsin û dixwînin. Celadet Bedirxan diyar dike ku di 18ê Tebaxa 1935an de hejmara bîst û şeşan belav bûye û piştre sekiniye. Lê belê bi alfabeya heyî çend pirtûk jî çap bûne di vê navberê de.

Her wiha sêyemîn dîroka giring a ji bo Hawarê jî wek "Nîsana sala hezar û neh sed û çel û yek" nîşan dide.[359] Bi vî awayî em dibînin ku *Hawar* bi awayekî birêkûpêk derneketiye, carinan mecbûr maye ku bisekine. Ji xeynî vê, Celadet Bedirxan di yeksaliya kovarê de behsa weşandina kovarê jî dike ka ji bo çend rojan carekê biryar dane. Di serî de biryar dane ku deh roj carekê kovara xwe biweşînin, lê ji ber ku newêrîne, ew kirine pazdehroj carekê. Lê piştre jî biryar dane ku bila her hefteyê carekê derkeve. Biryara wan neçûye serî û serê pazdeh rojan carekê jî derneketiye, lê hejdeh rojan carekê derketiye.[360]

Esas *Hawar* bi hevokên xwe yên ewil armanca xwe wiha diyar dike:

> Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e. Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vediqe. Her qesê qo xwe nas diqe; diqare xwe bide nas qirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nas qirin. Lewma qo zman şertê heyînê a pêşîn e. Hawar jû pêve bi her tiştê qo qurdanî û qurdîtî pê bendewar e, dê mijûl bibe. Tınê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê. Hawarê siyaset ji civatên welatî re hiştiye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, hiner û sinhetê de dê bixebitin.[361]

Bi van hevokan tenê jî mirov dibîne ku ev kovar ber bi ziman û xwenasinê ve gavekî mezin diavêje. Her wiha behsa giringiya zimên dike û vê yekê jî bi *xwe naskirin* û *xwe dan naskirin*ê ve girê dide ku ev jî hişmendiyeke mezin e û dixwaze gel bi zimên xwe biparêze û *şertê heyînê ê pêşîn* di destê xwe de bigire.

---

[358] Xwediyê Hawarê, "Sê Tarîxên Hawarê", *Hawar*, c: 2, h: 26, r. 689
[359] Xwediyê Hawarê, "Sê Tarîxên Hawarê", *Hawar*, c: 2, h: 26, r. 689
[360] Nivîsanoqa Hawarê, "Heyîneqe Yeqsalî", *Hawar*, c: 1, h: 20, r. 404
[361] "Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê", c: 1, h: 1, r. 23

Celadet Bedirxan her carê şîretan li xortan dike ku xwe binasin. Di nivîseke xwe ya bi navê *Xwe Binas* de bangî xortên kurd dike û dibêje bi saya wan, bi heyîna wan hebûna milet çêdibe. Armanca *Hawar*ê jî wiha dide zanîn: "Ev kitêboka ha ji bona vê yekê hatiye nivîsandin. Belê armanca wê ev e: Te ji te re dane naskirin." Derdê Celadet Bedirxan ew e ku bila her kes bi xwe bihese, lewre heta ku yek bi xwe nehese, xwe nede nasîn, di nav miletan de cihê wî tune ye.[362]

Ji xeynî şîretan, gazindan jî ji kurdên ku bi zimanê xwe nizanin dike û dibêje ji bo zimanekî biyanî pir dixebitin, lê ji bo kurdî –ya ku dikarin pir zû bielimin- naxebitin. Her wiha heyfa xwe bi wan însanan tîne ku bi zimanê biyanî dikarin bixwînin û binivîsin, lê bi kurdî nizanin. Ji ber vê jî dibêje:

> Malxirabino! Ma we ewçend wext nîne, hon ko ji bo hînbûna zmanên biyaniyan bi salan ve xebitîne û îro jî dixebitin, ji bona ko bikarin "fînfoneke" derewîn bi lêv bikin. Kuro eyb e, şerm e, fehit e. An hînî zmanê xwe bibin, an mebêjin em Kurd in. Bê zman Kurdîtî ji we re ne tu rûmet e, ji me re rûreşîke giran e.[363]

Her wekî din, Celadet Bedirxan *Hawar*ê wek dibistanekê dibîne. Hê ji serî ve stûnekê vekiriye da ku xwendevan tê de binivîsin û xwe bigihînin. Hêviya Celadet Bedirxan ew bû ku, çawa kovar derkeve bila nivîs bibarin ser serê wan de, lê belê wisa nebûye, lewre hejmara yên dinivîsin pir kêm e. Ji ber vê, endamên kovarê biryar daye ku bila her cure nivîs tê de bêne weşandin da ku xelk hînî xwendin û nivîsandinê bibe û bi vî awayî çend nivîsevan jî gihane. Bi vî awayî *Hawar*ê dişibîne zeviyekê ku bila her tov tê de bêne reşandin.[364]

Dr. Kamiran Alî Bedirxan jî behsa giringiya zimên û zimanên mirî dike. Piştî ku behsa qanûna dinyayê dike, pê re girêdayî behsa zimanan jî dike û *zimanên mirî* wiha pênase dike:

> Zman jî weq her tişt li hev dixin, nekeba wan nîne, di şerî de ne. Ji ber qo her zman dil diqe mezintir bibe hawîdorên xwe veqe, biqeve lêvên nû, serên nû. Ev yeq. Jû pêve zman dixwazin, zmanên din biqujin û biqevin şûna wan. Dîroqa

[362] Celadet Alî Bedirxan, "Xwe Binas…", *Hawar*, c: 1, h: 18, beşa latînîzekirî, r. 551
[363] Xwediyê Hawarê, "Sê Tarîxên Hawarê", *Hawar,* c: 2, h: 27, r. 688
[364] Hawar, "Dersxane", *Hawar,* c: 1, h: 17, beşa latînîzekirî, r. 545

dinê ji me re dide zanîn qo heta niho geleq zmanên dinê hatine quştin. Ji wan zmanan re "Zmanên mirî" dibêjin.[365]

Her wiha dibêje zimanê kurdî neketiyê vê xeterê lê belê divê kurd lê miqate bin. Pirseke wiha dike der barê zimên de ka çima kurd xwe davêjin bin hikumê zimanên biyaniyan: "Ma zmanê me ne spehî ye? Ma qurd xwendin û nivîsandinê nizanin? Ma ji bo her tiştî nav û pirseke kurdî nîne? Çawan nîne!!.. Belê heye. Lê belê, qurd û zmanê me di hevxistina zmanan de me hinek qêm qirye."[366] Ji bo vejandina zimên şîretan jî dike û dibêje ji bo vejandina zimên divê kurd hemû wexta ku diaxivin an jî dinivîsin bila peyvên biyanî tevlî kurdî nekin.[367] Kamiran Bedirxan der barê naskirina zimên de jî wiha dibêje: "Zmanê me geleq qevn e, zmaneqî dewlemend, spehî û freh e. Lê em zmanê xwe rind nizanin. Me ew hêj nas ne qir. Berî her tiştî divêt em hînê zmanê xwe bibin da qo biqarin wî nas biqin û bidin nas qirin."[368]

Xaleke giring jî ew e ku eleqeya vê kovarê bi siyasetê re tune ye, tenê tê nîşandan ku ev kovar dê bi "zanîn, hiner û sinhet" re mijûl bibe. Kovarên berî *Hawar*ê her çi qas behsa ziman û giringiya wî bikin jî, bivê nevê aliyekî wan li ser siyasetê bû. Polîtîkayên ku li ser zimên dihatin meşandin, qedexeya ziman û weşanan ne mimkin e ku mirov ji siyasetê dûr bixe. Lê dîsa jî, di gel ku di van rêzikan de tê dîtin ku eleqeya vê kovarê bi siyasetê re tune ye, ev ziman tenê jî siyaset e.

Her wiha der barê naveroka kovarê de, di rûpela ewil de tê nîşandan ku alfabeya kurdî dê bê belavkirin û di nav kurdan de bê hînkirin û çapkirin. Berî *Hawar*ê jî ev daxwaz hebû di nav rewşenbîrên kurdan de. Çi herfên erebî, çi yên latînî be ev nîqaş di kovaran de cihê xwe digirt. Heta wek me berê jî behs kir, çend ceribandin jî hatibûn kirin li ser vê mijarê û dawiya dawî Celadet Bedirxan ev yek bi awayekî pir û pak pêk anî û îro jî bikaranîna me ya alfabeya wî nîşaneya serkeftina wî ya mezin e.

---

[365] Dr. Kamiran Alî Bedirxan, "Di Dora Hevxistina Zmanan de", *Hawar,* c: 1, h: 3, r. 63
[366] Dr. Kamiran Alî Bedirxan, "Di Dora Hevxistina Zmanan de", *Hawar,* c: 1, h: 3, r. 64
[367] Dr. Kamiran Alî Bedirxan, "Di Dora Hevxistina Zmanan de", *Hawar,* c: 1, h: 3, r. 64
[368] Dr. Kamiran Alî Bedirxan, "Di Dora Hevxistina Zmanan de", *Hawar,* c: 1, h: 3, r. 65

Mesele û giringiya alfabeyê ji aliyê Dr. G. Michaelian ve jî hatiye vegotin di beşa fransî de ku hewldana qebûlkirina alfabeya latînî wek gavekî mezin dibîne, her wiha difikire ku ji ber hêsankirina alfabeyê, nivîs dê zûtir belav bibe di nav gel de. Vê tevgerê wek ronesansa ziman û edebiyata kurdî dibîne û dibêje hemdemên wan vê alfabeyê qebûl nekin jî, nifşa piştî wan dê minetdar bin ji bo vê bipêşketinê.[369]

Celadet Bedirxan li ser berhevkirina çîrok û çîrçîrokan jî disekine ku dîsa me ev yek di rêzikên Xelîl Xeyalî de dîtibû ku di *Rojî Kurd* de anîbû zimên. Berhevkarî jiyandina çandê ye bi awayekî nivîskî. Berhemên devkî her çi qas demeke dirêj bimînin jî, bivê nevê demek bi şûn de an deforme dibin an jî winda dibin. Celadet Bedirxan jî wek rewşenbîrên berî xwe balê dikişîne ser giringiya vî tiştî.

Ji xeynî alfabe û berhevkariyê, ferheng jî di standardîzasyona zimanekî de xwedî cihekî pir giring e. *Hawar* ji hejmara ewil ve guh dide vê giringiyê û di dawiya piraniya hejmaran de ferhengokeke kurdî-kurdî diweşîne da ku xwendevan hem ji naverokê fam bike, hem jî ev peyv di axaftinê de xerîb nemînin. *Hawar* bi van naverokên sereke ji aliyekî ve rê daye ku edebiyata kurdî bi pêş bikeve, ji aliyekî ve jî bi saya vê kovarê der barê kurdolojiyê de xebat û lêkolînên cur bi cur derketine.[370]

Celadet Bedirxan ji bo hînbûna nivîsandin û xwendineke xweş rêzimanekê jî belav kiriye di *Hawar*ê de. Vê xebatê jî di kurmanciya nivîskî de wek gavekî nû dibîne. Her wiha hîmê zimên jî li ser sê hêmanên bingehîn nîşan dide: *alfabe, rêziman* û *ferheng*. Bi vî awayî behsa rêbazên rêzimanê dike û dibêje bingeha rêzimana xwe di sala 1929an de li Hesîçê daniye. Rêzimanekê çêkiriye ji bo dibistanê lê ji ber şer çap nekiriye. Bi saya *Hawar*ê û bi daxwaza xortan rêzimaneke din amade kiriye, lê ev ne rêzimaneke dibistanî ye, ev xebat li ser bingeha qaydeyên rêzimana kurmancî ye. Her wiha diyar dike ku ji bo zarokan jî rêzimanekê amade kiriye bi navê *Kitêba Sînemxanê*.[371]

Zanîna heft, heşt zimanan karê Celadet Bedirxan hêsantir dike di danîna rê û rêbazên kurmancî de. Behsa biyaniyan jî dike û dibêje ew ji wan çêtir dikare zimên bide zanîn. Ji *biyaniyan* qesta wî, wekî ku em dizanin, çend mîsyoner in ku xebat li

[369] Dr. G. Michaelian, "A Propos de la musique Kurde", Hawar, c: 1, h: 10, r. 209
[370] Rohat, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, r.193
[371] Xwediyê Hawarê, "Sê Tarîxên Hawarê", *Hawar*, c: 2, h: 27, rr. 688-689

ser rêziman û ferhengê kirine. Der barê vê mijarê de wiha dibêje: "Ez qo qurd û qurdmanczman im û zmanê xwe rind dizanim û mın ew bi heft heşt zmanên din danîye ber hev, qitqitên wî hûrhûnandine; keydeyên wî ji hev derêxistine, diqarim ji biyanîyan bêhtir û kenctir dehqera wî bidim xuya qirin û zanîn."[372]

Celadet Bedirxan dixwaze bi xwendevanên piştî xwe bide zanîn ka alfabeya wî çawa hat amadekirin û bi çi zehmetiyan derket:

> Bi şeş hejmarên Hawarê ên pêşîn me hin rûpelên elfabê belav qiri bûn. Bi wan rûpelan me hîmê Elfabêya Qurdî didanî û ji xwenda û zanayên qurdan fiqrên wan liser elfabêyê pirsîyar diqirin. Ji ber wan rûpelan sed û pêncih dest ma bûn. Min dil ne qir qo ew rûpelên ha winda bibin. Min ew dane hev û çend rûpelên din bi ser xistin, û pê qitêboqeq hate pê. Ev qitêboqa ha, bîra Elfabêya Qurdî a pêşîn e qo nifşên dawîyê lê fedqirin û pê bizanin qo pêşîyên wan di çi tuneyîyê de elfabêya pêşîn da bûn çap qirin. Ji bona pêqanîna çermê wê divîya bû qo çend rûpelên din biqevin pêşiyê.[373]

Li ser vê, behsa bîranîna xwe ya bi Major Noel[374] re dike û dibêje Major Noel nivîsên kurdî bi latînî dinivîsî û pir rihetî dixwend, lê wî bi xwe zehmetî dikişand ji ber herfên erebî. Ji ber vê, hema wê çaxê biryar daye ku alfabeya kurdî li ser hîmê latînî dane û dest bi xebatan kiriye da ku hezar sal derbas bibe jî, bikaribe nivîsa xwe bixwîne.[375]

Wexta ku Celadet Bedirxan dest bi sazkirina alfabeya xwe kiriye, dîtiye ku di latînî de bîst û şeş herfên sereke hene û di kurdî de deng ji van bêhtir in. Ji ber vê gelek dengên hevedudanî jî ketine nav alfabeya Celadet Bedirxan, yên wek /ch/, /ou/ û /ai/. Xuya ye wî ji ber bandora fransî ev deng xistine nav alfabeya xwe, lewre ev herfên hevedudanî di fransî de hene û wexta têne bilêvkirin dengek tenê derdikeve ji devê mirov, wek: ş /ch/ , û /ou/, e /ai/.[376]

Ji bo ku ji vê tevliheviya herfên hevedudanî xelas bibe, Celadet Bedirxan ji yûnanî û rûsî herf anîne û li alfabeya xwe zêde kirine û alfabeya wî bûye sih û şeş

[372] "Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê", Hawar, c: 1, h:1, r. 23
[373] "Pêşgotingeq", *Hawar,* c: 1, h: 13, r. 263
[374] Celadet Bedirxan û Kamiran Bedirxan di 1919an de bi Major Noel re çûne Meletiyê.
[375] "Pêşgotingeq", *Hawar,* c: 1, h: 13, r. 263
[376] "Pêşgotingeq", *Hawar,* c: 1, h: 13, r. 263

herf. Heta bi wê alfabeyê kitêbeke alfabeyê û ferhengeke biçûk nivîsiye, lê belê ew winda bûne. Wekî ku di bîranîna xwe de diyar dike, li gel hin nivîsên wî yên din, ev alfabe û ferheng çûne Mehkema Xarpûtê di 1925an de.[377]

Celadet Bedirxan wexta li Almanyayê bûye, xebatên xwe yên li ser alfabeyê berdewam kirine. Ji ber ku ji yûnanî û rûsî jî herf girtine, îcar alfabeya wî bûye sê texlît û li ber çavê wî xweş xuya nekiriye. Ji xeynî vê du herfên zêde jî hebûne tê de. Ji ber vê biryar daye ku herfên yûnanî û rûsî jê derêxe ji bo yekrengiya alfabeyê xirab nebe û wan du herfên zêde jî jê avêtine, her wiha bilindek (kûmik) danîne ser çend herfên latînî û di şûna yên yûnanî û rûsî de bi kar anîne. Bi vî awayî sih û çar herfên yekreng pêk hatine. Her wiha ji bo ku kurdên li Tirkiyeyê bikaribin bi awayekî rihet bixwînin û binivîsin, Celadet Bedirxan hin herf guherandine û alfabeya xwe nêzikî ya tirkî saz kiriye.[378]

Helbet standardîzasyon tenê bi sererastkirina alfabeyê pêk nayê. Sererastkirin û bipêşketina zimên jî di vê pêvajoyê de ye û ev mijar di *Hawar*ê de wek nîqaşek derbas dibe. Hevindê Sorî yê ku di kovarê de bi soranî dinivîse, di hejmara 16an de behsa yek û yekîtiya zimanê kurdî dike û ev nivîs bi kurmancî jî hatiye weşandin ku dibêje bê yekîtiya zar û zimên yekîtiya qewmî pêk nayê. Mînaka Almanya û Îtalyayê dide û dibêje di van hikûmetan de heta ku ziman nebû yek û di navbera wan de zimanekî hevpar peyda nebû, yekîtiya wan neçû serî. Her wiha ji xwîneran çend pirsan dike der barê standardîzasyonê de û bersivên wan dixwaze: "1- Zmanê qurdi çawan xwerû û paq dibit? 2- Bi çî awayî zarên Qurdistanê ên cihê diqevin nîzingî hev û zareqî welê tête pê qo qurd hemî di zarên hev digehin. (zarên hev fam diqin). 3- Zmanê qurdî çawan pêş ve diçit û bi çî awayî biser diqevit?"[379]

Ev pirsên li jor di hejmara 16an de hatine kirin û di hejmara 22yan de çend bersiv hatine dayîn. Bersiva Elî Seydoyê Gewrî wiha ye:

Niho min divêt ez fiqra xwe liser yeqîtîya zmanê qurdî bidim zanîn:

[377] "Pêşgotingeq", *Hawar*, c: 1, h: 13, rr. 263-264
[378] "Pêşgotingeq", c: 1, h: 13, rr. 263-264
[379] Hevindê Sorî, "Sehitî Le Bo Yekîtiya Zimanê Kurdî", *Hawar*, c: 1, h: 16, r. 324

1- Zmanê qurdî bi bijartina pirsên qurdî, ji hemû zaran, û bi xistana wan li şûna pirsên biyanî qo qetine nav zmanê me (tirqî û erebî).

2- Berî her tîştî divêt em zareqî ji bo xwendin û nivîsandinê bibijêrin, piştre pirsên zarên din bêxin nav wî zarî.

3- Zmanê qurdî bi awayê di jêrîn pêş ve diçit û biser diqevit:

A: berhevqirina şihr û pendê di bapîr û qalan, da qo qanîyeqe edebî biqeve destê her nivîsêvanî.

B: danîna dibistanan di nav bajar, gund û eşîran de.

C: wergerandina qitêbên biyanîyan ên hêja li zarê xwe.

D: belavqirina rûjname û qovaran.

F: danîna du civatên cihê, zanistî û dînî. Ev her du civat bi hılbijartina pirsên qevnar û bi peydaqirin û hevedudanîna pirsên nuh dê mijûl bibin.[380]

Ev bersiva Elî Seydoyê Gewrî 4 modelên standardîzasyona Einar Haugen tîne bîra me ku ew jî di serî de dibêje divê zaravayek bê hilbijartin. Her wiha benda Ayê jî dikare wek *pêkanîn*a Einar Haugen bê qebûlkirin. Her wiha bendên B, C û Dyê jî wek *belavkirin*ê dikarin bên diyarkirin ku qesta Haugen bi *belavkirin*ê ew e ku bi weşan, medya û dibistanan divê zimanê ku tê standardîzekirin di nav gel de bê belavkirin. Em dibînin ku Elî Seydoyê Gewrî jî bi vekirina dibistanan, wergerandina kitêban û belavkirina rojname û kovaran dibêje ziman dikare zûtir belav bibe.

Her wiha Osman Sebrî jî bala xwîneran dikişîne ser giringiya ferhengê. Di pêşketina zimanekî de bêguman ferheng xwedî roleke pir mezin e. Osman Sebrî dibêje: “Di vê civata zanîstî de berî her tiştî ferhengeqe gewre, di pişt re qitêbên qevnar û nûjen, temamên wan liser hemû zarên qurdî bilav qirin û di piştre bi yeqîtîya zmanê qurdî mijûl bûn. Bi vî awayî heya deh salan di xwendinê de yeqîtî û di axaftinê de nîzîqayîyê hêsanî dibûnim.”[381]

[380] Elî Seydoyê Gewrî, “Sehitî Le Bo Yekîtiya Zimanê Kurdî”, *Hawar*, c: 1, h: 22, r. 447
[381] Osman Sebrî, “Sehitî Le Bo Yekîtiya Zimanê Kurdî”, *Hawar*, c: 1, h: 22, r. 448

Fikira Osman Sebrî ji ya Elî Seydoyê Gewrî û her wiha ji modela Einar Haugen cudatir e. Elî Seydoyê Gewrî û modela Einar Haugen hilbijartina zaravayekî diparêzin, lê belê Osman Sebrî li ser "hemû zarên qurdî" diaxive û dibêje "temamên wan liser hemû zarên qurdî bilav qirin û di piştre yeqîtîya zmanê qurdî mijûl bûn." Lê belê mirov dikare ji hevoka Osman Sebrî vê yekê jî derxe; divê mirov ewil li ser hemû zarên kurdî bixebite û piştre ji bo yekîtiya zimên bixebite. Ev model dibe ku zehmettir be.

Ji bo pirsên jorîn bersiva Cegerxwîn jî yekîtiya zimên e û hilbijartina zaravayekê ye. Li gorî wî, wekî miletên din ên ku zaravayekê hilbijartine û yên din kuştine, divê kurd jî wisa bikin, lê dibêje ya ku dê bê hilbijartin divê ya herî sivik, bilind û şîrîn be û ya ku piraniya kurdan pê diaxivin. Her wiha li gorî fikira Cegerxwîn, heke di nav zaravaya hilbijartî de kêmasiyekê hebe, mirov dikarin ji yên kuştî hilbijêre.[382]

Lacê Henê dibêje kurd yekziman, yeknijad û yekxwîn in, lê belê ji ber lihevnehatina zarava û şêweyên wan, nikarin hev nas bikin û xwe bidin naskirin. Ji ber vê, ew jî ji bo pirsên li jor, bersiva yekîtiya nivîsê dide û behsa giringiya wê dike. Her wiha li gorî wî zimanekî wisa peyda nebûye ku hemû kurd –lor, kelhor, bextiyarî, zaza, hewraman, jor û jêr, rojhilat û rojava- bikaribin pê binivîsin û bixwînin, ji ber vê paqijî û safîkirina zimên zehmet e. Lacê Henê pêşniyaz dike ku bila her nivîskar û zana li ser zaravayê xwe bixebite û pir û pak bike. Piştre hemû zaravayan têkel bike. Her wiha li ser rastnivîsê jî disekine û dibêje ji bo ku mirov bikaribe ji hev fam bike, nivîs divê bi awayekî têkûz bê nivîsîn.[383]

Her wiha nivîskarekî bi navê Pîrot, bi elfabeya erebî û zaravaya soranî ji *Hawar*ê re nivîsekê dişîne bi navê *Eksî Sedayî Hawar* ku me ev nivîs ji beşa latînîzekirî ya *Hawar*ê girt. Di vê nivîsê de pesnê alfabeya latînî dide û dibêje Tewfîq Wehbî jî alfabeyeke latînî amade kiriye û xelkê Iraqê fêrî van herfan bûne. Her wiha yekîtiya alfabeyê diparêze û ji Celadet Bedirxan dipirse ka gelo ne mimkin e li gel Tewfîq Wehbî alfabeyek çêkira û alfabeyeke yekreng çêbûya ji bo kurdî. Ji xeynî

[382] Cegerxwîn, "Sehîtî Le Bo Yekîtiya Zimanê Kurdî", *Hawar*, c: 1, h: 23, beşa latînîzekirî, r. 608
[383] Lacê Henê, "Sehîtî Le Bo Yekîtiya Zimanê Kurdî" *Hawar,* c: 1, h: 23, beşa latînîzekirî, rr. 608-610

yekrengiya alfabeyê, Pîrot yekîtiya zaravayan jî diparêze û hêvîdar e ku *Hawar* vî tiştî pêk bîne.[384]

Li ser vê yekê Celadet Bedirxan bi navê Xweyiyê Hawarê bersivek ji Pîrot re dide, di heman hejmarê de. Fikira yekrengî ya Pîrot diparêze û dibêje "di yekîtiya zimên de gava pêşîn jî yekîtiya herfan e." Ji bo vê jî, dibêje zana û xwendewarên vî miletî divê di hemû zaravayan de heman alfabeyê bi kar bînin. Lê belê Celadet Bedirxan li ser yekîtiya zaravayan tiştek nabêje. Her wiha behsa têkiliya xwe û Tewfîq Wehbî dike û dibêje haya wî jê hebû ku Wehbî alfabeyeke latînî amade kiriye. Heta rojekê li Şamê hev dîtine û alfabeyên xwe dane ber hev, hin ferq di navbera wan de hebûne û biryar dane ku alfabeyên xwe bikin yek, lê belê ji ber ku Tewfîq Wehbî hêj li ser dixebitî, dê ji bo yekkirinê piştre bixebitîna. Piştî ku Tewfîq Wehbî vegeriyaye Iraqê, Celadet Bedirxan jê re name şandine, lê wî bersiv nedayê, ji ber ku nameyên Bedirxan negihîştine destê wî ji ber bûyerên wê serdemê. Her wiha Celadet Bedirxan diyar dike ku derketina *Hawar*ê ji ber vê dereng maye. Çar mehan li benda bersivê maye, lê piştre nekariye li bendê bimîne û kovara xwe weşandiye.[385]

Xebata Tewfîq Wehbî di nivîseke Pierre Rondot de cih digire. Pierre Rondot di xebata xwe de li ser her sê alfabeyên latînî sekiniye: ya Iraq, Sûriye û Yekîtiya Sovyetê. Di ya Iraqê de behsa xebata Tewfîq Wehbî dike û dibêje di 1929an de bi herfên erebî alfabeyek amade kiriye. Rondot di nav tabloyekê de vê alfabeyê nîşan dide û tiştê balkêş ew e ku tê de herfa /ü/yê jî heye. Vê herfê bi erebî nîşan daye û Rondot beranberî wê gotiye "/ü/ya almanî". Di 1930an de M. C. J. Edmons li ser xebata Tewfîq Wehbî sekiniye û ew xebat bi herfên latînî amade kiriye û di dawiya 1931ê de weşandiye. Piştre bi hev re vê xebata dawî sererast kirine û sivik kirine. Çend weşan derketine bi vê alfabeya dawî ji 1932yan û pê ve, piştre Tewfîq Wehbî di 1933yan de xebata xwe ya ku bi hûrgilî li ser sekiniye, weşandiye û M. C. J. Edmonds jî di heman salê de şîroveyên xwe li ser kirine.[386]

Rondot di vê xebata xwe de tabloya alfabeya latînî ya Tewfîq Wehbî û C. J. Edmonds a wersiyona 1932yan daye. Di vê alfabeyê de herfên bi hev ve hene, wekî

[384] Pîrot, "Eksî Sedayî Hawar", *Hawar*, c: 1, h: 10, beşa latînîzekirî, rr. 505-506
[385] Xweyiyê Hawarê, "Li Ser Yekîtiya Zimanê Kurdî", *Hawar,* c: 1, h: 10, beşa latînîzekirî, rr. 509-510
[386] Pierre Rondot, "Trois Essais de Latinisation de l'alphabet kurde: Iraq, Syrie, U.R.S.S.", r. 13

mînak: /ch/, /gb/, /rb/, /sb/, /iy/, /uw/.[387] Wekî ku em dizanin Celadet Bedirxan jî di pêvajoya alfabeya xwe de herfên bi hev ve bi kar anîbûn.

Yê ku daxwaza yekîtiya zimên dike ne tenê Pîrot e, xwendevanekî bi navê Hamid Ferec nameyeke bi soranî ji *Hawar*ê re dişîne û ji bo yekbûna zaravayan hêviyên xwe tîne zimên, da ku hemû kurd bi heman awayî ji *Hawar*ê îstifade bikin.[388] Balkêş e ku ev her du name jî ji nav kurdên soran tên û daxwaza yekîtiya zimên dikin. Her çi qas li Silêmaniyê[389] dibistan ji zû ve hatibin vekirin û xortên li wir ji zû ve hînî xwendin û nivîsandina kurdî bibin jî, vî tiştî nakin serbilindiyek û dixwazin ji *Hawar*ê jî fam bikin û bidin famkirin. Ji ber vê dixwazin yekîtiyek çêbibe.

Li ser vê yekê Celadet Bedirxan dibêje ku yekîtiya milet bi yekîtiya zimên çêdibe û mînaka Almanyayê dide ku bi zimanê ku Luther çêkiriye, yekîtiyek li wir ava bûye, ango yekbûna Almanyayê li ser yekîtiya zimanê almanî pêk hatiye. Li ser vê mînakê ji bo kurdî jî dibêje "yekbûna kurdan jî bi yekîtiya zimanê kurdî çêdibe. Yekîtiya zimanî jî bi yekîtiya herfan dest pê dike. Yanî di yekîtiya zimanî de yekîtiya herfan gava pêşîn e."[390]

Wekî ku em dizanin modela yekem a Einar Haugen *hilbijartin*a zaravayê ye, heke di nav kurdan de jî ev yek pêk bihata, dibe ku yekîtiyeke xurttir dê pêk bihata. Lê di gel daxwaza hin kesan û nîşandana giringiya wê, pêkanîna vê gelek zehmet bû. Ji ber vê Celadet Bedirxan bi sazkirina alfabeyê û danîna hîmê rêzimanê, xwestiye standardîzasyona kurmancî ava bike.

2.4. DANASÎNA ALFABEYA CELADET ALÎ BEDIRXAN

Alfabeya Celadet Bedirxan ji sih û yek herfan pêk tê. Alfabeya wî ewil bi vê rêzê hatiye dayîn û tenê bi herfên hûrdek in:

---

[387] Pierre Rondot, "Trois Essais de Latinisation de l'alphabet kurde: Iraq, Syrie, U.R.S.S.", r. 17
[388] Hamid Ferec, "Pîrozname", *Hawar*, c: 1, h: 3, beşa latînîzekirî, r. 488
[389] Hawar, "Dersxane", *Hawar,* c: 1, h: 17, beşa latînîzekirî, r. 545
[390] Celadet Alî Bedir-Xan, "Bi Hinceta Pîroznamekê", *Hawar*, c: 1, h: 3, beşa latînîzekirî, r. 489

a b c e ç d i g h x ê j î k q u l m n o p r s ş t û f v w y z[391]

Piştre rêza herfên hûrdek hatiye guhartin bi vî awayî:

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z[392]

Her çi qas di nav metnan de herfên /ẍ/ û /ḧ/ derbas bibin jî, Celadet Bedirxan ev her du herf nexistine nav alfabeyê. Lê belê Pierre Rondot wexta tabloya alfabeya Celadet Bedirxan dide, van her du herfan jî tê de nîşan dide.[393]

Li gorî ku Zana Farqînî vediguhêze, Osman Sebrî dide zanîn ku wî û Celadet Bedirxan tenê li ser alfabeyê dixebitîn û Osman Sebrî ji Celadet Bedirxan re gotiye ku çar herf kêm in: p, ç, k, t. Lê Celadet Bedirxan jê re gotiye ku ew ê p bi pyê, ç bi çyê, k bi kyê û t jî bi tyê binivîsin.[394]

Kovara *Hawar*ê di serî de alfabeyê bi awayê herfên hûrdek dide. Di hejmara 25an de ji ber daxwaza xwîneran destnivîsa alfabeyê bi herfên girdek û hûrdek diweşîne. Lê di alfabeyê de, ya bi şêweyê herfên girdek tenê 28 herf hene, /Ê/, /Î/, /Û/ jê kêm in, her çi qas di ya bi awayê hûrdek de hebin jî.[395] Lê belê di hejmara 27an de, di beşa rêzimanê de herfên hûrdek û girdek hatine nasandin û di yên girdek de ev her sê herf hene.[396]

Dengdêr û dengdar, kinbûn û dirêjbûna wan jî rave kiriye. Li gorî vê /e/, /i/, /u/ kin in û /a/, /ê/, /î/, /o/, /û/ dirêj in. Her wiha her çi qas di metnan de herfa /ḧ/ û /ẍ/yê xuya bibin jî, di alfabeyê de cih nagirin. Ev herf wek dengê erebî ne û Celadet Bedirxan ji bo ku wan ji dengê /h/ û /x/yê veqetîne du xal danîne ser wan. Celadet Bedirxan mijarê wiha rave dike: "Ji van pêve du herfên biyanî hene qo bireq ji qurdan wan dibêjin. Lewre qo ew herfên ha di eslên xwe de ne qurdî ne me ew ne

[391] "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 1, r. 25
[392] *Hawar,* c: 2, h: 25, r. 649
[393] Pierre Rondot, "Trois Essais de Latinisation de l'alphabet kurde: Iraq, Syrie, U.R.S.S.", r. 27
[394] Amed û Zîn, Welatparêzê hêja Apo (Osman Sebrî) wiha dipeyive, Weşanxane?, Parîs, 1991, r. 78-79, vgz. Zana Farqînî, "Nîqaşeke Berdewam: Alfabe", *Kovara Zend*, Havin 2012, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, rr. 21-31
[395] Hawar, c: 2, h: 25, r. 649
[396] C. A. Bedir-Xan, "Bingehên Gramêra Kurdmancî", *Hawar,* c: 2, h: 27, r. 695

êxistine nav elfabêya xwe."[397] Alfabeya nû di hejmara ewil a *Hawar*ê de bi fransî û bi herfên erebî jî hatiye ravekirin.[398]

Alfabeya kurmancî ya latînî nêzikî ya tirkî ye. Ji bo ku kurdên bakur bikaribin bi rihetî fêrî alfabeyê bibin, Celadet Bedirxan biryareke wisa daye û wiha dibêje: "Gora destûrên me ên bingehî, qo ji bona çêqirina elfabêya xwe me pêqanî û di pêşîya vê bendê de me da zanîn, divîya bû qo em bê sebebeqe zor ji elfabêya tirqan dûr meqevin."[399]

Wekî tê zanîn alfabeya tirkî di sala 1928an de dev ji herfên erebî berdaye û herfên latînî wergirtiye. Ango berî *Hawar*ê ev guherîn pêk hatiye. Di hejmara duyem a *Hawar*ê de tê nîşandan ku alfabeya kurdî li nêzikî alfabeya tirkî hatiye danîn û jê dûr neketiye. Ji xwe Celadet Bedirxan diyar dike ku dûrneketina ji alfabeya tirkî ji bo kurdên li bakur in, da ku rihettir bikaribin hînî alfabeya kurdî bibin,[400] ji lew re ji xeynî vê weşanê tu dezgeh an jî dibistan tune ye ku hînî alfabeya xwe bibin. Her wiha herfên erebî û latînî jî dide ber hev û wiha dibêje:

> Armanca elfabê seqinandina dengan li ser qaxezê bi şiqlan e, şiql bi herfan tên nîşan qirin, û herf kebalewî û bihemd in. Ji lewre nîşanqirina dengê (ج) bi (c) û yê (چ) bi (ç) û bi hevguhartin û cihguhastina wan weqhev û bêferk e. Lê bi vî awayî qurdên welatê jorîn û heçî qo elfabêya tirqî dinasin dê biqarin bê dişwarî ya qurdî hîn bibin û qomel û qitêbên me bihêsanîtî bixwînin.[401]

Di vî warî de em dibînin ku Celadet Bedirxan naxwaze ji bo herfa /ş/yê çend herfan bîne cem hev wek /ch/ya fransî û wek /sch/ya almanî an jî wek /sh/ya îngilîzî. Rasterast dixwaze bi şekilekî nîşan bide û wî şekilî jî ji tirkî digire.[402]

Behsa hêsaniya herfên latînî jî tê kirin. Li gorî Celadet Bedirxan "qurd dê biqarin elfabêya biyanîyan û biyanî ya me bi hêsanîtî fêr bibin."[403] Her wiha li gorî wî herfên serbixwe ji yên hevedudanî hêsantir in.

---

[397] "Elfabêya Qurdî", c: 1, h: 1, r. 25
[398] "L'aphabet Kurde", *Hawar,* c: 1, h: 1, r. 30
[399] Celadet Alî Bedirxan, "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 11, r. 227
[400] "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 2, r. 47
[401] "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 2, r. 47
[402] "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 6, r. 128

Celadet Bedirxan behsa rengê dengan jî kiriye di vê nivîsa xwe de ku îro jî di nav zimannas an jî kurdînivîsan de nîqaşek e. Li gorî hin kesan divê *ker* (ajal) û *ker* (yê/ya ku nabihîze) bi awayên cuda bên nivîsîn da ku tevlihevî çênebe. Ji bo çareseriyê jî hin ji wan /r/yek li dawiya *ker*ê zêde dikin û dibe *kerr* û vê peyvê ji peyva *ker* (ajal) cuda dikin. Lê belê ev cudahiya dengî ji /r/yê pêk nayê, ji rengê /k/yê pêk tê û Celadet Bedirxan vê mijarê wiha rave dike: "Belê, herfin hene qo geh zrav, geh stûr, geh ji pêşî, geh ji paşîyê tên xwendin. Lê ev ferkên ha ne ji guhêrîna cihderqa dengan, lê belê ji guhêrîna rengê dengan têne pê, û ji lewre di elfabêyê de nayin nîşan qirin. Ji ber qo elfabê tinê dengan nîşan diqe, ne rengê dengan."[404]

Celadet Bedirxan di hejmara 3yan de behsa herfên /v/ û /w/yê dike û bi zimanên tirkî, îngilîzî û erebî dide ber hev. Bilêvkirina van her du herfan di kurmancî de, dişibîne ya zimanê îngilîzî ku ev her yek cuda cuda têne bilêvkirin. Her wiha li gorî îstatîstîka ku daniye, herfa /w/yê zêdetir tê bikaranîn li gorî /v/yê.[405]

Mijareke balkêş jî meseleya /q/ û /k/yê ye di *Hawar*ê de. Wexta em dibînin Celadet Bedirxan di serî de herfên /k/ û /q/yê li şûna hev bi kar tîne, lê ji hejmara 24an pê ve ev yek sererast dibe. Bedirxan nîşan dide ku ev her du herf di erebî de hene, di tirkî de tenê /k/ heye:

> Herçend di hin pirsên erebî de qo qetine nav zmanê tirqî ji (ك) pêve (ق) hebe jî, tirq van du herfan cihê cihê bilêv naqin. (ق) a erebî gora denganîya zmanê xwe weq (ك) qe stûr dixwînin û duqan ji cihderqeqê derdixînin. Ji ber vê yeqê van her du dengan bi herfa (k) nîşan qirine û herfa (q) yeqcar ne êxistin nav elfabêya xwe.[406]

Her wiha Celadet Bedirxan ne tenê bi kurmancî, lê bi fransî jî behsa vê mijarê dike. Behsa alfabeya kurdî di beşa *Birê Frensizî* ya di hejmara 3yan de tê kirin û Celadet Bedirxan bi kûrahî li ser ferqa /q/ û /k/yê disekine. Herfa /q/yê bi dengên almanî û fransî dide ber hev. Dibêje /k/ya di zimanên latînî de bi demê re bûye /c/ lê bilêvkirina wê wek /k/ ye; wek *café, cristal*, her wiha dibêje ev peyv di almanî de

---

[403] "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 2, r. 47
[404] "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 2, r. 48
[405] Celadet Alî Bedir Xan, "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 3, rr. 65-66
[406] Celadet Alî Bedir Xan, "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 3, r. 65

wek *kaffe, kristal* têne nivîsîn. Her wiha ji bo famkirina van her du herfan, bi hin kesan peyva *krîstal*ê dide nivîsin ka gelo ew ê bi /q/ an bi /k/yê binivîsin. Bi xortên ku wî alfabe hînî wan kiriye, dide nivîsandin, ew bi /k/yê dinivîsin, yanî wek *kristal*a almanî. Lê li vir mirov meraq dike ew /k/ kîjan /k/ ye, lewre Celadet Bedirxan di gelek hejmaran de şûna /k/yê /q/ û şûna /q/yê jî /k/ dinivîse. Lê li gorî alfabeya ku hînî xortan kiriye, wan wek *kristal* nivîsiye, ango li gorî kurmanciya me ya îro nivîsîye. Heman peyvê bi kurdekî dide nivîsîn ku ew ji xeynî alfabeya erebî tu alfabeyek din nizane, lê belê zimanê erebî jî nizane. Wî heman peyv bi /ق/ nivîsiye, ango bi /q/ yê. Dîsa heman peyv bi kurdekî daye nivîsîn û ew kes bi erebî dizane û bi salan li medreseyan xwendiye. Ew kes gelek li ser sekiniye, gelek caran bi lêv kiriye û guhdarî kiriye. Piştre li gorî bilêvkirina kurdekî ku bi erebî nizane bi /ق/yê nivîsiye. Lê li gorî Celadet, ev peyv wexta bi erebî tê xwendin dengek ji qirikê derdikeve. Piştre dawiya dawî bi nivîsîna yekî ku bi erebî dizane biryar dide ku divê ev peyv bi /ك/yê /k/ bê nivîsîn. Her wiha heman peyv bi erebekî jî daye nivîsîn û wî jî wek biryara wî ya dawî, ango bi /ك/yê nivîsiye.[407]

Mirov piştî van agahiyan, bivê nevê dixwaze bipirse: Celadet Bedirxan ku van her du herfan bi zimanên ewrûpî û erebî dide ber hev, her wiha bi ceribandina peyva *krîstal*ê jî biryara /k/ya /ك/ erebî dide –ku ev wek /k/ya tirkî û kurdî tê bilêvkirin- çawa cihê /q/ û /k/yê tevlihev dike. Her wiha peyva *kurd* jî bi fransî wekî *kurd* tê nivîsîn û herfa di serî de wek /k/ tê bilêvkirin, lê Celadet Bedirxan dîsa vê peyvê bi kurmancî wek *qurd* dinivîse, her çi qas di heman metna fransî de bi kurdî *qurd* û bi fransî *kurd* dinivîse jî, mirov meraq dike, bilêvkirina wan wek hev in, lê gelo çima wek hev nanivîse. Her wiha di çîrokekê de jî hevokeke bi tirkî derbas dibe û *Kurd* dinivîse, lê di heman çîrokê de bi kurdî wek *qurd* dinivîse.[408]

Mijara /q/ û /k/yê di hejmara 6an de jî berdewam e. Celadet Bedirxan herfan yek bi yek datîne serê paragrafê di danasîna wan de. Wexta ku van her du herfan dide nasîn "Q. k –" dinivîse, ango /q/ yê girdek û /k/yê hûrdek dinivîse, lê dibe ku ev ji ber serê paragrafê ye wiha hatibe nivîsîn. Her wiha bivê nevê di vê beşê de serê

[407] Djéladet Aali Bedir Khan, "L'Alphabet Kurde", *Hawar,* c: 1, h: 3, rr. 70-71
[408] Celadet Alî Bedir-Xan, "Ber Tevna Mehfûrê", *Hawar,* c: 1, h: 4, r. 85

mirov tevlihev dibe, lewre bi dengê /q/ û /k/ya erebî dide ber hev û dibêje "(ق) a me nîzingî wê (k) yê qo di pirsa (kristal) de têt dîtin û frensiz (cristal) dinivîsînin."[409]

Xuya ye serê Celadet Bedirxan jî tevlihev bûye di vê mijara /q/ û /k/yê de. Lewre di hejmara 7an de jî berdewam dike û heman mînaka *krîstal*ê dide. Dîsa berê jî mînaka almanî dabû û li vir mirov dixwaze bipirse: di mînakên almanî de /k/ wek fransî bi /c/yê nayê nivîsîn û rasterast wek di mînakên *Kable, Korb* û *Kaffe*yê de xuya ye, bi /k/yê tê nivîsîn[410] û bilêvkirina wê jî wek /k/ya tirkî ye. Di vê rewşê de gelo çima /q/ û /k/ li şûna hev hatine nivîsîn?

Piştî vê agahiyê mirov dipirse, wê çaxê gelo çima di *Hawar*ê de peyvên ku tê de /k/ hene wek /k/ya *kristal*ê nayên nivîsîn, lê belê şûna wê /q/ tê bikaranîn, wek qurdî, qurdmancî û hwd. Celadet Bedirxan /qu/ya fransî û /q/ya kurmancî dişibîne hev û ji xwe wiha jî dibêje: "Di van du pirsan de dengê (qu) a frensiz û (q) a qurdî weq hev in û di tu tiştî de ji yeq hev ne cuda, ne qêm, nê zêde ne."[411] Lê wexta ku mirov bilêvkirina van herduyan dinêre, dibîne ku /qu/ya fransî wek /k/ û /q/ya kurmancî jî wek /q/ tê bilevkirin. Wek şekil dişibin hev ev her du herf û dibe ku Celadet Bedirxan ji ber vê, dengê wan jî wek hev dîtiye û ji bo /q/ya kurmancî jî /k/ bi kar aniye.

Ev rewşa /q/ û /k/yê heta hejmara 23yan wiha berdewam e, ji hejmara 24an û pê ve /q/ û /k/ cih diguherin û di forma îro de têne bikaranîn. Sedema vê guherînê nehatiye diyarkirin, tenê di serê hejmara 24an de agahiyeke wiha heye: "K-Q Di elfabêya me de ev du herf bi hev guhêrîne: 'k' ketiye şûna 'q'ê, û 'q' ketiye şûna 'k'ê."[412]

Her wiha danasîna herfan berdewam dike û ferqa /u/ û /û/yê derdixe pêş û wiha dibêje Celadet Bedirxan: "Me goti bû qo (u) ne qina (û) ye. Ji ber qo di denganîya qurdî de dengeqî dengdêrî carinan qin û carinan drêj nabit. Herçend ji bona guhên nehînbûyî di cara pêşîn de weq nizingî hev xuya bibin jî di rastîyê de ji

[409] "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 6, r. 128
[410] Celadet Alî Bedir-Xan, "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 7, r. 148
[411] "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 6, r. 128
[412] Hawar, c: 2, h: 24, r. 629

hev cuda ne û cihderqên wan cihe ne."[413] Li gorî vê agahiyê ev her du herf ji hev cuda ne. Her wiha Celadet Bedirxan behsa fonksiyoneke din a /u/yê dike û dibêje ev herf carinan dengdêran jî bi xwe re dibe, wek mînak:

Bihurîn – borîn[414]

Celadet Bedirxan li ser /y/ û /w/yê jî radiweste û dibêje ev her du herf carinan li şûna hev têne bikaranîn. Wek mînak:

Gerihan geriyan

Dihar diyar[415]

Celadet Bedirxan wiha behsa herfa /ê/yê dike û dibêje bi dengekî hesiyaye ku nêzikî dengê erebî ye. Di serî de gotiye qey ev /a/ya kin e, lê piştre biryar daye ku ne ew e. Lewre li gorî wî di nav zimên de /a/yeke dirêj heye û kina wê nikare hebe. Piştre pê hesiyaye ku ev /e/yeke stûr e. Di serî de xwestiye vî dengî bi du xalên li ser nîşan bide, wek (pëz) û (sëd).[416]

Lê belê piştre behsa şekilê (^) jî dike û dibêje ev şekil dengên herfan diguherîne û bilind dike, ji ber wê ew şekil qebûl kiriye û navê wê *bilindek* daniye.[417] Celadet Bedirxan di hejmara 10an de jî dibêje dengê /ê/yê herî baş bi bilindekê tê nîşankirin.[418] Her wiha dibêje "Bi vî awayî ji bona dengdêrên qurdî keydeyeq hate danîn; dengdêrên bilind bibilindeq in û ên qin bêbilindeq in."[419]

Celadet Bedirxan behsa ferqa /i/ û /î/yê dike. Her wekî tê zanîn /i/ya tirkî bêxal hatiye nîşandan, lê belê ji bo ku wexta berî herfên wek /m/ û /n/yê tê nivîsîn tevlihevî çênebe û bi van herfan ve nezeliqe, Celadet Bedirxan biryar daye ku ev herf bi xal bê nivîsîn û vê meseleyê wiha rave dike:

---

[413] Celadet Alî Bedir-Xan, "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 17, r. 346
[414] Celadet Alî Bedir-Xan, "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 18, r. 365
[415] "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 5, r. 109
[416] Celadet Alî Bedir-Xan, "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 9, r. 189
[417] "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 2, r. 48
[418] Celadet Alî Bedir-Xan, "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 10, r. 206
[419] Celadet Alî Bedir-Xan, "Elfabêya Qurdî", *Hawar,* c: 1, h: 12, r. 246

> No, ji ber qo (i) qe bê nikte di nav herfên (u, n, m) û di peş û paşê hîn herfan de tevlî wan dibe û ji wan derêxistana wê diqeve dişwarîyê. Ji xwe tirq jî piştî çêqirina elfabêya xwe pê hesiyan û ji bona veketendina (i) qe bênikte ji herfên jorin –qo qetiye rex an nava wan- ser herfa qo berî (i)yê dihat işareteqê berdidan. (…) Jû pêve, herweqî heta niho xuya bû, ji lewra qo dengayîyên van du zmanan cihe ne, isûlê dengdêrên qurdî bivê nevê ji isûlê tirqan dûr qetiye.[420]

Wekî ku em dibînin gelek peyvên wek *zman, bra* yên ku bi du dengdaran dest pê dikin hene di *Hawar*ê de ku îro ev peyv wek *ziman, bira* têne nivîsîn. Bi gumana me wexta ev peyv bi herfên erebî têne nivîsîn dengdêra di navbera her du herfan de nayê nivîsîn, ji ber wê Celadet Bedirxan ev peyv wiha nivîsîne. Der barê vê mijarê de wiha dibêje: "Di her zmanê arî de pirs diqarin bi du dengdaran destpêbiqin, bi gotineqe din herweqî dengdêreq di nava pirsê, di pêşîya pirsê de jî diqare du dengdaran bidêre. Weqo: blûr, xwar, stûr, krên, standin, braştin." Her wiha behsa dîftonga /xw/yê jî dike û dibêje ku ev her du dengdar dikevin nav hev û bi hev re têne bilêvkirin. Ji bo vê yekê peyva *xweş*ê mînak dide û dibêje dengê /x/yê baş tê bihîstin, û /w/yê jî wekî ku rengê peyvê diguherîne pênase dike.[421] Lê belê /xw/ dîftong e û dengdarên wek di peyvên *zman, bra* de xuya dikin ne dîftong in. Ji ber wê bi ya me divê di heman kategoriyê de nebin. Her wiha wek me behs kir, dibe ku ji tesîra herfên erebî be peyvên wek *ziman, bira* bêyî dengdêr hatine nivîsîn.

2.4.1. Fikirên li ser alfabeyê di *Hawar*ê de

Alfabeya latînî şoreşeke mezin bû ji bo ekola *Hawar*ê. Xwendin û nivîsîna rihetî, rêya belavkirina hişmendiyê û zêdekirina hejmara kesên xwenda hêsantir dikir. Bi vê armancê Celadet Bedirxan û hevalên wî, bi rewşên îza û bi wê tunebûnê ketibûn vê rêya asê û wan dixwest bila gelê wan ji gelên din kêmtir nemînin û her bi pêş bikevin. Ji ber vê, nivîsên der barê zimên û guhastina alfabeyê ji bo Celadet Bedirxan giring bû û dixwest nêrînên xwendevan û nivîskaran ên di vî warî de biweşîne di *Hawar*ê de.

[420] Celadet Alî Bedir-Xan, "Elfabêya Qurdî", *Hawar*, c: 1, h: 11, r. 227
[421] Celadet Alî Bedir-Xan, "Elfabêya Qurdî", *Hawar*, c: 1, h: 12, r. 246

Celadet Bedirxan fikirên gel ên der barê alfabeya latînî de wiha vediguhêze di bin sernavê *Stûna Fekehan* de: "Pêqve digotin qo qurdmancî bi herfên latînî geleq kenc têt nivîsandin. Ji bin paşilên xwe pelin derdixistin û ji min re dixwendin."[422]

Nivîsên serbixwe yên hin nivîskaran jî hene di *Hawar*ê de ku behsa hişmendî û pêşveçûna kurdan dikin. Cemîlê Haco yek ji wan nivîskaran e ku nivîsa wî ya bi navê *Qurdmanc Kenc in Lê Nezan in* di hejmara 7an de cih girtiye. Di nivîsa xwe de Cemîlê Haco behsa nezaniya kurdan û cahiliya wan dike. Tiştê giring ew e ku piştî vê nivîsê Celadet Bedirxan behsa vî xortê bîst, bîst û yek salî dike û pesnê wî dide. Li gorî ku Celadet Bedirxan behs dike, ev xort bi tu zimanî xwendin û nivîsandinê nizane û Celadet Bedirxan bi alfabeya xwe ya ku li ser dixebitî, ew hînî xwendin û nivîsandinê kiriye. Her wiha dibêje di nav hefteyekê de hînî vê alfabeyê bûye.[423] Ev jî nîqaşên der barê alfabeya erebî û latînî de tîne bîra me ku hin rewşenbîran digot hînbûna alfabeya latînî ji ya erebî hêsantir e. Kesên ku hînî alfabeya erebî dibin bi mehan şûn de hîn dibin, lê ya latînî ne wisa ye, rihettir e û ev ceribandina Celadet Bedirxan jî delîlek e ji bo vê yekê.[424]

Nivîskarê bi navê Elî Seydo der barê alfabeya latînî de fikirên xwe wiha dibêje:

> Weqî niho, berî derqetina hawarê mamhosta min pîriqa min bû. Hingî min zmanê xwe bi herfên erebî dinivîsandin. Lê sibetir herçî qo min berî rûjqê nivîsandi bû, min niqari bû ez bixwînim û weqe xwe bilêv biqim. Ser vê yeqê min dev ji herfên erebî berda û ji xwe re bi herfên latînî elfabêyeq çêqir. Êdin bi elfabêya xwe min her tişt kenc dinivîsand û rast dixwend.
>
> Gava hawar derqet min elfabêya xwe û ya hawarê danî ber hev û dît qo her du elfabê geleq nîzingî hev in. Ne gereq e qo ez bibêjim, ev nîzingayî ez geleq şa û qêfxweş qirim. Par çû bûm Qurdistana jêrîn. Li Bexdayê min Tewfîk Wehbî beg dît. Ew jî bi elfabêqê mijûl dibû. Lê berî wê elfabêya hawarê derqet û me da pey.[425]

---

[422] "Stûna Fekehan", *Hawar,* c: 1, h: 1, r. 26
[423] Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan, "Qurdmanc Kenc in Lê Nezan in", *Hawar,* c: 1, h: 7, rr: 143-144
[424] Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan, "Qurdmanc Kenc in Lê Nezan in", *Hawar,* c: 1, h: 7, r: 143
[425] Elî Seydo, "Ez û Hawar", *Hawar,* c: 1, h: 9, r. 189

Kurtenivîseke Marten Hartman ji aliyê Celadet Bedirxan ve hatiye wergerandin di hejmara 19an de û di vê nivîsê de behsa alfabeya latînî jî tê kirin: "Ji xwe bê şiq e qo ji bona zmanê xwe ê rengîn û geleqî nîgardar, û ji hiqmê zmanê biyanîyan paqhilanî herfên latînî jî dê kebûl biqit." û Celadet Bedirxan jî fikirên xwe wiha dibêje: "Heqe berbînî û berbêjîyên Hartman hêj tevda ne çû bin jî serî evçend heye qo em îrû zmanê xwe ê rengîn bi herfên latînî dinivîsînin."[426]

Em dikarin rastî çend rexneyên Celadet Bedirxan bi xwe jî bên der barê alfabeyê de. Rexneyek li ser alfabeya erebî tê kirin di hejmara 27an de. Di metna bi navê *Gelawêj*ê de, behsa kovara *Gelawêj*ê tê kirin, ya ku li Bexdayê derdikeve. Alfabeya vê kovarê erebî ye û li ser vê yekê tê gotin, kovareke ji hemû kovaran tekûztir e, lê ji ber alfabeya wê bi temamî nayê xwendin û famkirin.[427] Her wiha li ser kovarê wiha hatiye nivîsîn: "Herçend zarê nîvro ji me re hinek zehmet be jî bi tîpên kurdî her zarê zmanê me xweş tête xwendin. Lê kurdî bi herfên erebî an bi tîpine din, dimîne wî mirovê ko xwe di nav cilên biyaniyan de veşartiye. Naskirina wî zehmet e. Me ew zehmet bi xwe da, lê dîsan me tiştekî hindik tê derêxist."[428]

Celadet Bedirxan behsa Refîq Hilmî û pirtûka wî ya helbestê dike û dîsa ji ber alfabeya erebî rexne dike û dibêje xwendin û famkirina wê zehmet e, mirov bi temamî nikare fam bike.[429] Wekî ku em ji van nivîs û gotinan jî dibînin ev alfabeya nû gelek giring bû ji bo Celadet Bedirxan. Wexta ku wî alfabeya xwe reforme kir, li Tirkiyê ji zû ve alfabe guherîbû. Çawa ku em ji gotinên wî fam dikin, wî digot ji xwe kurdên bakurî bivê nevê dê hînî alfabeya latînî bibin. Ji ber vê ew ê pir bi hêsanî fêrî alfabeya kurdî ya latînî bibin û dê hejmara xwendeyan zêde bibe.

---

[426] Celadet Alî Bedir-Xan, "Qurd û Qurdistan", *Hawar,* c: 1, h: 19, r. 384
[427] "Gelawêj", *Hawar,* c: 2, h: 27, r. 692
[428] "Gelawêj", *Hawar,* c: 2, h: 27, r. 692
[429] "Şihir û Edebiyata Kurdî Refîq Hilmî", *Hawar,* c: 2, h: 34, r. 839

BEŞA SÊYEM

JI ALIYÊ RASTNIVÎSANDINA KURMANCÎ VE STANDARDÎZASYONA *HAWAR* Û *RONAHÎ*YÊ

3.1. STANDARDÎZASYON DI *HAWAR*Ê DE

Kovara *Hawar*ê ya ku di 1932yan de dest bi weşanê kir, ji aliyê Celadet Alî Bedirxan ve derket. Armanca vê kovarê ew bû ku herfên latînî hînî kurdan bike û bi van herfên nû berê kurdan bide modernîzasyonê. Ev kovar berevajî fikirên Celadet Bedirxan ên ewil, bi awayekî rêkûpêk derneket. Ji ber pirsgirêkên aborî carinan dereng derdiket, heta derengmayînên bi salan jî xuya dibin di kovarê de. Bi vî awayî 57 hejmar derket û îro bi saya amadekariya Firat Cewerî em dikarin bi du cildan bigihîjin hemû hejmarên wê.

Celadet Bedirxan bi gelemperî rewşa welêt û gelê xwe, bi taybetî jî rewşa xwendebûn, pêşketin, yekbûn û modernbûna gelê xwe kiribû derd ji xwe re, ji ber vê ye ku hemû hebûna xwe, hemû heyî û tuneyiya xwe danîbû ser xebatên xwe da ku kurd jî rojên xweş bibînin. Gihîştina encameke xweş bi piranî bi xwendin û nivîsîna yekbûyî çareser dibû. Divê kurd ji hev û din fam bikirana, ne tenê di axaftinê de, di nivîsê de divê ji hev fam bikirana da ku dengê wan bigihîşta her deverê ku kurd lê hene. Bi vê armancê Celadet Bedirxan tevî hevalên xwe kovara xwe ya binavûdeng derxist. Armanca vê *Hawar*ê gihîştina hawara gel bû. Celadet Bedirxanê ku xwedî heft, heşt zimanan bû, xwest zimanekî nivîskî yê bi rêya hêsan û rêzimanekê ava bike.

Giringiya *Hawar*ê ew e ku alfabeya kurdî ya latînî cara ewil di vê weşanê de xwe da der û îro jî em wê alfabeyê bi kar tînin. Kovar heta hejmara 23yan bi herfên erebî jî derketiye û piştî vê hejmarê bi temamî bi alfabeya latînî derketiye. Di vê kovarê de ne tenê nivîsên kurmancî, her wiha kêm jî be çend nivîsên soranî û zazakî

jî hene. Nivîskarên vê kovarê ji entelîjansiya Şamê pêk tên, ji xeynî nivîskarên kurd, di kovarê de nivîskarên fransî jî hene û di beşa fransî de nivîsîne.

Hawar ne tenê kovareke edebî ye ku tê de helbest û çîrok têne dîtin, her wiha wek pirtûkeke dersê ye ku di gelek hejmaran de herfan dide nasîn û qaydeyên zimên vedibêje di bin banê rêzimanê de. Ev jî nîşan dide ku derdê Celadet Bedirxan ne tenê ew bû ku gelê kurd hînî xwendin û nivîsandinê bibin, wî dixwest bila gelê wî qaydeyên zimanê xwe jî bizane û li gorî wê binivîse. Ev xebata rêzimanî ya Celadet Bedirxan îro bingeha rêzimana me ye.

Ji xeynî van cureyan *Hawar* wek rojnameyê jî tê hesibandin. Husên Hebeş, li ser awayê rojnamegeriya *Hawar*ê disekine û cureyên rojnamegeriyê tê de lêkolîn dike. Li gorî wî di *Hawar*ê de cureyên rojnamegeriyê yên wek "nûçe, teqrîr, hevpeyvîn, cureyên tehlîlî û şîrove" hene. Wekî Husên Hebeş diyar dike, bi saya *Hawar*ê gelek peyvên nû li rojnamegeriya kurdî zêde bûye. Ji peyvên siyasetê heta yên dînî, ji yên çandî heta amûrên şer, ji rêzimanê heta edebiyatê û hwd.[430]

Her wiha, wekî rêziman û alfabeyê, ji bo rastnivîsê beşên taybet tune ne di *Hawar*ê de. Ji ber vê ji bo lêkolîna rastnivîsina *Hawar*ê, mirov dikare metnên wê ji xwe re bike bingehek. Em jî li ser van metnan kûr bûn û em ê di vê beşê de berê xwe bidin rastnivîsîna zimanê *Hawar*ê. Wekî ku me got *Hawar* bi alfabeya latînî dest bi weşanê kir û rê û rêbazên ku tê de hatine nivîsîn, ji bo qaydeya kurmancî pêngavên ewil bûn. Ji ber vê ji hejmarên ewil ber bi yên dawî ve em dikarin rastî guherînan bên, ev jî nîşan dide ku *Hawar* ji destpêkê heta dawiyê ber bi kemilînê ve çûye.

Em ê di vê beşê de cih bidin *Ronahî*yê jî ji bo ku em bikaribin ferqa pêşketina zimanê nivîskî bibînin. *Ronahî* vê kemilînê aşkeratir dike li ber me, lewre li gorî lêkolîna me em dibînin ku ji aliyê rastnivîsê ve di navbera hejmara ewil a *Hawar*ê û *Ronahî*yê de gelek cudahî hene. Piştî lêkolîna *Hawar*ê em ê van her du kovaran jî bidin ber hev.

Armanca vê xebatê neqandina rêbazên rastnivîsê ye ji nav metnên *Hawar*ê. Em dixwazin tesbît bikin ka Celadet Bedirxan di nivîsîna lêkeran, hejmaran, navên

[430] Husên Hebeş, *Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de,* Çapa Înternetê, April 2022, rr. 166-174

demsal, roj, meh, bêjeyên erdnîgarî, dînî û hwd. de kîjan awa tercîh kiriye, gelo di awayê nivîsîna van peyvan de maye di bin bandora kîjan zimanî de, an jî tercîheke serbixwe kiriye? Em ê di vê beşê de li ser van mijaran bisekinin û mînakan rave bikin.

Divê em diyar bikin ku di vê xebatê de *Hawar* tenê ji aliyê rastnivîsînê ve hatiye lêkolînkirin. Ji aliyê fonetîkê ve her çi qas hêjayî lêkolînê be jî, ji ber ku xebateke serbixwe û berfireh e û her wiha ji ber sînor û çarçoveya xebatê, em ê ji aliyê fonetîkê ve li *Hawar*ê nenêrin.

3.1.1. Lêker

Lêkerên ku heta niha di nav sê kategoriyan de hatine dabeşkirin, li gorî Mehmet Gemsiz ku em wî wek Zana Farqînî nas dikin, xwedî çar kategoriyan e: Lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, lêkerên hevedudanî û lêkerên veqetînbar.[431]

Lêkerên xwerû "ew lêkerên hîmî ne ku ji bêjeyeke tenê pêk hatine û li beşên din nayên dabeşandin."[432] Lêkerên dariştî "ew cure lêker in ku ji hêmaneke tenê çênebûne, ango ne bi tena serê xwe ne."[433] Ango li gorî ku Farqînî diyar dike lêkerên dariştî di kurmancî de bi pêşgir û paşgiran pêk tên. Lêkerên hevedudanî ji navdêr û lêkerekê an jî ji rengdêr û lêkerekê pêk tên. Her wiha ev cure lêker dikarin bi bêjeya hevedudanî jî çêbin ku ev ji navdêr û rengdêrekê, ji rengdêr û navdêrekê an jî ji navdêr û navdêrekê pêk tê.[434]

Li gorî van pênaseyan em ê lêkerên ku me di *Hawar*ê de tesbît kirine, li gorî van cure lêkeran dabeş bikin. Ji ber ku lêkerên hevedudanî bêhtir ber bi çav in, em ê bala xwe bidin vê cureyê û em ê li ser rastnivîsîna wan rawestin.

---

[431] Mehmet Gemsiz, *Binyat û Rastnivîsîna Lêkeran di Berhemên Rêzimanê yên Kurmancîya Bakur de,* Teza Masterê ya Çapnebûyî, Mêrdîn 2018, r. 71

[432] Mehmet Gemsiz, *Binyat û Rastnivîsîna Lêkeran di Berhemên Rêzimanê yên Kurmancîya Bakur de,* r. 71

[433] Mehmet Gemsiz, *Binyat û Rastnivîsîna Lêkeran di Berhemên Rêzimanê yên Kurmancîya Bakur de,* r. 73

[434] Mehmet Gemsiz, *Binyat û Rastnivîsîna Lêkeran di Berhemên Rêzimanê yên Kurmancîya Bakur de,* r. 78

3.1.1.1. Lêkerên Hevedudanî

Lêkerên hevedudanî di tevahiya *Hawar*ê de bi awayekî standard nehatine nivîsîn. Li gorî rewşa xwe (navdêrî, pasîv, dançêker) mirov dikare bibêje ku standardek çêbûye, ji xeynî hin îstisnayan. Li gorî van her sê binbeşên lêkerên hevedudanî em ê lêkeran kategorîze bikin.

3.1.1.1.1. Lêkerên Hevedudanî yên Navdêrî

Lêkerên hevedudanî yên navdêrî di *Hawar*ê de bi piranî bi hev ve hatine nivîsîn. Hin îstisna hene ku ji hev cuda hatine nivîsîn. Lêkerên ku me tesbît kirine bi piranî bi lêkera *kirin*ê yên hevedudanî pêk hatine. Mînakek ji bo lêkera hevedudanî ya navdêrî ya ku ji hev cuda hatiye nivîsîn:

"*Hej qirina* welatê wî jê ra bû bû îmaneq."[435]

Mînakên lêkerên hevedudanî yên navdêrî yên ku bi hev ve hatine nivîsîn:

"*Hejkirina* welêt ji îmanê tê."[436]

hejqirina welêt,[437] *hejqirina* te,[438] *hejkirina* diya me/*hejkirina* me[439]

"Berî *belavkirina* mîratê, wesiyetdêr divê jê deynê mîrathiştî bide û wesiyetên wê bîne cih."[440]

"Berî û piştî *belavqirina* elfabêyê min fiqrên geleq qesan pirsîn."[441]

"Zarawa, di nav yeq zarî de awayên gotinê û *bilêvqirinê*."[442]

Ji van mînakan em dikarin pê derxin ku Celadet Bedirxan di lêkerên hevedudanî yên navdêrî de yên ku bi bi lêkera *kirin*ê hatine çêkirin, rastnivîsîna bi

[435] *Hawar*, c: 1, h: 3, r. 67
[436] *Hawar*, c: 2, h: 47, r. 1049
[437] *Hawar*, c: 1, h: 9, r. 183
[438] *Hawar*, c: 1, h: 11, r. 225
[439] *Hawar*, c: 2, h: 32, r. 796
[440] *Hawar*, c: 2, h: 53, r. 1107
[441] *Hawar*, c: 1, h: 13, r. 264
[442] *Hawar*, c: 1, h: 3, r. 67

hev ve tercîh kiriye. Lê lêkerên hevedudanî yên navdêrî yên ku ji bilî *kirin*ê hatine çêkirin jî hene û ev cuda hatine nivîsîn. Em dikarin mînaka *mayîn*ê bidin:

"Ji ber ko ev kitêb ji bo me kurdan hatiye nivîsîn, em tucar *kêm mayîna* wê naxwazin."[443]

"Destengî ewqas pêş de çû ko dewlemend ji *birçî mayînê* ditirsin."[444]

Her wiha lêkera *hezkirin*ê jî di heman hevokê de bi du awayên cuda hatiye nivîsîn:

"Ji liz, ereq, tûtin, cilên hevrîşim *hez kirin* û ne *hezkirin* ilim bi havila civatê ye."[445]

Ev jî dibe ku ji ber bandora qertafa neyîniyê be ku Celadet Bedirxan vê qertafê ji lêkerê cuda dinivîse.

3.1.1.1.2. Lêkerên Hevedudanî yên Dançêker

Lêkerên hevedudanî yên dançêker di *Hawar*ê de ji hev cuda hatine nivîsîn. Çend mînak ji bo vê:

"Nîşan ji hêleqê di nivîsandinê de bi vegera kelemê wextî *dide winda qirin*."[446]

"(…) ji xelkê re *dida nas kirin*."[447]

"Jû pê ve Siyehpûş bi vê şihirê ji me re du şairên din *dide nas kirin*: 'Mekî' û 'Şêxê Babeşîrê'."[448]

"(…) hikûmeta nû bi raya meclîsê û bi emrê Şah şer *da betal kirin*."[449]

"Her qesê qo xwe nas diqe; diqare xwe *bide nas qirin*."[450]

---

[443] *Hawar*, c: 2, h: 28, r. 709
[444] *Hawar*, c: 2, h: 29, r. 735
[445] *Hawar*, c: 2, h: 52, r. 1092
[446] *Hawar*, c: 1, h: 2, r. 48
[447] *Hawar*, c: 2, h: 50, r. 1074
[448] *Hawar*, c: 2, h. 33, r. 815
[449] *Hawar*, c: 2, h: 32, r. 798

Her çi qas lêkerên hevedudanî di rewşên navdêrî, dançêker û pasîv de an bi hev ve an jî ji hev cuda hatibin nivîsîn jî, lêkera *sehkirin*ê bi bendik (-) hatiye nivîsîn û di vê hevokê de, di rewşa dançêker de ye. Her wiha em dikarin vê bendikê di rolên din de jî bibînin ku em ê piştre behs bikin:

"Mirovên dilxwar û fitnekar dikevin pey ayetên managiran û li gora daxwazên xwe mana wan ayetan seh dikin û *didin seh-kirin* û pê dest bi fitne û fesadiyê dikin."[451]

Di heman nivîsê de, heman lêker di rewşa navdêrî û pasîv (bi awayê neyînî) de bi hev ve hatiye nivîsîn:

"Manayê hin ayetên Quranê, kifş in, *sehkirina* wan hêsanî ye û ew ayetên ha hîmên Quranê ne, hinên din managiran, mana wan zû bi zû *nayin sehkirin*."[452]

"Ji lewra xwendin û *sehkirina* wê ji bo me dişwar e."[453]

3.1.1.1.3. Lêkerên Hevedudanî yên Pasîv

Lêkerên hevedudanî yên pasîv di *Hawar*ê de ji hev cuda hatine nivîsîn. Çend mînak ji bo vê mijarê:

"(…) dayîna berdîl û mehdera yekî ji yekî re *naye qebûl kirin*."[454]

"Bi te kîjan êş berî hemiyan divêt *bête derman kirin*?"[455]

"Bireserên navdêran, li gora cisnên xwe li pêşî an li paşiya navdêran *têne zêde kirin*."[456]

"Tevdirên gerek ji bo vaporên me yên ko bi destê dijmin *têne binav kirin* û çêkirina vaporên nû."[457]

---

[450] *Hawar*, c: 1, h: 1, r. 23
[451] *Hawar*, c: 2, h: 40, r. 942
[452] *Hawar*, c: 2, h: 40, r. 942
[453] *Hawar*, c: 2, h: 34, r. 839
[454] *Hawar*, c: 2, h. 31, r.765
[455] *Hawar*, c: 2, h: 32, r. 792
[456] *Hawar*, c: 2, h: 32, r. 794

"Kurdên Tirkiyê, milyon û nîvek û du milyon *hatine nîşan dan*."[458]

Em dikarin ji bo lêkerên hevedudanî yên ku di *Hawar*ê de hatine bikaranîn van encaman derêxin:

1- Lêkera hevedudanî ya navdêrî bi hev ve hatiye nivîsîn, ji xeynî hin îstisnayan.

2- Lêkera hevedudanî ya dançêker û pasîv ji hev cuda hatiye nivîsîn, ji xeynî hin îstisnayan.

Li gorî van encaman, em dikarin bibêjin ku Celadet Bedirxan li gorî rewşa lêkerên hevedudanî standardek çêkiriye di *Hawar*ê de. Wexta ku em li bikaranîna van lêkeran a îro dinêrin, em dibînin ku bi piranî bi hev ve têne nivîsîn.[459] Lê yên ku dane şopa Celadet Bedirxan jî hene. Em dikarin li mînaka *Kurmancî* binêrin, ku ev rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ye û hejmara wê ya ewil di 1987an de derketiye. Ji hejmara 40. em çend hevokan wek mînak nîşan bidin:

"Di gel vê babeta giran li ser peyvên rojnamevanîyê û hin peyvên kêmnas jî *hat kar kirin*."[460] (Pasîv)

"(…) li Ewropayê, *domkirina* hinde salên xebatê ne karekî gengaz bû." (Navdêrî)[461]

Li gorî van her du mînakên li jor ku me ji heman metnê girtine xuya ye ku ev xebat di meseleya lêkerên hevedudanî de qaydeya Celadet Bedirxan bi kar aniye; lêkerên hevedudanî yên navdêrî bi hev ve û yên pasîv ji hev cuda nivîsîne.

---

[457] *Hawar*, c: 2, h: 46, r. 1039
[458] *Hawar*, c: 2, h: 30, r. 754
[459] Ji bo zêdetir agahiyê, bnr: Mehmet Gemsiz, *Binyat û Rastnivîsîna Lêkeran di Berhemên Rêzimanê yên Kurmancîya Bakur de,* Teza Masterê ya Çapnebûyî, Mêrdîn 2018
[460] *Kurmancî*, Rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravayê kurmancî, hejmar: 40, bihar 2007, Avesta, Stembol 2010, r. 455
[461] *Kurmancî*, Rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravayê kurmancî, hejmar: 40, r. 455

3.1.1.2. Lêkera *bûn*ê

Lêkera *bûn*ê ji ber bikaranîna Celadet Bedirxan a di berhemên xwe de, bû mijara vê xebatê. Celadet Bedirxan ev lêker bi piranî cuda nivîsiye. Her çi qas di *Hawar*ê de li ser vê bikaranînê agahiyeke serbixwe tunebe jî, di rêzimana Celadet Bedirxan û Roger Lescot de ev mijar bi taybetî hatiye lêkolînkirin. Em ê jî li gorî agahiyên vê berhema rêzimanê, li ser *Hawar*ê bisekinin.

Li Hekariyê ev lêker wek *bün* û li Botan jî wek *bîn* tê bilêvkirin. Ev jî ji *bûyîn*ê (bilêvkirina wê dibe *büyîn)* tê ku ev ji ber bandora /y/yê ya piştî /û/yê ye. Ji ber vê *bûyîn* bi demê re bûye *bîn; biwîn* û piştre jî *bûn.* Divê bê nîşandan ku *bîn* tu car di zimanê nivîskî de cih negirtiye. Melayê Cizîriyê ku ji Botan e, her dem *bûn* bi kar aniye, berevajî devoka xwe ku wek *bîn* bi lêv dikin.[462] Ev mînak jî nîşan dide ku Celadet Bedirxan girêdayî devoka xwe nemaye di pêvajoya standardîzasyona kurmancî de.

Lêkera *bûn*ê bi du awayan dikare bê kişandin, hem wek lêkera alîkar hem jî wek *bûyîn*ê.[463]

Bûn wek lêkera alîkar li gorî kirdeyê tê kişandin, wekî mînak:

Ez *im*	Em *in*
Tu *yî*	Hûn *in*
Ew *e*	Ew *in*

Bûn bi tena serê xwe li gorî dem û cînavkên kesane tê kişandin, wek mînak:

Ez *dibim*

Ez *bûm*

Ez *dibûm*[464]

---

[462] Emir Djeladet Bedir Khan, Roger Lescot, *Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)*, Librairie d'Amérique et d'Orient Adrien Maisonneuve, Paris 1970, r. 16

[463] Emir Djeladet Bedir Khan, Roger Lescot, *Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)*, r. 146

Li gorî *Grammaire Kurde (Dialecte Kurmandji)* ya Celadet Bedirxan û Roger Lescot lêkera *bûn*ê hem wek *être* (lêkera alîkar) hem jî wek *devenir* (bûyîn)a fransî tê bikaranîn.[465] Li gorî vê berhemê *bûn* wexta ku di rola *être* de be cuda hatiye nivîsîn, lê belê wexta ku di rola *devenir* de be bi hev ve tê nivîsîn.[466]

Wekî mînak:

Ez *dibûm*.[467] Di rola *devenir* de ye ango *bûyîn* e, lewre bi hev ve hatiye nivîsîn.

Bû bû zana.[468] Di vê hevokê de *bû*ya ewil *bûyîn* e ku di dema borî de hatiye kişandin, ango di rola *devenir* de ye. *Bû*ya duyem jî *bûn* e ku di dema borî de hatiye kişandin û di rola *être* de ye. Ji ber bandora rola xwe ya lêkera alîkar, ev lêker ji hev cuda hatiye nivîsîn.

Em berê xwe bidin mînakên ku di *Hawar*ê de derbas dibin. Mînakên ku *bûn* wekî *être* ango wekî lêkera alîkar hatiye bikaranîn:

"Ji milê din min kitêbeke kiçik bi navê 'Kitêba Sinemxanê' *nivîsandi bû.*"[469]

"Dinê sar û ezman tijî ewr *bû bû*."[470]

"Xulam tucaran derya *ne dîtî bû* û zehmeta keştiyê *ne kişandi bû*."[471]

Wekî ku ji hevoka sêyemîn xuya dibe, ne tenê lêkerên erênî, yên neyînî jî cuda têne nivîsîn. Ji xwe qaydeya Celadet Bedirxan e ku qertafên neyînî cuda dinivîse, ev rewş hema hema di her rûpeleke *Hawar* û *Ronahî*yê de dikare bê dîtin, her wiha em ê di vê beşê de cih bidin rastnivîsandina vê qertafê jî.

Mînakên ku *bûn* wekî *devenir* ango wekî *bûyîn* hatine bikaranîn:

---

[464] Emir Djeladet Bedir Khan, Roger Lescot, *Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)*, r. 146
[465] Emir Djeladet Bedir Khan, Roger Lescot, *Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)*, r. 146-147
[466] Emir Djeladet Bedir Khan, Roger Lescot, *Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)*, r. 146
[467] Emir Djeladet Bedir Khan, Roger Lescot, *Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)*, r. 147
[468] Emir Djeladet Bedir Khan, Roger Lescot, *Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)*, r. 210
[469] *Hawar*, c: 2, h. 27, r. 689
[470] *Hawar*, c: 2, h: 57, r. 1140
[471] *Hawar*, c: 2, h: 57, r. 1141

"Ji xwe ji bona zmanê me weqe din *ne dibû*, niqari bû bibe."[472]

"Ezman reştir, ewr her tarîtir *dibûn*, dengê bayî êdî dengê mirinê bû."[473]

Ji mînakên *Hawar*ê û ji rêzimana Celadet Bedirxan û Roger Lescot em pê derdixin ku Celadet Bedirxan lêkera *bûn*ê bi du awayan bi kar anîne. Di rewşa lêkera alîkar a dema borî de cuda nivîsiye, lê belê di rewşa *bûyîn*ê de bi hev ve nivîsiye.

3.1.2. Daçek

Daçek wek mijareke serbixwe nayê behskirin di *Hawar*ê de. Mînakên li ber destê me rasterast ji metnên kovarê hatine girtin. Wexta em lê dinêrin standardeke daçekan çênebûye. Her nivîskar li gorî xwe, an jî em dikarin bibêjin, li gorî devoka xwe daçek bi kar anîne. Em dikarin di heman rûpelê de hem "de, re" û hem jî "da, ra" bibînin. Wek mînak Celadet Bedirxan û Kamiran Bedirxan bi piranî paşdaçekên "de, re" bi kar anîne, lê mirov dikare di nivîsên Kamiran Bedirxan de yên "da, ra"yê jî bibîne, lê belê Osman Sebrî dibe ku ji ber devoka xwe be, bi piranî yên "da, ra" bi kar anîne. Ev bikaranîna devokî li aliyekî, standarda nivîskî ya daçekan jî çênebûye, ango nivîsîna cuda an jî bi hev ve. Ji bo van daçekan em dikarin çend mînakan bidin: [474]

"Ji wan *re* digot ko, li deştê, ji her yekî wan *re,* ji erdê wan deh caran bêhtir erd dê bihata dayîn."[475]

"Ji roja ko biyanî ketine welatê kurdan heya îro xelkê wî çiyayî serên xwe ji wan *ra* danenîn e."[476]

"Di navbera hemî kurdan *de* mişabeleke milî heye."[477]

"Lê îro ev eşîrên han hemî ne di cihê xwe *da* ne."[478]

---

[472] *Hawar,* c: 1, h: 20, r. 403
[473] *Hawar,* c: 1, h: 21, r. 429
[474] Ji bo ku tevlîhevî çênebe, em ê di vê binbeşê de dîpnotan bê nivîskar bidin, lewre armanca me xebata ji aliyê zimên ve ye. Em ê tenê cild, hejmar û rûpelê bidin.
[475] *Hawar,* c: 2, h: 24, r. 630
[476] *Hawar,* c: 2, h: 27, r. 692
[477] *Hawar,* c: 2, h: 24, r. 630
[478] *Hawar,* c: 2, h: 27, r. 692

Bazinedaçekên "di…de" û "li" pirî caran tevlihev dibin û li şûna hev têne bikaranîn. Daçeka "li"yê cihekî ne diyar, ango cihekî berfireh nîşan dide. Wek mînak wexta em dibêjin "Ew li dibistanê ye." Em cihê ku lê ye bi aşkera diyar nakin, an jî ne giring e ku em bibêjin. Ji vê hevokê tê famkirin ku ew li cihekî dibistanê ye, lê ne diyar e ka li hewşê, li korîdorê an di polê de ye. Berevajî vê, bazinedaçeka "di…de"yê cihê ku mirov lê ye bi awayekî aşkera diyar dike. Wexta ku em dibêjin "Ew di polê de ye." cihê wî/wê yê li dibistanê aşkera ye.

Samî Tan di vê mijarê de dibêje: "Bo nimûne 'li' her tim bi serê xwe tê bikaranîn, lê 'ji' û 'bi' hem bi tena serê xwe hem jî di gel paşdaçekên mîna 've', 're', 'de' tên bikaranîn û 'di' çend rewşên awarte ne tê de, her tim bi paşdaçekên mîna 'de' û 're' tê bikaranîn."[479] Ji ber vê nabe ku mirov ji bo bajar û welatan daçeka "di…de"yê bi kar bîne, lê belê di *Hawar*ê de çend mînakên wiha hene:

"Di baqurê Palowê di çiyayên birêl de"[480] Li gorî fikira me divê ev hevok wiha be: "Li bakurê Palowê, di çiyayên birêl de." Her wiha mînakeke din a heman rengî heye:

"Di baqurê Sûriyeyê de ji Cizîra mîr Şeref heta rojavayê Cerablisê bi sedan gundên qurdmancan û eşîrên qurdmanc hene qo bê diqtor in."[481] Dîsa li gorî me ev hevok divê wiha be: "Li bakurê Sûriyeyê …"

"Bi hezar salan ve di zozanên Botan de bi bayên baqurî honiq dibû û di Cizîrê de di nav germîya lat û zinarên Burca-beleq de diqeliha."[482] Di vê hevokê de dîsa ji ber rêbaza ku me li jor behs kir divê şûna daçeka "di…de"yê "li" be, ango "li zozanên Botan (…) li Cizîrê."

Li gorî heman rêbazê divê ev hevok wiha bin "Di Kurdistanê de ew meqbûl e"[483] bibe "Li Kurdistanê ew meqbûl e.", "Di Medînê de dahatiye."[484] bibe "Li Medînê dahatiye." Her wiha dîsa mînakek wiha heye:

---

[479] Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî-çapa berfirehkirî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2011, r. 190
[480] *Hawar*, c: 1, h: 23, r. 469
[481] *Hawar*, c: 1, h: 3, r. 65
[482] *Hawar*, c: 1, h: 5, r. 105
[483] *Hawar*, c: 2, h: 33, r. 813

"Pastör ji Strasbûrgê hati bû Parîsê û di sala 1867an de di Sorbonê de dersa kîmyayê digot."[485] Di vê hevokê de daçek divê bi vî awayî be: "li Sorbonê dersa kîmyayê digot."

Paşdaçekên ku bi cînavkên lihevxistî re hatine nivîsîn ev in: jû pêve, pêve, ju pêve, pêre, ji zûda, ji van pêve, jêre, bi erdêve, pêşde, şûnda, bi hevre, tevda, têde, ji tere, jê pêve, ji niho pêde. Em dikarin ji bo van daçekan çend mînakan bidin:

"*Jû pêve* jin bi çêkirina eba, kulav û kumên wan jî mijûl dibin."[486]

"*Pêqve* digotin qo qurdmancî bi herfên latînî geleq kenc têt nivîsandin."[487]

"Li gora nûçeyên paşîn elmanan Qirim, ji Sevestepolê *pêve* vegirtine û dest bi bomberdimana Sevestepolê jî kirine."[488]

"(…) *ji zûda* gehiştine rehmeta xwedê."[489]

"Zîn û Zend îrû deh sal in bi zencîra hêvînê *bi hevre* giredayî ne."[490]

Paşdaçek carinan bi cînavkên lihevxistî re carinan ji wan cuda hatine nivîsîn: pêre, pê re, pê ra; jê re, jêre; ji bo na, ji bona; jê pê ve, jê pêve. Em ê bi çend hevokan mînak bidin ji bo van daçekan:

"Necmo hate xelat qirin, em jî *pêre*."[491]

"Lê heyfa min tê go yeqî minewer *pê re* ne bû."[492]

"Heya roja gihanê *pê ra* dimeşim ez."[493]

"*Ji bo na* welatî mirin, ma çi jê spehîtir e?"[494]

---

[484] *Hawar*, c: 2, h: 40, r. 942
[485] *Hawar*, c: 2, h: 55, r. 1124
[486] *Hawar*, c: 2, h: 24, r. 630
[487] *Hawar*, c: 1, h: 1, r. 26
[488] *Hawar*, c: 2, h: 35, r. 858
[489] *Hawar*, c: 1, h: 5, r. 105
[490] *Hawar*, c: 1, h: 7, r. 144
[491] *Hawar*, c: 1, h: 11, r. 223
[492] *Hawar*, c: 1, h: 15, r. 307
[493] *Hawar*, c: 1, h: 21, r. 430

"Xwediyê mektûbê *jê pêve* digot…"[495]

"Riya rastiyê ya Quranê û mislimaniyê ye û *jê pê ve* tu rê nîne."[496]

"Lê gava ez *jêre* dibêjim, qo ez hej wê diqim, bila ji min bawer mebe."[497]

"Lê gava ez *jê re* dibêjim, qo ez hej wê diqim, bila ji min bawer mebe."[498] Ev her du hevok ji heman metnê ne û daçek bi du awayên cuda hatine nivîsîn. Di vê metnê de bi piranî "jê re" hatiye bikaranîn û carek "jêre" hatiye bikaranîn. Mirov dibêje dibe ku carek şaşî hatibe nivîsîn, lê belê em di metnên din de jî rastî awayê nivîsîna bi hev ve ya daçeka "jêre" tên. Wek mînak: "Min her rûj *jêre* çend herf nîşan diqirin û bi wan re pirsin çêdiqirin."[499] Ev jî nîşan dide ku ji aliyê nivîsîna daçekan ve standardeke tam pêk nehatiye.

Di dîrokan de daçek bêyî standardîzasyonekê hatine nivîsîn. Wek mînak:

"Ji ber ko vî şerî li yekê Îlona 1939an de dest pê kiriye li yekê Îlona 1941ê du salên xwe ên pêşîn diqedîne û pê li sala xwe a sisiyan dike."[500] Di daçekan de "li…de" bi hev re nayê bikaranîn, her wiha piştî duyemîn daçeka "li"yê "de" nehatiye bikaranîn.

Îro em di dîrokan de wek bazinedaçek "di…de"yê bi kar tînin. Ev bikaranîn di *Hawar*ê de jî heye, wek mînak:

"Min notên eşîra jêliyan di sala 1932an de li Hesîçê cem xwe nivîsandi bûn."[501] Lê belê heke hemû dîrok bi vî awayî bihatana nivîsîn, me yê bigota di vî warî de standardek çêbûye. Lê belê em rastî çend cureyan tên. Wek mînak:

"Dawî dawî *li* 28ê Îlonê nimînendeyên ûris û ingilîz û emêrikanî di Moskoyê de gihane hev."[502]

---

[494] *Hawar*, c: 1, h: 23, r. 469
[495] *Hawar*, c: 2, h: 57, r. 1146
[496] *Hawar*, c: 2, h: 31, r. 765
[497] *Hawar*, c: 1, h: 6, r. 124
[498] *Hawar*, c: 1, h: 6, r. 124
[499] *Hawar*, c: 1, h: 7, r. 144
[500] *Hawar*, c: 2, h: 33, r. 808
[501] *Hawar*, c: 2, h: 34, r. 828

"Piştî şerine xurt emêrikaniyan terka Batanê da û *li* 9ê Nîsanê kişiyane girava Korèigdorê."[503]

"*Li* 30ê Adarê Krips ew proje belav kir."[504]

"*Di* yekê Adarê *de* gihiştim."[505]

"Li gora nûçeyên radyowê *di* şeşê Nîsanê *de* elmanan drêjî Yewnanistan û Yûgoslavyayê kirine."[506]

"*Li* 27ê Sibatê *de* nîzingî Sirabayayê de (…)"[507]

Daçekên van hevokên li jor li gorî formekê nehatine nivîsin. Wekî ku em dibînin, berî mehan hem "li", hem "di" hatiye bikaranîn, her wiha hem "di…de" û hem jî "li…de" hatiye bikaranîn. Her wiha daçekên ku bi salan re hatine bi kar anîn jî hev nagirin. Di *Hawar*ê de wexta sal hatine nivîsîn bi piranî daçeka "di…de"yê hatiye bikaranîn, lê belê ji xeynî vê yên wek "li" û "li…de" jî hene:

"Lê paşê eleman derbasî Efriqayê bûn û *li* 3ê Nîsana sala 1941ê ingilîz ji erdê talyanan derêxistin."[508]

"*Li* 25ê Nîsana sala 1777an *de* noqarê di bendera Nûyorkê de dirêjî cengeştiya îngilîzî Îgel kir."[509]

"Şerê ûris *li* 22ê Hizêrana sala 1941ê *de* dest pê kiri bû."[510]

"*Li* 10ê Kanûna-paşîn sala 1941, roja ko balafirên elemanî bi ser Ilıstriyûsê de girti bûn."[511]

---

[502] *Hawar*, c: 2, h: 34, r. 838
[503] *Hawar*, c: 2, h: 42, r. 979
[504] *Hawar*, c: 2, h: 42, r. 979
[505] *Hawar*, c: 2, h: 52, r. 1099
[506] *Hawar*, c: 2, h: 27, r. 696
[507] *Hawar*, c: 2, h: 41, r. 964
[508] *Hawar*, c: 2, h: 37, r. 896
[509] *Hawar*, c: 2, h: 38, r. 909
[510] *Hawar*, c: 2, h: 38, r. 912
[511] *Hawar*, c: 2, h: 40, r. 946

3.1.3. /i/ya berî /y/yê

Heta hejmara 25an /i/ ya berî /y/yê wek /î/ hatiye nivîsîn di *Hawar*ê de. Çapa hejmara 26an ne pir zelal e, ji ber wê nivîs baş nayên xwendin. Bi qasî me dît berî /y/yê hem /i/ hem /î/ heye, wek *baweriyê, bawerîya*. Di hejmara 27an de wek /i/ hatiye nivîsîn, wek *tevayiya, rastiyê, baweriya*". Her wiha di hejmara 28an de bi awayekî aşkera ev mesele hatiye çareserkirin:

> Lê heke "y" bêî ko bi wan ve bizeliqe kete pêşiya van dengdêran, hingê (ê) û (î) herçend (i) bêne xwendin jî di nivîsandinê de bi (i) yê nayine guhartin û weke xwe dimînin. Herwekî di komekên jêrîn de (ê) û (î) ya bêjeyên (kî, kê, derê) "i" têne xwendin, yanî (ki, ki, deri) lê di nivîsandinê de di şikilên xwe ên eslî de têne şanî kirin. [Ev kî ye? Tu kurê kê yî? Ew xelkê kûderê ye?][512]

Tablo 1: Tabloya /i/ya Berî /y/yê ya Celadet Bedirxan

derî	deriyê me	vî deriyî
tilî	tilîyên min[513]	vê tiliyê
xanî	xaniyê te	van xaniyan
kursî	kursiyên wî	van kursiyan[514]

Berî vê agahiyê berî /y/yê /î/ hatiye bikaranîn û peyv wiha hatine nivîsîn:

"tevayîya, paşîya, xweyîtîya, pirsiyarîyên, xurtîya, mihaçirîyê, jiyîna, spehîtîya"[515]

Lê piştre bi /i/yê hatine nivîsîn:

"kaniyan, ronahiya, qenciya, berpirsiyar" û hwd.

---

[512] *Hawar*, c: 2, h: 28, r. 713
[513] Li vir dibe ku şaş hatibe nivîsîn, lewre mînaka piştî wê "vê tiliyê" ye.
[514] *Hawar*, c: 2, h: 28, r. 713
[515] Ji ber ku mînakên wiha hema hema di her rûpelê de hene, em ê ji bo her peyveke bi vî rengî dîpnotê nîşan nedin.

3.1.4. Navên Taybetî

Navên taybetî di *Hawar*ê de bi awayekî sîstematîk nehatine nivîsîn. Ev navên welat, netewe, erdnîgarî, bajar û zimanan di her hejmarê de, di her nivîsê de cuda hatine nivîsîn. Xebateke edîtoryal an jî xebata standardîzasyonê ji bo vê yekê nehatiye kirin. Em ê wek binbeş van navan binirxînin.

3.1.4.1. Navên Welatan

Navên welatan bi piranî bi herfa girdek hatine nivîsîn. Hin îstista hene, lê belê xuya ye wek nivîsîna welatan mezin hatiye qebûlkirin. Peyva *Kurdistan*ê ku ji ber tevliheviya /q/ û /k/yê di hejmarên berê de wek *Qurdistan* hatiye nivîsîn, carinan bi herfa girdek, carinan jî bi hûrdek dest pê kiriye. Mînak:

"Ehmedê-Xanî bi Memo-Zînê, navê xwe di dîroqa qurd û *Qurdistanê* de abadîn qiriye."[516]

"Mela yeq ji şair û zanayên mezin û navdar yê *qurdistanê* ye."[517]

"Sala 1246 a de, li *Elmanyayê* min careqe din çavê xwe li elfabêya xwe gerand."[518]

"Wer dixuye ko *Frense* ne rahet e."[519]

"Dibêjin ko elman ji frensizan hinekan jî benderên *efrîqayê* dixwaze."[520]

Navên hin welat û bajaran bi kurmancî wiha hatine nivîsîn:

"Denîmerke, Norvêj, Îtalye, Spanya, Birxaristan, bakurê Kurdistanê, kurdistan, Ecemistan, Emêrîke, polonya, Polonya, Lûksembûrg, Mecer, Romanye, Slovekye, Hindistana Holendî, Elemanye, Fransa, Frense, Gîna-nû, rohelatê Emêrîka navîn, Kôln, Köln, Emêrîka navîn, Emêrîka latîn, Pêtrêsbûrg, Petresbûrg, Petrêsbûrg, Efrîqa bakur, Yewnanistan, Îtalye, Diyarbeqr, Bêrût, Meletya, Melatya"

---

[516] *Hawar*, c: 1, h: 3, r. 68
[517] *Hawar*, c: 1, h: 6, r. 125
[518] *Hawar*, c: 1, h: 13, r. 264
[519] *Hawar*, c: 2, h: 33, r. 818
[520] *Hawar*, c: 2, h: 33, r. 818

3.1.4.2. Navên Zimanan

Navên zimanan bi tirkî bi herfên girdek têne nivîsîn. Wek mînak: "Türkçe, Almanca, Kürtçe." Lê ji bo berewardkirina zimanê *Hawar*ê û yê tirkî, divê em li rastnivîsîna tirkî ya serdema *Hawar*ê binêrin. *İmlâ Lügati*ya ku di 1928an de derketiye, yekemîn berhema rastnivîsînê ya tirkî ye.[521] Li gorî vê berhemê navên zimanan bi hûrdek têne nivîsîn:

Ya hiç türkçeleri olmıyan veya arap köklerinden… (Yên ku qet tirkiya wan tune ne an jî ji kokên erebî…)[522]

Ji bo fransî em dikarin li beşa fransî ya *Hawar*ê binêrin. Navên zimanan di beşa fransî de bi hûrdek hatine nivîsîn:

Sans doute la grammaire kurde à laquelle nous travaillons depuis plusieurs années paraitra dans un proche avenir, de même qu'un ouvrage en langue française.[523] (Bê guman rêzimana kurdî ya ku ev çend sal in em li ser dixebitin, dê demeke nêzik de derkeve, her wiha dê bi zimanê fransî jî derkeve.)

Li gorî van mînakan em dikarin bibêjin ku tirkî wexta derbasî alfabeya latinî bû, dibe ku di bin bandora fransî de mabe. Her çi qas piştre rêbazên rastnivîsînê hatibin guhertin jî, di serdema nû ya guhastina alfabeyê de dibe ku zimanê fransî wek mînak girtibe ji xwe re. Her wiha, heke em li *Hawar*ê binêrin, em dibînin ku navên zimanan di *Hawar*ê de li gorî rêbazekê nehatine nivîsîn. Ev nav bi piranî bi herfên hûrdek hatine nivîsîn wek yên fransî, lê belê carinan bi yên girdek jî dest pê kirine, ev jî nîşan dide ku standardeke tam pêk nehatiye, lê ji ber ku bi piranî bi hûrdekê hatine nivîsîn, mirov dikare bibêje ku tercîha Celadet Bedirxan di nivîsîna navên zimanan de herfên hûrdek e. Ji xwe wekî ku em ê piştre di analîza *Ronahî*yê de jî bibînin, bi piranî hûrdek hatiye bikaranîn. Bi vî awayî, mirov dikare bibêje ku kurdî jî wek tirkî, di bin bandora fransî de maye di vê mijarê de:

---

[521] Cem Demirtürk, *Türkçe Yazım Kılavuzlarının Gelişimi Üzerine Bir İnceleme*, Teza Masterê ya Çapnebûyî, Zanîngeha Pamukkaleyê, Denizli 2019, rr. 22

[522] Cem Demirtürk, *Türkçe Yazım Kılavuzlarının Gelişimi Üzerine Bir İnceleme*, rr. 22-27

[523] Djéladet Aali Bedir-Khan, *De La Grammaire Kurde: Avertissement, Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 16, Stockholm 1998, r. 327

"Berdêlqa wê di zmanê *Elmanî* de "lehre" ye."[524]

"Tevî gerîna di nav du sed û pêncî kitêbên *inglîzî, frensizî, elmanî, erebî, tirkî* û *farisî*, hîn dibînim ev war hewceyî ger û pirsineke xurt e."[525]

"Gramêra *frensizî* dibêje ko zmanê frensizî veqetandekên xwe ji pronaveke latînî girtine."[526]

Hin navên zimanan ku di *Hawar*ê de derbas dibin:

"qurdî, farisî, yûnanî, rûsî, Elmanî, elmanî, erebî, fransizî, frensizî, Fransizî, inglîzî, îngilîzî, îtalyanî, Osmanî, tirkî, polonî"

3.1.4.3. Navên Neteweyan

Navên neteweyan bi piranî bi herfên hûrdek dest pê kirine, lê belê hin îstisna jî hene:

"Di şerê 1914an de zora *elmanan* çû bû û *elman* şerpeze bû bûn."[527]

"Herçî dijminên *Elman* in wê bibin hevalên Ûris."[528]

"Di nav wan miletan de mirov diqarit *Ernewid, Ereb* û *Qurdan* bijmêrit."[529]

"Dibêjin ko *elman* ji *frensizan* hinekan jî benderên efrîqayê dixwaze."[530]

"Li gora tifaqekê, Polonye biketa şer diviya bû *Frensiz* û *Ingilîz* li paş wê rabin."[531]

Her wiha "îtalyan" û "îtalî" jî wek "talyan" û "talyanî" hatiye nivîsîn:

"Li Berlînê, elman, *talyan* û japonan tifaqek imza kir û jê re tifaqa sêbendîn gotin."[532]

---

[524] *Hawar*, c: 1, h: 2, r. 48
[525] *Hawar*, c: 2, h: 28, r. 709
[526] *Hawar*, c: 2, h: 34, r. 839
[527] *Hawar*, c: 2, h: 30, r. 751
[528] *Hawar*, c: 2, h: 30, r. 757
[529] *Hawar*, c: 1, h: 19, r. 384
[530] *Hawar*, c: 2, h: 33, r. 818
[531] *Hawar*, c: 2, h: 30, r. 752

Hin navên neteweyan ku di *Hawar*ê de derbas dibin:

"qurd, Qurd, qurmanc, tirq, irakî, ingilîz, Ingilîz, alman, elman, eleman, Frensiz, frensiz, Ernewid, Ereb, Ecem, ecem, ewistûryayî, siryanî, tirk, Ûris, talyan, japon, emêrîkanî"

Wekî ku em dibînin di *Hawar*ê de, navên welatan ji xeynî hin îstisnayan bi herfên girdek dest pê kirine. Navên neteweyan bi piranî bi herfên hûrdek dest pê kirine, lê kêm caran jî be em dikarin yên ku bi herfên girdek dest pê kirine bibînin. Lê ji ber ku bi piranî bi yên hûrdek dest pê kirine, mirov dikare bibêje ku Celadet Alî Bedirxan di rastnivîsa neteweyan de herfa hûrdek qebûl kiriye.

Ji bo nivîsîna navên neteweyan em dikarin li mînakên tirkî û fransî binêrin. Di *İmlâ Lügati* de tê dîtin ku navên neteweyan di serî de bi hûrdek hatine qebûlkirin:

...türk dili (…zimanê tirkî)

fransız ruhu (ruhê fransî)

Eski ve yeni türk kitaplarındaki...[533] (Yên di pirtûkên kevn û nû yên tirkî de)

Lê belê di fransî de rewş hinek diguhere. Wexta ku mirov behsa nişteciheki/ê dike, wê çaxê peyv bi herfa girdek dest pê dike. Wekî mînak: *Les Latins et les Grecs diffèrent de croyance et de pratique en plusieurs points.*[534] (Di navbera latîn û yûnanan de, ji aliyê bawerî û pratîkê ve gelek cudahî hene). Li vir wekî ku em dibînin netewe bi girdek hatiye nivîsîn. Lê heke netewe bi rengdêrekê tê bikaranîn wê çaxê bi hûrdek tê nivîsîn: *Le quartier latin*. (Taxa latîniyan).[535]

Wekî ku em dibînin, di zimanê fransî de rastnivîsa navên neteweyan li gorî bikaranîna awayê navdêr û rengdêr diguhere. Carinan girdek û carinan jî hûrdek hatine nivîsîn. Ji ber ku di serdema *Hawar*ê de bi van her du zimanan jî bi hûrdek hatine nivîsîn, em dikarin bibêjin ku ji aliyekî ve Celadet Bedirxan xwestiye wek wan bi herfên hûrdek binivîse, lê belê wek fransizî rêbazekê nedaniye.

---

[532] *Hawar*, c: 2, h: 30, r. 752
[533] Cem Demirtürk, *Türkçe Yazım Kılavuzlarının Gelişimi Üzerine Bir İnceleme*, r. 26
[534] "Latin" https://academie.atilf.fr/8/consulter/latin?page=1
[535] "Latin" https://academie.atilf.fr/8/consulter/latin?page=1

3.1.4.4. Navên Erdnîgarî

Navên erdnîgarî an jî navên cihên dîrokî di *Hawar*ê de bi awayekî sîstematîk nehatine nivîsîn. Di çapa 8mîn a *Ferhenga Akademiya Fransî* (1935) de navên erdnîgarî bi hûrdek hatine nivîsîn: *le mont Athos* (Çiyayê Athosê) *, le mont Blanc* (Çiyayê Spî),[536] *le lac d'Annecy* (Gola Annecyê), *le lac Léman* (Gola Lémanê).[537]

Ev standardîzasyona ku em di fransî de dibînin, di *Hawar*ê de pêk nehatiye. Navên erdnîgarî yên ku ji du bêjeyan pêk tên, bi du, sê awayên cuda hatine nivîsîn. Bi qasî ku me tespît kirine, em ê yek bi yek lê binêrin.

Navên çiyayan ên ku her du jî bi herfa girdek dest pê kirine:

"Çiyayê Şingarê, Çayê Mazî, Çiyayê Kehniyan, Çiyayê Kosiyan, Çiyayê Pehnik, Çiyeyê Reş, Çiyayê Findikê, Çiyayê Agirî, Çiyayê Cûdî, Çiya Tûresîn"

Navên çiyayan ên ku *çiya* bi herfa hûrdek û nav bi xwe bi herfa girdek hatine nivîsîn:

"çiyayê Tûrê, çiyayê Elbatê, çiyayê Fişatê, çiyayê Şingalê, çiyayê Bêli, çiyayê Cûdî"

Navên çiyayan ên ku *çiya* bi herfa girdek û nav bi xwe bi herfa hûrdek hatine nivîsîn:

"Çiyayê mizûriyan, Çiyayên jêliyan, Çiyayê reş."

Navên behran ên ku her du peyv jî bi herfên girdek dest pê kirine:

"Behra Manşê, Behra Êjê"

Navên behran ên ku her du peyv jî bi herfên hûrdek dest pê kirine:

"behra spî"

---

[536] "mont" https://academie.atilf.fr/8/consulter/mont?page=1
[537] "lac" https://academie.atilf.fr/8/consulter/lac?page=1

Navên behran ên ku peyva *behr*ê bi herfa girdek û ya din bi hûrdek hatiye nivîsîn:

“Behra hindî, Behra sor, Behra spî, Behira hindî”

Navên behran ên ku peyva *behr*ê bi herfa hûrdek û ya din bi girdek hatiye nivîsîn:

“behra Ezovê, behra Manşê, behira Qezwînê, behira Azovê, behira Etlantîkê”

Navên behran ên ku di navbera her du peyvan de bendik hatiye danîn:

“Behra-spî, Behra-bakur, Behra-sor, Behra-hindî, Behira-spî, Behira-reş, Behira-sor, Behira-hindî”

Navên av û çeman ên ku her du peyv jî bi herfên girdek hatine nivîsîn:

“Çemê Donbas, Çemê Don”

Navên av û çeman ên ku peyva ewil bi herfa hûrdek û ya din bi girdek dest pê kiriye:

“ava Diclê, çemê Donz, kenala Goherê, çemê Îrewadî, çemê Donês, çemê Don, çemê Volgê, çemê Manêç, çemê Genderê, avtenga Melayayê”

Yên din:

“Kehniya pehn, Ava-Diclê”

Navên giravan bi piranî peyva ewil bi herfa hûrdek a din bi girdek dest pê kiriye:

“girava Islan, girava Simatrayê, girava Cavayê, girava Korêîgdorê, nîvgirava Kirimê, girava Korsîkayê, girava Hawayê, girava Wêkê”

Navên deşt û zozanan bi piranî peyva ewil bi herfa hûrdek a din bi girdek dest pê kiriye:

“zozanên Botan, zozanên Sîpanê Xelatê, deştê Şor, deşta Narikê, zozanê Herekolê, zozanê Çiravê”

Navên taybetî yên ku di navbera her du peyvan de bendik hatiye danîn:

“Keleha-Şahîn, Burca-beleq, Birca-belek, Kêla-Memê, Eyn-Tirb, Pira-Bafet, Kehniya-Emo, Serê-Sinsalê, Binê-Burcan, Newala-Tîlik, Çemê-Kursî, Kehniya-Evdilcelîl, Şkefta-Dilop”[538]

Navên taybetî yên din ku bi şekilên cuda hatine nivîsîn:

“Dêriqa çayê mazî, Banîya Qanîhinarê, Asraka Berxêr, Lata Sor, girê Qirnasisê, Dêra rebênê kher, gundê Şadiyan, welatê hekariyan, Banê Azîzan, Deriyê Asê, Deriyê Gawat, Meydana Elî Axa, Pira Haçikan, Xana Kewan, qesra Şebistanê, keleha Kormasê, keleha Vidînê, taxa Romdenê, bajarê Voroskê, Şikefta Birxêrê, gola Îlmenê, gundê Xêştûrê, Dêra kevirên daçikandî, Keleha kurdan, keleha şevalyan, çola Cezîrê”

Wekî ku em li jorê dibînin navên erdnîgarî û dîrokî di *Hawar*ê de bi awayekî sîstematîk nehatine nivîsîn. Carinan wek tirkî her du peyv jî bi herfên girdek dest pê kirine, carinan wek fransî peyva ewil bi ya hûrdek û ya duyem bi girdek dest pê kiriye, carinan jî berevajî van her du zimanan, her du peyv jî bi herfa hûrdek hatine nivîsîn û carinan jî di navbera her du peyvan de bendik hatiye danîn. Ji ber vê em nikarin bibêjin rastnivîsîna navên erdnîgarî û dîrokî ya di *Hawar*ê de hatine standardîzekirin.

3.1.4.5. Nivîsîna Navên ku bi Dîn re Eleqedar in

Peyva *Xwedê* bi awayên cuda derbas dibe di *Hawar*ê de. Mînaka bi herfa girdek:

“Lo bihna dojehê ji vê dinê dibihim û ez hawara xwe ji *Xwedê* re dişînim ko laşê min tê nemîne.”[539]

---

[538] *Hawar*, c: 2, h: 25, r. 651
[539] *Hawar*, c: 2, h: 25, r. 657

Mînaka bi herfa hûrdek:

"Lê *xwedê* bi tenê kafiran dike ser riya xwar."[540]

Navê *Xwedê* wek *Xuda* jî derbas dibe, heta em dikarin di heman rûpelê de an jî di heman hevokê de rastî van her du navan jî bên:

"*Xwedê* ji anîna qiyasekê bi kelmêşekê an bi tiştekî jê mezintir şerm nake û mirovên bawermend dizanin ko ew qiyas ji aliyê *Xudayê* wan ve heq e, lê nebawermend ji xwe dipirsin: Gelo qesda *Xwedê* ji vê qiyasê çi ye?"[541]

Navên dîn û bawerî, kesên pîroz û pirtûkên pîroz di *Hawar*ê de:

"Lê tucar ne ji ava zelal qo xwedê pesna wê di *kuranê* de da û di hekê wê de (we cehelna minel maî qule şeyîn hey) me her tişt bi avê jiyandine, gotiye."[542]

"Yê ko heramiyê dike baweriya xwe bi *Quranê* ne aniye."[543]

"(…) bi *Tewrat* û *Incîla* ko ji Mûsa û Îsa re û bi kitêbên ko ji hemî pêxemberên Xwedê re dahatine (…)"[544]

"Bi tenê zanayan pê dizanîn û di kiniştan de *tewrat* bi vî zimanî dihate xwendin."[545]

"Deyne ber wan *Mishefa-reş* û nan û penîr e."[546]

"Ma hon çawan dixwazin ko cuhî bi we bawer bin?"[547]

Navê pirtûkên pîroz di van hevokên jorê de bi şekilên cuda hatine nivîsîn. Herfa ewil carinan girdek û carinan jî hûrdek e.

---

[540] *Hawar*, c: 2, h: 27, r. 686
[541] *Hawar*, c: 2, h: 27, r. 686
[542] *Hawar*, c: 1, h: 2, r. 45
[543] *Hawar*, c: 2, h: 28, r. 708
[544] *Hawar*, c: 2, h: 31, r. 766
[545] *Hawar*, c: 2, h: 40, r. 944
[546] *Hawar*, c: 2, h: 49, r. 1062
[547] *Hawar*, c: 2, h: 29, r. 726

"Heta ko tu ji *Cuhî* û *Fileyan* nebî, ew ji te dilxweş nabin. Bêje wan: Riya rastiyê ya *Quranê* û *mislimaniyê* ye û jê pê ve tu rê nîne."[548]

Di vê hevoka jor de *cuhî* û *file* bi herfên girdek û *mislimanî* bi herfa hûrdek hatiye nivîsîn. Lê belê di vê hevoka jêr de bi herfa girdek hatiye nivîsîn:

"Cuhiyan ji *Mislimanan* re got."[549]

Di vê rewşê de em dikarin bibêjin ku kesên aîdê dînekî yên wek *Cuhî*, *File*, *Misliman* bi herfên girdek û baweriya dînekî yên wek *mislimanî*, *filetî* bi herfên hûrdek hatine nivîsîn. Lê yên îstisna jî hene. Wekî mînak di hevokekê de *kurdên êzîdî* bi herfên hûrdek hatiye nivîsîn:

"Li Şingalê û ber bi nîvroyê wê ve, *kurdên êzîdî* rûdinin."[550]

Wekî ku em ji van mînakan dibînin navên dîn, bawerî, kes û pirtûkên pîroz bi awayekî standard nehatine sazkirin di *Hawar*ê de.

3.1.5. Nivîsîna Unwanan

Gelek unwanên bi kurdî û biyanî derbas dibin di *Hawar*ê de. Nivîsîna van unwanan jî wek navên din li gorî sîstemekê çênebûye. Piraniya van unwanan bi herfa hûrdek dest pê kiriye, lê belê yên bi girdek dest pê dikin jî hene. Yên ku bi hûrdek dest pê dikin ev in:

"xalid beg Bedir-xan, mîr Şeref, Evdirehman garisî, Şeroyê serxansi, Resûlê findikî, Tewfîq Wehbî beg, mîr Şerefê bidlîsî, Emîn Zekî begî, Mehmed beg, mîrza Ferîdûn, Resûl axa, Şêx Xalidê cizerî, Elî axayê bernihî, şêx Ehmed, Bedir-Xan beg, Qedrî begê Cemîl paşa, Smaîl axayê şikakî, Salihê lal, şahê Îran, Bekoyê awan, Mûsa begê kêsanî, şêx Ebdilqadirê Gêlanî, şêx Nûredînê Birîvkanî, şêx Xalidê duçeng, merêşal Çenkeyşek, genêral Wêvel, generel Romel, general Yablonskî, emîral Darlan, mister Rûzwelt, mîr Bedir-Xan, melek Ferxedîn, melek Secadîn, Mûsa pêxember, siltan Êzî, siltan şêx Adî, şah Nad, melîka Tidmirê, mele Ehmed, feqe

[548] *Hawar*, c: 2, h: 31, r. 765
[549] *Hawar*, c: 2, h: 31, r. 766
[550] *Hawar*, c: 2, h: 24, r. 630

Hesen, Mihemed begê mîrê Botan". Wekî ku em dibînin unwanên van kesan bi herfên hûrdek hatine nivîsîn.

Yên ku bi herfên girdek hatine nivîsîn ev in:

"Mîr Mihemed beg, Mîrza Sibhî, Şêx Xalidê Cizerî, Melayê Jaba, Şahê Neqşebend, Şêx Sedeqe, Merêşal Laval, Şêxê Şemsaniya"

Navên eşîr û mîrekan jî bi herfên hûrdek hatine nivîsîn:

"mîrekên mala Azîzan, eşîra Bextiyarî, qebîla Rûta, eşîra kendaliya, mala Emer, eşîra Bêzikanir,"

Lê belê "Eşîra jêliyan" berevajî mînakên li jor hatiye nivîsîn.

3.1.6. Qertafa Neyîniyê

Qertafa neyîniyê *ne* bi piranî ji lêkeran cuda hatiye nivîsîn di *Hawar*ê de. Ev qertaf di fransî de jî cuda hatiye nivîsîn di wê serdemê de:

"Il ne dit jamais la vérité."[551] (Tu car rastiyê nabêje)

Dibe ku Celadet Bedirxan ji ber fransî qertafa neyîniyê cuda nivîsîye. Ji *Hawar*ê çend mînak:

"ne maye, ne bune, ne çûye, ne êxistine, ber ne diqetin, guh ne dida, ne çûn, ne dinîvîsandin, ne ma, ne nale, ne ma ye, ne ajot, ne borî, ne diqir, ne da, ne bûwa, ne dihişt, ne ma bû, ne wêrî bû, ne bû, ne dîtin, ne dî, ne dibûn, ne dihatin, ne qetin ê, ne geriya, ne hata, ne go, ne girt, n'avêt, ne ket, ne bînim, ne dîtaya, ne hişt, ne anîne, ne peyive, na kî, me xwaze, ne lebitandin e, na bin, tu ne ye, na yînin, na yin, na bin, na bînîn, ne ke, na keve, na dim"

Yên bi hev ve hatine nivîsîn jî hene, lê belê hejmara wan ne pir zêde ye. Qertafên *ne*yê ku bi hev ve hatine nivîsîn bi piranî ne lêker, lê rengdêr in.

Qertafên neyîniyê yên ku bi bêjeyê ve hatine nivîsîn:

[551] "ne" https://academie.atilf.fr/8/consulter/NE?options=motExact&page=1

“nespehî, nehêja, nekenc”

Yên bi lêkerê ve hatine nivîsîn:

“nekin, neke, nebe, negire”

Neyîniyên ku bi *na*yê dest pê dikin û bi hev ve têne nivîsîn jî hene:

“nake, nakim, nakeve”

Her wiha gelek îfadeyên neyînî yên ku bi *me*yê dest pê dikin jî hene:

“mehîlin, me be jî, mehilin, mekin, mebêjit, mebe, memînin, mebit, meçî, meqî, mexwe, mehesin, meke, girêmede.”

Qertafa neyînî ya *me*yê heta hejmara 27an bi hev ve hatiye nivîsîn, lê piştî vê hejmarê bi piranî wek qertafa *ne*yê cuda hatiye nivîsîn: “me be, me de, me bin, me firoşin, me kin, me ke, me xwin, me westînin, me êşînin, me rin, me bêjin, me xwazin.”

Lê wexta ketiye navberê bi hev ve hatiye nivîsîn: “ramekin, rûmenin, vemeşêrin.”

Qertafa neyînî ya *ni*yê jî ji lêkeran cuda hatiye nivîsîn: “ni zanin, ni karin, ni zanin.”

3.1.7. Nivîsîna Peyvan

Wekî ku em dizanin nivîskarên *Hawar*ê ne ji herêmekê ne. Ji ber vê her nivîskarî peyvên li gorî devoka xwe bi kar aniye û wek edîtorî ev peyv nehatine standardkirin. Ji xeynî vê, standarda nivîskî ya van peyvan jî nehatiye sazkirin. Ango em dikarin bibêjin ku hin peyv bi çend awayan hatine nivîsîn. Her wiha hinek peyv hene bi du dengdaran dest pê kirine û mirov dikare bibêje ku nivîsîna van herfan a bi vî awayî ji ber bandora erebî ye, lê dibe ku ji ber bandora zimanên Ewrûpayê jî be. Lewre di zimanên hind-ewrûpî de bêjeyek dikare bi du dengdaran dest pê bike. Ev peyv wexta bi erebî têne nivîsîn di navberê de herfa dengdêr tune ye, ji ber vê jî bi vî awayî hatine latînîzekirin. Çend mînak ji bo van peyvan:

"Zman, freh, bra, hejqirn, dran, hênctê, zrav, şqestin, drêj, zravtir, şqênandin, qrêj, şkeft, jmarîn"

Peyva *ziman* ku heta hejmara 40î wek *zman* hatiye bikaranîn, kêm caran wek *ziman* hatiye bikaranîn. Çawa ku me li jor behs kir, ev dibe ku ji ber herfên erebî be wexta latîzîne bûye, herfa dengdêr nehatiye bikaranîn. Ji hejmara 40î pê ve ev peyv bûye *ziman*. Lê belê balkêş e ku di nivîsên soranî yên bi alfabeya latînî de wek *ziman* hatiye bikaranîn, berî ku di yên kurmancî de bibe *ziman*. Wek mînak:

"Leber ewe zimanî qurdî we edebiyati qurdiş wequ zimanan û edebiyatani diqey arî ye."[552]

Di metnekê de em rastî peyva *kher* tên, wekî tê zanîn di kurdî de /kh/ nayê bikaranîn, lê belê di zimanên ewrûpî de tê dîtin: "Ma kher bûne, tu deng naye ji tuwan".[553] Ev peyv di dîpnotekê de wiha hatiye aşkerakirin: "Me 'kher' yanî mirovê ko nabihîze, bi vî awayî nivîsand, da ko ji kerê heywan bête veqetanîn. Ji xwe ev 'kh' ji ya din stûrtir e."[554] Ev nîqaş îro jî berdewam e, lê çareserî wekî di herfa dawiyê de hatiye dîtin. Bi nivîsîna du /r/yan a dawiya peyvê, ferqa yekê ji ya din derdixin holê.[555] Lê belê wekî ku Celadet Bedirxan nîşan dide, di bilêvkirina wan her du peyvan de herfa ewil yanî /k/ cuda derdikeve, lê /r/ wekî xwe dimîne.

Her wiha ev rengê deng e, li gorî Celadet Bedirxan pênase dike: "Belê, herfin hene qo geh zrav, geh stûr, geh ji pêşî, geh ji paşîyê tên xwendin. Lê ev ferkên ha ne ji guhêrîna cihderqa dengan têne pê, û ji lewre di elfabêyê de nayin nîşan qirin. Ji ber qo elfabê tinê dengan nîşan diqe, ne rengê dengan."[556] Em ê nîqaşa vê ya berfirehtir di beşa çarem de bibînin.

Her wiha peyva *îro* jî di cilda yekem de gelek caran wek *îrû* hatiye nivîsîn û ev jî devoka botî ye. Lê belê di cilda duyem de hema hema nehatiye bikaranîn, şûna wê *îro* hatiye bikaranîn. Wek mînak:

---

[552] *Hawar*, c: 1, h: 5, r. 103
[553] *Hawar*, c: 2, h: 25, r. 650
[554] *Hawar*, c: 2, h: 25, r. 650
[555] Li ser vê mijarê ji bo zêdetir agahiyê bnr. Zana Farqînî, "Nîqaşeke Berdewam: Alfabe", rr. 21-31
[556] *Hawar*, c: 1, h: 2, r. 48

"*Îrû* li deşta Sirûcê bi qêmanî 200 gûndê qurmancan hene, di her gundî de bi qêmanî pence mal hene."[557]

Peyva *payîz*ê carinan wek *pehîz*, carinan jî wek *paîz* hatiye nivîsîn. Xuya ye her nivîskarî li gorî xwe bi kar aniye.

"Lê divê li *Paîzê* ji nû ve dest pê bike."[558]

"Li *Pehîzê*, her gund li gora zêdayîha xwe barek dido difs, birinc, genim dida axê."[559]

"*Payîza* navîn"[560]

Hin peyvên ku bi çend awayên cuda hatine nivîsîn:

"gund, gûnd; derbqê, derbeqê; şqestin, şiqest; rûj, roj; qurmancî, qurdmancî; roj bi roj, rûj bi rûj; îro, îrû; dirêj, drêj; kîjkî, kîjikî; kîlomêtir, kîlomêter; behir, behr; emrê Xuda, emir; brinên me, birînên ko; awaqî, hawaqî; zman, ziman; piçûk, qiçîq"

3.1.7.1. Peyvên Devokî

Standardîzasyona ferhengî di *Hawar*ê de pêk nehatiye. Em dikarin rastî gelek peyv û lêkerên devokî bên ku ev jî bi piranî yên botî ne.

Peyvên devokî: "niho, îrû, dîsan, tinê, vêca, zûqa, rûj, şolê wan, derbqê, li hire, dişwar, êdin, welê, avîje, çawan, perîcar, ruhnahî, ştexalî, çire, spehî, sund, rûjqê, pêrûz, xweh, êdın, hemî, rûjanî, dadê, ruhnî, siha, bab, ewende, ewinde, honiq, carqê, hiniq, nihû, ho nabe, parîzeqî, ewî, bongî, herê, wilo, rûjeqê, hermet, şakiz, tuwên din, xweher, herûj, nuho, xûynê, belbî, zeydetir, efiw, stowê, ko, swind, zerdelû"

Ji van peyvan *roj* hem di wateya *tavê* de hem jî di wateya demê de wek *roj* û *rûj* hatiye bikaranîn. Lê belê ji bo *tavê* bi piranî *roj* hatiye bikaranîn:

---

[557] *Hawar*, c: 1, h: 17, r. 345
[558] *Hawar*, c: 2, h: 32, r. 800
[559] *Hawar*, c: 2, h: 34, r. 837
[560] *Hawar*, c: 1, h: 6, r. 133

"Di ser serê çiyayê Hereqolê de *roj* weq efsereqe zêr dibirikî. Hereqol xêw û şah e, *roj* tacê wê."[561]

"Li Sûriyeyê her *rûj* erebî û frensizî dibihîzim."[562]

"Ji dûr ve, he*rûj*, *roj* dibirike, bajarên mezin û gundên ava xuya dibin."[563]

"Lê di wê rê de, di wî gelîyî de ronahî nîne, tav nîne, *roj* dernaqeve."[564]

Lê belê di cilda duyem a *Hawar*ê de peyva *rûj*ê hema hema naxuyê, ji bo herdu wateyan jî *roj* tê bikaranîn. Wek mînak:

"Ev şev dirêj û bi melal in; *roj* kurt in. *Roj* kêm caran xwe şanî dide; û dinya ji ronahiyê bêhtir di tariyê de dizivire, tê û diçe, li rojê, li çira û li tenha wê digere."[565] Xuya ye wek standard peyva *roj*ê hatiye qebûlkirin.

Niho jî peyveke devoka Botan e. Her çi qas peyva *niha* ya ku di dema me de wek standard tê bikaranîn di *Hawar*ê de hebe jî, *niho* jî gelek caran hatiye bikaranîn, her wiha em rastî *nuho* jî tên.

Her wiha divê em li ser gihaneka *ku*yê jî bisekinin. Balkêş e ku di warê peyvan de standardîzasyek nehatiye kirin, lê belê gihaneka *ku*yê ji hejmara ewil heta dawî wek *ko* hatiye nivîsîn û ev jî devoka botî ye. Xuya ye ji bo vê gihanekê sererastkirinek hatiye kirin an jî wek *ko* hatiye qebûlkirin, lê belê îro wek *ku* tê bikaranîn. Her wiha di *Birê Frensizî* de cih daye vê gihanekê jî ku dibêje ev wek "qo"[566] tê nivîsîn û wek "go" tê bilêvkirin.[567]

Peyva *belbî* jî derbas dibe di *Hawar*ê de ku ev peyv bi piranî li Dêrikê tê bikaranîn, lê belê ev peyv di helbesta Osman Sebrî de derbas dibe:

---

[561] *Hawar*, c: 1, h: 7, r. 144
[562] *Hawar*, c: 1, h: 8, r. 164
[563] *Hawar*, c: 1, h: 10, r. 203
[564] *Hawar*, c: 1, h: 10, r. 203
[565] *Hawar*, c: 2, h: 42, r. 976
[566] Esas ev "ko"ye, di vê hejmarê de "q" û "k" hêj li şûna hev têne bikaranîn.
[567] *Hawar*, c: 1, h: 15, r. 308

"Belbî vê janê li dil biderxe."[568]

Ji xeynî peyvan hin lêker jî bi devokî hatine kişandin, yên wek: "bêt, têt, divêt, bête şandin, hiltêt, hej diqir, têşihim, dibêjit, diqeliha (dikeliya), binve, nizanit, tihin, bit, birejiha, dey ne kir"

3.1.8. Navên Demsal, Meh û Rojan

Navên demsalan di nav hemû kurmancan de hema hema bi heman awayî têne gotin. Navên rojan jî kêm zêde wekî hev in. Lê navên mehan gengeşiyeke pir mezin e. Mirov dikare hem di nav gel de, hem jî di nav metnên nivîskî de rastî gelek cureyên navên mehan bê. Li vir em ê bikaranîna van navan a di *Hawar*ê de nîşan bidin.

3.1.8.1. Navên Demsalan

Navên demsalan wek mijareke taybetî nayê behskirin di *Hawar*ê de. Me ev nav ji metnan girtin. Ji bo navên demsalan jî standardek tune ye di *Hawar*ê de, em dibînin ku ji bo demsalekê çend navên cuda hatine bikaranîn. Wek mînak peyva *payîz*ê hem wek *pehîz* û hem wek *paîz*ê derbas dibe:

"Bihara min, *pehîza* min, hemî reş."[569]

"Bihara jiyîna min bê te *paîz* e dadê."[570]

Ev her du rêzik di heman rûpelê de ne. Rêzika ewil ji helbesta *Welat û dilê min* a Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan e û ya duyem jî ji *Dadê*ya Qedrîcan e. Bi vî awayî em dikarin bibêjin ku her nivîskarî li gorî xwe peyv nivîsîne. Her wiha wek îmla jî rêbazek tune ye di demsalan de. Carinan bi herfa girdek, carinan bi ya hûrdek dest pê dikin. Wekî mînak:

"Lê divê li *Paîzê* ji nû ve dest pê bike."[571]

"Îsal ku her du *paîz*

---

[568] *Hawar*, c: 1, h: 20, r. 406
[569] *Hawar*, c: 1, h: 14, r. 285
[570] *Hawar*, c: 1, h: 14, r. 285
[571] *Hawar*, c: 2, h: 32, r. 800

Gîhane hev bi reşî”[572]

Demsala *bihar*ê jî bi du awayên cuda hatiye nivîsîn:

“Xunava qiyametê bi ser wan de bariye, û heşîn bûne weke giyayê ko *bihar* bi ser de hatiye.”[573]

“Tu *bihara* ber dilê min î”[574]

“…berf û bagerê da bû şîrgermiya tava *Biharê*.”[575]

“Dibêjin qo di wê newalê, di wî cihî de qo Siyabend û xec mirine serê her *Biharê* du derxên gul radibin û du qoqî di ser wan re difirin.”[576]

Gava em li van her çar hevokên li jor dinêrin, em dibînin ku peyva *bihar*ê hem bi awayên cuda û hem jî bêyî rêbazeke îmlayê hatiye nivîsîn.

Peyvên *zivistan* û *havîn*ê jî dîsa hem bi herfa girdek, hem jî bi ya hûrdek dest pê kirine:

“Geleq ne borî *zivistana* welatê jorîn bi ser de hat.”[577]

“Bihar û Havîn, Paîz û *Zivistan*, rûj û şev, boş bûna bayî, barîna baranê, hatina berfê, hemî bi kanonên xwedê dikewimin.”[578]

“Gelo li *havînê* bixwîne û li zivistanê tevda li malê rûnin, ma nabe?”[579]

“Herçî şerê Libyayê, ji ber Germa *Havînê*, sivik bûye.”[580]

3.1.8.2. Navên Mehan

Navên mehan di hejmara duyem a *Hawar*ê de wiha hatiye dayîn:

---

[572] *Hawar*, c: 2, h: 53, r. 1108
[573] *Hawar*, c: 2, h: 25, r. 654
[574] *Hawar*, c: 2, h: 31, r. 773
[575] *Hawar*, c. 2, h: 30, r. 748
[576] *Hawar*, c: 1, h: 13, rr. 267-268
[577] *Hawar*, c: 1, h: 4, r. 83
[578] *Hawar*, c: 1, h: 3, r. 63
[579] *Hawar*, c: 1, h: 4, r. 85
[580] *Hawar*, c: 2, h: 32, r. 800

1- Adar	Bihara-pêşîn
2- Nîsan	Bihara-navîn
3- Gulan	Bihara-paşîn
4- Hizêran	Havîna-pêşîn
5- Tîrmeh	Havîna-navîn
6- Tebax	Havîna-paşîn
7- Îlon	Paîza-pêşîn
8- Çirîya-berî	Paîza-navîn
9- Çiriya-paşî	Paîza-paşîn
10- Çileye-berî/Qanûna-berî	Zivistana-pêşîn
11- Çileya-paşî/Qanûna-paşî	Zivistana-navîn
12- Sibat/Gecoq	Zivistana-paşîn[581]

Wekî ku em dibînin navê her mehekê bi awayekî din jî hatiye nivîsîn. Celadet Bedirxan li ser vê wiha dibêje: "Ji xwe qurdmanc mehan bi du awan bi nav diqin. Bi navên ser xwe û bi navên çaxên salê."[582]

Navên mehan jî ji aliyê rastnivîsê ve negihîştiye standardekê. Hinek ji wan bi herfa girdek, hinek jî bi ya hûrdek dest pê kiriye. Her wiha di navbera hinekan de bendik heye, lê di ya hinekan de tune ye. Wek mînak:

"Ji 15ê *Çiriya-Paşîn* û hir ve vaporticaretên emêrîkanî wê bikarin herin benderên îngilîzî û ewê ji Ingilterê re çek û cebiracanê bibin."[583]

[581] *Hawar*, c: 1, h: 2, r. 49
[582] *Hawar*, c: 1, h: 2, r. 49

"Li 16ê *Çiriya-paşîn* eleman ketine bajarê Kerçê û avtenga ko rê dide Qevqasê, xistine destên xwe."[584]

"Dîsan par li 9ê *Kanûna-pêşîn* ingilizan dirêjî talyanan kir."[585]

"Mister Rûzwelt li 7ê *Kanûna Paşîn* di peşberê Kongrê de nitqek daye."[586]

"Li 5ê *Adarê* Japon ketin Betavyayê."[587]

"Tarîxa hejmara çaran, *adara* 1940 û tarîxa a dehan, *Îlona* 1940 e."[588]

"*Ilon, Tebax, Tîrmeh, Adar, Nîsan* û *Gulan* û cot û bazar"[589]

Her wiha *sibat* di bergê hejmara 40î de wek *Şibat* derbas dibe: "28 *Şibat* 1942"[590] Meha *hezîran*ê jî carekê wek *Hizêrnê* derbas dibe: "Cêms piçûkê heft biran bû û di sala 1811an di meha *Hizêrnê* de ji deya xwe bû bû."[591] Kêm caran wek *hezîran*, lê belê bi gelemperî wek "hizêran" derbas dibe.

3.1.8.3. Navên Rojan

Navên rojan di *Hawar*ê de wiha derbas dibin: în, şembih, yeqşemb, duşemb, sêşemb, çarşemb, pêncşemb[592]

Wekî ku tê dîtin di dawiya navên rojan de /b/ heye, ev herf îro di kurmanciya nivîskî de tune ye lê di devokan de heye, wekî ya toriyan. Her wiha *şemî* carinan wek *şembî* û carinan jî wek *şembih* derbas dibe.

Nivîsîna rojan jî bi awayekî standard nehatiye sazkirin. Hem bi herfa girdek, hem jî bi ya hûrdek dest pê dikin:

"Em serbest berdan, mîna rojên *pêncşembê*."[593]

---

583 *Hawar*, c: 2, h: 36, r. 871
584 *Hawar*, c: 2, h: 36, r. 878
585 *Hawar*, c: 2, h: 37, r. 896
586 *Hawar*, c: 2, h: 38, r. 909
587 *Hawar*, c: 2, h: 41, r. 965
588 *Hawar*, c: 2, h: 27, r. 692
589 *Hawar*, c: 1, h: 6, r. 127
590 *Hawar*, c: 2, h: 40, r. 941
591 *Hawar*, c: 2, h: 56, r. 1132
592 *Hawar*, c: 1, h: 6, r. 133

"Şerê ko roja *Duşembê* dest pê kiri bû roja *Pêncşembê* û bi selametî xelas bû."[594]

3.1.9. Cînavka Paşnûsek

Ev cînavka ku di kurmanciya îro de bi hev ve tê nivîsîn, di *Hawar*ê de carinan cuda hatiye nivîsîn û carinan jî bi bendik hatiye nivîsîn. Yên ku bi bendik hatine nivîsîn:

"da-ê, bid-ê, nagehişt-ê, dibêjin-ê, dikevin-ê, tên-ê, berdan-ê, goti-yê, girt-ê, da-yê, bibin-ê, bikev-ê, got-ê, bavêjin-ê, ne didan-ê, keti bûn-ê, didin-ê, gihişti-ê, bigînin-ê, bidin-ê, bidim-ê, giha bû-yê, da-yê"[595]

Hin hevokên mînak:

"Ezê çend pirsan bêjim tu guh *bid-ê*."[596]

"Qehremanekî Yewnanistana kevn heye, *dibêjin-ê* "Herkûl"."[597]

Yên ku bê bendik û cuda hatine nivîsîn:

"gazî kir ê, dikevin ê, diketin ê, bikevin ê, keti bû ê, ket ê, got ê, dibêjin ê, da yê, dan ê, da ê, venegeryan ê, gihîştîn ê, goti bû ê, didin ê, ne da ê, keti bûn ê, bidin ê, gihiştim ê, herin ê"

Hin hevokên mînak:

"(…) bi eskerê mayîn ve drêjî girê din kir û ket ê."[598]

"Ji roja ko gund şewitye, xelk venegeryan ê."[599]

Îro, cînavka paşnûsek di kurmancî de bi hev ve tê nivîsîn, wekî mînak: "min gotê", "min dayê".

---

[593] *Hawar*, c: 2, h: 35, r. 853
[594] *Hawar*, c: 2, h: 32, r. 798
[595] *Hawar*, c: 2, h: 37, r. 898
[596] *Hawar*, c: 2, h: 24, r. 635
[597] *Hawar*, c: 2, h: 25, r. 651
[598] *Hawar*, c: 2, h: 32, r. 790
[599] *Hawar*, c: 2, h: 34, r. 831

3.1.10. Bikaranîna *kes*ê

Bêjeya *kes*ê di *Hawar*ê de hem cuda hem bi hev ve hatiye nivîsîn. Ji bo vê mijarê jî standardîzasyonek nehatiye sazkirin:

"herqes, tuqes, her qes, herkes, tukes"

Çend hevokên mînak:

"*Her kes* li gora emelê xwe tê ceza an mikafat kirin û ji *tu kes* re neheqîtî naye kirin."[600]

"*Herkesî* ji berê de wezîfa xwe nas kiri bû."[601]

"Heke mirov bi xwe kedrê xwe nagirit niq *tuqesî* bikedr nabit."[602]

3.1.11. Gihanek

Mijara gihanekan negihîştiye standardekê di *Hawar*ê de. Çend mînak ji bo gihanekan:

"ber vê yeqê, herweqî, herçend, her çend, ewçend, ji bona, çikeder, çikas, qu, qo, ji xwe, hevkas"

Çend hevokên mînak:

"*Her çend* zmanê me tête nivîsandin, *ewçend* jî fireh û dewlemend dibe û bi pêş ve diçe."[603]

"Di her komekê de *herçend* lêker hene *ewçend* jî hevok peyda dibin."[604]

"Lê *herçend* mêrên çekhilgir ne ma bin jî; jin, zaro, pîr û nexweş ketin pêşiya dijmin."[605]

---

[600] *Hawar*, c: 2, h: 47, r. 1043
[601] *Hawar*, c: 2, h: 49, r. 1061
[602] *Hawar*, c: 1, h: 19, r. 383
[603] *Hawar*, c: 2, h: 27, r. 696
[604] *Hawar*, c: 2, h: 28, r. 716
[605] *Hawar*, c: 2, h: 30, r. 748

"*Herweqî* di nav qurdan de, heçî mirovên zana radibûn qitêbên xwe ne bi zmanê qurdî lê bi zmanê biyaniyan dinivîsandin."[606]

Wekî ku ji van hevokan jî tê dîtin, gihanek carinan bi hev ve carinan jî cuda hatine nivîsîn.

3.1.12. Hejmar

Hejmar bi şekilên cuda hatine nivîsîn di *Hawar*ê de û standardek çênebûye ji bo vê mijarê:

"yek, dido, du, dudu, nwanzdeh, duwim, kesê diwim, sêyim, kesê seyim, çarim, heftim, heftdeh, donzde, dwanzde, çel"

Rastnivîsîna hejmaran îro jî negihîştiye standardekê. Li gorî *Rêzimana Kurmancî* ya Samî Tan, ev hejmarên li jor wiha têne nivîsîn:

"yek, du, nozdeh, duyemîn, sêyemîn, çaremîn, heftemîn, hevdehemîn, dozdeh, çil"[607]

Li gorî *Komxebata Kurmancîyê* ev hejmar li gorî rêza li jor wiha têne nivîsîn:

"yek, du, nozdeh, duyem, sêyem, çarem, heftem, hevdeh, duwazdeh, çil"[608]

Wekî ku tê dîtin di rastnivîsîna hejmarên bingehîn de zêde cudahî tune ye, lê di hejmarên rêzîn de her çi qas Samî Tan {-emîn} bi kar anîbe jî, Komxebatê {-em} bi kar aniye.

Ji xeynî vê, hejmarên ku li pey hev têne nivîsîn jî li gorî standardekê nehatine sazkirin di *Hawar*ê de. Di navbera hin hejmaran de ku li pey hev hatine bêhnok an jî bendik hatiye danîn:

"yek, du heval; sê-çar sal"

---

[606] *Hawar*, c: 1, h: 1, r. 27
[607] Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî,* rr. 199-200
[608] Bnr. Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* Weqfa Mezopotamyayê, Stenbol 2019, rr. 179-189

3.1.13. /v/ û /w/

Carinan şûna /w/yê /v/ hatiye nivîsîn di *Hawar*ê de. Wek mînak:

"hildiveşînin, daviya, davî, hilveşîya bûn, gevre, visan"

Çend hevokên mînak:

"Hîm û riqnên xwe *hildiveşînin*."[609]

"Yên ditirsin, xwe, namûsa xwe û welatê xwe *hildiweşînin*."[610]

"Ev hal *daviya* hevxistana zmanan e."[611]

"Lê tişteq heye qo li geşbûna *dawîya* zmanê me nîşan diqe."[612]

3.1.14. Herfa Kelijandinê

Wekî ku em dizanin di kurmancî de /y/ an jî /w/ dikevin navbera her du dengdêran. Bi vî awayî xwendina bêjeyên wiha rihettir dibe û di bilêvkirinê de ahengek çêdibe. Herfa /w/yê bi piranî hatiye bikaranîn di *Hawar*ê de ji bo kelijandinê. Wek mînak:

"parsûwê, biçûwana, zarowên, bûwa, ordiwa îngilîzî, radyowa Moskoyê, tiwê, Zeynowa, rûwê"

Bêjeyên bê herfa kelijandinê jî gelek in di *Hawar*ê de:

"biraên, tuê, baê, naên, ruê, mamostaên, zaroên, zavao, çiyao, xudaê, mewzûa, bêî"

---

[609] *Hawar*, c: 1, h: 3, r. 64
[610] *Hawar*, c: 1, h: 23, r. 470
[611] *Hawar*, c: 1, h: 3, r. 64
[612] *Hawar*, c: 1, h: 20, r. 403

3.1.15. Dubêje

Heman bêjeyên ku li dû hev tên carinan bi bêhnok, carinan bi bendik, carinan jî bê nuqteşanek hatine nivîsîn di *Hawar*ê de:

“hêdî, hêdî; cot, cot; zer, zer; cihê, cihê”

“hêdî hêdî; cihê cihê; hêdû hêdû”

“car-car”

Lê îro ev dubêje bêyî nuqteşanê têne nivîsîn, wek: hêdî hêdî, cot cot û hwd.

3.1.16. Navên Stêrkan

Navên stêrkan ji aliyê rastnivîsê ve dîsa bêstandard in di *Hawar*ê de. Carinan her du bêje bi girdekê, carinan her du bi hûrdekê, carinan jî yek ji wan bi girdekê û yek ji wan jî bi hûrdekê hatine nivîsîn:

“Komika sêwiyan, Termê Mixêl, Kerwankuj, stêrka sibehê, Dûpîşk”

3.1.17. Navên Hêlan

Navên hêlan bi awayên cuda hatine nivîsîn di *Hawar*ê de. Ji bo navekî çend nav têne dîtin, ev jî nîşan dide ku di *Hawar*ê de ji bo vê jî standardek çênebûye.

Rojava; rova, roava

Rojhilat; rojhelat, rohelat, rohel

Bakur; baku

Her wiha peyva *başûr*ê derbas nabe di *Hawar*ê de, li şûna wê *nîvro* hatiye bikaranîn.

Çend mînak ji bo navên hêlan:

"Efrîqa bakur, Rûsya bakur, nîvrorohelê Bîngaziyê, nîvroyê Efrîqayê, nîvrorohelatê Kurdistanê, nîvrorohelê Efrîqayê, bakurê Kurdistanê, kurdistana bakur, Qurdistana baqurî"

3.2. PÊVEKA *HAWARÊ*: *RONAHÎ*

Hawar di wê serdema tarî de, di wê tunebûnê de wek nûzayekê derdikeve û tê dikeve nav destê gelê kurd. Wexta ku digihîje hejmara 42yan dide zanîn ku kovareke nû derdikeve bi navê *Ronahî*yê. Ev kovara ku ji 28 hejmaran pêk tê, hejmara xwe ya ewil di 1ê Nîsana 1942yan de pêşkêşî xwendevanan dike û heta 1945an berdewam dike. Li ser bergê kovarê, di binê navê *Ronahî*yê de bi fransî wiha hatiye nivîsîn: *Supplément Illustré de la Revue Kurde Hawar*, ango Pêveka Biwêne ya Kovara Kurdî ya Hawarê. Ji vê gotinê tê famkirin ku ev ne kovareke serbixwe, lê pêveka *Hawar*ê ye.

Heke em ji aliyê naverokê ve li van her du kovaran binêrin, em dibînin ku *Ronahî* berevajî *Hawar*ê cih daye gelek wêneyan, bi taybetî wêneyên der barê şer de; leşker, balafir, keştî û bi taybetî jî wêneyên jinên şervan, xwendekar an jî karker. Tespîtên Fırat Aydınkaya yên der barê wêneyên *Ronahî*yê de pir balkêş in. Li gorî Aydınkaya, bi *Ronahî*yê kevneşopiyeke nû ya mîzanpajê derket di nav weşangeriya kurdan de. Wêneyê ku rasterast xîtabî çavan dike, wek modernbûna estetîk jî dikare bê dîtin û ji xeynî vê di civaka nexwendewar de, wêne stratejiyeke giring a ragihandinê ye û li ser zêde dike ku xwediyê kovarê bi van wêneyan dixwaze peyama xebat û hêzdariyê bide gelê xwe. Her wiha ji xeynî nîşandana wêneyên amûrên şer, bi cihdana wêneyên jinên rojavayî yên ku dixebitin, dixwaze ji jinên kurd re di civakê de cihek veke.[613]

Her wiha *Hawar* ji destpêkê ve, di her hejmarekê de cih daye çend nivîskaran. Ji ber vê em dikarin di her hejmarê de rastî peyvên ji devoka nivîskaran bên ku rastnivîsa peyvan li gorî nivîskaran diguhere. Wekî ku me di beşa *Hawar*ê de analîza wê kir, sererastkirineke bi vî rengî, ango edîtoryal nehatiye kirin tê de. Ji ber vê jî em pir rihetî dikarin cudahiyan bibînin di nav nivîsan de.

[613] Fırat Aydınkaya, "Tamamlanmamış Bir Proje Olarak Kürt Modernleşmesi", di *Kürt Tarihi* de, sayı: 25, İstanbul, 2016, rr. 17-18

Lê belê cudahiya *Ronahî*yê di vî warî de ji *Hawar*ê ew e ku heta hejmara 12an nivîs ji destê nivîskarekî, ango ji destê Celadet Bedirxan derketine û bi piranî nûçeyên der barê şer de ne. Heta di binê van nivîsan de wek adetî navê nivîskar tune ye, ji ber wê em wisa dihesibînin ku ev nivîs aîdî Celadet Bedirxan in, lewre xwediyê kovarê ew e.

Her wiha, piştî ku kovar ber bi rengê *Hawar*ê ve diçe, ango tê de ji bilî nûçeyên şer, çîrok û helbest jî xuya dibin û bi vî awayî em dikarin navên nivîskaran jî bibînin û bi vê guherîna şekilî, em cudahiyên rastnivîsê jî dibînin. Herçî daçek in, heta vê hejmarê wek "de, re, ve" hatine nivîsîn, piştî vê hejmarê, her wiha bi zêdebûna nivîskaran re girêdayî, carinan wek "da, ra, va" hatine nivîsîn, bi taybetî di nivîsên Osman Sebrî de em rastî vî awayî tên ku di *Hawar*ê de jî bi vî rengî bûn nivîsên wî.

Heta vê hejmarê (cudahiyê) hêviyek bi me re çêdibe der barê daçekan de, lewre bi mirov re hîsek wisa çêdibe ku di meseleya daçekan de standardîzasyonek çêbûye û Celadet Bedirxan ev mijar wiha qebûl kiriye. Lê wexta ku em rastî şêwazên din jî tên, em fam dikin ku her nivîskar li gorî xwe dinivîse. Lê rastiyeke wiha jî heye ku qet naguhere, ne di *Hawar*ê de ne jî di *Ronahî*yê de: gihaneka *ko*yê. Ev gihanek di devoka Celadet Bedirxan de heye û di tevahiya van her du kovaran de xuya dibe. Wekî ku me berê jî gotibû, xuya ye Celadet Bedirxan ev gihanek bi vî rengî qebûl kiriye û daye qebûlkirin, lewre her çi qas di devoka hinekan de ev wek *ku* be jî, bi tevahî wek *ko* hatiye nivîsîn.

Cudahiyeke din jî ew e ku mijarên rêziman û alfabeyê hene di *Hawar*ê de, xuya ye ev hatiye çareserkirin an jî taybetmendiya *Hawar*ê ye ku di *Ronahî*yê de ev mijar tune ne. Celadet Bedirxan piştî çend hejmaran cih dide gelek cure nivîsan jî di *Ronahî*yê de, da ku zimanê nivîskî bi pêş bikeve. Yek ji wan nivîsan jî ji cureya polîsî ye û dibêje xwediyê *Ronahi*yê her çi qas ne meyildarê vê cure nivîsan be jî, xwendevanên van cureyan jî hene. Celadet Bedirxan nivîsên li gorî dilê xwe tenê naweşîne, ji bo xatirê bipêşketina zimên dixwaze ji her cureyan biweşîne.[614]

[614] Bişarê Segman, "Dr. Rweylot", *Ronahî*, Xwedî û Berpirsiyarê Kovarê: Mîr Celadet Bedirxan, Berhevok: Çapxana Jîna Nû, h: 24, Uppsala 1985, r. 473

Derketina *Ronahî*yê şahiyeke mezin e ji bo Celadet Bedirxan û vê mizgîniyê bi van gotinan diweşîne di *Hawar*ê de:

> Ji yêkê Nîsanê ve me dest bi belavkirina kovareke din kiriye: Ronahî.
>
> Ronahî kovareke bi resim û sûret e. Di tarîxa çapa kurdan de tiştekî nû. Belê heta niho tu kovarên kurdî bi resim û sûret belav ne bûne. Ji lewre belavbûna Ronahiyê di jiyîna me a milî û civakî de bûyereke girane ye.
>
> Di gel vê hindê ne Hawar ne Ronahî ne jî çend kovar û kurazeyên din nikarin kitêbxana me a milî û civakî ya ko yekcar vala ye tijî bikin. Ev her du kovar dilopine behireke mezin in; dilopine behira zanînê ne. Di vê behirê de ji me kurdan bêhtir kêmpar tu milet nîne. Heçî miletê ko îro doza heq û heyîna xwe dike divêt di vê behirê de xudanpar bibe; lê ne bi dilopan, belkî bi çal û çalik û gotikan.
>
> Belê, ava çalan jî bi dilopan têne pê û her miletî jî holê dest pê kiriye. Bi tenê divêt dilop bidin pey hev. Heke ewan ne da pey hev dilopên pêşîn di sînga axa hişk de winda dibin. Me kiriyariya Ronahiyê jî kiriye 5 lireyên Sûriye. Lê me hêvî heye ko ji xwendevanên me ên demlewend yên ko tu diyarî rênekirine Hawarê vê kasûliyê bi hênceta belavbûna Ronahiyê wê bi şûn de vegerînin. Bi vî awayî Ronahî jî weke Hawarê, rexma dilaxêva kaxizê, wê bikare bijî û kurdan du kovar û di behira zanînê de li şûna dilopekê du dilop wê hebin."[615]

Li ser zaravayên kurdî, di *Ronahî*yê de diyardeyeke wiha jî heye ku dibêje *Ronahî* jî dê wekî *Hawar*ê cih bide her zarê kurdî, çi kurmancî çi babanî.[616]

Her wiha navên kovarên wê serdemê jî derbas dibin di *Ronahî*yê de. Yek ji wan jî Kovara *Gelawêj*ê ye ku di hejmareke xwe de behsa *Ronahî*yê dike û zimanê wê jî wek kurdiya botan nîşan dide. Di *Ronahî*yê de ji bo vê yekê bersivek hatiye dayîn û ev bersiv ji bo me jî giring e der barê aşkerakirina zimanê kovarê de: "Belê Gulavêjê gotiye: 'bi zimanî kurdî Botan'. Gelo ji gotina 'kurdiya Botan' mexsed çi ye? Bê şik mexsed kurdiya ko di cihê Botan de pê tête axaftin e." Piştre behsa dîroka kurdî û zaravayên wê dike û peyvê tîne ser "kurdiya Botan" û dibêje ev zimanê

[615] Xwediyê Hawarê, "Kiriyariya Hawarê", *Hawar*, c: 2, h: 42, rr. 996, 997
[616] Xwediyê Ronahiyê, "Reşbelek", *Ronahî*, h: 4, r. 61

kurdên Botan e, her wiha ji ber şêwaza xwe ya xweser, di nav kurdên din de bi rihetî dikarin kifş bibin.[617]

Li ser vê yekê aşkera dike ku kurdên li Sûriyeyê bi kurmancî dinivîsin û li ser dixebitin ku zimanekî yekbûyî pêk bînin. Ji ber vê jî diyar dike ku her yek devoka xwe bi şûn de dihêle û dixwaze zimanekî hevpar çêbe. Her wiha bi awayekî zelal nîşan dide ku botîtiya kovar û rojnameyan di xwediyên wan de ye û dibêje "Belê xwediyên wan kovar û rojnaman bi xwe botî ne. Lê ew jî di nivîsarên xwe de zaravayê xwe tucaran aşkera nakin. Aşkera bikirina diviya bû li şûna (rabû û çêbû) (rabî û çêbî) binivîsandana."[618]

Celadet Bedirxan her û her giliyan ji alfabeya erebî dike ku rihetî nikare bê xwendin û carinan nayê famkirin. Nivîsên bi vî rengî di *Hawar*ê de zêdetir in. Mînakeke wiha heye di *Ronahî*yê de ku Celadet Bedirxan dibêje wexta nivîseke *Gelawêj*ê ji herfên erebî wergerandiye herfên latînî[619] hin şaşî kirine û ji ber vê jî ji xwendevanan rica dike ku li wî negirin, ji ber ku diyar dike bi zarê nîvro, yanî bi soranî nizane. Her wiha gazindên xwe jî dike û dibêje heke ev nivîs bi latînî bihata nivîsîn, her çi qas bi vî zarî nizane jî, ew ê xeletî nekira. Bi vî awayî qelsiya herfên erebî nîşan dide û li ser vê wiha dibêje: "Herçî herfên latînî, ji bervajî ve, tiştê ko pê hate nivîsandin, mirov dikare wî bêî ko mana wî bizane rast bixwîne û paşê bide eqilê xwe û di mana wî bigehe. Yanî bi herfên erebî berî çavan mejî dixebite û xêra vê xebatê çav dibînin û lê dilivin. Herçî herfên latînî, di wan de çav rast bi rast û bêî mihakema mejî dibînin, ziman digere û paşê mejî bi kêfa xwe dixebite û tê digehe." Li ser vê mînakek ji erebî dide û dibêje wexta *elif* û *nûn*ek têne cem hev, zanayên ereb bi roj û mehan didin ber hev û ji hev dipirsin gelo ev bêje "in-ne" an "en-ne" ye. Her wiha ji bo kurdî jî mînakekê wiha dide: "Bi min be ne insaf e ko em jî bidin vê rê û gava "rê"yek daye pey "kaf"ekê em ji hev bipirsin gelo ev bêje çawan wê bête xwendin: "kir" "ker" an "kur"?"[620]

[617] Ronahî, "Bo Agadarî", *Ronahî,* h: 23, rr. 454-455
[618] Ronahî, "Bo Agadarî", *Ronahî,* h: 23, rr. 454-455
[619] Li vir dibêje "tîpên kurdmancî"
[620] "Gelawêj", *Ronahî,* h: 5, r. 80

Bi kurtasî em dikarin bibêjin ku ne bi qasî *Hawar*ê, lê di *Ronahî*yê de jî nivîsên li ser hêsanbûna alfabeya latînî, giringiya ziman û nivîsandinê hene. Ji bo ku mijara me berbelav nebe, em ê li vir cih nedin wan nivîsan.[621]

Piştî hejmara 28an *Ronahî* bi dawî dibe lê der barê vê dawîbûnê de agahiyek tune ye û *Hawar* bi heman awayî bi dawî dibe. Heta di hejmara dawî ya *Ronahî*yê de çîrokeke bi navê *Katêrîn* heye û di dawiya wê de dinivîse ku dumahik heye. Ji vir tê famkirin ku niyeta kovarê bi sekinandinê tune bûye. Lê ji ber çi sekiniye nayê zanîn.

Piştî vê danasîna *Ronahî*yê em ê hewl bidin berawirdkirina *Hawar* û *Ronahî*yê bikin ji aliyê zimên ve.

3.2.1. Berawirdkirina *Hawar* û *Ronahî*yê ji Aliyê Zimên ve

Wexta ku me analîza *Hawar*ê kir ji aliyê rastnivîsê ve, me dît ku gelek mijar nehatine standardkirin. Her çi qas di nivîsên Celadet Bedirxan de em dikarin standardek bibînin jî, di nivîsên nivîskarên din de ev rewş diguhere. Meseleya daçekan, hejmaran, nivîsîna peyvan, rastnivîsa navên roj, meh, rojên taybetî an jî navên erdnîgarî di nivîsên her nivîskarekî de ji hev cuda ne. Ji ber vê em dikarin bibêjin ku di tevahiya *Hawar*ê de standardîzasyonek pêk nehatiye di vî warî de.

Vê carê em ê berê xwe bidin *Ronahî*yê ka wek *Hawar*ê berdewam dike an guherînin hene. Dîsa bi heman awayî mijar bi mijar em ê standardîzasyona rastnivîsê ya *Ronahî*yê pêşkêş bikin.

Heke em ji paşdaçekan dest pê bikin, ji ber ku îro jî nîqaş li ser hene, em dibînin ku heta hejmara 12an a *Ronahî*yê wek "de, re, ve" hatine nivîsîn. Ji xwe wekî ku me behs kiribû, heta vê hejmarê nivîs ji destê yek nivîskarî derketine, ew jî xwediyê *Ronahî*yê Celadet Bedirxan e. Ji ber vê, heta vê hejmarê xwendina me bi rihetî didome, lewre şêweya nivîsînê û rastnivîs her li gorî standardekê hatine sazkirin. Lê bi hejmara 12an û pê ve, bi zêdebûna nivîskaran şêwe û rastnivîs jî

[621] bnr. Osman Sebrî, "Çend Gazind", *Ronahî, h. 20,* r. 389; Osman Sebrî, "Ziman û Nivîsandina Wî", *Ronahî*, h: 24, r. 486

guherîne. Herçî paşdaçek in, Osman Sebrî bi taybetî "da, ra, va" bi kar anîne. Bi mînakên li jêrê em dikarin aşkeratir bikin:[622]

"Elîsabêt herçî civatên arîkariyê ji bo şerevaniyên îngilîzî hene tê *de* ye û bi lebatên wan civatan *re* bi kar û wezîfa xwe a milî mîna yeke ji xelkê radibe."[623]

"Di sala 1784an *da* Napolyon jî di nav wan şagirtên ko ji bo dibistana Parîsê a herbiyê hati bûne bijartin *da* bû. (…) Ji vê pê *va*, dema xwe bi xwarina tiştên xweş û raketina ser nivînên çak derbas dikirin."[624]

Ango li gorî van hevokan em dikarin aşkera bikin ku meseleya paşdaçekan esas li cem Celadet Bedirxan gihîştiye encamekê. Lê destê xwe nedaye nivîsên din ji aliyê rastnivîsê ve, dibe ku ew qas giring ne xuya ye ji aliyê wan ve. An jî qebûlkirina her du şêwazan jî ji wan re çêtir hatiye.

Meseleya daçekan her û her di aloziyê de ye. Wekî ku me di beşa *Hawar*ê de behs kir, ji aliyê daçekan ve standardek çênebûye. Li jor me behsa paşdaçekan kir, ev li aliyekî, di bikaranîna bazinedaçeka wekî "di…de" û daçeka "li"yê de jî tevliheviyek heye di *Hawar*ê de, ev mesele di *Ronahî*yê de jî çareser nebûye. Em dikarin bi mînakan nîşan bidin:

"Di Çeneqelê de şerê tirkan jî kir."[625]

Ji ber ku di diyarkirina cihên wek bajar û welat de cih tam ne aşkera ye, yanî derdoreke fireh e, daçeka "li"yê tê bikaranîn. Li gorî vê ev hevok divê wiha bê nivîsîn: "Li Çeneqelê şerê tirkan jî kir."[626]

"Di gundekî Stanlîngradê de."[627]

---

[622] Em ê ji niha pê ve di mînakên bi vî rengî de navê nivîskar û metnê nedin, ji ber ku ji aliyê zimên ve em lêkolîn dikin, me nexwest bila tevlihevî çêbe.
[623] *Ronahî*, h: 1, r. 1
[624] *Ronahî*, h: 19, r. 369
[625] *Ronahî*, h: 6, r. 94
[626] Ji bo bêhtir agahiyê bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, rr. 190-194
[627] *Ronahî*, h: 10, r. 182

Ji bo gund divê daçeka “li”yê bê bikaranîn wekî ku li jor hat diyarkirin, lewre gund cihekî vekirî ye, ango cihekî diyar nayê nîşandan. Li gorî vê divê ev hevok wiha be: “Li gundekî Stanlîngradê.”

“Li 22ê mehê”[628] Meh ji ber ku diyar e bi “di…de”yê tê nîşandan. Li gorî vê ev hevok divê wiha be: “Di 22ê mehê de.”

Di vê hevokê de jî heman tişt heye: “Li 11ê Kanûna-pêşîn”[629]

“Di meha Îlonê de”[630]

“Di meha Tîrmehê û di Pesîfîkê de bertorpiyora japonî Oha bin av kiri bû.”[631]

Di van her du hevokên dawî de ji bo mehê bazinedaçeka “di…de” bi kar aniye, lê di herdu hevokên jortir de ji ber ku roj jî hatiye diyarkirin daçeka “li”yê hatiye bikaranîn. Lê divê ev her çar mînakên dawî “di…de” bin. Lewre meh di nav kontekstekе diyar de ye. Mînakên bi vî rengî gelek xuya ne di *Ronahî*yê de.

Navên neteweyan di *Hawar*ê de bi awayekî standard nehatine nivîsîn. Wekî ku me di beşa *Hawar*ê de diyar kir hinek ji wan bi hûrdek û hinek jî bi girdekan hatine nivîsîn. Lê di *Ronahî*yê de xuya ye ev mesele hatiye çareserkirin û navên neteweyan bi hûrdekan hatine qebûlkirin wek rastnivîsa fransî ku di wî zimanî de jî navên neteweyan bi hûrdekan têne nivîsîn. Ji bo vê çend mînak em dikarin bidin: ingilîz, eleman, talyan, japon, ewistralî, denîmarkî, çînî, ûris.[632]

Her wiha navên demsalan di *Ronahî*yê de bi piranî bi girdekan hatine nivîsîn. Çend îstisna hene helbet lê pir kêm in, ew jî dîsa wek meseleya daçekan di nivîsên Osman Sebrî de xuya dibin. Lê Celadet Bedirxan xuya ye rastnivîsa demsalan bi girdekan qebûl kiriye, lewre di nivîsên wî de bi vî awayî hatine nivîsîn. Helbet divê em dîsa destnîşan bikin ku di *Hawar*ê de ev mijar dîsa têkilhev e, carinan bi hûrdek

[628] *Ronahî*, h: 11, r. 198
[629] *Ronahî*, h: 12, r. 216
[630] *Ronahî*, h: 12, r. 215
[631] *Ronahî*, h: 10, r. 180
[632] Ji ber ku navên neteweyan gelek caran derbas dibin, me pêdivî nedît ku em ji bo her yekê dîpnotek bidin.

carinan jî bi girdekan hatine nivîsîn. Çend mînak ji *Ronahî*yê: Paîz, Zivistan, Behar, Bihar, Havîn.

Em ê mînakên ji nivîsên Celadet Bedirxan û Osman Sebrî bidin:

"Bi nîzingbûna *B*iharê şerê ûris hero xurtir dibe."[633]

"Di rojên havîn û *p*aîzê da birek xort digehên hev û diçin ber çêm."[634]

Herçî lêkera "bûn"ê ye, wek a *Hawar*ê berdewam dike di *Ronahî*yê de jî. Ev lêker di her du kovaran de jî di rewşa *être (*bûn)ê de ji lêkerê cuda hatiye nivîsîn. Her çi qas em îro bi hev ve binivîsin jî, mirov dikare bibêje ku wê demê Celadet Bedirxan wek standard bi vî awayî qebûl kiriye. Ji ber ku di tevahiya kovarê de bi vî awayî hatiye nivîsîn, em ê yek bi yek di hevokan de mînak nedin, lewre hema hema dikare di her rûpelekê de bê dîtin. Çend mînak: çû bû, da bû, keti bûn, anî bûn, nizanî bû. Lê ji ber ku bi piranî cuda hatiye nivîsîn, cudanivîsîna *bûn*ê dikare wek standarda *Hawar* û *Ronahî*yê bê qebûlkirin.

Wekî lêkera *bûn*ê qertafa neyîniyê *ne* jî ji aliyê rastnivîsê ve rêya *Hawar*ê dişopîne di *Ronahî*yê de. Ev qertaf berevajî bikaranîna me ya îro, cuda hatiye nivîsîn di her du kovaran de jî. Her wiha di *Hawar*ê de em gelek caran rastî qertafa *me*yê jî tên ji bo neyîniyê, lê di *Ronahî*yê de kêm caran hatiye bikaranîn. Di vê rewşê de em dikarin bibêjin ku qertafa neyîniyê ji bo standardê wek *ne* hatiye qebûlkirin, lê belê dîsa ji lêkerê cuda hatiye nivîsîn. Wekî mînak: ne dizanî, ne kiriye, ne ketiye, ne goti bû, ne dianî, ne hişt, ne ma bû, ne miriye. Lê qertafa *me*yê bi hev ve hatiye nivîsîn û di metnekê de xuya dibe, ji ber vê divê em bidin zanîn ku *me* ne taybetmendiya *Ronahî*yê ye, lê belê şêweya nivîsîna Lawikê Tiloyî ye ku ew jî yek ji nivîskarên kovarê ye. Mînak: bermede, çêmeke, mebêje, meke[635]

Navên rojan di *Ronahî*yê de wiha derbas dibin:

"Yekşemb, Duşemb, Sêşemb, Çarşemb, Pêncşemb, În, Şembî."

---

[633] *Ronahî*, h: 1, r. 4
[634] *Ronahî*, h: 17, r. 319
[635] Lawikê Tiloyî, "Ji Min Ve Tiştên Dinyayê", *Ronahî*, h: 21, r. 416

Cudahiya ji *Hawar*ê roja şemiyê ye. Di *Hawar*ê de bi piranî wek *şembih* lê di *Ronahî*yê de wek *şembî* derbas dibe. Em carekê rastî *sebt*ê[636] jî tên di *Ronahî*yê de.

Her wiha rastnivîsa navên rojan negihîştiye standardekê di *Hawar*ê de, lê di *Ronahî*yê de bi piranî bi herfa girdekê hatine nivîsîn. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku ev mijar di *Ronahî*yê de bi nivîsîna girdekan standard bûye.

Navên mehan di *Ronahî*yê de wiha derbas dibin:

"Adar, Nîsan, Gulan, Hizêran, Tîrmeh, Tebax, Îlon, Çiriya-pêşîn, Çiriya-paşîn, Kanûna-pêşîn, Kanûna-paşîn, Sibat"[637]

Wek nav ji *Hawar*ê ne cudatir in, lê ji aliyê rastnivîsê ve hinek tevlihevî hebe jî ji *Hawar*ê bêhtir xwedînîzam in. Lewre di *Hawar*ê de carinan bi hûrdek û carinan jî bi girdekan hatine nivîsîn, lê di *Ronahî*yê de ji xeynî çend îstisnayan bi girdekan hatine nivîsîn.

Lê belê mehên dubêjeyî negihîştine standardekê wekî ku di *Hawar*ê de jî tê dîtin. Di navên dubêjeyî de bi piranî bêjeya ewil bi herfa girdekê hatiye nivîsîn; yên ku her du jî bi herfa girdekê hatine nivîsîn hene, an jî ya ewil girdek û ya duyem hûrdek, her wiha dubêjeyên ku bi bendik hatine nivîsîn bêhtir in di kovarê de. Ji bo vê em dikarin van mînakan bidin:

"Kanûna paşîn[638], Çiriya Pêşîn[639], Çiriya paşîn[640], Kanûna-pêşîn[641],"

Her wiha dîsa di metneke Osman Sebrî de em dikarin bibînin ku derî rastnivîsa Celadet Bedirxan, bi şêwaza herfên hûrdek hatine nivîsîn navên mehan. Mînak: gulan, hezîran.[642] Dîsa em divê diyar bikin ku meha *hezîran*ê bi piranî wek *hizêran* derbas dibe, lê Osman Sebrî wek *hezîran* bi kar aniye ku îro em jî bi vî awayî bi kar tînin.

---

[636] *Ronahî*, h: 27, r. 546
[637] Me navên mehan ji metnên cuda yên *Ronahî*yê girtin. Ji ber ku di tevahiya kovarê de têne dîtin, me hewce nedît ku ji bo her yekê dîpnotekê bidin.
[638] *Ronahî*, h: 7, r. 124
[639] *Ronahî*, h: 7, r. 109
[640] *Ronahî*, h: 12, r. 208
[641] *Ronahî*, h: 12, r. 216
[642] *Ronahî*, h: 17, r. 317

Lê di metneke bi navê *Drêjahiya Şev û Rojan* de navên mehan bi awayekî sîstematîk hatine rêzkirin. Navekî cuda tune ye di vê lîsteyê de, lê navên dubêjeyî wiha hatine nivîsîn: Bêjeya ewil girdek, bêjeya duyem hûrdek û di navbera wan de bendik heye. Wekî mînak: Kanûna-paşîn.[643]

Unwan bi piranî bi hûrdekan hatine nivîsîn di *Hawar*ê de, lê yên bi girdekê hatine nivîsîn jî hene. *Ronahî* di vî warî de standardek çêkiriye, di vê kovarê de unwan bi piranî bi hûrdekan hatine nivîsîn. Em ê ji bo her yekê dîpnot nedin, lewre ev jî dikarin di her hejmarekê de bêne dîtin. Em ê bi çend mînakan ji aliyê dîtbariyê ve mijarê zelaltir bikin: general De Gol, general Romel, Marûf Ciyawik beg, Mihemed Elî beg, Arif beg Pijderî, Ehmed beg Zehawî, Fewzî paşa, Hesen aẍa, Fehîme xanim, Şewket efendî, Îsmet efendî, mîr Sêvdîn, Şahîn aẍa, emîral Darlan, genêral Mak Artûr.

Mijara gihanekan negihîştiye standardekê di *Hawar*ê de. Gihanekên wek *ew çend, ev çend, tu caran, her wekî* hem bi hev ve û hem jî ji hev cuda hatine nivîsîn di *Hawar*ê de, lê di *Ronahî*yê de berevajî vê bi piranî bi hev ve hatine nivîsîn. Wekî encam em dikarin bibêjin ku di *Ronahî*yê de rastnivîsîna hin cureyên peyvan bi vî awayî hatiye qebûlkirin: *herwekî, ewçend, evçend, tucaran*.

Herçî *ko* ye, wekî ku di *Hawar*ê de jî xuya ye wek standard hatiye qebûlkirin û di *Ronahî*yê de jî her wiha ye. Ev *ko*ya ku di devoka botî de serdest e, di tevahiya *Hawar* û *Ronahî*yê de cihê xwe girtiye.

Wek cînavk bikaranîna *kes* a bi peyvan re di *Ronahî*yê de bi hev ve ye. Lê carinan cuda jî hatiye nivîsîn. Ev mijar di *Hawar*ê de jî negihîştiye standardekê, yanî bi her du awayan jî hatiye nivîsîn. Wekî mînak: *tukesî, herkes, her kesî*.

Heke em li mijara peyvên devokî binêrin di nav metnên *Ronahî*yê de em bi rihetî dikarin rastî peyv an lêkerên devokî bên. Wekî mînak: "tavêjin, biçiwa, no, ko, divêt, weşihaye, spêhî, welê ko, dibît, digehît, bienirit, belbî, biderxist, tavêt." Heta di *Ronahî*yê de çîrokeke bi navê *Mezinê Êlê Elo Bî Wê Îşê Êlê Çilo Bî* heye, wekî ku

[643] Ronahî, h: 13, r. 228

ji sernavê wê jî diyar e nivîseke devokî ye.[644] Her wiha çîrokeke bi navê *Serpêhatî Mam-Hirç* jî heye ku di dawiya wê de bi navê *Ronahî*yê wiha hatiye nivîsîn: "Herwekî bi xwe gotiye Sebrî silopî ye, lê welê dixuyê li beriyê mezin bûye û zarê xwe ê bingehîn hilnaniye; lê yê beriyê jî bi temamî ne girtiye. Ji lewre bi zarekî tevlîhev û navîn dibêje û dinivîsîne."[645] Ji vir xuya ye ku Celadet Bedirxan destê xwe nade nivîsan û bi taybetî lêker û peyvên devokî.

Her wiha ji bo peyvan standardek nehatiye danîn, wekî mînak *biçûk* bi sê awayan xuya ye di *Ronahî*yê de: *kiçik, biçûk, piçûk*. Ev a dawî di *Hawar*ê de jî gelek tê dîtin.

Wekî din em dikarin cih bidin peyvên tirkî jî ku di *Hawar*ê de jî mînakên bi vî rengî hene: ḧemamçî[646], paşaler[647], yûzbaşî[648]

Wexta ku em li mijara lêkerên hevedudanî dinêrin, em dibînin ku *Ronahî* daye pey *Hawar*ê. Lêkerên hevedudanî yên navdêrî bi hev ve û yên pasîv û dançêker ji hev cuda hatine nivîsîn. Çend mînak ji *Ronahî*yê:

"Hikûmetê bi qazîkî xisûsî û bê pere wan gelşan dide *hel kirin*."[649] (Dançêker)

"Mezinahiya wê tucaran bi rastî ne hate *seh kirin*."[650] (Pasîv)

"Ev jî hate *hisab kirin*."[651] (Pasîv)

"[…] dest bi *agirkirinê* kir."[652] (Navdêrî)

Her wiha lêkera "binavbûn"ê jî bi awayên cuda hatiye nivîsîn wekî *Hawar*ê:

bin av kirin[653], hati be bi nav kirin[654], binavbûna Îgilê[655]

---

[644] *Ronahî*, h: 27, r. 552
[645] *Ronahî*, h: 24, r. 469
[646] *Ronahî*, h: 17, r. 307
[647] *Ronahî*, h: 23, r. 443
[648] *Ronahî*, h: 25, r. 508
[649] *Ronahî*, h: 2, r. 21
[650] *Ronahî*, h: 5, r. 73
[651] *Ronahî*, h: 5, r. 76
[652] *Ronahî*, h: 15, r. 269

Carinan bendik jî hatiye bikaranîn di navbera lêkerên hevedudanî de ku ev bi taybetî yên navdêrî ne:

"Li gora nizama nû di hûndirê fabrîkê de *resim-girtin* bend e."[656]

"Di meqamê protestoyê de an bi sebebeke din *rojî-girtin* ne tiştekî nû ye."[657]

"*gurî-bûna* evînê"[658], "*aciz-bûna* xwe"[659]

Herfa kelijandinê bi piranî wek /w/ hatiye bikaranîn, lê kêm caran em dikarin /y/yê jî bibînin. Wekî mînak: zarowên xwe, zaroyên kirêt, radyowa, ordiwa, tiwê. Her wiha di ravekên zincîrî de herfa kelijandinê nehatiye bikaranîn. Wek mînak: çêkiroxê wê ê bilind; miletê xwe miletê dinyayê ê bijarte hesibandiye; jiyîna me a civakî; bi karê xwe ê milî.

Her çi qas em niha di navbera du herfên dengdêr de herfa kelijandinê bi kar bînin jî di *Hawar* û *Ronahî*yê de çend bêje hene ku bi taybetî di wan de ev herf tune ye: bêî, teî.

Navên erdnîgarî bi piranî bi hûrdekê dest pê dikin di *Ronahî*yê de. Her çi qas di *Hawar*ê de ev mijar tevlihev be jî. Di *Ronahî*yê de bi taybetî *girav*, *çiya*, *çem*, *gelî*, *qenel* bi hûrdekê dest pê dikin:

"girava Seylanê, girava Hondoyê, girava Maltê, girava Girîtê, girava Gwadelkenalê, girava Batanê, nîvgrava Bonê, çemê Don, çemê Zihêriyê, keleha Rihaniyê, kenala Swêşê, geliyê Mizûrka, geliyê Gûzan, geliyê Hesana, ava Nîlê, çiyayê Talorikê, çiyayê Kavarê, çiyayê Nêribê, çiyayê Hekîmxanê, kaniya Diclê, pira Hîzol."

---

[653] *Ronahî*, h: 5, r. 73
[654] *Ronahî*, h: 12, r. 213
[655] *Ronahî*, h: 17, r. 315
[656] *Ronahî*, h: 11, r. 199
[657] *Ronahî*, h: 12, r. 223
[658] *Ronahî*, h: 12, r. 210
[659] *Ronahî*, h: 20, r. 386

Navên behran bi piranî bi girdekê dest pê dikin, lê di van mînakan de bêjeya duyem bi hûrdekê dest pê dikin di *Ronahî*yê de. Her wiha yên bi bendikê hatine nivîsîn jî hene. Ji van cureyan çend mînak:

"Behra-hindî, Behira-hindî, Behira hindî, Behira-spî, behira Azovê, Behira-reş, behira Qezwînê, behira Atlantîkê, behira Êgê."

Di vê rewşê de ji xeynî navê behran, mirov dikare bibêje ku ji aliyê rastnivîsê ve di navên erdnîgarî de standardek çêbûye. Bêjeya ewil bi hûrdek û ya duyem bi girdek hatine nivîsîn.

Heke em berê xwe bidin navên hêlan em dibînin ku wekî di *Hawar*ê de xuya ye, di *Ronahî*yê de jî ji bo navên hêlan cur bi cur nav hatine bikaranîn. Wekî mînak: roava, rojava, rohelat, rohel, rojhilat, rojhelat. Her wiha ev nav bi hûrdekê hatine nivîsîn. Ji xeynî vê navên bi bendik û bi hev ve jî hene. Ji bo navên aliyan çend mînak:

"nîvroyê Hindistanê, roavayê Tokyoyê, bakurê Emêrîkayê, rohelat, nîvrorohelat, nîvroroava, milê rohelê, milê roavê, bakûr-roava, nîvro, nîvro-roava, rojhilat, rojava, rojhelat"

Divê em li tewanga dîrokan jî hûr bibin, ji ber ku di *Hawar*ê de tewangên roj û salan tevlihev in, bi piranî cuda hatine nivîsîn, lê yên bi hev ve hatine nivîsîn jî hene. Mirov dikare bibêje ku di *Ronahî*yê de ev mijar gihîştiye standardekê, ango bi piranî bi hev ve hatine nivîsîn, ji xeynî çend îstisnayên ku ew jî bi piranî di metnên Osman Sebrî de xuya dibin. Ji bo vê mijarê çend mînak:

"21ê Hizêrana sala 1941ê; di sala 1920an de; di Gulana sala 1041ê û di şerekî behrî de; li 7ê Kanûna pêşîn sala 1941; li 17ê Çiriya-pêşîn; li 8ê Çiriya-pêşîn; li 8ê Çiriya-paşîn; li 14ê mehê piştî nîvê şevê; di sala 1861ê de"

Cînavkên paşnûsek bi bendikê ji lêkerê hatine cudakirin, an jî navberek hatiye danîn û cuda hatine nivîsîn. Ev mijar di *Hawar*ê de jî wisa bû. Kêm caran jî be bi hev ve hatine nivîsîn, wekî bikaranîna me ya îro, lê ev dibe ku şaşî hatibin nivîsîn, lewre

bi piranî wek her du awayên din hatine nivîsîn. Ji bo van em dikarin çend mînakan bidin:

"da-ê, ket ê, ne gihand-ê, got-ê, diçin ê, got ê, xistin ê, gihîştim ê, da ê, da-yê, dayê, dida-yê, gotê, da bû-yê, keti bûn-ê"

Heke em li herfan binêrin, em dizanin ku Celadet Bedirxan ji 31 herfan alfabeya kurmancî pêk aniye. Lê her çi qas di nav vê alfabeyê de tunebin jî, herfên /ẍ/ û /ḧ/yê bi awayekî aktîf têne bikaranîn di metnan de. Ev herf di *Hawar*ê de jî xuya dibin. Ji *Ronahî*yê çend mînak:

"ẍerîb, ẍezeb, diştеẍile, aẍa, pisaẍa, reẍma, ceẍrafî, Evdilḧelîm, ştexaliyê-ştеẍaliyê, meḧrûm, ḧeqê, kaẍez"

Her wiha ji bo navên pirtûkên pîroz an jî bêjeyên bi dîn re eleqedar em nikarin zêde tiştek destnîşan bikin, lewre berevajî *Hawar*ê kêm bêje hene di vî warî de. Em dikarin van mînakan bidin ku di van de tê dîtin pirtûkên pîroz bi hûrdekê têne nivîsîn: "Îsa pêxember, îsewiyên Protestan, incîl û tewrat"

Navên welatan wek *Hawar*ê bi girdekê hatine nivîsîn: "Ingiltere, Emêrîke, Misir, Elmanya, Trablisẍerb, Kelêdonya-nû, Zêlanda-nû"

Navên şexs, bajar an jî rojnameyên biyanî li gorî bilêvkirin û rastnivîsa kurmancî hatine nivîsîn. Di hejmarên ewil de ji bo hemûyan nebe jî, navên resen di kevanekê de hatine dayîn. Çend mînak ji bo van navan:

"Çermanof, Mak Artûr, Rûzwelt, Çorçil, Waşîngton, Cîmî, Con Roklî, Nyûz Kronikil, Emanoêl, Şarlê 12an, Karlo Bonapart, marêşal Manêrhaym, Rûso, Monteskiyo, Voltêr, Lwiyê şanzdehan, Mr. Hêlö, Corc Lêt, Newyork-Teymîs"

Qertafa dema bê bi cînavkê ve hatiye nivîsîn, di *Hawar*ê de jî her wiha ye: meê, emê, ezê.

Dubêjeyên ku di *Hawar*ê de dixuyin hem ji hev cuda, hem bi bendik û hem jî bi bêhnokê hatine nivîsîn. Di *Ronahî*yê de jî rewş wiha ye. Lê bi taybetî di metnên

Qedrîcan de dubêjeyên bi bendik û bi bêhnok xuya dibin. Her wiha navê nivîskar bi xwe jî bi bendik hatiye nivîsîn, wek *Qedrî-can*. Ji bo van bêjeyan çend mînak:

"zû zû; car-caran; hêdî hêdî; hêdî, hêdî; hêdî-hêdî; kit kit; heyran, heyran; tobe, tobe; perwaz, perwaz; çem çem; lepe-lepe; quncik-quncik; kerî, kerî; guş, guş"

Ji xeynî dubêjeyan di *Ronahî*yê de hin bêje hene ku bi bendikê hatine nivîsîn û bala mirov dikişînin. Îro em van bêjeyan bê bendik dinivîsin. Wek mînak:

"tîr-kevanên xwe; xweyî-rûmet; dinya-alem; yanzdeh-mehî; cendekê li-berderî; bejin-navîn; bi hev-ve; hûr-hûrî; kit-kitê; hûr-mûrên me; ji-xwe-hejkirî; çare-çar; ling-dilind; çira-vemirandî; xirçe-xirç; dest-lepê; ser-hatin; cil-kesk; du-sê; bejn-direj; rî-sor; ser-hesin"

Heke wekî encam em li berawirdkirina *Hawar* û *Ronahî*yê binêrin, em dikarin bibêjin ku *Hawar* deh sal berî *Ronahî*yê derketiye. Standardîzasyon û qayîdeyên rastnivîsê yên bi herfên latînî cara ewil di *Hawar*ê de derdikevin pêşiya me. Ji ber ku ceribandina ewil e, ev qayîde bi carekê temam nebûne û wekî zimanekî nivîskî yê tam derneketine. Ji ber vê ye ku em di her hejmarekê de rastî rastnivîsên curbicur tên. Dibe ku wê demê Celadet Bedirxan li ser rastnivîsê nesekinî be jî, lewre ji xeynî çend mijarên wek /i/ya beriya /y/yê, daçek an jî navên mehan, em rasterast mijarên li ser rastnivîsê nabînin.

Me di nav metnan de bala xwe da bikaranîna rastnivîsa bêjeyan. Di vê kontekstê de, mijarên wek rastnivîsîna navên taybetî, navên welat, netewe û zimanan, navên meh û rojan, navên erdnîgarî û hwd. di nav metnên *Hawar*ê de bi awayekî standard nehatine nivîsîn. Lê em dikarin bibêjin ku hejmarên dawî yên *Hawar*ê li gorî yên ewil birêkûpêktir in.

Herçî *Ronahî* ye, ji ber ku deh sal piştî *Hawar*ê derketiye, xuya ye bi awayekî profesyoneltir hatiye amade kirin. Cudahiya herî mezin a van her du kovaran jî ew e ku *Ronahî* biwêne ye. Ji aliyê mijarên ku me li jor behs kirin û ji aliyê daçek, tewanga sal û mehan ve *Ronahî* li gorî *Hawar*ê bêhtir standardîze bûye. Bingeha ku Celadet Bedirxan daniye û îro jî di gel çend guherînan em rastnivîsa xwe li ser vê bingehê ava dikin, di *Ronahî*yê de çêtir xuya dibe.

BEŞA ÇAREM

RASTNIVÎSÊN PIŞTÎ *HAWAR*Ê

Rastnivîseke xurt rêya herî hêsan a gihîştina standardîzasyonê ye. Bi qebûlkirin û belavkirina rastnivîsê, gel rêbazên zimanê xwe zû hîn dibe û hîn dike. Lê belê bêyî rêbazeke xurt, avakirina standardekê, qebûlkirin û belavkirina wê pir zehmet e. Wê çaxê her kesek li gorî xwe rêbazekê ava dike û dide dû wê. Li cem kurdan jî rewş wiha ye. Me cara ewil nivîsa bi alfabeya latînî di *Hawar*ê de dît. Ji ber ku ev pêşeng bû, gelek kesan ew şopand.

Hawar ji aliyê rastnivîsê ve mijarên serbixwe pêşberî me nake. Em dikarin ji naverokê pê derxin ka bêje, lêker, daçek, navên taybetî û hwd. çawa bi kar anîne, navên ziman, netewe, erdnîgarî bi hûrdek an bi girdekê nivîsîne. Ev ji bo me gelek giring in, lewre ev qaîde di standardîzasyona zimên de bingeh in. Wekî ku me diyar kir, ev qayde dikarin ji naveroka *Hawar*ê bêne dîtin, lê belê ji bo van sernavekî taybetî nehatiye vekirin, ji bilî çend mijaran ku bêhtir mijarên rêzimanê ne.

Piştî *Hawar*ê Arif Zêrevan e ku ev kar rakiriye ser milên xwe û gavek li standardîzasyonê zêde kiriye, ya ku Celadet Alî Bedirxan ava kiriye. Ji xeynî wî Halil Aktuğ û Kemal Burkay jî li ser rastnivîsê xebitîne. Herî dawî –ku van salên dawî derketine- *Rêbera Rastnivîsînê* ya Mustafa Aydoğan û piştî wê jî *Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmancîyê* ya Weqfa Mezopotamyayê derketine. Em ê li vir yek bi yek li ser van berheman rawestin û lê binêrin ka ji aliyê rêbazê ve çi qas li dû ya Celadet Bedirxan çûne û çi cudahî hene.

4.1. *BINGEHÊN RASTNIVÎSANDINA KURDIYÊ* YA ARIF ZÊREVAN

Berhema Arif Zêrevan ya bi navê *Bingehên Rastnivîsandina Kurdîyê (kirmancî)* di sala 1997an de li Swêdê çap bûye. Zêrevan dibêje hin zimanên wek îngilîzî û tirkî xwe dispêrin tradîsyonan. Lê yên wek fransî û swêdî jî xwe dispêrin

rêbazên gramerê ku Celadet Alî Bedirxan jî wiha kiriye, her wiha dibêje wî jî xwe spartiye rêbazên gramerê.[660]

Arif Zêrevan li ser zimanê fransî, îngilîzî, swêdî û tirkî lêkolîn kirine, *Hawar, Ronahî* û *Roja Nû* xwendine ji bo ku bizane ka Celadet Alî Bedirxan û Kamiran Bedirxan kîjan bingeh bi kar anîne. Li gorî lêkolîna wî Celadet Bedirxan ji sedî 95 bingeha fransî bi kar aniye.[661]

Wekî ku em ji berhemê jî dibînin, Zêrevan gihaneka *ku*yê wekî Celadet Bedirxan wek *ko* bi kar aniye û dide zanîn ku di kurdî de herfa /u/yê tune ye û ev deng biyanî ye. Meseleya gihaneka *ko*yê wiha destnîşan dike:

> Herwiha min gihaneka "ko-yê" jî wekî Celadetî nivîsandiye. Hem Celadetî û hem Kamiranî heta mirina xwe jî ev gihanek wekî "ko" nivîsandine. Ji ber ko "u" di eslê xwe de di kurdiyê de nîne (mirov dikare "kwirdî" jî binivîsîne) û dengekê biyanî ye. Miadilê wî dengî di kurdiyê de "wi" ye. Di hinek bêjeyan de ev "wi" pêk ve kelayî ne û bûne "u" (kurd, kuştin, kulav), di hinek bêjeyan de jî "w" ketiye "i" maye (gihan, kirmanc, kirm, hingivî). Ji ber ko "o-ya" di "ko-yê" de ne ew "wi-ya" pêkvekelayî ye nikare bibe "u". Piştî mirina Celadetî û Kamiranî bi çi awayî "ku" belav bû ez nizanim.[662]

Mijareke din jî tewandina navê zimên e ku ji sernavê berhema Zêrevanî xuya ye: *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê.* Li gorî Zêrevan ev awayê tewandinê zêde ne berbelav e, lê dibêje ji ber ku navên zimanan navdêrên mê ne, dikarin bêne tewandin. Lê wexta wek rengdêr têne bikaranîn wek *zimanê kurdî* wê çaxê nayên tewandin.[663] Ji ber vê ne xerîb e ku em tewandineke wiha di berhema wî de dibînin. Her çi qas pir neyê bikaranîn jî em dikarin vê yekê di navê berhema Weqfa Mezopotamyayê de jî bibînin ku navê wê wek *Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmancîyê* danîne.

---

[660] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (Kirmancî)*, Nefel, Sweden 1997, r. 13
[661] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê,* r. 14
[662] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê,* r. 14
[663] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê,* r. 15

Her wiha Zêrevan lêkerên hevedudanî yên di halê dançêker û pasîv de jî ji hev cuda nivîsîne ku ev yek jî nîqaşek e di nav zimannasan de. Wek mînak: têt diyar kirin, bêt dest nîşan kirin.[664] Celadet Bedirxan jî ev cure lêker ji hev cuda nivîsîne.

Meseleya unwanan di *Hawar*ê de negihîştiye standardekê; carinan bi girdek, carinan jî bi hûrdekê hatine nivîsîn. Zêrevan unwanan hûrdek nîşan dide: prîns Wilhelm, kralîçe Krîstîna, madam Curie û hwd.[665] Dibe ku ev ji ber *Ronahî*yê be. Her çi qas di *Hawar*ê de carinan bi hûrdek carinan bi girdek hatibin nivîsîn jî, ev qaîde di *Ronahî*yê bêhtir bi hûrdekê ye.

Navên erdnîgarî di *Hawar*ê de bi çend cureyên cuda hatine nivîsîn. Bi taybetî navên hêlan bi bêjeyekê ve hatine cem hev carinan bi hûrdek, carinan bi girdekê hatine nivîsîn, carinan jî di navberê de bendik heye. Zêrevan di vê mijarê de wiha dibêje: "Heger mirov cotnavê hinek cihên cografîk bi bendikê (-) pêk ve girê bide divêt navê didoyê bi hûrekê bêt nivîsandin.

Rojhilata-nêvê, Rojhilata-dûr, Latîn-emerîka, San-salwador"[666]

Der barê rastnivîsîna bêjeyên demdiyarker de Zêrevan, Celadet Bedirxanî rexne dike û wiha dibêje:

> Bêjeyên demdiyarker bi hûrekê tên nivîsandin. Ev ji bo navê roj, heyîv û demsalan jî welê ye. Celadet Alî Bedir-Xan navê roj, heyîv û demsalan bi girdekê dinivîse. Ez gelekê lê xebitîm ko fam bikim ka çima wî welê kiriye, lê li ti deran min bersivek nedît. Ji ber em dizanin ko Celadet Alî Bedir-Xan navê netewe û zimanan bi hûrekê dinivîse. Celadetî di mesela hûrek û girdekan de hertim wekî fransiyê hereke kiriye, lê tenê di bêjeyên demdiyarker de welê nekiriye. Bi ya min divêt mirov navê roj, heyîv û demsalan bi hûrekê binivîse.[667]

Li gorî vê ravekirina Zêrevanî, Celadet Bedirxan "navê roj, heyîv û demsalan bi girdekan dinivîse". Lê me berê behs kiribû; di *Hawar*ê de ji bo vê yekê standardek çênebûye. Mesela navên demsalan carinan bi girdek, carinan jî bi hûrdekê hatine

[664] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê,* r. 24
[665] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê,* r. 56
[666] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê,* r. 56
[667] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê,* r. 62

nivîsîn, lê di *Rohanî*yê de bi piranî bi girdekê hatine nivîsîn. Dibe ku Arif Zêrevan behsa qaydeya *Ronahî*yê dike. An jî navên mehên ku ji du bêjeyan pêk tên carinan bi hûrdekê dest pê kirine, carinan her du bêje jî bi hûrdek an bi girdekê dest pê kirine.

Her wiha Zêrevan bendik datîne navbera hejmar û tewangê: "Sala 1965-ê xwidê ez dam."[668] Lê di *Hawar*ê de tewang bi piranî bi hejmarê ve hatiye nivîsîn, carinan jî cuda hatiye nivîsîn. Her wiha Zêrevan bendikê di nivîsîna emr (sal) de jî bi kar tîne: 70-salî.[669] Zêrevan tercîha xwe ya bikaranîna bendikê bi vî awayî tîne zimên:

> Bi ya min, riya herî baş ew e ko mirov bendikê bi kar bîne, ji ber apostrof xeta rêzê xirab dike û welê dike ko çavên mirovî ji rêzê derdikevin û paşê jî li rêzê vedigerin. Bênîşandekî jî rê lê vedike ko mirov reqeman baş vavêr neke û di resmê bêjeyê de kirêtiyekê çêdike. Lê bendik hem ji rêzê dernakeve, hem resmê bêjeyê xirab nake û hem jî arîkariya çavên mirovî dike ko mirov pêş de here û xwendina xwe bêyî ko bihilingive berdewam bike.[670]

Nîqaşa zayenda tewanga hejmaran jî di berhema Zêrevan de hatiye kirin ku li gorî wî zayenda hemû hejmaran mê ye û vê yekê ji bikaranînên din "rasttir" dibîne: "Di kirmanciyê de zayenda hemî jimarnavên bingehî mê ye û ew bi "ê"-yê têne tewandin. Botî, hacî beyrî, behdînî, hekarî û klasîkên kirmancî jimarnavan mê dihesibînin û bi qenaeta min ev ji wan tewangên dî rasttir e."[671]

Lê ne Celadet Bedirxan, ne *Rêber*a Mistefa Aydogan û ne jî Komxebata Kurmancîyê wiha dibêjin. Her wiha Zêrevan di vê mijarê de jî Celadet Bedirxanî rexne dike:

> Celadet dibêje ji ber ko zayenda "çarê" gelejimar e ew navdêra xwe jî li gor xwe ditewîne. Lê rastî ne welê ye. Ji ber ko ne jimarnavê tewanga xwe daye navdêrê, tewanga gelejimara navdêrê bi jimarnavê ve bûye. Gava em "ez çaran dibînim" dibêjin navdêreka veşartî heye ko em bi nav nakin. Divêt em bibêjin "ez çar zelaman dibînim" yan "ez çar tiştan dibînim". Heger ko bi rastî jî

[668] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê,* r. 67
[669] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, r. 120
[670] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, r. 133
[671] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, r. 72

tewanga jimarnavê tehsîr li navdêrê bikira divêt me "ez yek zelamê dibînim" binivîsanda ji ber ko zayenda "yekê" mê ye.[672]

Yek ji mijarên ku pir tê nîqaşkirin ya veqetandekan e. Zêrevan ji bo veqetandekên nebinavkirî "-eka" (mê) û "-ekê" (nêr) bi kar tîne û dibêje "-eka" ji bo sivikahiyê di axaftinê de bûye "-eke".[673]

Li gorî wî veqetandeka nêr jî di orîjînala xwe de "yê di" ye, ango "Hesp yê di Keremî".[674] Bi demê re *di* ketiye û /ê/ jî bi bêjeyê ve zeliqiye. Vê mijarê wiha rave dike: "Ew 'ê-'ya ko dikeve paşiya veqetandeka navdêra nebinavkirî wekî 'ê-'ya ko dikeve paşiya veqetandeka navdêra binavkirî ye. Herdu 'ê' jî ji pronava işarkî "yê"-yê çêbûyî ne."[675]

Her wiha vê guhartinê jî wek "sivikkirin" destnîşan dike:

Guhortina ko li hinek deverên Kurdistanê ketiye veqetandeka navdêrên nebinavkirî, ya ji bo yekejimara zayenda nêr, ji sivikkirinê pê ve ne titişt e. çawa ko li hinek deveran "jineka spehî" dikin "jineke spehî", welê "zelamekê têr" jî sivik dikin û dibêjin "zelamekî têr". Yan ne, bi ti awayî mirov nikare "zelamekî têr" biparêze. Ev guhortin bi xwe re du problemên mezin tîne: 1) nediyarbûna tewang û veqetandekê, 2) guhortine rengdêran bi hokeran.[676]

Bi vî awayî nediyariya navbera tewang û veqetandekê nîşan dide ku M. Aydogan jî behsa vê tevliheviyê dike di *Rêber*a xwe de.[677]

Arif Zêrevan beşeke fireh veqetandiye ji bo xalbendiyê. Bi piranî rêbazên gelemperî ne, lê der barê bêhnokê de dibêje berî gihanekê dikare bê danîn û mînakeke wiha dide:

'Turîstên elmanî pir diçin Tirkiye û Suriyeyê, û pir hindik diçin Iraqê.'"[678]

---

[672] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, r. 74
[673] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, rr. 85-86
[674] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, r. 84
[675] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, r. 87
[676] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, rr. 87-88
[677] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, r. 88
[678] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, r. 110

Ev awayê bêhnoka berî /û/yê di *Hawar* û *Ronahî*yê de jî gelek caran dikare bê dîtin, lê îro pir nayê bikaranîn. Her wiha Zêrevan cudahiyek wiha jî dike û dibêje: "Ya baş ew e ko mirov bihnokê daneyne nêvbera du komekên ko parçeyeka hevpişk di komekekê de hebin (…) Mirov bihnokê danayne nêvbera komekeka sereke û hevokeka bi gihanekê lêk hatî girêdan."[679]

Bi van mijarên sereke em dibînin ku Arif Zêrevan berî her tiştî bi gihaneka *ko*yê ya Celadet Bedirxan, di piraniya mijaran de xwe dispêre wî. Lê di hin mijarên wek tewangê de ji Celadet Bedirxan cudatir difikire.

4.2. *DERSÊN ZMANÊ KURDÎ* YA KEMAL BURKAY

Berhema *Dersên Zmanê Kurdî* ya Kemal Burkay cara ewil di 1988an de li Stockholmê çap bûye. Çapa li ber destê me ya şeşemîn e ku di 2004an de li Stenbolê derketiye. Her çi qas navê wê bi kurmancî jî be, vegotina berhemê bi tirkî ye.

Em nikarin bibêjin ku ev berhemeke rastnivîsê ye. Berhem, tevî metnên kurmancî cih daye peyvên kurmancî-tirkî û her wiha mijarên rêzimanê. Ji alfabeyê dest pê dike, bi kişandina lêkeran, hîndekariyan û bikaranîna hevokan berhem geş bûye. Her çi qas mijara me ne rêziman be jî, me xwest em li ser vê berhemê jî rawestin da ku bizanibin ka piştî rêbazên Celadet Bedirxan çi hatine guherandin an jî kîjan rê hatiye şopandin. Em ê li ser hemû lêkeran nesekinin, her çi qas em tê de kişandinên cuda bibînin jî. Lewre em naxwazin mijara me derkeve derveyî armanca xwe.

Wekî ku ji navê wê jî diyar e, Burkay şûna bêjeya *zimanê zmên* bi kar aniye, wekî hejmarên pêşîn ên *Hawar*ê ku piştre ev bêje bi *ziman* guheriye. Mînakeke wekî vê jî lêkera *firotin*ê ye ku Burkay gotiye *frot*.[680]

Di pêşgotinê de herfa /İ/yê hatiye bikaranîn, lê ev di alfabeya kurmancî de tune ye, her wiha di alfabeya zimanên ewrûpî de jî tune ye. Dibe ku Burkay mabe di bin bandora tirkî de.[681] Wekî din, bi vê mijarê re eleqedar, di vê pêşgotinê de hatiye

[679] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, r. 110
[680] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* Weşanên Deng, Çapa Şeşemîn, İstanbul 2004, r. 76
[681] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 5

diyarkirin ku heta niha herfên /i/, /î/ wek ya tirkî /ı/, /i/ dihatin nivîsîn, lê di vê çapê de hatiye guherandin û wek standarda kurmanciya îro hatiye nivîsîn.[682]

Tewanga piştî hejmar an jî salan, di nav zimannasan de nîqaşek e. Celadet Bedirxan bi xwe jî tewangê carinan ji hejmaran cuda, carinan jî bi hev ve nivîsiye di *Hawar*ê de. Arif Zêrevan di *Bingehên rastnivîsandina kurdiyê* de bendikek daniye navbera tewang û salan. Her du *Rêber*ên Mistefa Aydogan û Komxebata Kurmancîyê jî nivîsîna bi hev ve tercîh dikin. Ji xeynî van bikaranînan yên ku apostrof bi kar tînin jî hene. Ya Burkay naşibe yek ji van jî, nivîskar salan bêtewang dinivîse.[683]

Yek ji mijarên nîqaşbar jî ya daçekan e. Em dixwazin bibêjin ku Burkay di vê berhema xwe de bikaranîna paşdaçekên "da, ra, va" tercîh dike. Wekî mînak:

"Di gund da dibistan jî heye."[684]

"Dibistan ji wî ra dûr e."[685]

"Çanda me wê pêş va biçe."[686]

Ji xeynî bikaranîna "da, ra, va"yê, ji aliyê wateyê ve jî di nav daçekan de tevliheviyek heye. Wexta bazinedaçeka "di…da"yê dide nasîn, çend mînakên wiha dide:

Di mal da: evde

Di salê carê da: yılda bir kez[687]

Mirov ji van hevokan dikare fam bike ku Burkay maye di bin bandora tirkî de. Bazinedaçekên "di…de/da" û daçeka "li"yê gelek têne tevlihevkirin. Divê em fam bikin ku "li" ji bo cihên firehtir, ango cihekî tam ne diyar tê bikaranîn. Wexta em dibêjin "ez li malê me", ne diyar e ka ez li odeyê, baxçe an salonê me, bes diyar e ku ez li malê, li derekê me. Her wiha "di…de" cihê tam ez lê me diyar dike: Ez di

[682] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 5
[683] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 5
[684] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 30
[685] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 33
[686] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî*, r. 128
[687] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 28

odeyê de me. Ji ber vê yekê nabe ku em bibêjin “ez di mal da me”. Ji xeynî vê, wexta em li mînaka duyemîn binêrin, em dikarin bibêjin ku di kurmancî de ji xwe bikaranînek wiha tune ye. Ango em nabêjin “di salê carê da”, lê em dibêjin “salê carekê”.

Her wiha du mînakên wiha jî dane: “Li mal” û “Di mal da” ku beranberî her duyan jî bi tirkî gotiye “Evde”.[688] Em dikarin bibêjin ku li gorî Burkay ferqa van her du mînakan tune ye, her du jî di heman wateyê de ne. Lê wekî me li jor jî diyar kir, cihên bikaranîna “li” û “di…de”yê ji hev cuda ne.

Kemal Burkay /i/ya beriya /y/yê, ku ev jî yek ji nîqaşên demdirêj e, wek /î/ dinivîse: “Ceh û genim li zevîyan zer dibin.”[689] Wekî ku me di beşa standardîzasyona *Hawar*ê de diyar kir, Celadet Bedirxan jî di serî de berî /y/yê /î/ bi kar aniye, lê piştre kiriye /i/. Lê Burkay li ser nîqaşa vê nesekiniye ka ji ber çi /î/ bi kar aniye.

Navê zimanan bi girdekê hatine nivîsîn, wek: Kurdî, Tirkî.[690] Ev jî dibe ku ji ber bandora zimanê tirkî be ku di vî zimanî de jî navên zimanan bi girdekê têne nivîsîn.

Beşa ewil a berhemê nasandin û bilêvkirina herfan e. Yek ji van herfan /v/ ye ku ji bo wê gotiye bilêvkirina wê wek /v/ya almanî ye. Her wiha ji bo /w/yê jî gotiye wek dengê /v/yê ya tirkî ye.[691] Lê divê em bibêjin ku /v/ya kurmancî û tirkî wek hev têne bilêvkirin. Wek mînak *viyan* û *varlık*. Herfa ewil a her duyan jî wek hev derdikeve ji devê mirov. Her wiha /w/ya kurmancî dengê /v/ya tirkî nade, qet naşibê jî. Mirov dikare bibêje ku wek “waw”a erebî ye. Ango wexta ku mirov /v/yê bi lêv dike, diranê mirov digihîje lêva jêr, lê wexta mirov /w/yê bi lêv dike, lêv û diran li hev nakevin.

Herfeke din a ku divê em li ser bisekinin /x/ ye. Ji bo /x/yê dibêje du bilêvkirinên wê hene, yek wek /ğ/ya tirkî tê bilêvkirin, ya din jî hinek hişktir e û di tirkî de tune ye.[692] Rast e, du rengên /x/yê hene. Lê divê bê diyarkirin ku /ğ/ya[693] tirkî

[688] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 34
[689] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 51
[690] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 8
[691] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî*, r. 13
[692] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 13

û /x/ya kurmancî tu car wekhev nayên bilêvkirin. /x/ ji qirikê derdikeve, di tirkî de herfek ku ji qirikê derdikeve tune ye. Wek mînakên *yağmur* û *ağa*yê. Rastiyek wiha heye ku tirk ji qirikê bi lêv nakin van peyvan, lê kurmanc /ğ/ya tirkî wek /x/ya kurdî bi lêv dikin, ango tu car nabêjin *ağa*, lê dibêjin *axa*.

Halê nivîskî yê çend hejmaran jî wek yên gelemperî nehatiye nivîsîn di vê berhemê de. Ji bo *heşt, hejdeh, heştê* û *hevdeh* gotiye *heyşt, heyştdeh, heyştê* û *heftdeh*".[694]

Burkay lêkerên wek *navro kirin, şîv kirin* û *taştî kirin* çêkirine û di nav hevokê de mînakên van lêkeran jî dane:

"Ez navroya xwe dikim" (xwarina nîvro)

"Hesen şîva xwe dike" (Hesen şîvê dixwe)

"Gundî taştîya xwe dikin" (Gundî taştê dixwin)[695]

Lê kurmanc ji bo xwarinê *kirin* nabêjin, dibêjin "Ez taştê dixwim". Mirov dikare bibêje ji ber bandora tirkî wiha bi kar aniye, lê di tirkî de jî tenê ji bo *taştê* lêkera *kirin*ê tê bikaranîn, ango "kahvaltı yapıyorum". Ji bo danên din, ew jî lêkera *xwarin*ê bi kar tînin.

Mehên salê di berhema Burkay de wiha hatine diyarkirin: Çileyê Paşîn, Sibat, Adar, Nîsan, Gulan, Hizêran, Tîrmeh, Tebax, Îlon, Çirîya Pêşîn, Çirîya Paşîn, Çileyê Pêşîn.[696] Ev nav di *Hawar*ê de jî wiha ne.

Wekî ku em dizanin Celadet Bedirxan qertafên neyîniyê bi piranî cuda nivîsîne di *Hawar*ê de. Burkay jî di dema borî de bi vî awayî nivîsiye: Min ne got, min ne kir[697], ne dît.[698] Dibe ku ev jî ji ber bandora *Hawar*ê be.

---

[693] Heta tirk ji bo vê herfê dibêjin "yumuşak g". Ango ne di gotina navê wê de, ne jî di bilêvkirina bêjeyan de dengê "x"yê ji devê wan dernakeve.
[694] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 26
[695] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* rr. 67-68
[696] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 70
[697] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 76
[698] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 132

Burkay navên rojan wiha rêz kirine: şemî, yekşemî, duşemî, sêşemî, çarşemî, pêncşemî, înî.[699] Wekî ku me nîşan dabû, navên rojan bi /b/yê diqedin di *Hawar*ê de, wek yekşemb, duşemb û hwd. Rêberên rastnivîsînê yên Aydogan û Komxebatê jî wek yekşem, duşem, ango wek bikaranîna îro nivîsîne. Lê ya Burkay ji van cudatir e, di dawiya her yekê de /î/ heye.

Her wiha Burkay jî di kêşana demên hevedudanî de *bû*yê ji lêkerê cuda dinivîse ku ev awa di *Hawar*ê de jî pir berbelav e: Te, wî, wê anî bû.[700]

4.3. *RASTNIVÎSA KURDÎ* YA HALİL AKTUĞ

Yek ji rastnivîsên ku piştî Celadet Bedirxan derketiye *Rastnivîsa Kurdî (Kurmancî)* ya Halil Aktuğ e ku di 2019an de ji weşanên Sîtavê derketiye. Ev berhem hem bi kurmancî, hem bi tirkî hatiye vegotin, ango beranberî her rûpeleke kurmancî, yeke tirkî heye. Berhem 533 rûpel e, lê mijarên rastnivîsê heta 165an e, ji 166an pê ve heta dawiya pirtûkê li gorî rêza alfabeyê peyv hatine dayîn. Lê armanca vê ne diyar e, lewre ne ferheng e, ango hemberî peyvan raveyeke bi kurmancî an jî tirkî tune ye. Bi tenê peyvên kurmancî hatine rêzkirin.

Em ê li ser hemû mijarên vê berhemê nesekinin, lewre ev derdikeve derveyî mijara me. Mijarên vê berhemê hema hema bi berhemên din re wek hev in. Ji ber vê, em ê tenê li ser çend mijaran bisekinin.

Halil Aktuğ /i/ya berî /y/yê wek /î/ qebûl dike. Heta dibêje "di kurdî de, di tu peyvan de berî /y/yê /i/ nayê bikaranîn.[701] Wekî ku me li jor diyar kir Kemal Burkay jî bi vî awayî difikire.

Di nasandina herfan de behsa /û/yê dike û dibêje "Dengê 'û'ya kurdî nêzikî dengê 'ü'ya tirkî ye."[702] Divê em diyar bikin ku ev deng bi piranî wek /u/ya tirkî ye. Lê li hin deveran wek Serhed û Botanê ev deng wek /ü/ derdikeve. Wekî mînak bilêvkirina "bûk, kûr, dûr"ê wek /ü/ya tirkî ye, ango wek "bük, kür, dür" tê bilêvkirin li van deveran.

---

[699] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 92
[700] Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî,* r. 149
[701] Halil Aktuğ, *Rastnivîsa Kurdî (Kurmancî) Kürtçe İmlâ Kılavuzu*, Sîtav, Ankara 2019, r. 16
[702] Halil Aktuğ, *Rastnivîsa Kurdî,* r. 18

Her wiha nivîskar behsa pevdengê dike û dibêje "du dengdar bi hev re tên nivîsandin û xwendin."[703] Wek mînak jî /xw/, /sp/ û /st/yê nîşan dide. Lê ferqek di nav van herfan de heye. Wekî ku em dizanin /xw/ dîftong e, di dema bilêvkirinê de her du deng bi yek carî derdikevin ji devê mirov, ango /x/ ji qirikê û /w/ jî ji lêvan derdikevin. Herçî /sp/ û /st/ ye, ev wexta ku têne bilêvkirin dengê /i/yê dikeve navbera van herfan. Wekî ku /i/yeke pir sivik hebe di nav de. Wekî mînak, wexta ku em dibêjin *stran*, /st/ bi hev re dernakevin ji devê me, ewil /s/ piştre /t/, her wiha çawa ku di navbera wan de /i/yek hebe, dengek wisa tê bihîstin. Ji ber vê divê dîftonga /xw/ û dengên /st/, /sp/yê neyên tevlihevkirin.

Nivîskar di hin bêjeyan de qertafa {-a}yê bi kar aniye. Lê mirov nizane ev qertafa pirhejmariyê ye an yekhejmariyê. Heke ya yekhejmariyê be, ev qertaf mê ye an nêr? Lê heke pirhejmar be, qertafeke wiha di pirhejmariyê de tune ye. Du mînak ji pirtûka wî: "Çimku di vê hevokê de peyva 'başûr' raveka *rengdêra* ye.", "Di zimanên dinyayê de navê *hêla* bi serê xwe (bi tenê) nebûne navê *herêma*."[704]

Her wiha ji ber ku daçek jî nîqaşeke domdar e, em dixwazin bibêjin ku Aktuğ jî paşdaçekan wek "de, re, ve" qebûl dike. Lê tevliheviyek wek ya Kemal Burkay di vê berhemê de jî heye. Xuya ye Aktuğ jî daçekên "li" û "di…de"yê tevlihev dike: "Zozan di mal de ye."[705] Li vir divê daçeka "li"yê bê bikaranîn, ji ber ku nediyariyeke cihê Zozan heye ka li kîjan derê malê ye. Ji ber vê divê ev hevok wiha be: "Zozan li malê ye."

Hevokeke din jî ev e: "Ji mal de derket."[706] Bikaranîneke bi vî rengî tune ye di kurmancî de. Divê ev hevok wiha be "Ji malê derket." Ji ber ku "ji" û "de" dijî hev in. "Ji" bi piranî wek "-den"a tirkî tê bikaranîn, an jî wek "from"a îngilîzî û "de"ya fransî. Lê "de"ya ku Aktuğ bi kar aniye cihekî hûndirîn nîşan dide. Yanî wexta ku em ji malê derdikevin, nabe ku em nava wê jî bi "de"yê nîşan bidin.

Mijara tewangên hejmaran jî têra xwe gengeşe û tevliheviyekê çêdike. Lê Celadet Bedirxan dibêje ji diduyan heta nozdehan, hejmar bi {-an}ê têne tewandin,

[703] Halil Aktuğ, *Rastnivîsa Kurdî*, r. 24
[704] Halil Aktuğ, *Rastnivîsa Kurdî*, r. 38
[705] Halil Aktuğ, *Rastnivîsa Kurdî*, r. 50
[706] Halil Aktuğ, *Rastnivîsa Kurdî*, r. 50

yên dawiya wan bi sifirê diqedin bi /î/yê têne tewandin. Lê Aktuğ dibêje: "Qertafa '-î' di şûna qertafa pirhijmarîyê '-an'ê de ye."[707] Her wiha dibêje ji bo ku tevlihevî çênebe navdêrên piştî hejmarên ku bi sifirê diqedin, divê mirov qertafa {-an}ê bi kar bîne şûna /î/yê.[708]

Di meseleya qertafên dema bê de her nivîskar ji bo standardîzasyonê fikira xwe aniye zimên û tercîha xwe gotiye. Lê Aktuğ hemûyan (ê, dê, yê, wê) qebûl dike, her wiha dibêje: "Di lêkeran de nivîsandina daçeka dema bê 'ê' bi cinavkan ve tê nivîsandin."[709] Lê "dê, yê, wê" cuda dinivîse.

Di rastnivîsekê de divê ji bo demekê çend cure tunebin. Ev devokî ne û ji xwe ji ber berfirehbûna devokan e ku di kurmanciyê de gihîştina standardekê zehmet e û rêyên asê derdikevin pêşiya me. Ji ber ku em hê jî negihîştine standardekê, em dikarin bibêjin ku rastnivîsek, ku bi taybetî ji bo standarda zimên tê amadekirin, divê rê nede gengeşiyan û ji zimên a herî baş hilbijêre.

4.4. *RÊBERA RASTNIVÎSÎNÊ* YA MISTEFA AYDOGAN Û YA KOMXEBATA KURMANCÎYÊ

Em ê di vê beşê de li ser *Rêbera Rastnivîsînê* ya Mistefa Aydogan û *Rêbera Rastnivîsînê* ya Weqfa Mezopotamyayê bisekinin ku ev a dawî li ser navê Komxebata Kurmancîyê weşiyaye. Wekî ku ji navên van berheman jî diyar e, ev her du jî li ser rastnivîsîna kurmancî hatine amadekirin. *Rêber*a[710] Mistefa Aydoganî di 2012an de çap bûye û ya Komxebata Kurmancîyê jî di sala 2019an de çap bûye. Xebata Aydoganî xebateke serbixwe ye û ya Komxebata Kurmancîyê, çawa ku ji navê wê jî diyar e, komxebatek e ku ji 18 endamên wek lêkolîner û zimannasan pêk tê. Bingeha xebata Komxebata Kurmancîyê li ser a Mistefa Aydogan hatiye

[707] Halil Aktuğ, *Rastnivîsa Kurdî,* r. 72
[708] Halil Aktuğ, *Rastnivîsa Kurdî,* r. 72
[709] Halil Aktuğ, *Rastnivîsa Kurdî,* r. 136
[710] Em ê ji niha pê ve ji bo *Rêbera Rastnivîsînê* tenê *Rêber* bi kar bînin.

avakirin.[711] Ji ber vê lêkolîna me ya li ser van her du berheman dê di bin banê heman sernavî de be.

Van her du berheman jî di serî de behsa giringiya standardîzasyonê kiriye û di her duyan de jî heman gotin derbas dibe:

> Ji bo nivîsîneka baş, birêkûpêk, fambar û herweha ji bo berlêgirtina tevlihevî û sergêjîyan qayîdeyên zelal –çi yên ku xwe bispêrin rêzimanê, çi jî yên ku xwe bispêrin hevfikirî û lihevkirinê- şert in. Lewra gava ku qayîdeyên rastnivîsînê yên li ser bingehên navbirî hebin, xwendin hêsantir û zelaltir dibe. Rê li ber têgihîştinên şaş venabe. Herweha naveroka zimanê nivîskî jî bi mebesta xwe ra guncayî dihê ragihandin.[712]

Em dikarin bibêjin ku di navbera her du berheman de zêde ferq tune ye, Komxebata Kurmancîyê çi qas hin aliyên rastnivîsîna Mistefa Aydoganî revîze kiribe jî, bi piranî jê zêde ne cuda ye. Em ê bi hûrgilî lê binêrin û bi *Hawar*ê jî bidin ber hev.

Mistefa Aydogan li ser *herf*, *tîp* û *pît*ê nîqaş dike û dibêje *pît* metateza *tîp*ê ye û ev bi xwe jî ji zimanê yûnanî derbasî latînî bûye, piştre bi rêya fransî û îngilîzî derbasî zimanê kurdî bûye. Her wiha dibêje: "Ango 'tîp' bêjeyeka bîyanî ye. Herf jî ji zimanê erebî hatiye wergirtin. Lê tarîxa bikarînana wê ya di kurmancîyê de ji ya tîpê/pîtê jî kevntir e û ew zêdetir dihê naskirin."[713] Ji ber vê Aydogan bikaranîna *herf*ê tercîh dike. Berevajî vê, Komxebatê bêyî îzahkirinekê *tîp* qebûl kiriye û ew bi kar aniye.[714]

Her wiha Celadet Bedirxan di *Hawar*ê de hem *herf* hem jî *tîp* bi kar tîne:

"Elfabêya qurdî ji sih û yeq *herfan* hevedudanî ye."[715]

"Belê Gelawêj kovareke hêja ye (…) Ji ber ko ew ne bi *tîpên* kurdî lê bi *herfên erebî* hati bû çap kirin."[716]

---

[711] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 18
[712] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 15; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* Rûpel, İstanbul 2012, r. 20
[713] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 25
[714] bnr. Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 19
[715] *Hawar*, c: 1, h: 1, r. 25

Navên welat û paytextan di her du rastnivîsan de jî bi herfa girdekê dest pê kiriye lê navên pereyan ji hev cuda hatine nivîsîn: Aydoganî gotiye "yekîneyên pereyan" û bi girdekê dest pê kiriye, lê Komxebatê gotiye "yekeyên pereyan" û bi hûrdekê dest pê kiriye.[717]

Celadet Bedirxan li ser vê nîqaşeke taybetî venekiriye, lê wexta heqê *Hawar*ê diyar kiriye, di hejmarên ewil de hem bi girdek hem bi hûrdekê nivîsiye:

"500 kirûş-Sûriye – 100 frenq" û wexta ji bo welatên din diyar kiriye, vê carê bi girdekê nivîsiye:

"150 Frenq"[718]

Di hejmara 28an de bi awayekî kurt nivîsiye:

"500 Q. S."[719]

Ji hejmara 29an heta 54an bi girdekê nivîsiye û mirov difikire ku standardeke wisa daniye, lê belê ji hejmara 55an pê ve dîsa bi hûrdekê nivîsiye:

"500 Qirûşên Sûriye"[720]

"Ji bo Sûriyê 5 lîreyên Sûriye – Ji bo welatên din lîrekî îngilîzî"[721]

Navên netewe û zimanan bi hûrdekê hatine nivîsandin di her du berheman de jî. Wek mînak: alman-almanî, faris-farisî.[722]

Lê di vê mijarê de standardîzasyonek tune ye di *Hawar*ê de. Hem netewe hem ziman carinan bi hûrdekê, carinan bi girdekê dest pê dikin. Lê di *Ronahî*yê de bi piranî bi hûrdekê hatine nivîsîn. Ji ber vê mirov a bi awayê nivîsîna bi herfên hûrdek dikare wek standardîzasyona Celadet Bedirxan diyar bike.

---

[716] *Hawar*, c: 2, h: 27, r. 692
[717] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 30; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 42
[718] *Hawar*, c: 1, h: 1, r. 42
[719] *Hawar*, c: 2, h: 27, r. 702
[720] *Hawar*, c: 2, h: 28, r. 722
[721] *Hawar*, c: 2, h: 54, r. 1122
[722] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 38; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 51

Navên hêlan di van her du berheman de jî bi hûrdekê dest pê dikin. Mînak: bakur, başûr, rojava, rojhilat. Her wiha hêla welatekî jî bi hûrdekê dest pê dike û ewil hêl, piştre welat tê nîşandan. Mînak: bakurê Kurdistanê, başûrê Kurdistanê.[723]

Her du awa jî di *Hawar*ê de hatine bikaranîn. Ango navê hêlan hem di pêşiya navê welêt/bajêr hem di paşiyê de hatiye bikaranîn:

"Di nîveka *Kurdistana bakur* û navbera bajarên Sêrt, Mûş, Bidlîs û Diyarbekirê da bi navê çiyayê Sasonê çiyayek heye."[724]

"Dîsa di *bakurê Skenderonê* da 14 eşîr rûdinin."[725]

"Ew li Mûşê hatiye dinê li ciyekî dûr; ji kenarê *bakurê Kurdistanê*."[726]

"Di *rojhelatê Cizîrê* de meydaneke fireh û mezin e."[727]

Navên hêlan bi awayekî standard nehatine nivîsîn di *Hawar*ê de. Em dikarin van navan bibînin:

"Bakur, baku, rojava, roava, rova, rojhelat, rohelat, rohel, nîvro, nîvrorohel, nîvrorohelat"

Lê belê di her du *Rêber*ên navborî de standardek hatiye danîn ji bo van navan:

"Hêlên sereke: bakur, başûr, rojhilat, rojava.

Hêlên nesereke: bakurrojava, bakurrojhilat, başûrrojava, başûrrojhilat."[728]

Navên rojan di her du rastnivîsan de bi hûrdekan dest pê dikin û bi vî awayî ne: yekşem, duşem, sêşem, çarşem, pêncşem, înî, şemî.[729]

Navên rojan wekî ku me berê behs kiribû, berevajî van her du Rêberan bi /b/yê diqedin di *Hawar*ê de, wek yekşemb, duşemb.[730] Ev herf îro ketiye û nayê

[723] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 40; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 52
[724] *Hawar*, c: 2, h: 27, r. 692
[725] *Hawar*, c: 2, h: 29, r. 731
[726] *Hawar*, c: 2, h: 30, r. 757
[727] *Hawar*, c: 2, h: 25, r. 651
[728] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 39; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 52-53
[729] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 41; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 55

bikaranîn. Her wiha *şemî* carinan wek *şembî* û carinan jî wek *şembih* derbas dibe û navên rojan carinan bi hûrdekê, carinan jî bi girdekê derbas dibin di *Hawar*ê de.

Navên demsalan di her du rastnivîsan de wiha hatine nîşandan: bihar, havîn, payîz, zivistan.[731] Her wiha tê nîşandan ku navên demsalan bi hûrdekê tên nivîsîn.

Lê di *Hawar*ê de navên demsalan hem bi awayên cuda hatine nivîsîn, hem jî carinan bi hûrdekê carinan bi girdekê dest pê dikin. Wek mînak: payîz, pehîz, paîz, bihar, bihar, zivistan, havîn.[732]

Navên mehan wekî ku tê zanîn di berheman de cuda cuda têne dîtin. Bi taybetî jî navên mehên 11, 12, 1 û 2yem. Mistefa Aydogan li gorî nivîskar û berheman lêkolînek kiriye û navên mehan ên cuda nîşan dane di berhema xwe de.[733] Ji bo standardîzasyona kurmancî jî ev nav guncayî dîtine:

1. kanûna paşîn	2. sibat	3. adar
4. nîsan	5. gulan	6. hezîran
7. tîrmeh	8. tebax	9. îlon
10. çirîya pêşîn	11. çirîya paşîn	12. kanûna pêşîn[734]

Komxebata Kurmancîyê jî heman nav qebûl kirine.[735] Li gorî van her du berheman ji xeynî navê meheke taybet, navên mehan bi hûrdekê têne nivîsîn.

Navên mehan ên ku Celadet Bedirxan destnîşan kirine, me di beşa standardîzasyona *Hawar*ê de dabû. Ji ber wê em ê li vir nenivîsin careke din. Cudahiya di navbera wan de meha 6an e ku her du *Rêber* wek *hezîran* qebûl dikin û Celadet Bedirxan wek *hizêran*. Her wiha navên mehên 11, 12, 1 û 2 jî ji hev cuda ne.[736]

---

[730] *Hawar*, c: 1, h: 6, r. 133
[731] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 42; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 56
[732] bnr. di vê tezê de "Navên Demsalan"
[733] bnr. Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 57-61
[734] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 62
[735] bnr. Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 43
[736] Ji bo navên mehan bnr. *Hawar*, c: 1, h: 2, r. 49

Navên mehan ji aliyê rastnivîsê ve negihîştiye standardekê di *Hawar*ê de. Hin nav bi hûrdek, hinek ji wan jî bi girdek hatine nivîsîn.[737]

Wekî ku her du rastnivîsên navborî jî diyar dikin, di kurmancî de herfa ducare tune ye. Wek mînak: "ger/gerr, ker/kerr".[738] Aydogan diyar dike ku wexta mirov van peyvan bi lêv dike tesîrek li /r/yê nabe, lê belê li /k/yê dibe. Ji ber vê divê di van rewşan de herfek du caran neyê nivîsîn. Her wiha rexneyek wiha jî dike û dibêje: "Divê her kurmancîaxêvek ji xwe re şîfreyên taybetî çêneke."[739] Di *Hawar*ê de jî wexta ev mijar tê behskirin, Celadet Bedirxan /h/yek datîne kêleka /k/yê, ango wek /kh/ bi kar tîne ji bo cudakirina van her du dengan.

Di mijara herfên ducare de ev her du berhemên navborî û *Hawar* ji hev vediqetin. Li gorî van her du berheman, wexta {-tir} bê dawiya bêjeyekê ku herfa wê ya dawiyê jî bi /t/yê diqede, divê her du /t/ jî bêne parastin. Ango li gorî van berheman divê mirov *xurtir* nenivîse, lê belê *xurttir* binivîse, an jî divê mirov *rastir* nenivîse, lê belê *rasttir* binivîse.[740] Aydogan sedema vê wiha nîşan dide: "Gava ku weha nehê nivîsîn, 'kort' û 'kor'a ji nimûneyên jorê di awayên xwe yên komparatîv de ji hevûdin nahên veqetandin. Ango, awayê 'kort'ê yê komparatîv jî dibe 'kortir', ya 'kor'ê jî dibe 'kortir'.[741]

Li gorî Celadet Bedirxan jî divê ev herf ducare neyên nivîsîn. Ev mijar di *Hawar*ê de wiha hatiye vegotin:

> Tîpa dubare: Di zmanê kurdmancî de tîpa dubare nîne. Ji lewre, heke di bêjeyekê de tîpek dubare bû, yeke wan ji ber xwe de dikeve û tîpek bi tenê dimîne. Wekî niho, parkîta (tir) gava dikeve paşiya bêjeyên ko bi (t) yê temam dibin yek ji wan her du "t" yan dikeve. Ji lewre di nivîsandinê de jî (t) yek bi tenê tête nivîsandin. Ji ber ko di vekîta kurdmancî de tîpa ko naye xwendin, naye nivîsandin. Ev in çend misal:
>
> xurt xurt-tir xurtir

[737] bnr. di vê tezê de "Navên Mehan"
[738] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 63
[739] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 63
[740] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 48; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 67
[741] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 67

rast	rast-tir	rastir
kurt	kurt-tir	kurtir[742]

Hin mînakên bi herfên din jî hatine dayîn. Di *Hawar*ê de hatiye diyarkirin ku peyva *paş-şîv*ê divê wek *paşîv* bê nivîsîn û peyva *yek-kîte*yê jî divê wek *yekîte* bê nivîsîn.[743]

Lê belê li gorî her du rastnivîsên li ber destê me, divê *paş-şîv* wek *paşşîv* bê nivîsîn, ne wek *paşîv*, her wiha divê *yek-kîte* divê wek *yekkîte* bê nivîsîn, ne wek *yekîte*.[744] Li vir em dikarin bibêjin ku di nav gel de dibe ku peyva *yekkîte*/*yekîte*yê zêde nayê bikaranîn, lê peyva *paşşîv*/*paşîv*ê bi awayekî aktîf tê bikaranîn û li gorî bilêvkirina gel ev peyv bi du /ş/yan nayê bihîstin. Her dem wek *paşîv* tê bihîstin.

Lidûhevhatina herfên /d/ û /t/yê jî di nav zimannasan de bûye nîqaşek. Gelo /d/ya bêjeya ku herfa wê ya dawî pê diqede û piştre "tir" tê nivîsîn, divê bê parastin an neyê nivîsîn? Li gorî Celadet Bedirxan, divê /d/ neyê nivîsîn û wiha rave dike:

"Tîpên têvel, lê ji yek cihderkê, an ji cihderkên nîzingî hev jî nadin pey hev:

Rind-tir	rintir
pişt-dawî	pişdawî
bilind-tir	bilintir
dewlemend-tir	dewlementir"[745]

Aydogan di jêrenota vê mijarê de wiha dibêje:

> Yên ku "bilindtir"ê bi awayê "bilintir"ê dinivîsin, ango [d]ya berî [t]yê jê diavêjin, xwe dispêrin wê yekê ku cihderka [d]yê û [t]yê yek in, loma wan jî wekî herfên ducare dihesibînin û gava ku bêjeyek bi [d]yê biqede û paşgir jî bi [t]yê dest pê bike, hingê [d]yê jê diavêjin. Ev awayekê şaş e û li dijî prensîpa parastina koka bêjeyê ye. Rast e ku [d] û [t] xwedîyên eynî cihderkê ne. Ferqa

[742] *Hawar*, c: 2, h: 28, r. 714
[743] *Hawar*, c: 2, h: 28, r. 714
[744] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 49; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 69
[745] *Hawar*, c: 2, h: 28, r. 714

wan ji alîyê fonetîkî ve ew e ku [d] dengdayî ye û [t] nedengdayî ye. Lê ew ne yek deng in. Ji alîyê dengnasîyê ve ew du fonemên cuda ne û her yek di morfemeka cuda de ye ku bêjeya hevedudanî pêk diînin. Loma divê li gor prensîpa parastina rehmorfemê bihê nivîsîn û rehmorfema nimûneya dayî têk neçe.[746]

Mijara /i/ya berî /y/yê wek mijarên din dîsa bûye mijara nîqaşê di nav zimannasan de. Celadet Bedirxan bêjeyên ku bi /î/yê diqedin û bi /y/yê têne girêdan heta hejmara 28an a *Hawar*ê wek /î/ diparêze.[747] Lê belê piştî vê hejmarê dibêje berî /y/yê divê /i/ bê nivîsîn. Ji wê pê ve berî /y/yê /i/ hatiye nivîsîn, heta di kursên dersên kurmancî de ev rêbaz bi hûrgilî dihat vegotin da ku xwendekar di nivîsînê de tevliheviyê nekin. Lê belê piştre di hin weşanan de tê dîtin ku /î/ya berî /y/yê dîsa wek /î/ tê nivîsîn. Ev mijar di van her du rastnivîsan de jî derdikeve pêşiya me. Li gorî Aydogan, wexta piştî bêjeyeke ku bi /î/yê diqede lêkera alîkar bi /y/yê dest pê dike û ji ber ku lêkera alîkar bi bêjeyê ve nayê nivîsîn /î/ya dawiya bêjeyê xwe diparêze. Lê belê wexta bi lêkerê ve tê nivîsîn /î/ çima dibe /i/. Wekî ku diyar dike di bilêvkirinê de her du awa jî bi hev ve têne xwendin, ango mirov fam nake lêkera alîkar bi hev ve tê nivîsîn an cuda. Li gorî nivîskar, ji ber vê ye ku /î/ya berî /y/yê divê bê parastin.[748] Her wiha ev awayê Aydogan ji aliyê Komxebata Kurmancîyê ve jî hatiye qebûlkirin û berhema wan bi xwe jî bi vî awayî hatiye nivîsîn.[749]

Navên biyaniyan di *Hawar*ê de carinan wek navên orîjînal hatine nivîsîn. Wek mînak: “Wilson”.[750] Lê belê yên ku li gorî bilêvkirina kurmancî hatine guhartin jî hene. Wek Mister Çorçil,[751] Rûzwelt,[752] general Römel,[753] general Oçinlêk[754] û hwd. Li gorî her du rastnivîsan jî divê ev nav wek orîjînal bêne nivîsandin.[755]

---

[746] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 67
[747] Bnr. di vê tezê de i’ya berî y’yê
[748] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 75-76
[749] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 54
[750] *Hawar*, c: 2, h: 31, r. 776
[751] *Hawar*, c: 2, h: 31, r. 776
[752] *Hawar*, c: 2, h: 31, r. 778
[753] *Hawar*, c: 2, h: 38, r. 914
[754] *Hawar*, c: 2, h: 39, r. 934
[755] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 57; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 84

Pirseke din heye di rastnivîsan de. Gelo bêjeyên fransî yên ku tê de /oi/ hene, çawa tên xwendin bi kurmancî? Li gorî rastnivîsa Mistefa Aydogan ev deng wekî /uwa/ ye, lê belê Komxebata Kurmancîyê vê yekê wek /iwa/ qebûl dike:

Tablo 2: Berawirdkirina Her Du Rêberan ji Aliyê Bêjeyên Fransî ve

Bêjeyên fransî	Rastnivîsa M. Aydoganî	Rastnivîsa K. Kurmancîyê
t**oi**lette	T**uwa**let	T**iwa**let
Laborat**oi**re	Laborat**uwa**r	Laborat**iwa**r
Répert**oi**re	Repert**uwa**r	Repert**iwa**r
Conservatoire	konservat**uwa**r[756]	Konservat**iwa**r[757]

Navên pirtûkên pîroz di her du rastnivîsan de jî bi girdekê hatine nivîsandin. Wek mînak: Mishefa Reş, Cilwe, Quran, Încîl, Tewrat, Zebûr[758]

Lê belê em nikarin standardîzasyonek wiha di *Hawar*ê de bibînin. Ev nav carinan bi girdekê, carinan jî bi hûrdekê hatine nivîsîn.[759]

Navên taxan di her du rastnivîsan de bi girdek dest pê dikin. Mînak: Taxa Reşoyî[760]

Lê di *Hawar*ê de bi hûrdekê ye: "Di taxa Torê di Medresa-sor de veşartî ye."[761] "li taxa Mihaciran"[762], "ji taxa Romdenê"[763]

Navên parzemînan di her du rastnivîsan de jî bi girdekê dest pê dikin: Afrîka, Ewropa, Asya, Amerîka, Okyanûsya[764]

---

[756] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 97
[757] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 67
[758] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 93; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 127
[759] bnr. di vê tezê de "Nivîsîna navên ku bi dîn re eleqedar in"
[760] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 94; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 128
[761] *Hawar*, c: 1, h: 6, r. 125
[762] *Hawar*, c: 2, h: 35, r. 851
[763] *Hawar*, c: 2, h: 36, r. 871
[764] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 94; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 129

Lê di *Hawar*ê de hem bi hûrdekê, hem bi girdekê ne: "Li *ewropayê*, miletin hebûn qo hej zmanên xwe ne deqirin."[765]

"Qitêba wî geleq binav û deng e û zanayên *Ewrûpayê* jî kedrê qitêba Çelebî digirin."[766]

"Hinan digot divêt em ekser derînin bêja *Ewropayê*."[767]

"Şerê ko Hîtler di Polonyayê de dest pê kir hemî *Ewrope* vegirt, jê derbasî *Efrîqayê* bû û jê kete birekî *Asyayê* jî."[768]

"Lê divêt ez bibêjim heke *Emêrîke* bêgav ma û (…)"[769]

Li gorî her du rastnivîsan divê navên beşên parzemînan jî bi girdekê bêne nivîsîn: Mînak: Amerîkaya Latînî, Rojhilata Dûr.[770]

Lê di *Hawar*ê de sîstemeke wiha tune ye, ango her sernav bi girdek an hûrdekê nehatiye nivîsandin:

" … nemaze li ser şerê *rohelatê dûr*, kurt û pist zêde bû bûn."[771]

" … di saya vê zeferê de Qevqas û welatên *rohelatê nîzing* hatine xelas kirin."[772]

"Ji milê din Cave dikeve *bakurê roavayê Ewistralyayê* jî."[773]

Navên derya, okyanûs, tengav, çem, deşt, çiya, birc û kelehan di her du rastnivîsan de hatine diyarkirin ku divê bi girdekê bêne nivîsîn.[774]

---

[765] *Hawar*, c: 1, h: 1, r. 27
[766] *Hawar*, c: 1, h: 16, r. 324
[767] *Hawar*, c: 2, h: 39, r. 935
[768] *Hawar*, c: 2, h: 36, r. 870
[769] *Hawar*, c: 2, h: 36, r. 870
[770] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 94; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 129
[771] *Hawar*, c: 2, h: 39, r. 934
[772] *Hawar*, c: 2, h: 39, r. 934
[773] *Hawar*, c: 2, h: 40, r. 949
[774] bnr. Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 94-95; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 129-130

Lê belê em nikarin bibêjin di *Hawar*ê de sîstemeke wiha pêk hatiye. Em dibînin ku carinan bi hûrdekê, carinan bi girdekê dest pê dikin, carinan di navbera du bêjeyan de bendikek heye.[775]

Navên zanîngehan (di rastnivîsa Aydoganî û di *Hawar*ê de wek "unîversîte" derbas dibe)[776] di her du berhemên rastnivîsînê de cuda hatine nivîsîn. Aydogan wexta navê zanîngehê dinivîse daçeka "li"yê berî navê bajêr zêde dike. Wek mînak: Unîversîteya Qazî Mihemedî ya li Mehabadê.[777]

Komxebata Kurmancîyê navên zanîngehan bêdaçek nîşan dane: Zanîngeha Qazî Mihemedî ya Mehabadê.[778]

Navên gel û netewe, ziman, zarava û devok, dîn, mezheb û mensûbên wan di her du rastnivîsan de bi hûrdekê hatine nîşandan. Mînak: kurd, fransizî, cihû, mislimanî.[779]

Lê belê di *Hawar*ê de standardeke rastnivîsa van navan tune ye. Carinan bi girdekê, carinan jî bi hûrdekê hatine nivîsîn.[780]

Mijara veqetandekan gelek caran hatiye tevlihevkirin. Ji ber ku kurmancî zimanekî zayendî ye, divê hem tewang hem jî veqetandekên bêjeyan li gorî zayendan bêne diyarkirin. Meseleyeke din jî ku serê mirov tevlihev dike *binavkirî* û *nebinavkirî*bûna navdêran e. Di vê rewşê de veqetandek dîsa divê li gorî zayendan bê nivîsîn.

Wekî ku Celadet Bedirxan diyar dike veqetandek ev in: "Veqetandekên binavkirî sisê ne: ê, a, ên."[781] Ji bo veqetandekên binavkirî tu pirsgirêk naxuyê, ji ber ku her du rastnivîs jî van qebûl dikin. Lê belê di mijara veqetandekên nebinavkirî de nîqaşek heye ku şêwaza em ji Celadet Bedirxan hîn bûne serûbin dike û di xwendin û nivîsînê de tevliheviyekê çêdike. Em vê mijarê aşkeratir binivîsin.

---

[775] ji bo mînakan bnr. di vê tezê de "Navên Erdnîgarî"
[776] bnr. *Hawar*, c: 2, h: 35, r. 851
[777] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 136
[778] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 100
[779] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 103; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 138
[780] bnr. di vê tezê de "Navên taybet, netewe, ziman, dîn"
[781] *Hawar*, c: 2, h: 32, r. 794

Celadet Bedirxan veqetandekên nebinavkirî bi vî awayî diyar dike di *Hawar*ê de:

-ekî: ji bo yekejmara zayendê nêr

-eke: ji bo yekejmara zayendê mê

-ine: ji bo gelejmara her du zayendan

Hespekî delal hat.	Hespine delal hatin.
Mehîneke delal hat.	Mehînine delal hatin.[782]

Lê belê hem Mistefa Aydogan hem jî Komxebata Kurmancîyê vê yekê diguherînin û li gorî berhemên wan qertafên[783] veqetandekên binavkirî û nebinavkirî wekhev in:

Li gel navdêrên nêr (hem yên binavkirî hem yên nebinavkirî) yên yekhejmar: -ê

Li gel navdêrên mê (hem yên binavkirî hem yên nebinavkirî) yên yekhejmar: -a

Li gel navdêrên her du zayendan (hem yên binavkirî hem yên nebinavkirî) yên pirhejmar: -ên[784]

Ji aliyê veqetandekên binavkirî ve fikira van her du berheman wekhev e. Mînak: hespê malê, mehîna malê, hespên min.[785]

Ji aliyê veqetandekên nebinavkirî ve em hinek cudahî dibînin di van her du berheman de. Komxebata Kurmancîyê ji bo navdêrên nêr ên yekhejmar sê awayên cuda nîşan dide:

1. –ek-ê

2. –ek-î

[782] *Hawar*, c: 2, h: 33, r. 819
[783] Mistefa Aydogan ji bo "qertaf"ê "pirtik", Komxebat jî "gire" bi kar aniye.
[784] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 132; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 169
[785] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 133-136; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 170-172

3. –ek-ø

Li gorî Komxebatê “tu tesîra gireya nenasyarîyê li ser gireya îzafeyê tune ye. Lewra gireya îzafeyê, ji bo navdêrên nêr yên yekhejmar her wekî ya navdêrên nêr yên nasyar “-ê” ye. Ev “-ê” bi dû <(y)ek>ê da dihê û pê ve dihê nivîsîn. Nimûne: derîyekê mezin, derîyekê xanîyî.”[786]

Ji bo ya duyem dibêje: “Herçî awayê duyem e (-ek-î), di îzafeya navdêrên nêr yên yekhejmar û nenasyar da tewang û îzafeyê tev li hevûdin dike û loma <î>ya gireya tewangê ji bedêla <ê>ya morfema îzafeya navdêrên nêr bi kar diîne. Nimûne: derîyekî mezin, derîyekî xanîyî.” Ji bo awayê sêyem jî dibêje ku tu morfemên îzafeyê bi kar naîne. Wek “derîyek mezin, diranek min”[787]

Li gorî Komxebatê awayê sêyem nayê qebûlkirin. Lê her du awayên din (-ek-ê, -ek-î) ji bo nivîsînê têne qebûlkirin. Ango em dikarin bibêjin ku her du awa jî rast in. Her wiha diyar dike ku ji ber berbelavbûna (-ek-î)yê, Komxebat bi piranî vê tercîh dike.[788]

Mistefa Aydogan wekî Komxebatê binbeşeke taybetî venekiriye ji bo (-ek-ê) û (-ek-î)yê. Ew jî di jêrenotê de behsa van her sê awayan dike. Li gorî ravekirina Aydoganî bi /î/yê tewang û veqetandek tevlihev dibin:

> (…) loma <î>ya pirtika tewangê ji bedêla <ê>ya morfema veqetandeka navdêrên nêr bi kar diîne. Nimûneya vî awayî jî weha ye: hespekî malê. Herçî –î ye, pirtika tewanga navdêrên nêr yên yekhejmar e. Lê herçî veqetandeka navdêrên nêr e –çi ji bo navdêrên nêr yên binavkirî, çi ji bo navdêrên nêr yên nebinavkirî- li gor rêzimana kurmancîyê her eynî morfem e, ango <-ê> ye. Herçî <-(y)ek> e jî morfema nebinavkirinê ye û tu eleqeya wê bi veqetandekê re tune ye û nebinavkirina navdêran jî <-ê>ya morfema veqetandekê naguharîne. Ji xwe, bi şaşî, wekî tewanga veqetandekê jî dihê binavkirin. Lê tewanga

[786] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 133
[787] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 134
[788] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 134

veqetandekê tune ye. Lewre veqetandek kategorîyeka rêzimanî ya cuda ye û tewang jî kategorîyeka din e.[789]

Li gorî vê îfadeya Aydogan mirov dikare bikaranîna veqetandekên mê yên binavkirî û nebinavkirî rasterast qebûl bike, lewre ji ber "-a"yê mirov dibîne ku zayenda navdêrê mê ye. Wek mînak: mehîna min, mehîneka min.

Lê belê ji bo veqetandekên nêr ên nebinavkirî tevliheviyekê çêdibe. Lewre wexta ku em dibêjin "hespê min", em dibînin ku hesp nêr e û "-ê" veqetandeka binavkirî ye. Lê wexta ku em dibêjin "hespekê min" di serî de em dibêjin qey (-ekê) mê ye, lê belê li vir veqetandeka nêr a nebinavkirî ye. Ji ber bikaranîna berbelav û ya Celadet Bedirxan û her wiha wekî ku Komxebat jî diyar dike ev awa têrbelav e, awayê (-ekî)yê rihettir xuya ye di nivîsînê de, wekî din serê mirov bivê nevê tevlihev dibe. Li gorî vê, wê çaxê ji bo jinekê divê em bibêjin "Ez hevalekê dibînim" an "Ez hevaleka dibînim"? Ji bo mêrekî jî divê em bibêjin "Ez hevalekî dibînim" an "Ez hevalekê dibînim"?

Di nivîsan de bi piranî em awayê Celadet Bedirxan dibînin. Ji ber vê, heke ev awayê hînbûyî bê parastin û berdewamkirin, dibe ku rê li ber şaşfamkirinan bê girtin.

Nivîsîna dema bê dîsa li gorî nivîskaran bi awayên cuda têne nivîsîn. Em dibînin ku di *Hawar*ê de qertafa dema bê bi piranî bi hev ve hatine nivîsîn. Wek mînak: "Emê, ezê, minê, tuê, ewê, honê, tiwê bêî, meê."

Ji xeynî van yên ji cînavkê cihê hatine nivîsîn jî hene: "Min dê bigota, me ê, wê bên, wê bidit, ez dê bidim." Her wiha di van mînakan de tê dîtin ku ji bo dema bê "wê" û "dê" jî hatine bikaranîn. Mirov dikare bibeje ku "ê" bi piranî bi hev ve, "wê, dê" bi piranî cihê hatine nivîsîn. Standardîzasyonek xuya nake li ser vê mijarê di *Hawar*ê de.

Wekî ku her du rastnivîsên li ber destê me nîşan didin gelek awayên nivîsîna dema bê hene: dê, ê, wê, yê, tê.[790] Li gorî destnîşankirina Aydogan, nivîsîna bi awayên cuda tevliheviyek çêdike û divê standardek ji bo vê yekê bê danîn. Li gorî

[789] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 170
[790] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 146; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 187

nivîskar divê “dê” bê bikaranîn ji bo dema bê û vê mijarê wiha rave dike: “Me li jorê got ku ev awayên vê bêjeya dema bê hene: ê, wê, yê, tê, dê. Me behsa ‘tê’yê kiribû. Bêjeya ‘ê’yê, sivikbûn yan jî xerabbûna awayê ‘dê’yê ye. Ango ‘d’ya ‘dê’yê ketiye, ‘ê’ maye. Herfa [w]ya bêjeya ‘wê’ û [y]ya bêjeya ‘yê’ ji bo pevgirêdana du vokalan e (ji bo nimûneyê; tuwê bibînî, tuyê bibînî yan jî tu wê bibînî, tu yê bibînî).”[791]

Her wiha li gorî Aydogan ev bêje deformebûyî ne û dikarin sergêjiyê çêkin. Bêjeya “dê”yê diparêze û pişta xwe dide bikaranîna wê ya di klasîkan de û berbelavbûna wê ya di nav gel de. Ji ber vê bikaranîna “dê”yê çêtir dibîne ji bo kurmancî. Her wiha Komxebata Kurmancîyê jî bikaranîna “dê”yê tercîh dike.[792]

Mijara neyîniyê jî ji aliyê standardîzasyonê ve mijareke giring e. Her du *Rêber* dibêjin “morfemên neyîniyê sê heb in: ne, na, ni.” Wekî ku her du rastnivîs jî nîşan didin, ev her sê jî bi lêkeran ve têne nivîsîn.[793]

Lê di *Hawar*ê de em standardîzasyonek bi vî rengî nabînin. Ev her sê guherto jî hem bi lêkerê ve hem jî cuda hatine nivîsîn. Mînak: nake, na ke; nekir, ne kir; nizane, ni zane. Lê awayê cudanivîsînê bêhtir xuya ye di *Hawar*ê de, her wiha di *Ronahî*yê de jî bi vî rengî ye. Ji xeynî van di *Hawar*ê de bi *me*yê jî neyînî têne dîtin, lê di her du rastnivîsan de behsa vê nehatiye kirin. Neyîniyên ku bi *me*yê hatine çêkirin, dîsa wek yên din, hem bi lêkerê ve, hem jî jê cuda hatine nivîsîn. Wek mînak: “mebe, me be”[794]

Her wiha neyîniya ku bi *me*yê tê çêkirin tenê ji bo neyîniya raweya fermanî ye. Qanatê Kurdo li ser vê dibêje “(Me-) di Soranî de ji bo darijtina raweya fermanê tê bikaranîn. Di Kurmancî de digel vê qertafê, qertafa (ne-)yê jî tê bikaranîn.”[795]

Mijara daçekan jî negihîştiye standardekê. Her nivîskar li gorî herêma xwe daçekan dinivîse. Bi taybetî di paşdaçekan de mirov dikare vê cudahiyê bibîne. Hinek “de, re, ve” dinivîsin, hinek jî “da, ra, va” dinivîsin. Em van her du awayan jî

---

[791] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 188-189
[792] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 147
[793] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 151; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 192
[794] bnr. di vê tezê de “Neyînî”
[795] Prof. Dr. Qanatê Kurdo, *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî*, ji Kurdiya Soranî: Zülküf Ergün, Nûbihar, Stenbol 2013, r. 179

di *Hawar*ê de dibînin. Heta di nivîsa nivîskarekî de em rastî her du awayan jî tên. Her wiha di *Hawar*ê de cînavkên lihevxistî yên ku bi hev ve hatine nivîsandin jî derdikevin pêşiya me ku ev cînavk ji daçek û cînavkê (wî/wê) pêk hatine. Wekî mînak: jêre, pêre.

Her du rastnivîsên li ber me nîşan didin ku divê daçek serbixwe bêne nivîsîn.[796] Lê ev her du rastnivîs di nivîsandina paşdaçekan de ji hev vediqetin. Rastnivîsa Mistefa Aydogan paşdaçekan wek "de, re, ve"[797] nîşan dide, lê belê ya Komxebata Kurmancîyê wekî awayê standard "da, ra, ve" nîşan dide, lê belê awayên din ên wek "da, ra, va" û "de, re, ve" jî wek bîformên standardê qebûl dike.[798]

Mijareke din jî ya hejmaran e. Wekî ku tê zanîn, hejmar jî zayendî ne û anegorî zayenda xwe ditewin. Tewanga her hejmarekê ne wek hev e, hinek ji wan mê, hinek nêr û hinek jî pirhejmar in. *Hawar* di vî warî de standardîzasyonek pêk aniye. Li gorî *Hawar*ê;

- "yek" bi "ê"yê tê tewandin.
- du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh, deh, yanzdeh, dwanzdeh, sêzdeh, çardeh, panzdeh, şanzdeh, hevdeh, hejdeh, nozdeh, bîst bi "an"ê têne tewandin.
- sih, çil, pêncî, şêst, heftê, heştê, not, sed bi "î"yê têne tewandin.
- "hezar" jî gava bi serê xwe ye bi "î"yê tê tewandin.[799]

Wekî ku Mistefa Aydogan diyar dike hin kurmancîaxêv hejmarnavên bingehîn wek *mê* ditewînin. Hinek ji wan jî *nêr* dihesibînin û bi vî awayî ditewînin. Tercîha *Rêber*a xwe jî wiha vedibêje:

> Tercîha vê rêberê ji bo nivîsîna hejmarnavan zayenda nêr e. Ev awa di kovara Hawarê de û herweha di nivîsîna kurmancîyê ya dema me de jî wekî awayê serdest xuya dike. Loma ya baştir ew e ku ji bo peydakirina standarda di vî warî

[796] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 168; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 221
[797] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 221-224
[798] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 168-170
[799] *Hawar,* c: 2, h: 54, rr. 1118-1119

de, hejmarnav li gor vî awayî bihê nivîsîn.” Her wiha dibêje “hejmarnavên kurmancîyê yên bingehîn, ji bilî hejmarnava “yek”ê, hemû “nêr” in.[800]

Komxebata Kurmancîyê jî diyar dike ku hin kurmancîaxêv hejmarnavan *mê* û hin ji wan jî wek *nêr* dihesibînin. Her wiha berevajî Aydogan wiha dibêje: “Komxebata me piştî minaqeşeyên piralî her du awayan jî di nivîsîna kurmancîyê da qebûl dike.”[801] Lê belê ji bo standardîzasyonê wek Aydogan difikire û dibêje ji bo nivîsînê divê yek ji van sîsteman bê hilbijartin. Kovara *Hawar*ê û bikaranîna berbelav a îro wek referans nîşan dide, ji ber vê awayê duyem, ango zayenda hejmarnavan nêr qebûl dike.[802]

Ji ber vê, heke sîstema *Hawar*ê û van her du rastnivîsan di nivîsan de bê bikaranîn, hem dê standardîzasyonek pêk bê di vî warî de, hem jî dê tevlihevî çênebe. Heke her nivîskar dîsa li gorî xwe tewandinê bike, ji bo xwîner têgihiştin îza dibe û her tişt dikeve nav guhê hev.

Hejmarnavên rêzîn jî bi awayên cuda têne nivîsîn. Ji aliyê rastnivîsîna wan ve standardîzasyonek tune ye di *Hawar*ê de:

“kesê pêşîn, kesê diwim, duwim; kesê seyim, sêyim; çarim, heftim”

Hejmarnavên rêzîn wekî ku li jor xuya ye di *Hawar*ê de bi “-im”ê hatiye çêkirin. Mistefa Aydogan û Komxebata Kurmancîyê “-em”ê tercîh dikin: hejmarnav + -em. Mînak: “yekem, duyem, sêyem.”[803]

Her wiha hejmarên ku li dû hev tên di *Hawar*ê de, carinan bi bêhnok, carinan jî bi bendik hatine bikaranîn:

“yek, du heval”, “sê-çar sal”

Tewanga hejmarnavan di *Hawar*ê de carinan bi hev ve, carinan jî jê cuda hatiye nivîsîn. Mînak: “di sala 1932an de” “di sala 1705 an de”.

---

[800] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* rr. 235-236
[801] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 181
[802] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 181
[803] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 189; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 244

Li gorî her du rastnivîsan divê tewang bi hejmarnavan ve bêne nivîsîn, nivîsandina ji hev cuda, an jî veqetîna bi apostrofê şaş e.[804]

Binavkirina xalbendiyan, ku di *Hawar*ê de wek "niqteşanî" derbas dibe, di her du rastnivîsan û *Hawar*ê de ji hev cuda ne. Em ê tenê yên ku di *Hawar*ê de derbas dibin û beranberî wan ê her du rastnivîsan nîşan bidin:[805]

Tablo 3: Xalbendî

Xalbendî/Niqteşanî	Hawar	Rastnivîsa Mistefa Aydogan	Rastnivîsa Komxebata Kurmancîyê
(.)	niqte	xal	xal
(?)	niqtepirs	pirsnîşan	pirsnîşan
(!)	niqtebang	xalbang	bangnîşan
(:)	niqtecot	cotxal	cotxal
(;)	niqtebihnok	xalbêhnok	xalbêhnok
( )	kevanek	kevanek	kevanek
" "	dunik	dunik	dunik
–	xêzek	xêzik	xêzik
-	bendik	bendik	bendik

[804] Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 186; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 241

[805] Hawar, c: 2, h: 28, r. 715; Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 198; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 254; ji bo xalbendiyên din ên ku di vê lîsteyê de cih negirtine bnr. Weqfa Mezopotamyayê, 2019, Stenbol, r. 198; Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê,* r. 254

Li gorî van daneyan em dikarin bibêjin ku ne *Rêber*a Aydogan ne jî ya Komxebatê sedî sed daye dû rastnivîsa Celadet Bedirxan. Helbet ji ber ku Celadet Bedirxan di *Hawar* û *Ronahî*yê de mijarên serbixwe yên rastnivîsê nenivîsîne, tesbîtkirina van a di kovaran de zehmet e, lê dîsa jî ji nav metnan mirov meyla wî ya cureya bikaranînê dibîne. Li gorî metnên van kovaran, mirov dikare bibêje ku Celadet Bedirxan bêhtir rastnivîsa wek a fransî bi kar aniye. Her wiha, bi zêdebûna kurdînivîs û zimannasan, fikirên cur bi cur derketine holê. Li jor me xwest em xebateke biçûk bikin li ser rastnivîsên ku piştî her du kovarên Celadet Bedirxan derketine.

Lê belê divê em bînin zimên ku piştî *Rêber*a Komxebatê gelek rexne li ser hatine kirin. Ev rexne bi piranî li ser vî tiştî ne ku hin qayde dûrî yên Celadet Bedirxan in ku bi salan e bi vî awayî têne bikaranîn. Hinek ji van rexnegiran vê tevgera Komxebatê wek "hîperkorektî" ango "sererastkirina zêde" dibînin.[806] Di van nivîsan de li ser mijarên wek /i/ya berî /y/yê, daçek, tewang, qertafên zayendê û hwd. rexne hatine kirin.

Ev rexne nîşanî me didin bêyî piştgiriya dewletê an jî bêyî xebatên fermî yên wek komîsyonên zimên, danîna standarda zimanekî gelek zehmet e. Ev kar ji aliyê komekê ve an jî kesekî/ê ve çi qas bi awayekî birêkûpêk bimeşe jî qebûlkirina ji aliyê her kesî ve zehmet e û ji ber vê beriya nîqaş, pirs û rexneyan nikare bê girtin. Li vir du modelên Einar Haugen têne bîra mirov ku bi tevahî çar model in; kodkirin û belavkirin. Ji bo ku zaravayê ku tê hilbijartin bê kodkirin û belavkirin û helbet ji aliyê gel ve bê pejirandin, pêdivî bi saziyeke xurt heye. Ji ber tunebûna saziyên fermî, di rewşa kurdan de nîqaşên bingehîn hê jî berdewam dikin û pirsgirêkên der barê rastnivîsînê de zû bi zû nikarin bêne çareserkirin.

[806] bnr. Ergin Öpengin, "Pirsên Rênivîsa Kurmancî: Pêdaçûneke Rexneyî li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydogan", *Derwaze*, Jimare 1, İstanbul, Gulan 2017, r. 192; Husein Muhammed, "Rêbera Rastnivîsînê ya WM û Derdê Giran yê Hîperkorektiyê û Xweferzkirinê", (02.02.2020) r. 2 https://zimannas.files.wordpress.com/2020/02/husein-muhammed-1.pdf (30.03.2022)

ENCAM

Ziman ji xeynî peywira xwe ya ku di nav însanan de dibe amûra têkiliyê, girêdanek jî çêdike di nav gel de. Helbet ji bo mayîndebûna gelekî yekîtî yek ji unsûrên herî giring e û ev jî bi saya zimanê hevpar pêk tê. Zimanê hevpar jî bi xwe re pêdiviya zimanekî standard tîne ji bo ku yekîtiya ku ava dibe sist nebe. Ev yekîtî ber bi netewetiyê ve gaveke mezin diavêje û zimanê standard di vê pêvajoyê de xwedî roleke mezin e. Gelên ku niha wek netewe têne pênasekirin, bê guman ji pêvajoya standardkirina zimên derbas bûne.

Hin ziman bi pejirandina devoka herî guncav, zimanê xwe yê standard ava kirine. Hin ji wan jî hema ji binî ve hatine guherandin. Wekî mînak; tirkî. Tirkî hêj di dema osmaniyan ve, ango bi sedsalan, alfabeya erebî bi kar aniye. Di serdema dawî ya osmaniyan de hin rewşenbîrên tirk ji bo modernbûn, ewrûpîbûn û nivîsandina sivik xwestine ku alfabeya xwe biguherin û ya latînî qebûl bikin. Ev pêvajoyeke gelek zehmet bû, lewre alfabeya erebî bi dîn re têkildar tê dîtin û li gorî hinekan terikandina alfabeya erebî dûrketina ji mislimaniyê ye. Ji ber van fikirên dijî hev, ev pêvajo demeke dirêj berdewam kir, heta sala 1928an ku wê salê alfabeya latînî hate qebûlkirin, komîsyonên zimên hatin avakirin û ji bo sadekirina zimên, ango xebata terikandina bêjeyên biyanî dest pê kir.

Li aliyê kurmancan jî daxwaza zimanê standard û guherîna alfabeyê bi ya tirkan re hevdem e. Bi Meşrutiyeta Duyem re weşangeriya kurdan dest pê kir li Stenbolê. Di van weşanan de fikirên bingehîn dihatin aşkerakirin. Her çi qas di serî de daxwaza kurdan a wek netewetiyeke serbixwe tunebe jî, piştre bi guherîna siyasetê, her wiha bi dawîbûna Şerê Cîhanê yê Yekem û bi hilweşîna Dewleta Osmanî ev daxwaz wek çîrûskek derket. Heta wê çaxê kurdên ku xwe wek osmanî didît, ji gelê xwe daxwazeke wisa nedikir. Lewre li gorî wan û rewşenbîrên ji nijadên din, her miletê ku di bin banê Dewleta Osmanî de dijiya, ji xwe osmanî bû, wek bûyereke xwezayî.

Hêj berî Şerê Cîhanê yê Yekem di nav kurdan de xebatên li ser zimên dihatin kirin. Wekî rewşa tirkan, di nav kurdan de jî yên dixwest alfabeyê biguherînin û zimanekî standard ava bikin hebûn, yên ku dijî van derdiketin jî hebûn. Yên ku fikira wan cudatir bû, an alfabeya erebî ya sererastkirî û sivikkirî, an alfabeya kirîlî an jî alfabeya urdûyî dixwest. Bi dawîbûna şer, hestên neteweyî yên kurdan geş bûn û bi vê re girêdayî, daxwazên li ser zimanê standard zêdetir bûn. Ji ber vê çend ceribandin hatin kirin, lê belê ev xebat têk çûn.

Daxwaza guherîna alfabeyê û avakirina zimanekî standard di 1932yan de wek pratîk derket pêşiya kurdan. Lê belê ne li Stenbola ku bingeha van nîqaşan lê derketibû, li Şamê cara ewil alfabeya kurmancî ya latînî ji aliyê Celadet Alî Bedirxan ve derket. Ev alfabe jî ji pêvajoyên zehmet derbas bûbû. Lêgerîna dengên kurdî yên bi awayê şeklan, helbet ne hêsan bû. Ji ber vê Celadet Bedirxan bi zanîna xwe ya çend zimanan ev pêvajo anîbû serî. Dawiya dawî ji bo ku kurdên li Tirkiyeyê çêtir jê fam bikin û zûtir bielimin, alfabe ji xeynî çend herfan dişibiya ya tirkî.

Ev alfabeya ku di *Hawar*ê de derket cara ewil, bi *Ronahî*yê re berdewam kir. Weşana *Hawar*ê hêj berdewam bû wexta ku *Ronahî* derket. Ev her du xebat ji aliyê rastnivîsê ve xebatên bingehîn in, lewre hîmê standardîzasyona ku bi salan e dihat xwestin, hatibû danîn. Ji ber vê di vê xebatê de me ji aliyê rastnivîsê ve li *Hawar*ê nêrî, her wiha me *Ronahî*yê jî xist nav çarçoveya xebata xwe.

Celadet Bedirxan di *Hawar*ê de giringiya alfabe û zimên rave kiriye her carê. Ji ber vê, wekî ku *Hawar* dibistanek û her hejmarek wê jî dersek be, wî alfabe, rêziman û ferheng hînî xwendevanên kurd dikir. Lê *Ronahî* ne bi vî rengî bû. Lewre Celadet Bedirxan mijarên xwe di *Hawar*ê de vegotibûn, *Ronahî* ne wek kitêba dersê bû. Tê de bi piranî nûçeyên der barê şer, pêkenok û dîrok hebûn. Her wiha cudahiya herî mezin jî ew bû ku *Ronahî* biwêne derdiket, ji ber vê ev yekemîn kovara kurdî ye ku biwêne derketiye.

Her çi qas di *Hawar*ê de mijarên alfabe û rêzimanê bi awayekî zanistî hatibin vegotin jî, der barê rastnivîsê de zêde agahî tune ye wek mijareke sereke. Ji ber ku standardîzasyona zimên ji xeynî alfabe û rêzimanê, bi rastnivîsê re jî têkildar e, me xwest em ji vî aliyî ve lê bikolin. Ev xebat bi qasî ya alfabe û rêzimanê ne hêsan e,

lewre divê em ji nav nivîsan aliyê rastnivîsê bineqînin û ev jî gelek zehmet bû. Lewre ji aliyê nivîsîna bêjeyan ve standardek nehatiye danîn di *Hawar*ê de. Wekî mînak navê netewe, ziman, hêl, erdnîgarî û hwd. di her nivîsê de wekî hev nehatine nivîsîn, jê wêdetir ji ber ku edîtoriya standardkirina bêjeyan nehatiye kirin, her nivîskar li gorî xwe nivîsiye. Ji ber vê, em dikarin rastî gelek awayan bên di *Hawar*ê de.

Lê *Ronahî* ji *Hawar*ê cudatir e. Hêj ji hejmara ewil ve di *Hawar*ê de nivîskarên xwedî devokên cuda hene. Ev devok jî bandor li nivîsa wan dike. Lê *Ronahî* hema hema nîvê hejmarên xwe bi yek nivîskarî derxistiye: xwediyê wê Celadet Alî Bedirxan. Ji ber vê em dikarin pir rihetî standarda ku Celadet Bedirxan daniye bibînin di *Ronahî*yê de. Heta tevlibûna nivîskarên din, hema hema her bêje û bi taybetî jî her daçek ji destê yek nivîskarî derketiye û ji şêweya nivîsan jî ev tişt xwe pir baş aşkera dike.

Ji ber vê, wexta ku me li ser rastnivîsa *Hawar*ê lêkolîn dikir, me xwe mecbûr dît ku em bi heman awayî li ser *Ronahî*yê jî rawestin, ya ku temamkera *Hawar* û xebata me bû. Di vê çarçoveyê de me *Hawar* û *Ronahî*yê da ber hev û me dît ku zimanê *Ronahî*yê bêhtir cihê xwe girtiye û ji aliyê rastnivîsê ve zelaltir e. Di *Ronahî*yê de jî ji ber ku xebata edîtoryal a bêjeyan xuya nake, lewre her nivîskar dîsa li gorî xwe dinivîse, ji bo rêbazên rastnivîsê me bêhtir berê xwe da nivîsên Celadet Bedirxan bi xwe.

Di van her du kovaran de mirov dikare bi hêsanî helwesta Celadet Bedirxan a hemberî zimên û bi taybetî ser standardîzasyona zimên bibîne. Ji destpêkê ber bi dawiyê ve, em dikarin bibînin ku Celadet Bedirxan ber bi standardekê ve diçe. Li ser mijaran, bikaranîna peyvan û hilbijartina devokê ve em dibînin ku helwestên xwe diguhere, ango ne konservatîv e. Em vê yekê jî di *Ronahî*yê de bi awayekî aşkera dibînin. Di Kovara *Gelawêj*ê de hatiye nivîsîn ku zimanê *Ronahî*yê kurdiya botan e. Lê belê Celadet Bedirxan wek bersiv dibêje kurdên li Sûriyeyê hewl didin ku zimanekî yekbûyî pêk bînin û ji ber vê her nivîskar devoka xwe li paş xwe dihêle. Her wiha dibêje heke wî bi devoka xwe binivîsiya, ew ê şûna (rabû û çêbû) (rabî û çêbî) binivîsanda.

Ji vê ravekirina Celadet Bedirxan em dibînin derdê wî ne ew e ku devoka xwe an jî devoka herêmeke din derêxe holê. Berevajî vê dixwaze zimanekî hevpar çêbibe da ku her kes bikaribe ji hev fam bike. Ji ber vê jî, di avakirina alfabe û rêzimana xwe de, li gorî qaydeyan tevgeriyaye û bi devokê girêdayî nemaye. Ji ber ku qaydeya ziman ji binyada zimên der tê, Celadet Bedirxan jî hin qaydeyên heyî tespît kirine û li gorî vê rastnivîsa xwe edilandiye. Lewma jî em dikarin bibêjin ku meyla Celadet Bedirxan ne li ser devoka Botanê ye, li ser yekkirina zimên e.

Xebatên Celadet Bedirxan, hevdîtina wî ya Tewfîq Wehbî û berawirdkirina alfabeyên wan ji bo yekkirina zimên bû helbet. Lê belê ji ber ku li welatên cuda bûn û piştre hevdîtina wan pêk nehat, Celadet Bedirxan berê da kurmancî û li ser standardkirina wê xebatên xwe meşandin. Ev standardîzasyon an jî avakirina zimanê nivîskî, ji guherîneke bingehîn pêk hat, ango bi guherîna alfabeya erebî bi ya latînî. Bi xebatên salan û bi beranberkirina alfabeyên zimanên din Celadet Bedirxan dawiya dawî biryar da ku alfabeya wî bi yek şekilî be, tê de cudahî û tevlihevî nebe. Bi vî awayî alfabeya xwe ya ku ji 31 herfan pêk tê, ava kir û îro jî kurmanc vê alfabeyê bi kar tînin.

Piştî avakirina alfabeyê, nivîsîna tekûz helbet ne mimkin bû, bi demê re dê bikemiliya û mînaka vê di *Hawar*ê de pir baş xuya dike. Li vir dibe meraqek ka gelo Celadet Bedirxan rastnivîsa xwe li gorî xwe saz kiriye û maye bin bandora zimanên din de. Celadet Bedirxan ji zarokatiya xwe ve hînî zimanê yûnanî bûbû, hinek rûsî dizanîbû, li Almanyayê hînî almanî bûbû û bi awayekî pratîk zimanê fransî bi kar dianî, lewre di wê serdemê de Sûriye di bin desthilatdariya Fransayê de bû û fransî bi awayekî aktîf li wir dihat bikaranîn. Celadet Bedirxan jî di têkiliyên xwe yên bi fransiyan re bi fransî diaxivî. Ji ber vê em dikarin bibêjin ku Celadet Bedirxan maye bin bandora fransî de, lewre heke em li bikaranîna herfên girdek û hûrdek ên bêjeyan binêrin, em dibînin ku Celadet Bedirxan jî wek a fransî bi kar aniye. Her wiha em dikarin bibêjin ku tirkî jî di wê serdemê de bin bandora fransî de maye, lewre di bikaranîna navên netewe û zimanan de riya fransiyan şopandine.

Celadet Bedirxan, fikira ku hêj di 1919an de xistibû serê xwe, di *Hawar*ê de wek pratîk nîşan da. Lê belê divê em bînin zimên ku mijara standardîzasyonê bi Celadet Bedirxan dest pê nekiribû û bi wî re jî bi dawî nebû. Nîqaşên ser zimên ên ku

beriya xebata Celadet Bedirxan hatibûn rojevê, dibe ku paşxaneya wî ava kiribe. Lewre beriya wî mînakên alfabeyê jî derketibûn, lê ne latînî û her wiha daxwazên li ser avakirina rêziman û ferhengan jî her dihat nîqaşkirin.

Her wiha, wekî ku me got, piştî xebatên wî jî, gelek berhemên ji cureyên cuda derketin. Berhemên rastnivîs û rêzimanê jî yek bi yek derdiketin, lê pirsgirêk ew bû ku di van berheman de hevfikirek tune bû û her nivîskar li gorî xwe dinivîsî, bi taybetî jî her nivîskar li gorî zimanê serdest ê welatê xwe dinivîsî, ji ber vê bivê nevê bandora zimanê serdest li rastnivîsa wê/wî bandorek mezin çêdikir. Ji ber van gengeşiyan em nikarin bibêjin ku kurmancî ji sedî sed standardîze bûye, lê belê em dikarin bibêjin ku xebatên ser zimên ên ku îro têne meşandin bingeha xwe ji Celadet Bedirxan digirin.

Ji bo famkirina standardîzasyona îro, me berê xebata xwe da rastnivîsên piştî Celadet Bedirxan jî. Fikirên wan nivîskaran û bikaranîna şêweya rastnivîsê dê riya me ronî bikira. Di vê kontekstê de me li berhemên Arif Zêrevan, Kemal Burkay û Halil Aktuğ nêrî. Herî dawî me li berhemên Mistefa Aydogan û Komxebata Kurmancîyê di bin sernavekê de nêrî. Lewre wekî ku di berhema Komxebatê de jî diyar e, wan di amadekirina rastnivîsa xwe de berhema Aydogan bingeh girtiye ji xwe re. Bi biryara komîsyona Komxebatê, gelek mijarên Aydogan hatine qebûlkirin, ji ber vê bi îmzaya wan kesan ev berhem bi navê Komxebata Kurmancîyê derket.

Lê belê ev her du berhemên dawî jî nebûn derman ji bo standardîzasyona kurmancî. Piştî weşana wan, ji xeynî nêrînên erênî, gelek rexne hatin kirin. Ev rexne bi gelemperî li ser vî tiştî bû ka çima Komxebatê rêbazên Celadet Bedirxan xirab kiriye û tiştên ku heta niha têne bikaranîn çima berevajî kirine. Piraniya van rexnegiran, her wiha pêşniyaz dikin ku ev komîsyon dîsa bicive û xebata xwe ya ku rastnivîsa kurmancî ser û bin kiriye careke din binirxîne û binivîse.

Li gorî van berhemên dawî em dibînin ku standardîzasyonek ava nebûye di nav kurmancan de. Lewre ne berhemên berê, ne jî van xebatên dawî bandorek mezin kir ser nivîskaran. Lê tiştê ku em dibînin, piraniya kurmancînivîsan li gorî rê û rêbazên Celadet Bedirxan dinivîsin, lê dîsa jî xuya ye ev gengeşe û nîqaş dê bidome.

Armanca vê xebatê destnîşankirina rêbazên Celadet Bedirxan bûn der barê alfabe û rastnivîsê de. Me hewl da rastnivîsên piştî wî jî li gorî *Hawar*ê binirxînin. Di vê xebatê de armanc ne ew e ku em yek ji van xebatan rast an jî şaş nîşan bidin. Me xwest em berawirdiyek di navbera wan de çêkin.

ÇAVKANÎ

AKIN, Salih, *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî,* Avesta Yayınları, İstanbul 2013

AKTUĞ, Halil, *Rastnivîsa Kurdî (Kurmancî) Kürtçe İmlâ Kılavuzu*, Sîtav, Ankara 2019

ALAKOM, Rohat, "100. Yaşında Kürd Kadınları Teâli Cemiyeti", di *Kürt Çalışmaları Bahar Akademisi-1* de, İBV Yayınları, İstanbul 2020, r. 15-26

ALAN, Ahmet, *Hetawî Kurd (1913-1914),* Avesta, Stenbol 2016

ALTAN, Bilal, Mehmet AKBAŞ, Ercan ÇAĞLAYAN, "Kürdistan Teâli Cemiyeti'nin Şubeleri ve Bağlı Kuruluşları", di *Akademik Tarih ve Düşünce Dergisi* de, cilt: 6, sayı: 1, Mart 2019, r. 313-339

ANDERSON, Benedict, *Hayali Cemaatler – Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması,* İskender Savaşır, (Çev.), Metis Yayınları, İstanbul 2020

"Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem , c: 1, h: 1, Stockholm 1998, r. 23-24

ASLAN, S. Azad,"Folklor û Netewetiya Kurd a Ewil: Guherînên Giring ji Osmanîtiyê ber bi Netewetiya Kurd ve", *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî-Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur-Berawirdî-1*, Ramazan Pertev (Ed.), Sevda Orak Reşitoğlu (wer.), Avesta, Stenbol 2015, r. 111-138

AYDINKAYA, Fırat, "Kürt Modernleşmesi Dosya Editörü", di *Kürt Tarihi* de, sayı: 25, İstanbul 2016, r.8-9

AYDINKAYA, Fırat, "Tamamlanmamış Bir Proje Olarak Kürt Modernleşmesi", di *Kürt Tarihi* de, sayı: 25, İstanbul, 2016, r. 10-21

AYDOGAN, Îbrahîm Seydo, *Guman-1 Zimanê Kurdî*, Weşanên Lîs, Diyarbakır 2013

AYDOGAN, Mistefa, *Rêbera Rastnivîsînê,* Rûpel, İstanbul 2012

AYDOĞAN, İbrahim Seydo, "Linguicide yan jî zimankujî-Geriyanek di dîroka Fransayê de li ser yekîtiya zimên û yekîtiya neteweyî", di *Kovara Zend* de, Zend Bilim Kültür Eğitim Basın Yayın Ltd. Şti., İstanbul, Payîz 2008, r. 13-18

AZÎZAN, Herekol, "Klasîkên Me", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 2, h: 33, Stockholm 1998, rr. 810-818

AZÎZAN, Herekol, “Zilamek û Zimanek”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, cild: 2, h. 40, Stockholm 1998, r. 944-946

AZÎZÎ, M. S., “Alfabemiz ve Okumayı Kolaylaştırma”, *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu(Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 2, İstanbul 2013, r. 269-270

AZÎZÎ, M. S., “Hişyar Bin”*, Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 2, İstanbul 2013, r. 154-155

BABAN, İsmail Hakkı, “Kürdçe Üzerine”*, Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, Arap Harflerinden Latin Harflerine Çeviren: Mehmed Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, jimar: 3, Uppsala 1998, r. 161-164

BABANZADE, İsmail Hakkı, “Kürdler ve Kürdistan”*, Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, Arap Harflerinden Latin Harflerine Çeviren: Mehmed Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, sayı: 1, Uppsala 1998, r. 67-69

BABANZADE, İsmail Hakkı, “Kürtlerin Yükselmesi”*, Rojî Kurd,* Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 3, İstanbul 2013, r. 282-284

BABANZADE, İsmail Hakkı, “Müslümanlık ve Kürtlük”*, Rojî Kurd,* Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 2, İstanbul 2013, r. 263-265

BAJALAN, Djene Rhys, *Jön Kürtler-Birinci Dünya Savaşı’ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1914)*, Burcu Yalçınkaya (çev.), Avesta Yayınları, İstanbul 2010

BAYKUŞAK, Tahir, “Tevgera Kurd a li Stenbolê di Destpêka Sedsala 20an de”, di *Akademiya Îsmaîl Beşîkçî 1-2019 Payîz* de, İBV Yayınları, İstanbul 2021, r. 33-49

BEDIRHAN, M. Salih, “Berî Şîrê Qelem”*, Rojî Kurd,* Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 3, İstanbul 2013, r. 189-194

BEDIR KHAN, Djéladet Aali, “L’Alphabet Kurde”, *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 3, Stockholm 1998, r. 69-71

BEDIR KHAN, Emir Djeladet, Roger Lescot, *Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)*, Librairie d’Amérique et d’Orient Adrien Maisonneuve, Paris 1970

BEDIR-KHAN, Djéladet Aali, *De La Grammaire Kurde: Avertissement, Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 16, Stockholm 1998, r. 327-331

BEDIRXAN, Celadet Alî, *Rojên Almanyayê (1922-1925)*, Osman Özçelik (Wer.), Avesta Yayınları, Stembol 2015

BEDIRXAN, Celadet Alî, “Xwe Binas…”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 18, beşa latînîzekirî, Stockholm 1998, r. 551-555

BEDIRXAN, Dr. Kamiran Alî, “Di Dora Hevxistina Zmanan de”, *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem , c: 1, h: 3, Stockholm 1998, r. 63-65

BEDIRXAN, Emir Celadet Ali, *Bir Kürt Aydınından Mustafa Kemal’e Mektup,* Doz Yayınları, Birinci Baskı, İstanbul 1992

BEDIRXAN, Rewşen -Mehmed UZUN Sohbeti ve Mektuplar, *Banyas 1985,* Avesta Yayınları, İstanbul 2020

BEDIR-XAN, C. A., “Bingehên Gramêra Kurdmancî”, *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 2, h: 27, Stockholm 1998, r. 695-696

BEDIR-XAN, Celadet Alî, “Ber Tevna Mehfûrê”, *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 4, Stockholm 1998, r. 83-86

BEDIR-XAN, Celadet Alî, “Bi Hinceta Pîroznamekê”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 3, beşa latînîzekirî, Stockholm 1998, r. 489-489

BEDIR XAN, Celadet Alî, “Elfabêya Qurdî”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem , c: 1, h: 3, Stockholm 1998, r. 65-66

BEDIR-XAN, Celadet Alî, “Elfabêya Qurdî”, *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 7, Stockholm 1998, r. 148

BEDIR-XAN, Celadet Alî, “Elfabêya Qurdî”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 9, Stockholm 1998, r. 189

BEDIR-XAN, Celadet Alî, “Elfabêya Qurdî”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 10, Stockholm 1998, r. 206

BEDIRXAN, Celadet Alî, “Elfabêya Qurdî”, *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 11, Stockholm 1998, r. 227

BEDIR-XAN, Celadet Alî, “Elfabêya Qurdî”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 12, Stockholm 1998, r. 246

BEDIR-XAN, Celadet Alî, “Elfabêya Qurdî”, *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 17, Stockholm 1998, r. 346

BEDIR-XAN, Celadet Alî, “Elfabêya Qurdî”, *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 18, Stockholm 1998, r. 365

BEDIR-XAN, Celadet Alî, “Qurdeqî Qiçiq”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 8, Stockholm 1998, r. 168

BEDIR-XAN, Celadet Alî, “Qurd û Qurdistan”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 19, Stockholm 1998, r. 383-384

BEDIR-XAN, Celadet Alî, "Şêx Evdirehmanê Garisî Çû Rehmetê", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 11, Stockholm 1998, r. 223-225

BEDIR-XAN, Dr. Kamiran Alî, "Qurdmanc Kenc in Lê Nezan in", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 7, Stockholm 1998, r: 143-144

BEDIR-XAN, Rewşen, "Kebanî û Mamosta", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 2, h: 27, Stockholm 1998, r. 691

BELTEKİN, Nurettin, "Perwerde û Înşakirina Nasnameya Neteweyî: Fransa û Tirkiye", di *Akademiya Îsmaîl Beşîkçî 1-2019 Payîz* de, İBV Yayınları, İstanbul 2021, r. 51-61

"Bername", *Jîn*, ji herfên erebî bo herfên latînî: M. Emîn Bozarslan, Weşanên Deng, c: 2, h: 10, Uppsala 1985, r. 493-494

BITLÎSÎ, Kurdîyê, "Li Ser Zimanê Kurdî", *Jîn*, ji herfên erebî bo herfên latînî: M. Emîn Bozarslan, Weşanên Deng, Cild: 3, Hejmar: 15, Uppsala 1987, r. 693-700

BLAU, Joyce, "Emir Kamiran Bedirxan'ın Anıları", di *Kamiran Alî Bedirxan (1895-1978)*, Avesta Yayınları, İstanbul 2019, r. 61-82

BOTÎ, Seyîd Tahirê, "Ji bo Cerîdeya 'Kurdistan'ê", *Kurdistan – İlk Kürt Gazetesi 1898-1902,* Cilt 1, Arap Harflerinden Latin Harflerine Çeviren: Mehmed Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, eded: 5, Uppsala 1991, r. 161-162

BOULDEN, Laura, "Standardbûna Zimên", di *Kovara Zend* de, Zend Bilim Kültür Eğitim Basın Yayın Ltd. Şti, İstanbul, Havîn/Payîz 2007, r. 54-62

BOYÎK, Eskerê, *Çanda Kurdên Sovêtê,* Peywend, İstabul 2019

BOZARSLAN, Mehmed Emin, "Sunuş", *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, Arap Harflerinden Latin Harflerine Çeviren: Mehmed Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, Uppsala 1998, r. 19-31

BURKAY, Kemal, *Dersên Zmanê Kurdî,* Weşanên Deng, Çapa Şeşemîn, İstanbul 2004

BÜLBÜL, Mikail, "Weke Qada Rengvedaneke Neteweperweriyê di Pratîkên Tirk û Kurdan de Nîqaşên li ser Alfabeyê", di *Sempozyûma Edebiyata Berawirdî ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî* de, Nüket Esen, Ramazan Çeçen (Amd.), Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Birinci Baskı, Mardin 2015, r. 176-185

CEGERXWÎN, "Sehîtî Le Bo Yekîtiya Zimanê Kurdî", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 23, beşa latînîzekirî, Stockholm 1998, r. 608

CELÎL, Celîlê, *Kürt Aydınlanması*, Arif Karabağ (Çev.), Avesta Yayınları, İstanbul 2001

CEVDET, Doktor Abdullah, "Bir Hitap", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 1, İstanbul 2013, r. 241-242

CEWARÎ, Firîda Hecî, *Heciyê Cindî Jiyan û Kar*, Weşanên Lîs, Diyarbakır 2008

CHALIAND, Gérard, "Emir Kamiran Bedirxan ile İlişkilerime Dair Tanıklık", di *Kamiran Alî Bedirxan (1895-1978)* de, Avesta Yayınları, İstanbul 2019, r. 115-118

"Civata Arîqarîyê ji Bona Qurdên Belengaz", *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 2, Stockholm 1998, r. 43-44

COBARRUBIAS, Juan, "Language Planning: The State of the Art", in *Progress in Language Planning: International Perspectives,* Edited by: Juan Cobarribuas, Joshua A. Fishman, Walter de Gruyter&Co., Berlin 1983, r. 3-26

DOTOLI, Giovanni, "La Grammaire Dans la Prèmiere Édition du Dictionnaire de l'Académie Française (1694), Verbum 7 (7): 54, December 2016, r. 54-65

'EBDULKERÎM, Silêmanî, "Her Min Bim û Kesî Tirî nî", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 2, İstanbul 2013, r. 152-153

"Elfabêya Qurdî", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 1, Stockholm 1998, r. 25-26

"Elfabêya Qurdî", *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 2, Stockholm 1998, r. 47-48

"Elfabêya Qurdî", *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 5, Stockholm 1998, r. 109

"Elfabêya Qurdî", *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 6, Stockholm 1998, r. 128

DEMİRTÜRK, Cem, *Türkçe Yazım Kılavuzlarının Gelişimi Üzerine Bir İnceleme,* Teza Masterê ya Çapnebûyî, Zanîngeha Pamukkaleyê, Denizli 2019

FARQÎNÎ, Zana, "Nîqaşeke Berdewam: Alfabe", *Kovara Zend,* Havin 2012, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, r. rr. 21-31

FEREC, Hamid, "Pîrozname", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 3, beşa latînîzekirî, Stockholm 1998, r. 488

FERGUSON, Charles A., "The Language Factor in National Development", *Anthropological Linguistics,* Vol. 35, No. 1/4, A Retrospective of the Journal Anthropological Linguistics: Selected Papers, 1959-1985 (1993), r. 124-129

FISHMAN, Joshua A., *Do Not Leave Your Language Alone – The Hidden Status Agendas Within Corpus Planning in Language Policy*, Lawrence Erlbaum Associates, Publishers Mahwah, New Jersey, London 2006

FISHMAN, Joshua A., "Language modernization and planning in comparison with other types of national modernization and planning", in Language in Society, Vol: 2, No: 1, Cambridge University Press, 1973, r.23-43

FISHMAN, Joshua A., "The Impact of Nationalism on Language Planning: Some Comparisons between Early Twentieth-Century Europe and More Recent Years in South and Southeast Asia", in *Can Language be Planned?*, Editor(s): Joan Rubin, Björn H. Jernudd, University of Hawai'i Press, 1971, r. 3-19

"Gelawêj", *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 2, h: 27, Stockholm 1998, r. 692

"Gelawêj", *Ronahî*, Xwedî û Berpirsiyarê Kovarê: Mîr Celadet Bedirxan, Berhevok: Çapxana Jîna Nû, h: 5, Uppsala 1985, r. 80

GELLNER, Ernest, *Uluslar ve Ulusçuluk,* Büşra Ersanlı, Günay Göksu Özdoğan (Çev.), Hil Yayın, 3. Baskı, İstanbul 2018

GEMSİZ, Mehmet, *Binyat û Rastnivîsîna Lêkeran di Berhemên Rêzimanê yên Kurmancîya Bakur de,* Teza Masterê ya Çapnebûyî, Mêrdîn 2018

GEWRÎ, Elî Seydoyê, "Sehitî Le Bo Yekîtiya Zimanê Kurdî", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 22, Stockholm 1998, r. 447

HASSANPOUR, Amir, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985,* İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan (Çev.), Avesta Yayınları, İstanbul 1997

HAUGEN, Einar, "Dialect, Language, Nation", *American Anthropologist,* New Series, Vol. 68, No: 4 (Aug., 1966), r. 922-935

HAUGEN, Einar, "The Implementation of Corpus Planning: Theory and Practice", *Progress in Language Planning: International Perspectives,* Edited by: Juan Cobarribuas, Joshua A. Fishman, Walter de Gruyter&Co., Berlin 1983, r. 269-289

HAWAR, "Dersxane", *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem , c: 1, h: 17, beşa latînîzekirî, Stockholm 1998, r. 544-547

HAWARÊ, Nivîsanoqa, "Heyîneqe Yeqsalî", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem , Cild: 1, Hejmar: 20, Stockholm 1998, r. 403-405

HAWARÊ, Xwediyê, "Kiriyariya Hawarê", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 2, h: 42, Stockholm 1998, r. 996, 997

HAWARÊ, Xwediyê, “Sê Tarîxên Hawarê”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, Cild: 2, Hejmar: 26, Stockholm 1998, r. 688-689

HAWARÊ, Xweyiyê, “Li Ser Yekîtiya Zimanê Kurdî”, *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 10, beşa latînîzekirî, Stockholm 1998, rr. 509-510

HENÊ, Lacê, “Sehîtî Le Bo Yekîtiya Zimanê Kurdî” *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem , c: 1, h: 23, beşa latînîzekirî, Stockholm 1998, rr. 608-610

HENNING, Barbara, *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamlarındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*, İbrahim Bingöl (çev.), Avesta Yayınları, İstanbul 2021

HENNING, Dr. Barbara, “Osmanlının Son Döneminde ve Sonrasında Osmanlı-Kürt Bedirxaniler Ailesinin Tarihi - Bir Genel Bakış Denemesi ve Daha Fazla Araştırmaya Çağrı”, di *Kamiran Alî Bedirxan (1895-1978)* de, Heval Bucak&Hikmet İlhan(Çev.), Avesta Yayınları, İstanbul 2019, r. 11-28

KARDAM, Ahmet, *Cizre-Bohtan Beyi Bedirhan Direniş ve İsyan Yılları,* Dipnot Yayınları, Ankara 2017

KARDAM, Ahmet, *Cizre-Bohtan Beyi Bedirhan-Sürgün Yılları*, Dipnot Yayınları, Ankara 2019

KOLOĞLU, Orhan, *Osmalıcadan Türkçeye Okuryazarlığımız,* Tarihçi Kitabevi, İstabul 2015

KURDO, Prof. Dr. Qanatê, *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî*, ji Kurdiya Soranî: Zülküf Ergün, Nûbihar, Stenbol 2013

KURMANCÎ, Rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravayê kurmancî, hejmar: 40, bihar 2007, Avesta, Stembol 2010

KURMANCÎYÊ, Komxebata, *Rêbera Rastnivîsînê,* Weqfa Mezopotamyayê, Stenbol 2019

“L’aphabet Kurde”, *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem , c: 1, h: 1, Stockholm 1998, r. 30-32

LEVEND, Agâh Sırrı, *Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*, Üçüncü Baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 1972

LEWIS, Geoffrey, *Trajik Başarı Türk Dil Reformu*, Mehmet Fatih Uslu (Çev.), Paradigma Yayıncılık, 1. Basım, İstanbul 2007

LODGE, R. Anthony, *French From Dialect to Standard,* Taylor&Francis e-Library, 2001

LÜTFÎ, (Ahmed Ramiz), *20. Yy'ın Başlarında Kürt Milliyetçi Söylemine Bir Örnek*, Osmanlı Kaynaklarında Kürtler Çalışma Grubu, Bgst Yayınları, İstanbul 2007

MALBAT, Ekrem, *Kürt Kadınları Teali Cemiyeti ve Nizamnamesi*, Nûbihar, Stenbol 2019

MALMÎSANIJ, *Cızira Botanlı Bedirhaniler,* Avesta Yayınları, İstanbul 2009

MALMÎSANIJ, *Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti-İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği,* Avesta Yayınları, İstanbul 2002

MALMÎSANIJ, M., *Türkiye ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayımcılığının Dünü ve Bugünü,* Vate Yayınevi, İstanbul 2006

MESUD, Süleymaniyeli, "Alfabemiz ve Okumayı Kolaylaştırma", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 1, İstanbul 2013, r. 254-255

MICHAELIAN, Dr. G., "A Propos de la musique Kurde", *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem , c: 1, h: 10, Stockholm 1998, r. 209

MILROY, James, "The ideology of the standard language", *The Routledge Companion to Sociolinguistics*, Ed. by. Carmen Llamas, Louise Mullany and Peter Stockwell, Routledge Publishing, New York 2007, r. 133-139

MİDHAT, "Devletin Genel Kuvvetleri, Ortaya Çıkışı, Ayrılık ve Eşitliğin Gerekliliği Bu Konudaki Fikir Ayrılıkları ve Görüşler", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu(Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 1, İstanbul 2013, r. 251-254

NEBEZ, Jemal, *Kurd (Dîrok û Kultura Wan),* Ergîn Opengîn (Wer.), Avesta Yayınları, İstanbul 2007

NECDET, Diyarbekirî, "Cotkarî", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 1, İstanbul 2013, r. 120

NECMEDDİN, Kerküklü, "Kürt Talebe Cemiyeti ve Kürtlerin Hilafet Makamına Hizmetleri", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 1, İstanbul 2013, r. 243-244

NEUSTUPNY, J. V., "Basic Types of Treatment of Language Problems", *Linguistic Communications 1,* Monash University, 1970, r. 76-98

NOEL, E. W. Charles, *Kürdistan 1919-Binbaşı Noel'in Günlüğü*, Avesta Yayınları, Bülent Birer (Çev.), İstanbul 2014

ORHAN, Salim, *Dil Politikaları ve Dil Hakları Üzerine Teorik Çerçeve,* İnönü Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi İnÜHFD, Cilt: 8, Sayı: 2, 2017, r. 331-362

ÖNEN, Ronayi, “Dilde Bir Modernleşme Öyküsü: Celadet Bedirxan’ın Alfabe Serüveni” di nav *Kürt Tarihi* de, sayı: 25, İstanbul 2016, r. 41-47

ÖNEN, Ronayi, *Ziman û Netewesazî-Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*, Şehmuz Kurt (Wer.), Peywend Yayınları, İstanbul 2018

ÖPENGİN, Ergin, “Pirsên Rênivîsa Kurmancî: Pêdaçûneke Rexneyî li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydogan”, *Derwaze*, Jimare 1, İstanbul, Gulan 2017, r. 180-195

ÖZKIRIMLI, Umut, *Milliyetçilik Kuramları: eleştirel bir bakış*, Doğubatı Yayınları, 9. Basım, Ankara 2020

PAŞA, Wecdî Cemîl, “Hawareq”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 8, Stockholm 1998, r. 167-168

“Pêşgotingeq”, *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, cild: 1, hejmar: 13, Stockholm 1998, r. 263-264

PICARD, Patrick, “Aux Sources de l’Academie Française”, *Revue des Deux Mondes,* Mars 1994i r. 114-123

PÎROT, “Eksî Sedayî Hawar”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 10, beşa latînîzekirî, Stockholm 1998, rr. 505-506

PORZIG, Walter, *Dil Denen Mucize*, Vural Ülkü (Çev.), Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2018

QEDRÎ, Doç. Dr. Mamoste, “Dîroka Xet û Alfabeyên ku Kurdan Bikaranîne û Berhemên ku Bi Wan Nivîsandine”, di *3’yemîn Rojên Wêjeyê li Diyarbekirê- Konferansa Zimanê Kurdî* de, Weşanên Midûriyeta Çand û Turîzmê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, Diyarbekir 2006, rr. 95-113

“Qer, Gur û Rovî”, *Hawar,* Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 12, Stockholm 1998, r. 247-248

REBOURCET, Séverine, “Le français standard et la norme: l’histoire d’une “nationalisme linguistique et littéraire” à la française”, *École doctorale de The School of Languages, Literatures and Cultures de l’Université du Maryland,* Communications, lettres et sciences du langage, Vol. 2, No: 1, Printemps 2008, r.107-118

ROHAT, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, Weşanên Deng, İstanbul 1991

RONAHÎ, “Bo Agadarî”, *Ronahî,* Xwedî û Berpirsiyarê Kovarê: Mîr Celadet Bedirxan, Berhevok: Çapxana Jîna Nû, h: 23, Uppsala 1985, r. 454-455

RONAHIYÊ, Xwediyê, “Reşbelek”, *Ronahî*, Xwedî û Berpirsiyarê Kovarê: Mîr Celadet Bedirxan, Berhevok: Çapxana Jîna Nû, h: 4, Uppsala 1985, r. 61

RONDOT, Pierre, “Trois Essais de Latinisation de l’alphabet kurde: Iraq, Syrie, U.R.S.S.”, *Extrait du Bulletin d’Études Orientales de l’Institut Français de Damas, T. V.*, Le Caire 1936, r. 1-20

SADOĞLU, Hüseyin, *Türkiye’de Ulusçuluk ve Dil Politikaları,* İstanbul Bilgi Üniversitesi, 2. Baskı, İstanbul 2010

SEBRÎ, Osman, “Çend Gazind”, *Ronahî,* Xwedî û Berpirsiyarê Kovarê: Mîr Celadet Bedirxan, Berhevok: Çapxana Jîna Nû, *h. 20,* Uppsala 1985, r. 389-390

Osman Sebrî, *Hatıralarım*, Abdullah Koçal (Çev.), Weşanên Lîs, Diyarbakır 2012

SEBRÎ, Osman, “Sehitî Le Bo Yekîtiya Zimanê Kurdî”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 22, Stockholm 1998, r. 447-448

SEBRÎ, Osman, “Ziman û Nivîsandina Wî”, *Ronahî*, Xwedî û Berpirsiyarê Kovarê: Mîr Celadet Bedirxan, Berhevok: Çapxana Jîna Nû, h: 24, Uppsala 1985, r. 486-487

SEÎD, Molla, “Kürdçe Lisanımız”, *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi,* Arap Harflerinden Latin Harflerine Çeviren: Mehmed Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, Uppsala1998, r. 20-21

SEGMAN, Bişarê, “Dr. Rweylot”, *Ronahî*, Xwedî û Berpirsiyarê Kovarê: Mîr Celadet Bedirxan, Berhevok: Çapxana Jîna Nû, h: 24, Uppsala 1985, r. 473-480

SEYDO, Elî, “Ez û Hawar”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 9, Stockholm 1998, r. 189

SIWÊREKÎ, Kurdîyê, “Gazindek”, *Jîn*, ji herfên erebî bo herfên latînî: M. Emîn Bozarslan, Weşanên Deng, Cild: 4, Hejmar: 16, Uppsala 1987, r. 741-742

SMITH, Anthony D., *Milliyetçilik – Kuram- İdeoloji – Tarih,* Ümit Hüsrev Yolsal (Çev.), Atıf Yayınları, Ankara 2013

SMITH, Anthony D., *Millî Kimlik,* Bahadır Sina Şener (Çev.), İletişim Yayınları, *7.* Baskı, İstanbul 2014

SORÎ, Hevindê, “Sehitî Le Bo Yekîtiya Zimanê Kurdî”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem , c: 1, h: 16, Stockholm 1998, r. 323-324

“Stûna Fekehan”, *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 1, h: 1, Stockholm 1998, r. 26

ŞAVATA, Bahoz, “Bi Seîd Veroj re li ser Pirtûka *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan (1913-1923),* di *Kürt Tarihi* de, sayı: 42, İstanbul 2020, r. 46-51

ŞEWQÎ, Seyyah Ehmed, "Gelî Welatîya", *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi*, Arap Harflerinden Latin Harflerine Çeviren: Mehmed Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, jimar: 2, Uppsala 1998, r. 99-100

"Şihir û Edebiyata Kurdî Refîq Hilmî", *Hawar*, Firat Cewerî (Amd.) Weşanên Nûdem, c: 2, h: 34, Stockholm 1998, r. 839

TAN, Samî, *Rêzimana Kurmancî-çapa berfirehkirî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2011

THOMAS, Jenelle, *That Ain't Right!: Language Standardization and Prescription in French, Spanish and English*, Advisor: Jeffrey Killman, General University Honors, Spring 2010

TILOYÎ, Lawikê, "Ji Min Ve Tiştên Dinyayê", *Ronahî*, Xwedî û Berpirsiyarê Kovarê: Mîr Celadet Bedirxan, Berhevok: Çapxana Jîna Nû, h: 21, Uppsala 1985, r. 416

TOGAN, Bulgaristanlı, "Milletinize Karşı Vazifeniz", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 1, İstanbul 2013, rr. 260-262

UMRANÎ, Zanyar, "Bi Emîr Hesenpûr re li ser Zimên û Neteweyê", ji soranî: Mistefa Dewlemend, di *Kovara Zarema*yê de, Sal: 5, h: 13, İstanbul 2018, r. 62-75

X, Modanî, "Ziman û Nezaniya Kurdan", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 2, İstanbul 2013, r. 160-162

X., M., "Bextreşî û Mehrûmiya Kurdan", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 3, İstanbul 2013, r. 194-196

X., M., "Ji Mezin[ên] 'Kurdan' ra", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 4, İstanbul 2013, r. 221-223

X., M., "Serê vê Jimar[a] Sisiyan da "Bextbireşî û Mahrûmiyan Kurdan", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 4, İstanbul 2013, r. 225-226

X., M., "Ziman", *Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, jimar: 3, İstanbul 2013, r. 186-187

XEZAL, *"Dem[a] Kalê me-Çaxa me-Dema tê, Rojî Kurd*, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (Haz.), İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, cild: 1, İstanbul 2013, r. 122-124

VEROJ, Seîd, *Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran Bedirxan 1913-1923*, Dara Yayınları, Diyarbakır 2018

ZÊREVAN, Arif, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (Kirmancî)*, Nefel, Sweden 1997

ÇAVKANIYÊN DÎJÎTAL

Dictionnaire de l'Académie Française:

https://academie.atilf.fr/8/consulter/lac?page=1 (25.04.2022)

https://academie.atilf.fr/8/consulter/latin?page=1 (25.04.2022)

https://academie.atilf.fr/8/consulter/mont?page=1 (25.04.2022)

https://academie.atilf.fr/8/consulter/NE?options=motExact&page=1 (25.04.2022)

HEBEŞ, Husên, *Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de,* Çapa Înternetê, April 2022, r. 148 https://drhabasch.wordpress.com/2022/04/18/raperina-canda-kurdi-di-kovara-haware-de-2/

MUHAMMED, Husein, "Rêbera Rastnivîsînê ya WM û Derdê Giran yê Hîperkorektiyê û Xweferzkirinê", (02.02.2020) r. 2 https://zimannas.files.wordpress.com/2020/02/husein-muhammed-1.pdf (30.03.2022)

https://islamansiklopedisi.org.tr/yalcin-huseyin-cahit (25.04.2022)

https://www.tdk.gov.tr/tdk/kurumsal/tarihce-2/#:~:text=T%C3%BCrk%20Dil%20Kurumu%2C%20T%C3%BCrk%20Dili,S%C3%A2mih%20Rif'at't%C4%B1r. (25.04.2022)

GENİŞLETİLMİŞ ÖZET

İÇİNDEKİLER

GİRİŞ

Genel çerçeve – araştırma konusu

Araştırmanın sınırları

Çalışmanın amacı

Metodoloji

BİRİNCİ BÖLÜM

Dilin Standardizasyonu ve Planlaması

İKİNCİ BÖLÜM

CELADET ALİ BEDİRHAN VE STANDARDİZASYON AÇISINDAN *HAWAR* VE *RONAHÎ*'NİN ÖNEMİ

Hawar'da Dilin Önemi

Hawar ve *Ronahî*'nin Amacı ve Standardizasyonu

ÜÇÜNCÜ BÖLÜM

***HAWAR* VE *RONAHÎ*'NİN STANDARDİZASYONUNA GÖRE KURMANCÎ'NİN İMLA KURALLARI**

Hawar'da Standardizasyon

Hawar'ın eki: Ronahî

DÖRDÜNCÜ BÖLÜM

HAWAR'DAN SONRAKİ İMLA KURALLARI ÇALIŞMALARI

Mistefa Aydogan ve Komxebata Kurmancîyê'nin *Rêbera Rastnivîsînê* Adlı Eserleri

SONUÇ

Bir dilin gelişim sürecinde en önemli unsurlardan biri de standardizasyondur. Bu unsur ulusçuluk için de aynı rolü oynar. Standard dil sayesinde oluşan ortak dil de, sadece iletişim için değil, aynı zamanda bir milletin kültürünü de üst seviyelere taşır ve bu sayede okuryazarlık artar, ister istemez yayıncılıkta da büyük bir gelişim izlenir. Devlet desteği ve komisyonların kurulmasıyla iyi bir sonuca ulaşabilen standardizasyon, Kürtler açısından daha farklı yollarla gelişti. Mesela bu rolü *Hawar* adında bir dergi üstlendi. Bu dergi adeta bir dil komisyonu görevi de gördü. Celadet Ali Bedirhan arkadaşlarıyla birlikte bu dergide Kurmancî'nin Latin alfabesinin temellerini attı. Bu dönüşüm sadece dilde değil, insanlarda da bir uyanış yarattı. Dilin ulusla ilişkisi, bununla birlikte modernizme doğru atılan adımlar gelişimin ve ilerlemenin parçasıydılar. Kurmancî'nin Latin alfabesinin temeli 1932'de Şam'da atıldı ve bugün de bu alfabe kullanılmaktadır.

Dünyadaki diğer milletler gibi, Kurmanclar da alfabenin değiştirilmesi ve dilin geliştirilmesi sayesinde yazılı dilde bir aydınlığa kavuştu. Kürtlerin Latin alfabesinden önceki alfabesi Arap alfabesiydi ve bazı aydınlara göre bu alfabe bu dil için yetersizdi. Bu nedenle Osmanlı'nın son yıllarında, Kürt aydınları içinde dili geliştirme ve düzeltme adına tartışmalar başladı. Bazıları var olan alfabeyi savunurken bazıları kesinlikle alfabenin değiştirilmesi kanaatindeydiler.

Bu tartışmalar çeşitli dergi ve gazetelerde devam etti yıllarca. Örnek alfabeler hazırlandı. Milletin gelişimi ve ilerlemesi için dilbilgisi ve sözlüklerin çıkması gerektiği tartışıldı. Fakat bu tartışmalar sadece bu yayınlarda kaldı. Hukuk eğitimi alan Celadet Bedirhan 1920lerin sonunda Şam'a gitti ve 1932'de *Hawar* dergisini yayınlamaya başladı. Bu yayınla birlikte Kurmancî Latin alfabesiyle yazılmaya başladı.

GİRİŞ

Ulusçuluğun Avrupa'da nasıl ve ne zaman başladığı tartışma konusudur. Genel görüşe göre ulusçuluk sanayi devrimiyle feodal toplumdan ayrıldı ve eğitim, okur-yazarlık, kültür, dil ve din birliği gibi yeni değerlere sahip oldu. Bu oluşumun amacı bir birliğin oluşmasıydı ve buradaki en önemli unsur da ulus ve ulusçuluktu. Ulus ve ulusçuluğun birbirini oluşturmasındaki tartışmalar ve görüşler her ne kadar farklı olsa da, araştırmacıların görüş birliğine vardığı kavram *ortak/lık* kavramıdır. Ulus ve ulusçuluk için *ortak* kavramı çok önemlidir, özellikle de dil açısından. İnsanların birbirini anlamasını kolaylaştıran dil, iletişimi yaymaktan çok halk arasında bir birlik oluşturur.

Ulusçuluğun oluşturduğu milli kimlik, milli kültür ya da ortak kültür ve din aslında dile dayanır. Bu kavramların oluşup yaşayabilmesi için de dilin ortak ve standart olması gerekmektedir. Çünkü oluşturulan standart dille okullarda aynı dilde eğitim-öğretim verilir, basın ve medya keza bu dilde dinleyici ve okuyucularına ulaşır ve dil çok hızlı bir şekilde gelişip yayılır.

Bu noktada sanayi devriminin Avrupa için önemi büyüktür. Ernest Gellner'in de belirttiği gibi ulus ve ulusçuluk sanayi devrimiyle başlamıştır. Bu sanayi toplumuyla birlikte, eğitim adına büyük adımlar atılmıştır ve okur-yazarlık insanların daha üst seviyelere çıkmaları için en önemli unsur olmuştur. Bu durumla doğru orantılı olarak şehirleşme daha çabuk oluşmuştur ve iş imkanları da artmıştır. Dil üzerine kurulan komisyonlar da dilin gelişimi için yaptıkları dilbilgisi, imla ve sözlük çalışmalarıyla bu ilerlemeyi pekiştirmiştir.

Bu durum Kürtler açısından daha farklı olmuştur. Çünkü Osmanlı Devleti'nde yaşayan Kürtler kendilerini Osmanlı gibi görürlerdi. Bunun yanı sıra Müslümanlık da çok önemli bir unsurdu onlar için. Kendilerini önce Müslüman, sonra Osmanlı ve en son da Kürt olarak görmüşlerdir. Bu nedenle Kürt ulusçuluğu üzerine çeşitli tartışmalar vardır. Bazılarına göre Ehmedê Xanî Kürt ulusçuluğunun öncüsüdür, bazılarına göre son Osmanlı döneminde ulusçuluk başlamıştır ve daha

yaygın olan bir görüş de şudur ki Kürt ulusçuluğu Osmanlı Devleti'nin çöküşünden sonra, yani 1918 dolaylarında başlamıştır.

Her halükarda diyebiliriz ki Kürt ulusçuluğu İstanbul'da –Kürt aydınlarının kendilerine mesken edindiği şehir, birçoğu için sürgün şehri olsa da- yıllarca tartışma konusu olmuştur. Ulusçuluktan ziyade dil meselesi de birçok defa gündeme gelmiştir ve aydınların da üzerinde durduğu şey sade, okuyup yazması kolay olan ve herkesin anlayabileceği bir dil ulusçuluk için önayak olacaktır. Bu nedenle dil çalışmaları üzerine yoğunlaşmışlardır.

GENEL ÇERÇEVE – ARAŞTIRMA KONUSU

Bu çalışmanın konusu Kürtçe'nin Kurmancî diyalektsinin *Hawar* dergisi bağlamında standartlaşma sürecidir. Latin alfabesinin oluşturulmasıyla birlikte dilin gelişimi incelenmiştir. Daha çok imla kuralları üzerine durulmuştur. *Hawar*'dan sonraki bazı imla kuralları kitapları da incelenip *Hawar*'la karşılaştırılmıştır.

ARAŞTIRMANIN SINIRLARI

Bu çalışma *Hawar* dergisinin imla kuralları üzerine yapılmıştır. Dolayısıyla *Hawar*'dan önceki dönemden yani Osmanlı Devleti'nin son yıllarından başlanmıştır. Bunun amacı da *Hawar*'dan önce imla ve dil üzerine yapılan çalışmaları ortaya çıkarmaktır. Osmanlı'nın son yıllarındaki Kürtçe ve Kürtçe üzerine yapılan çalışmalar ele alındıktan sonra *Hawar* ve *Ronahî* dönemleri çalışılmıştır. Bu da 1932'den 1944'e dek devam etmiştir. Bu iki dergideki imla ve yazım kuralları incelendikten sonra, bunlardan sonra çıkan imla ve yazım kuralları kitapları incelenmiş olup benzerlik ve farklılıkları saptanmıştır.

ÇALIŞMANIN AMACI

Bu çalışmanın amacı oluşturulan ilk Kürtçe Latin alfabesi ve sürecini incelemektir. Latin alfabesiyle birlikte dilde birçok yenilik gözlenmiştir. Örneğin bu alfabeyle birlikte dilbilgisi kuralları oluşturulmuştur. Bilindiği gibi bu alfabe ilk olarak *Hawar* dergisinde ortaya çıkmıştır, bu nedenle hemen hemen her sayının sonunda küçük bir sözlük de bulunmaktadır.

Kürtçe Latin alfabesiyle çıkarılan bu dergi ilk olma özelliğini taşımaktadır. Buradaki amacımız bu alfabeyle çıkarılan dergiyi imla ve yazım kuralları çerçevesinde incelemektir, dilde standartlaşma açısından nasıl bir yol izlediğini saptamaktır. Bu çalışmanın sonunda *Hawar* dergisinin standart bir dil oluşturup oluşturmadığı sorusu üzerine durulmuştur.

METODOLOJİ

Einar Haugen dil standardizasyonu ve planlamasının öncüsü olarak bilinmektedir. Bu çerçevede dört model geliştirmiştir. Diyalektin seçilmesi, kodlaması, uygulaması ve yayılması Haugen'in oluşturduğu modellerdir. *Hawar* ve *Ronahî* dergileri bu modellere göre incelenmiştir. Haugen'in ileri sürdüğü gibi dil standardizasyonu devletin desteğiyle oluşturulabildiği gibi kişisel çalışmalarla da yapılabilir, fakat dil planlaması devlet desteksiz yapılamaz. Çünkü bu planlamanın arkasında ulusçuluk da devreye girer ve devletin okul, enstitü ve basın-yayın kurmasıyla gerçekleşmektedir.

Bu bağlamda Haugen'in de belirttiği gibi Celadet Ali Bedirhan Latin alfabesini tek başına oluşturmuştur ve bunu uygulamalı olarak *Hawar* dergisinde ortaya çıkarmıştır ilk olarak. Bu nedenle bu dergi Kürtçe'nin Kurmancî diyalektsinin hem ilk oluşturulduğu alan, hem de okulu olarak görülebilir. Haugen'in bahsettiği diyalekt seçiminde Celadet Ali Bedirhan Kurmancî'yi seçmiştir, Latin alfabesiyle kodlamıştır, yine aynı dergide metinlerle uygulayıp yaymıştır.

BİRİNCİ BÖLÜM

DİLİN STANDARDİZASYONU VE PLANLAMASI

Bir dil ancak standartlaştığında ve dil planlaması kuralları çerçevesinde oluşturulduğunda ulus dili olur ve herkes tarafından anlaşılıp konuşulabilir. Bu konu üzerine çalışan devletlerin de genel amacı ortak ve ulus dili yaratmaktır. Çünkü uluslaşma sürecinde en büyük etkenlerden biri de ortak ve standart dildir.

Almanya, Fransa ve İngiltere gibi büyük devletlere baktığımızda dil üzerine yaptıkları çalışmaların, kurdukları enstitü ve dil komisyonlarının hep aynı amaca yönelik olduğunu görüyoruz: ulus, ulusçuluk ve uluslaşma. Çünkü ortak bir dil olmadan ülkenin dört bir yanındaki insanlar kendi ağızlarına göre konuşup yazarlar ve bu da ulusçuluk için tehlikeli bir şeydir. Birbirini anlamadan, aynı dili konuşup yazmadan ulus olunamayacağını anlayan bu devletler ilk olarak dili düzeltip okul ve basınla yaymaya başlamışlardır. Buna verebileceğimiz en iyi örnek Fransa'daki Académie Française'dir. Fransız Devleti temeli sağlam bir ulus oluşturabilmek adına bu kurumu kurmuştur ve oluşturulan komisyonlarla dilbilgisi, imla ve yazım, sözlük çalışmaları yapılmıştır.

Yukarıda da bahsettiğimiz gibi Einar Haugen standartlaşma ve dil planlaması üzerine dört model önermiştir ve bu modellerle dilin en iyi seviyeye gelip insanlar tarafından kabul edilebileceğini öne sürüyor. Tabi bu modeller üzerine başka fikirler de çıkmıştır. Kültürün dil üzerindeki etkisini savunanlar ve dili grafikleştirmek isteyenler vardır. Haugen ise bu görüşler üzerine "kültür" faktörünü tekrar olarak görmektedir.

Bunun üzerine Haugen dört modelini açıklarken diyalekt seçiminin önemini vurgular. Bu diyalekt seçiminin halkın içinde büyük bir savaşa yol açabileceğini, şahsi olabileceğini ya da çoğunluğun kararı olabileceğini açıklar. Kodlamanın şahsi bir çalışma da olabileceğini öne sürer. Uygulamayı bir yazar, enstitü ya da hükümetin yapabileceğini savunur ve bu olayın yazıyla olabileceğini açıklar. Yani

kitap, broşür ve gazetelerin uygulamada rolü büyüktür. Yayılmanın ise yine belirtilen unsurlarla yapılabildiğini öne sürer.

İKİNCİ BÖLÜM

CELADET ALİ BEDİRHAN VE STANDARDİZASYON AÇISINDAN *HAWAR* VE *RONAHİ*'NİN ÖNEMİ

Celadet Ali Bedirhan 1932'de yayınladığı ilk Kürtçe Latin alfabesiyle büyük bir dönüşüme doğru yol almıştır. Latin alfabesine geçişin amacı Kürtlerin modernleşme ve ilerlemesidir. Tabi bu çalışmanın temeli daha öncelere dayanmaktadır. Celadet Ali Bedirhan kardeşi Kamiran Bedirhan'la birlikte 1919'da Major Noel'in öncülüğünde Malatya gezisine katılırlar. Major Noel'in defterine not aldıklarının Kürtçe olup Latin alfabesiyle yazıldıklarını görür ve çok kolay ve hızlı bir şekilde yazıp okuduğunu fark eder. Bu olay onu Latin alfabesi konusunda heyecanlandırır ve bu alfabeyi Kürtçe'ye adapte etmek için çalışmalara başlar. Lakin birtakım sorunlardan dolayı bu çalışma 1932'ye kadar ertelenmek zorunda kalır.

HAWAR'DA DİLİN ÖNEMİ

Kurmanci'nin standartlaşması söz konusuysa *Hawar*'ın incelenmesi olmazsa olmazlardandır. Çünkü Latin alfabesi ilk olarak bu dergide yayın hayatına geçer ve insanlara ulaşır. İlk etapta insanların bu alfabeyi benimseyip hayata geçirmeleri elbette zordur fakat sonradan bu alfabeyle okuma-yazmanın daha çabuk öğrenildiğini fark ettiklerinde onlar için büyük bir olay olur.

Hawar birçok sayısında dilin ve okuma-yazmanın önemini vurgular. Bu nedenle insanları Latin alfabesini öğrenmeye teşvik eder hatta yazılarını geliştirebilmeleri için dergiye yazı göndermelerini ister. Dili daha iyi kavrayabilmeleri için birkaç sayıda alfabeyi tanıtır ve sonra dilbilgisi kurallarını anlatmaya başlar. Kürtler için adeta bir okul ya da dershane görevi görür bu dergi çünkü Kürtlerin dillerini öğrenebilecekleri bir kurum yoktur o dönemde.

Her ne kadar ilk sayılarda alfabeden tutun da imlaya kadar hatalar gözlemlense de sonraki sayılarda gitgide düzelmiştir. Bu da derginin bir gelişim sürecinde olduğunu göstermektedir.

HAWAR VE *RONAHÎ*'NİN AMACI VE STANDARDİZASYONU

Hawar ve *Ronahî* dergileri Kürtçe'nin Kurmancî diyalektinin standartlaşması açısından birer öncü konumundadırlar. Her iki derginin de sahibi olan Celadet Ali Bedirhan'ın amacı herkesin anlayıp, konuşup ve yazabildiği bir dil oluşturmaktı. Bu nedenle yazı dili üzerinde çok durmuştur.

Bu iki dergi de dil üzerine genel bir bakış açısı sunar bize. Dilin oluşumu ve gelişimi her sayıda kendini gösterir. *Hawar* alfabe ve dilbilgisi açısından birçok bilgi sunarken, imla konusunda belli başlıklar açılmamıştır. İmla kuralları çalışmamızın ana unsurudur ve bu kuralları ortaya çıkarmak oldukça zordur. Çünkü bu kurallara ulaşmak için bütün metinler okunup incelenmiştir ve ulaşılan veriler sistematik olarak kaydedilmiştir. Zor olmasının sebebi de şudur ki ilk başlarda belli bir kural yoktur ve son sayılara doğru Celadet Ali Bedirhan'ın imla ve yazım kuralları açısından tercihleri daha açık bir şekilde görülmektedir.

Hawar'da yaşadığımız bu zorluklar *Ronahî*'de giderek azalmıştır. Çünkü bu dergide artık bazı kuralların oturduğunu net bir şekilde görebilmekteyiz. Celadet Ali Bedirhan *Ronahî*'nin ilk 12 sayısının yazarlığını yapmıştır, diğer yazarlar bu sayıdan sonra eklenmiştir. Dolayısıyla bu ilk 12 sayıda Celadet Ali Bedirhan'ın oturttuğu imla ve yazım kurallarını görebilmekteyiz. Bu da gösteriyor ki dil kuralları bakımından *Ronahî* dergisi *Hawar*'a göre daha sistemli bir dergidir.

ÜÇÜNCÜ BÖLÜM

HAWAR VE *RONAHÎ*'NİN STANDARDİZASYONUNA GÖRE KURMANCÎ'NİN İMLA KURALLARI

Bu bölümde ilk olarak *Hawar* dergisi incelenmiştir. İmla ve yazım kurallarına göre alt başlıklar şeklinde metinlerden alınan örneklerle inceleme yapılmıştır. Daha sonra *Ronahî* dergisi incelenmiştir ve *Hawar*'la karşılaştırılması yapılmıştır.

HAWAR'DA STANDARDİZASYON

Hawar dergisinin ilk 23 sayısı Arap alfabesiyle de çıkmıştır, bu sayıdan sonra tamamen Latin alfabesiyle çıkmıştır. Bu dergide Kurmancî'nin yanı sıra Soranî ve Zazakî metinler de vardır. Aynı zamanda dergi ilk sayısından itibaren birçok sayısında Fransızca metinlere de yer vermiştir.

Daha önce belirttiğimiz gibi *Hawar*'da imla ve yazım kurallarına özel başlıklar açılmamıştır dilbilgisi ve alfabe gibi. Bu nedenle dergideki metinler bu konu için baz alınmıştır. Bu bölümün amacı metinler yoluyla imla ve yazım kurallarını saptamaktır. Aşağıdaki alt başlıklar *Hawar*'ın imla ve yazım kuralları üzerine olan çalışmalardır.

- Fiil
- Edat
- /y/den önceki /i/
- Özel isimler
- Ülke, dil ve ulus isimleri
- Coğrafik isimler
- Din ile ilgili isimler
- Unvan isimleri
- Olumsuzluk eki
- Sözcüklerin yazımı
- Gün, ay ve mevsim isimleri

- Sayılar

HAWAR'IN EKİ: RONAHÎ

Ronahî'nin alt başlığında Fransızca olarak *Hawar*'ın eki olduğu belirtilmiştir. Bu nedenle biz de bu dergiyi *Hawar*'ın eki olarak isimlendirdik. Bu derginin *Hawar*'dan farkı resimli olması ve alfabe ve dilbilgisine yoğunlaşmamasıdır. Ayrıca çokça savaş haberleri vardır ve bunun dışında mizahi yazılara da rastlayabiliyoruz.

Ronahî dergisinin *Hawar*'a göre daha sistemli bir dergi olduğunu belirtmiştik. İmla ve yazım kuralları daha belirgin ve oturaklı bir şekilde işlenmiştir. Bir önceki alt başlıkta sıraladığımız fiil, edat, özel isimler gibi unsurlar bu dergide de incelenmiştir ve *Hawar*'la karşılaştırılmıştır.

DÖRDÜNCÜ BÖLÜM

HAWAR'DAN SONRAKİ İMLA KURALLARI ÇALIŞMALARI

Bu bölümde *Hawar*'dan sonraki imla ve yazım kuralları eserleri incelenmiştir. Bu başlıktaki amaç sonradan çıkan bu eserlerin *Hawar*'ın izinden gidip gitmediğidir. Bu bölümde beş eser incelenmiştir.

MİSTEFA AYDOGAN VE KOMXEBATA KURMANCÎYÊ'NİN *RÊBERA RASTNİVÎSÎNÊ* ADLI ESERLERİ

Rêbera Rastnivîsînê Mistefa Aydogan'ın ve daha sonradan Komxebata Kurmancîyê'nin çıkardığı aynı adlı eserdir. Bu iki eserdeki amaç Kurmancî'nin standardizasyonunu oluşturmaktır. Komxebata Kurmancîyê'nin eseri bir grup çalışmasıdır ve Mistefa Aydogan'ın daha önceden çıkarmış olduğu eseri temel almıştır.

Bu çalışmada yine *Hawar*'da belirttiğimiz alt başlıklar incelenmiştir. Aradaki farklar gözlemlenmiştir.

SONUÇ

Bazı diller kendilerine en uygun diyalekti benimseyerek kendi standart dillerini oluşturmuşlardır. Hatta bazıları baştan aşağı değişmiştir. Örneğin Türkçe. Osmanlı döneminde, yani yüzyıllar boyunca Arap alfabesi kullanılmıştır. Son Osmanlı döneminde modernite, Avrupacılık ve sadeleşme bazı Türk aydınlarını alfabeyi değiştirme fikrine sürüklemiştir. Bu zorlu bir süreçti çünkü bazılarına göre Arap alfabesinden kopmak dinden kopmak demekti. Aynı süreç Kürtlerde de yaşanmıştır. Bazı Kürt aydınları alfabeyi değiştirmek isterken, bazıları dinden kopma korkusuyla bu düşünceye karşı çıkmıştır.

Bu süreç yayınlarda tartışılmıştır fakat pratikte görülmemiştir. 1932'de Celadet Ali Bedirhan *Hawar* dergisinde Kurmacî'nin Latin alfabesini yayınlamıştır ve bu süreç standartlaşma adına önemli bir adım olarak görülmektedir. Her ne kadar Latin alfabesinin oluşturulma süreci zorlu geçse de, Kurmancî'ye en uygun sesler bulunup yazıya geçirilmiştir.

İlk olarak *Hawar*'da yayınlanan bu alfabe *Ronahî* dergisiyle devam etmiştir. Bu iki eser imla ve yazım kuralları bakımından temel eserler sayılabilirler. Çünkü yıllardır istenen alfabe değişikliği ve standardizasyon bu eserlerle temelini atmıştır. Bu nedenle bu çalışmada *Hawar*'ın yanı sıra *Ronahî* de yer almıştır ve dilin gelişim süreci incelenmiştir.

Celadet Ali Bedirhan bu dergide alfabe ve dilin önemine çokça vurgu yapmıştır. Bu nedenle, *Hawar*'ı bir okul ve her sayısını da ders bilerek alfabe, dilbilgisi ve sözlük çalışmaları yürütmüştür. Fakat *Ronahî* biraz farklıydı *Hawar*'dan. Bu dergide daha çok savaş haberleri, fıkra ve tarih yazıları yer almıştır. Ayrıca ikisi arasındaki en büyük fark da *Ronahî*'nin resimli olmasıydı, bu da bu derginin ilk resimli Kürtçe dergi olduğunu gösteriyor.

Hawar'ın ilk sayısından *Ronahî*'nin son sayısına kadar dilin bir gelişim sürecinde olduğunu görebiliyoruz. İlk sayılardaki ikilem ya da hatalar son sayılarda

sistemli bir şekilde karşımıza çıkmaktadır. Bu nedenle bu dergilerin yerinde saymadığını, aksine gün geçtikçe gelişip olgunlaştığını görebiliyoruz.

Bu çalışmanın amacı Celadet Ali Bedirhan'ın alfabe ve yazım kurallarını incelemektir. Ayrıca bu eserlerden sonraki dönem de incelenmiştir. Bu son eserleri incelemedeki amaç Celadet Ali Bedirhan'ın kurallarının nasıl görüldüğü, oluşturduğu yazı dilinin standart olarak kabul edilip edilmediğini saptamaktır.